



K.T

**ZANÎNGEHA MÊRDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

Teza Lîsansa Bilind

**DÎWANA MELA HESENÊ SOFYANÎ:
METIN Ê LÊKOLÎN**

Halit ERTAŞ

21711013

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn – 2024

K.T
ZANÎNGEHA MÊRDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKÎYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

DÎWANA MELA HESENÊ SOFYANÎ:
METIN Ê LÊKOLÎN

Halit ERTAŞ

21711013

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mardin – 2024

T. C.

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

TEZ ONAYI

Enstitümüz Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında 21711013 numaralı yüksek lisans programı öğrencisi **Halit ERTAŞ**’nin hazırladığı “**Dîwana Mela Hesenê Sofyanî: Metin û Lêkolîn**)” başlıklı YÜKSEK LİSANS tezi ile ilgili TEZ SAVUNMA SINAVI, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 30.07.2024 Salı günü saat 14:00’da yapılmış, tezin onayına OY BİRLİĞİYLE karar verilmiştir.

Başkan

Prof. Dr. Abdurrahman Adak (Danışman)

Üye

Prof. Dr. M. Edip Çağmar

Üye

Prof. Dr. Hayrullah Acar

ONAY

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu’nun.....tarih
ve.....sayılı kararı ile onaylanmıştır.

Enstitü Müdürü

Doç. Dr. Ahmet Kırkan

ETİK BEYAN

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmada;

- Tez içindeki bütün bilgileri etik davranış ve akademik kurallar çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tez çalışmasının hazırlık, bilgi, belge, veri toplama, analiz ve bilgilerin sunumu olmak üzere tüm aşamalarda bilimsel etik ve ahlak kurallarına uygun davrandığımı,
- Tez çalışmasında kullanılan tüm eserlere eksiksiz atıf yaptığımı ve kullanılan tüm eserlere kaynaklar/kaynakçada yer verdiğimi,
- Tez çalışmasının özgün olduğunu,
- Tez çalışmasının Mardin Artuklu Üniversitesi tarafından kullanılan “bilimsel intihal tespit programı” ile tarandığını ve hiçbir şekilde “intihal içermediğini” beyan eder, aksinin ortaya çıkması durumunda her türlü yasal sonucu kabullendiğimi bildiririm.

Halit Ertaş

2024

KURTE

Teza Lîsansa Bilind

Dîwana Mela Hesenê Sofyanî: Metin û Lêkolîn

Halit Ertaş

Zanîngeha Mardin Artukluyê

Enstitûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

235 rûpel

Mela Hesenê Sofyanî şairekî Edebîyata Kurdî ya Klasîk e. Di sala 1943an de li gundê Kevnecarê yê girêdayî Farqînê ji dayik bûye. Mela Hesenî li gel ilmê xwe yê dînî berê xwe daye babetên civakî û neteweyî jî. Li dû vê yekê dîwaneke xweser bi taybetmendîyên Edebîyata Kurdî ya Klasîk nivîsiye ku heta niha dîwana wî nehatîye weşandin ji bilî heşt helbestan. Ji aliyê naverokê ve pir dewlemend e ku ji temayên millî, civakî, evînî, zimanî, tenduristî, xwarin û hwd pêk tê. Ji aliyê ruxsarî ve piranî li dor teşeyên mesnewî û murebbe'ê nivîsîne û li gel vê yekê xezel, qesîde û museddesê jî cihê xwe tê de dîtine. Wezna erûzê her çend bi awayekî mûsîqî hebe jî rasterast qalibên wê dernakevin ku eve jî taybetmendîyeke şairên sedsala XXem e. Di van helbestan de exleb kêşa kîteyî hatîye bikaranîn. Ev xebat ji destpêkek û çar pişkan pêk tê; pişka yekem li ser danasîna helbestvanî ye, pişka duyem li ser vekolîna dîwanê ji aliyê naverok û şiklî ve ye, pişka sêyem analîza kesayetîya edebî ya şairî ye li dû lêkolîna her du beşên ewil, pişka çarem transkîrbekirina dîwanê ye. Ev dîwan taybetmendîyên xweser di xwe de dihevine, ji aliyê teşeyê ve pirreng e, ji aliyê zimanî ve rewan û zelal e. Helbestvanî, helbestên xwe bi taybetî di bin bandora Cegerxwîn û Ehmedê Xanîyî de nivîsîne. Mela Hesenê Sofyanî, şairekî civakî û millî ye û taybetmendîyên sedsala XXem ên Edebîyata Kurdî ya Klasîk dide.

Peyvên Sereke: Edebîyata Kurdî ya Klasîk, Helbest, Dîwan, Mela Hesenê Sofyanî.

ÖZET

Yüksek Lisans Tezi

Mela Hesenê Sofyanî Divanı: Metin ve İnceleme

Halit ERTAŞ

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Kültürü ve Dili Anabilim Dalı

235 sayfa

Mela Hesenê Sofyanî, bir Klasik Kürt Edebiyatı şairidir. 1943 yılında Silvan’ın Kevnecar Köyünde dünyaya gelmiştir. Mela Hesen, dini ilmiyle beraber daha çok milli ve toplumsal konulara odaklanmıştır. Bununla beraber Klasik Kürt Edebiyatı özellikleri kapsamında yazmış olduğu özgün divanı, sekiz şiir dışında daha önce hiçbir şekilde yayımlanmamıştır. Muhteva açısından oldukça zengin edebiyatın yanısıra milli ve toplumsal konularda yazılmış şiirlerden oluşmaktadır. Divanında şekilsel açıdan genel olarak mesnevi ve murabba nazım birimlerinin ağırlığının yanısıra gazel, kaside ve müseddes de yer almaktadır. Her ne kadar ritim olarak aruz ölçüsü etkisini hissettirse de aruz kalıpları belirgin bir şekilde ortaya çıkmamaktadır. Şair, şiirlerinde genel olarak hece ölçüsü kullanmıştır. Bu çalışma bir giriş ve dört kısımdan oluşmaktadır; birinci kısım şairin hayatı, ikinci kısım şekil ve içerik açısından divanın incelemesi, üçüncü kısım ilk iki bölümün incelemesi üzerine şairin edebi kişiliği, dördüncü kısım ise divanın transkribesinden oluşmaktadır. Bu divanın özgün özellikler barındırdığını, şekilsel açıdan çeşitli olup dilin sade ve akıcı olduğu tespit edilmiştir. Şair, şiirlerini Cegerxwîn ve Ehmedê Xanî’nin etkisinde kalarak kaleme almıştır. Mela Hesenê Sofyanî, sosyal ve milli ve bir şair olup XX. yüzyıl Klasik Kürt Edebiyatı özelliklerini taşımaktadır.

Anahtar Kelimeler: Klasik Kürt Edebiyatı, Şiir, Divan, Mela Hesenê Sofyanî

ABSTRACT

Master Thesis

Mela Hesênê Sofyanî's Divan: Text and Review

Halit Ertaş

Mardin Artuklu University

Institute of Living Languages in Türkiye

The Department of Kurdish Language and Culture

235 pages

Mela Hesênê Sofyanî is a poet from classical Kurdish literature. He was born in Kevnecir, Silvan, in 1943. Mela Hesên concentrated on national and social issues in addition to his theological expertise. His original divan, which he penned in the style of classical Kurdish literature, has never been published, with the exception of eight poems. It is highly content-rich, covering a wide range of topics including national, social, lyrical, linguistic, health, and cuisine. In terms of form, masnavi and murabba verse units predominate, while ghazals, qasida, and museddese are also represented. Although the rhythm of the aruz meter may be sensed, it is difficult to form, as is typical of twentieth-century poets. In these poems, syllabic meter is commonly utilized. This study consists of an introduction and four parts; the first part is the poet's life, the second part is the analysis of the divan in terms of form and content, the third part is the literary personality of the poet on the analysis of the first two parts, and the fourth part consists of the transcription of the divan. It has been determined that this divan has original features, is stylistically diverse and the language is simple and fluent. The poet wrote his poems under the influence of Cegerxwîn and Ehmedê Xanî. Mela Hesênê Sofyanî is a social and national poet and has the characteristics of Classical Kurdish Literature of the twentieth century.

Key Words: Classical Kurdish Literature, Poetry, Divan, Mela Hesênê Sofyanî

PÊŞGOTIN

Dîwan ew cureyê edebîyatê ye ku şair helbestên xwe li gor rê û rêbazên dîyarkirî tertîb dikin û di yek berhemê de kom dikin. Her wekî edebîyatên dîtir ên Rojhelatê di Edebîyata Kurdî de jî vî cureyî xwe daye der û ji alîyê Edebîyata Kurmancî ve bi taybetî di Serdema Mîrektîyan û Neqşîbendîtiya Xalidî de pêş ketîye. Şair û helbestvanên kurd ku bi taybetî mela û şêx bûn û perwerdeya xwe di medreseyan de dîtibûn berê xwe dane vî cureyê edebîyatê. Niha jî li gel Edebîyata Kurdî ya Modern, Edebîyata Kurdî ya Klasîk jî hebûna xwe didomîne, xusûsen bi xêra şêx û mela û seydayan. Her çend berhemdayîna bi tarzê klasîk berdewam be jî, lêbelê vê carê atmosfer cuda ye. Bandora medreseyan kêm e, perwerdeya dibistanên fermî mecbûrî ye û dinya jî li gor geşedanê guherîye. Bivêt nevê tesîra van tiştan jî li ser şair û şî'rê çêdibe. Her dîse, di serdema modern de jî roj bo rojê çendîn berhemên nû yên klasîk ji alîyê şairên kurd ve tene nivîsîn. Bi awayekî giştî li ser vê formê bi alfabeya kurdî-erebî, bi naverok û teşeyên nû berhemên nû tên dayîn.

Mijara vê xebatê, helbestvanekî Edebîyata Kurdî ya Klasîk, Mela Hesenê Sofyanî û dîwana wî ye. Sofyanî di sedsala XXem de jîyaye, niha jî sax e û dîwaneke civakî û millî li Edebîyata Kurdî ya Klasîk zêde kirîye. Dîwana Mela Hesenê Sofyanî dîwaneke serbixwe ye û heta niha ji bilî heşt helbestan hîç nehatîye weşandin an jî çapkirin. Mela Hesenî, di çarêka dawî ya sedsala XXem de dest bi nivîsîna dîwana xwe kirîye. Yek ji taybetmendiyên şairên serdema modern hebûna mijarên millî û civakî ye. Li dû vê yekê alîyê Mela Hesenê Sofyanî yê millî û civakî bêhtir derdikeve pêş. Dîwana eslî li ber destan bû di hengama xebatê de. Her çend dîwan ji 76 helbestan pêk bê jî Seydayî bi tenê destûra weşandina 43 helbestan da.

Berî her tiştî, li hember rewşeke awarte pêdivî hebû ev berhema giranbiha ji bo Edebîyata Kurdî bi awayekî dijîtal hatiba kopîkirin. Di destpêkê de bi xêra hevpeyvîna bi helbestvanî bi xwe re, agahiyên derbarê jîyana wî de hatin nivîsîn, paşê dîwan bi alfabeya transkrîpsiyonê hate latînîzekirin û dawîyê jî di bin banê çar beşan de lêkolîn li ser dîwanê hate kirin. Beşa yekem, bi giştî ji rewşa serdema helbestvanî û agahiyên şexsî yên derbarê wî de pêk tê. Di vê beşê de ji bo başnasîna Seydayî hevpeyvîn bi feqîyên wî re jî hatîye kirin. Her paşê, beşa duyem li ser

vekolîna dîwanê ye ji alîyê ruxsarî û naverokî ve. Di beşa sêyem de analîza kesayetîya edebîya ya helbestvanî hate kirin, li ser daneyên di her du beşên destpêkê de ketine ber destan. Beşa çarem, li gor rê û rêzikên dîyarkirî ji latînîzeyê dîwanê pêk tê.

Lêkolînên li ser berhemên klasîk, bi taybetî yên ku nivîskarê wan ne sax in, pêdivî bi kedeke zêde heye. Gelek caran di dema lêkolînê de lêkoler ji ber zanyariyên kêr dikeve nav neçariyê an li ser rastî û nerastîya hindêk agahiyan dikeve heftdilîyê. Di vê babetê de saxbûna helbestvanî derfeteke gelek mezin e ku ji bo lêkolerî di dema lêkolîna berhemê de ji her alîyê ve ji bo agahiyan rast û durist û nihênîyên berhemê xwedî derfeteke mezin e. Esasen di dema vekolînê de hevkarîya li gel helbestvanî ihtîmala hebûna xeletîyan kêmtir dike.

Di dûmahîka vê xebatê de em bi taybetî spasîyên xwe arasteyî şewirmendê xwe Prof. Dr. Abdurrahman Adakî dikin ku di hîna amadekirina vê xebatê de ji serî heta binî kedeka gelek mezin da. Her weha em sipasîya mamoste Prof. Dr. M. Edip Çağmarî dikin ku di warê xwegehandina vê dîwanê de rêberîya me kir û her gav li gel me bû di her qonaxa têkilîya li gel helbestvanî de û her weha di parastina tezê de wek endamekî jurîyê wezîfe kir. Her paşê, em spasîya Mela Hesenê Sofyanî bi xwe jî dikin ji ber sebir û harîkarîya wî ku me ji serî heta binî pêdaçûnek kir li ser dîwanê kir û her gav amade û harîkar bû bo pirsên me. Dîse ji ber têbînî û hişyariyên wî, em spasîyan xwe pêşkêşî jurîyê tezê mamoste Prof. Dr. Hayrullah Acarî jî dikin. Her weha ez spasîya hevala xwe Yasemîn Aygunê dikim ku min bi saya kompîtura wê karî teza xwe binivîsim û spasîya hemû hevalên mayî dikim ku di prosesa tezê da bi awayekî ji awayan piştgirîya wan gihîştîye min. Spas bo Xudayê dilovan û dilovîn.

Halit ERTAŞ

Mardin - 2024

NAVEROK

KURTE	IV
ÖZET.....	V
ABSTRACT	VI
PÊŞGOTIN	VII
NAVEROK	IX
LÎSTEYA GRAFÎK Û PÊVEKAN.....	XIV
KURTEBÊJE	XV
DESTPÊK	1
<i>Mijar, Giringî û Armanca Tezê</i>	1
<i>Rêbaza Amadekirina Tezê</i>	1
<i>Jêderên Tezê</i>	3
1. MELA HESENÊ SOFYANÎ: SERDEM, BÎYOGRAPHÎ Û BERHEM	5
1.1. Kurtenêrînek li ser Serdema Sofyanî.....	5
1.1.1. Bi awayekî giştî rewşa kurdan a berî serdema Sofyanî	5
1.1.2. Rewşa kurdan a giştî di serdema Komara Tirkîyeyê de	8
1.1.3. Edebîyata Kurdî ya neteweyî di serdema Komara Tirkîyeyê de	11
1.2. Jîyana Sofyanî.....	15
1.2.1. Malbat, jidayikbûn û zaroktîya wî.....	15
1.2.2. Navê wî û mexlesa wî.....	16
1.2.3. Perwerdeya wî	19
1.2.4. Melatî û muderrîstîya wî.....	22
1.2.5. Rûtîna rojane ya perwerdeya wî	24
1.2.6. Rewşa aborî ya medreseyan a serdema wî	26
1.2.7. Hinek feqîyên wî.....	28
1.2.7.1. Mela Remezanê Birîfkanî	28
1.2.7.2. Mela Remezan Can.....	29
1.2.7.3. Mela Remezanê Dedaşî	29
1.2.7.4. Ehmed Kanî	30
1.3. Berhemên Sofyanî	31
1.3.1. Dîwan.....	31
1.3.2. Haşîyeya Mem û Zînê.....	31

2. VEKOLÎNA DÎWANA SOFYANÎ.....	32
2.1. Danasîna Giştî ya Dîwanê	32
2.2. Zimanê Dîwanê.....	33
2.2.1. Ferhengok	34
2.2.2. Biwêj.....	37
2.2.3. Cotepeyv.....	38
2.2.4. Peyvên refleksê.....	39
2.2.5. Bêje û têgehên taybet.....	40
2.2.6. Devok û zaravayên kurdî.....	41
2.2.6.1. Unsûrên kurancî.....	41
2.2.6.1.1. Devoka Silîvanê/Amedê	41
2.2.6.1.2. Devoka Botanê.....	42
2.2.6.1.3. Devoka Colemerg û Badînanê.....	43
2.2.6.1.4. Devoka Mêrdînê	44
2.2.6.1.5. Devoka Serhedê.....	45
2.2.6.1.6. Kurmancîya nû.....	46
2.2.6.2. Unsûrên soranî.....	48
2.2.7. Unsûrên zimanên bîyanî	49
2.2.7.1. Unsûrên erebî.....	49
2.2.7.2. Unsûrên farisî.....	50
2.2.7.3. Unsûrên tirkî.....	50
2.2.7.4. Unsûrên îngilîzî	51
2.3. Hunerên Edebî	52
2.3.1. Hunerên edebî yên bi mecaz û teşbîhê ve girêdayî.....	53
2.3.1.1. Teşbîh (lêkçiwandin).....	53
2.3.1.2. Îstî'are	54
2.3.1.3. Mecaza mursel.....	54
2.3.1.4. Kînaye.....	55
2.3.2. Hunerên edebî yên bi wateyê ve girêdayî.....	55
2.3.2.1. Mubalexe	55
2.3.2.2. Teşxîs (kesandin).....	56
2.3.1.3. Tecahula 'arif.....	58
2.3.1.4. Îstîfham	58
2.3.1.5. Nîda	59
2.3.1.6. Tekrîr	59
2.3.1.7. Tedrîc.....	60
2.3.1.8. Tezad.....	61
2.3.1.9. Muqabele	62
2.3.1.10. Tenasub.....	62
2.3.1.11. Teraduf (hemwateyî)	63
2.3.1.12. Bera'etê istihlal.....	64

2.3.1.13. Telmîh (bîranîn, yaddaşt).....	64
2.3.1.14. Îrsala mesel.....	65
2.3.3. Hunerên edebî yên bi peyv, deng û ahengê ve girêdayî	66
2.3.3.1. Cînas	66
2.3.3.2. Muwazene.....	67
2.3.3.3. Tersî‘	67
2.3.3.4. Tesmît	68
2.3.3.5. Tezmîn	68
2.4. Teşeyên Nezmê.....	69
2.4.1. Teşeyên nezmê yên ku ji malikan/beytan pêk tên	69
2.4.1.1. Mesnewî.....	69
2.4.1.2. Qesîde	70
2.4.1.2.1. Qesîdeya hizirî.....	70
2.4.1.3. Xezel.....	70
2.4.1.3.1. Xezela murace‘e	71
2.4.1.3.2. Xezela mutewwel.....	72
2.4.1.3.3. Xezela muserre‘/muselsel.....	73
2.4.2. Teşeyên nezmê yên ku ji bendan pêk tên	73
2.4.2.1. Murebbe‘	74
2.4.2.1.1. Murebbe ‘a muzdewica asayî	74
2.4.2.1.2. Murebbe‘a mutekerrira kit a asayî.....	75
2.4.2.1.3. Murebbe‘a mutekerrira cot a asayî.....	75
2.4.2.1.4. Murebbe‘ wekî bendên serbixwe.....	76
2.4.2.2. Museddes	77
2.5. Tema û Cureyên Edebî	79
2.5.1. Temayên dîwanê.....	79
2.5.1.1. Hizra neteweyî.....	79
2.5.1.2. Giringîya zimanê kurdî.....	80
2.5.1.3. Rexneya civakî.....	81
2.5.1.4. Hevgirtin û yekîfî.....	82
2.5.1.5. Xwendin û zanîn.....	82
2.5.1.6. Beg, şêx û axa.....	83
2.5.1.7. Xizanî.....	85
2.5.1.8. Evîn.....	85
2.5.1.9. Dîn	86
2.5.1.10. Tenduristî/cixare	87
2.5.1.11. Mafên karkeran.....	88
2.5.1.12. Keşfên zanistî.....	88
2.5.1.13. Firoşgeh û dikandariya rast.....	89
2.5.2. Cureyên edebî.....	89
2.5.2.1. Helbesta lîrîk.....	89

2.5.2.2. Pendname.....	90
2.5.2.3. Mersîye	91
2.5.2.4. Medhîye	92
2.5.2.5. Name.....	92
2.5.1.6. Geştname (seyahetname).....	95
2.5.1.7. Simatîye	96
2.5.1.8. Cureyên bi keş û hewayê ra pêwendîdar	99
2.6. Kêş, Serwa û Paşserwa	100
2.6.1. Kêşa kîteyî	101
2.6.2. Serwa	103
2.6.2.1. Li gorî cih û cureyên serwayê.....	103
2.6.2.1.1. Serwaya bêpaşserwa.....	103
2.6.2.1.2. Serwaya bipaşserwa.....	103
2.6.2.2. Li gorî hevpişkîya dengên cureyên serwayê.....	104
2.6.2.2.1. Serwaya mucerred	104
2.6.2.2.2. Serwaya murdef.....	104
2.6.3. Paşserwa (redif).....	105
2.6.3.1. Paşserwayên qertafî.....	105
2.6.3.2. Paşserwayên qertaf û bêje.....	105
2.6.3.3. Paşserwayên bêje/kombêjeyî.....	106
3. KESAYETÎYA EDEBÎ YA SOFYANÎ	107
3.1. Helbestvanên Bandor li Sofyanî Kirîn.....	107
3.1.1. Ehmedê Xanî (1651-1709)	107
3.1.2. Cegerxwîn (1903-1984).....	109
3.2. Kesayetîya Sofyanî ya Poetîk	111
3.2.1. Ruhê Sofyanî yê hişyarkirinê.....	112
3.2.2. Ji alîyê ruxsarî ve poetîkaya Sofyanî.....	113
3.2.3. Dewlemendîya temayan di helbestên Sofyanî de	114
3.2.4. Hizir û bîr û bawerîyên Sofyanî.....	114
4. METNA REXNEYÎ YA DÎWANA SOFYANÎ	118
4.1. Danasîna Dîwanê û Nusxeyên Wê	118
4.1.1. Helbestên hatîne weşandin	118
4.1.1.1. <i>Seydayê Mela Yehya</i>	118
4.1.1.2. <i>Hela Rabe</i>	118
4.1.1.3. <i>Melayê Qurişa</i>	119
4.1.1.4. <i>Çengek Tişt</i>	119
4.1.1.5. <i>Ji Bo We</i>	119
4.1.1.6. <i>Geşta Serhedê</i>	119
4.1.1.7. <i>Derbarê Cixareyê de</i>	120
4.1.1.8. <i>Pesnê Pêşkêşê Mezin Barzanî</i>	120

4.1.2. Nusxeyên dîwanê.....	120
4.1.2.1. Teswîfa nusxeyê	120
4.2. Rêbaza Amadekirina Metina Dîwanê.....	122
4.3. Metina Rexneyî ya Dîwanê	125
ENCAMNAME	206
JÊDER.....	209
PÊVEK.....	214



LÎSTEYA GRAFÎK Û PÊVEKAN

LÎSTEYA GRAFÎKAN

Grafîk 1: Teşeyên Murebbe‘ê di Dîwanê de	77
Grafîk 2: Teşeyên Nezmê di Dîwanê de	78
Grafîk 3: Rêjeya Kêşa Kîteyî di Dîwanê de	102

LÎSTEYA PÊVEKAN

Wêne 1: Bergê Nusxeya Dîwanê yê Orîjînal.....	214
Wêne 2: Helbesta Yekem a Dîwanê.....	215
Wêne 3: Rûpela 39ê ya Dîwanê.....	216
Wêne 4: Rûpela 60ê ya Dîwanê.....	217
Wêne 5: Rûpela 80yê ya Dîwanê.....	218
Wêne 6: Mela Hesenê Sofyanî.....	219
Wêne 7: Wêneyê Komî	220

KURTEBÊJE

AMD	:amadekar
B.D	:bêdîrok
BNR	:binêre
C	:cild
Ç	:çap
H.B	:heman berhem
H.G	:heman gotar
HJ	:hejmar
HWD	:her wekî dî
LTNZ	:latînîzekirin
R	:rûpel
TR	:tirkî
WER	:wergêr
WEŞ	:weşanxane

DESTPÊK

Mijar, Giringî û Armanca Tezê

Dîwana Mela Hesenê Sofyanî ku yek ji berhemên Edebîyata Kurmancî ya hevçax e, babeta vê xebatê ye. Di vê xebatê li ser jîyana Sofyanî, latînîzekerina şî'rên di dîwanê de û lêkolîna metinê ji aliyê ruxsarî û naverokî ve hatîye rawestan.

Dîroka Edebîyata Kurdî di sedsala XXem de bûye şahidê gelek şair û edîbên kurd ku yek ji serdemên giring ên dîroka Edebîyata Kurdî ye. Li gel xebatên ku van salên dûmahîyê hatine kirin, gelek berhemên vê sedsalê yên curawcur hatine dîtin/tesbîtkirin û zanyarîyên giring derbarê serdem, şair, edebîyat û çandê de hatine bidestxistin. Bi vê perspektîfê, helbestvanê ku babeta teza me ye û aydê nîveka duyem a sedsala XXem e ku ne ji mêj ve ye xeberê me jê çêbûyî, dîwana xwe ji çarêka sedsala bîstem anku ji 1974ê heta sala 2020ê di maweyê 46 salan de nivîsiye. Bi taybetî, ev dîwan berhemeka giring e bi tema, mijar û şêweya xwe. Lewre divêtin ev dîwan di maweyekî kin de li pirtûkxaneya Edebîyata Kurdî bête zêdekirin.

Di vê xebatê de armanca me ya sereke gehandina vê dîwanê ye bo vekolerên Edebîyata Kurdî. Dîwan, heta niha bi çî şiklî nehatîye weşandin ji xeynî heşt helbestan. Ev helbest hemî jî di kovara Nûbiharê de hatine weşandin. Armanc, latînîzekerina helbestên di dîwanê de ne, da baştir bêne xwendin û famkirin û li dû vê yekê bi vekolîna ruxsarî û naverokî xwegehandina nirx û estetîka edebî ye ku di dîwanê de hatine cîbicîkirin. Ev dîwan dê di çarçoveya serdema xwe de ji aliyê edebî, civakî, siyasî û çandî ve bête nirxandin. Ji aliyekî dî ve pêdivîyî gotinê ye ku Prof. Dr. M. Edip Çağmar ev mijar pêşniyazî şewirmendê me kir û pêwendîya me ya bi Seydayî re bi rêya wî çêbû.

Rêbaza Amadekirina Tezê

Edebîyat zanistêke sosyal e û divê di vekolînên edebîyatê da jî ji rêbazên zanistên sosyal sûd bê wergirtin. Ji ber ku mijara teza me jîyana Mela Hesenê Sofyanî û vekolîna dîwana wî ye, me di teza xwe de hin rêbazên ku bo vê mijarê biguncin cîbicî kirin. Hevpeyvîn, raçavkirina çavkanîyan, analîz û tehlîl, amadekirina îstatîstîkan, transkrîpsîyona metina destnivîs bûne rêbazên sereke yên vê xebata me.

Di vê xebatê de wek gava pêşî serdana şairî hate kirin û nusxeya orîjînal jê hate standin. Di destpêkê de me hevpeyînek pê re kir bi mebesta nasîna şairî ku berhema wî baş bê tehlîlkin. Di maweyê 2 salan de 3 caran me serdana Seydayî kir. Di van her sê serdanan de şêwirmendê tezê Prof. Dr. Abdurrahman Adak û bi hemû dildarîya xwe mamoste Prof Dr. M. Edip Çağmar hebû ku bi xêra wî me ev mijar peyda kiribû. Di cara sêyem û dawîn a hevpeyvîna (06.07.2024) me de, bi Seydayî re suhbeteke dûr û dirêj çêbû. Seydayî ji şimkê heta kumkê behsa jîyana xwe kir.¹

Li dû lîsteya pirsên li ser bîyografiya alimên medreseyan ku ji aliyê şêwirmendê tezê ve hatibû dayîn, me di vê hevpeyvînê de pirsên xwe li ser jînenîgarîya wî, serdema wî û berhemên wî jê kirin. Mamoste Abdurrahman û mamoste Edip, her duyan jî di vî warî de piştî me qet bernedan û bi dîrektîfên wan me karê xwe qedand. Bi vê rêkê gelek zanyarîyên derbarê Sofyanî, berhema wî û serdema wî de ketin ber destan. Vê yekê merheleya ewil anku beşa yekem a xebatê pêk anî. Piştî, helbestên destxet ên di vê dîwanê de bi hûrbînan û baldarî hatine latînîzekirin.

Di dîwana Mela Hesenê Sofyanî da 76 helbestên serbixwe hene. Lêbelê li ser daxwaza Sofyanî ji van helbestan bi tenê 43 heb bûne mijara vê xebatê. Di dema latînîzekirinê de jî, şêwirmedê tezê her tim rêber û harîkar bû. Peyvên nedihatine xwendinê jî rasterast ji Seydayî dihatine pirsîn û fêrbûnê. Carekî jî ji serî heta binî li gel Mela Hesenê Sofyanî metina latînîze û ya orîjînal bi rengê danberhevê hate xwendin û xeletî hatin rastkirin. Çawa ku di beşa “Rêbaza Amadekirina Metina Dîwanê” da bi berfirehî hatîye îzahkirin, ji bo latînîzeyê serî li hindêk herfên navneteweyî hate dayîn, da deng û telafûz û wateya peyv û gotinê rasttir û çaktir bête famkirin.

Her wekî helbestên li ber destan ên ku hatîne latînîzekirin vê carê ji aliyê naverok û ruxsarîyê ve tehlîla wan bi hûrgilî li gel çavdêrî û rênîşanderî, harîkarîya şêwirmendê tezê hate kirin. Bi vî şiklî şîyanewerîya şairî û estetîka edebî ya

¹ Em spasîyên ji dil û can bo Mamoste Prof. Dr. Edip Çağmarî dikin ku her cara me xwestî bi me re bû bi hemî dildarîya xwe. Her weha em spasîyên xwe li seyda Mela Hesenê Sofyanî jî dikin ku gelek bi xwînşirînî bal me ve hat û hem di hevpeyvînê de hem jî di latînîzekirinê de gelek harîkarîya me kir. Wek dawî, em spasîyên bêhempa bo şêwirmendê xwe Prof. Dr. Abdurrahman Adakî dikin ku di her qonaxeka amadekirina tezê de bîgehîndî û bibêhnfirehî li def me bû û rênîşanderê me bû.

helbestan hate dîtin. Her weha dîwan ji alîyê temayên xwe ve hate hêlsengandin ku eve beşa duyem ya xebatê bû.

Pîştî lêkolîna dîwanê li ser esasê lêkolîna ku me kirîye, me beşa sêyem ji bo kesayetîya edebîya ya Sofyanî terxan kir. Sebeba nivîsîna wî û îlhama nivîsîna wî hatine tesbîtkirin. Di beşên lêkolîna dîwanê de hate dîtin ku helbestvan ji alîyê naverokê ve, bi hunerên edebî, cureyên nezmê, temayên pirreng û şîyana zimên, helbestvanekî pirhêl e. Her weha ji alîyê ruxsarî ve jî bi karanîna teşeyên nezmê, kêş û serwayên helbestê û estetîka zimên ve xwedîşîyan e. Di vê beşê de ji bo başnaskirina Seydayî me hevpeyvînên kurt bi çend feqîyên Seydayî re kirin û me cih da agahîyên ku ketine destê me. Di encamê de bi vî rengî mirov dê bikare şairê navborî û şairên di yê heman edebîyatê û serdemê bidin ber hev.

Pîşka çarem ji bo metina transkrîpta berhemê hatîye veqetandin ku her wekî hatî gotin xebat li ser 43 helbestan e. Her çend ji van helbestan serenavê hindek helbestan hebe jî exleb bêserenav in, bes di şûna serenavî de tarîxa wê hatîye danîn. Li dû hindê, ev tarîx li dawîya helbestan hatine danîn. Her weha ji bo lêkolîna vê xebatê helbet serî li gelek jêderan hatîye dayîn.

Jêderên Tezê

Di lêkolînên berhemên edebî de, qasî berhemê naskirina nivîskarî, qasî naskirina nivîskarî jî naskirina serdema nivîskarî giring e. Li dû hindê, hewil hate dayîn bi çirayekî serdema nivîskarî jî bê ronahîkirin. Ji bo vê yekê jî helbet rasterast ji destê yekem anku ji helbestvanî bi xwe agahî hatine girtin. Ji ber ku şair sax e, hevpeyvîn pê re hate kirin û pirs jê hatin kirin derbarê jîyan û berhema wî de.

Her weha, ji bo atmosfera sîyasî û edebî ya serdema helbestvanî serî li çavkanîyên kurdî û tirkî yê hatine dayîn, her wekî hatî: *Kürt Sorunu* (Altan Tan, Timaş, 2011), *Kürtler* (Serdar Yıldırım, TDV İslam Ansiklopedisi, 2019), *Dîroka Wêjeya Kurdî* (Qenatê Kurdo, Öz-Ge Yayınları, 1992), *Kürtler ve Kürdistan Tarihi* (Mehmet Emin Zeki Beg, Nûbihar, 2011), *Kürtler* (Mehrdad Izady, Weşanên Doz, 2011), *Bütün Yönleriyle Arabkendi* (M. Şerif Eroğlu, Kent Yayınları, 2004), *Mem û Zîn'de Kürt Milliyetçiliği* (Ferhad Şakelî, Weşanên Doz, 1996), *Dewleta Osmanî û Neteweperwerên Kurd* (Hakan Özoğlu, Kitap Yayınevi, 2012), *Serdema Xalidîtîyê di*

Tarîxa Edebîyata Kurdî ya Klasîk de (Abdurrahman Adak, Kürt Tarihi, 2017), *Çaldıran Osmanlılar Safeviler ve Kürtler* (Murad Ciwan, Avesta, 2015) *Şark Medreseleri* (Sabahattin Bala, Hiper Yayınları, 2009), *Şark Medreselerinde Bir Ömür* (Sadrettin Öztoprak, Hiper Yayınları, 2009), *Bingöl'de Medreseler ve Müderrisler* (Abdulmuttalip Arpa, Bingöl Araştırmaları Dergisi, 2014) û hinek berhemên dîtir ên bi tirkî yên derbarê serdem û neteweperwerîya kurdî de. Yek ji çavkanîyên dîtir di vê beşê de hevpeyvîna bi çend feqîyên Seydayî re bû. Ji ber ku helbestvan di serdema Komara Tirkîyeyê de jîyaye, bi taybetî xebatên behsa wê serdemê dikin bûne jêder.

Helbet serekanîya xebatê dîwana helbestvanî bû. Bes dema lêkolîna metinê ji aliyê hunerên edebî, teşeyên nezmê, cureyên edebî, kêş û serwa û temayên dîwanê ve hatî kirin me bi giranî ji van çankanîyan îstîfade hate kirin: *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk* (Abdurrahman Adak, Nûbihar, 2015) *Teşeyên Nezmê Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de* (Abdurrahman Adak, Nûbihar, 2019) *Ansiklopedîk Divân Şiirî Sözlüğü* (İskender Pala, Kapı Yayınları, 2012), *Alıştırmalarla Belagât Arapça Dil Bilgisi* (M. Edip Çağmar, Ensar, 2022), *Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat* (M. A. Yekta Saraç, 3F yayınları, 2007), *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi* (Cem Dilçin, Türk Dil Kurumu, 2009), *Açıklamalı Edebî Sanatlar* (İsa Kocakaplan, Türk Edebiyatı Vakfı, 2011), *Belâgat Terimleri Sözlüğü* (Ali Bulut, M.Ü. İlahiyat Fakültesi, 2015). Her weha di nav jêderan de gelek jêderên dîtir wekî gotar û pertûkên ji Edebîyatên Kurdî û Tirkî hene.

Her paşê bi taybetî ji bo başnasîna helbestvanî pêdivî bi axaftina bi kesên li derdora wî hebû. Di vê çarçoveyê de hevpeyvîn bi birayê wî Ehmed Kanî re hate kirin. Bê guman ji ber ku kesên herî nêzîk piştî malbata wî feqîyên wî bûn, hevpeyvîn bi wan re hate kirin. Hevpeyvînen bi feqîyên wî Mela Remezanê Birîfkanî, Mela Remezan Can, Mela Remezanê Dedaşî û bira û feqîyê wî Ehmed Kanî re hate kirin ku di encama vê yekê agahîyên derbarê şexsê helbestvanî, serdem, rêbaza perwerdeyê û îdeolojîya wî de ketin ber destan.

1. MELA HESENÊ SOFYANÎ: SERDEM, BÎYOĞRAFÎ Û BERHEM

Di vê pişkê de agahîyên derbarê serdema Mela Hesenê Sofyanî, jîyana wî û berhemên wî de hatine dayîn. Bi taybetî vekolînek li ser kesên kesên li ber destê wî rabûyî hatîye kirin. Hevpeyvîn bi hinek feqîyên wî re hatîye kirin.

1.1. Kurtenêrînek li ser Serdema Sofyanî

Ji bo jîyana şexsî ya Mela Hesenê Sofyanî baştir bê fêmkirin, pêwist e berî wê serdema ku Sofyanî jîyana xwe tê de borandîye bê zanîn. Sofyanî helbestvanekî hevçax ê sedsala XX/XXIem e. Lewma em ê di vê beşê de agahîyên giştî yên derbarê serdema wî da pêşkêş bikin. Her weha bi mebesta ku serdema wî bi taybetî ji aliyê edebî ve baştir bê naskirin em ê bi kurt û kurmancî li ser qonaxên berî wî yên Edebîyata Kurdî jî rawestin.

1.1.1. Bi awayekî giştî rewşa kurdan a berî serdema Sofyanî

Kurd miletekî kevn in ku hebûna wan digehe demên berî mîladê. Di tarîxê de ji berî zayînê bigire heta serdema Osmanîyan li erdnîgarîya Kurdistanê û derdorê wê gelek dewlet ava kirine. Di mênûya Edebîyata Kurdî de bi taybetî di serdemên destpêka Îslamê de ji aliyê nivîskarên kurd ve gelek berhem tene nivîsîn, lêbelê zimanê van hemîyan jî bi erebî ne. Di wê serdemê de dewletên kurdan ên cuda hene û hukimdarîya wan di destê kurdan de ye.

Bi taybetî di sedsala sêzdeyan de li gel pêvajoya rûxandina dewleta Ebasîyan ji aliyê Moxolan ve, hêdî hêdî dûmahî li dewletên kurdan jî tîn. Ev yek bi xwe re serdemeke nû ava dike; li erdnîgarîya Kurdistanê berî Osmanîyan dest pê dike û paşê jî di bin desthelatdarîya Osmanîyan de serdema mîrektîyan dewam dike. Di sedsala XVIem de kurd bi Osmanîyan re dibin tifaq û pêşîkê li cihên wekî Hekarî, Cizîr, Amêdî û Erdelanê; paşê li cihê wekî Bedlîsê, Bazîdê, Miksê, Hîzanê, Şêrwanê û Gêlê hwd mîrektîyên kurdan ava dikin û hebûna xwe heta sedsala nozdeyan didomînin.²

²² Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, Çapa Sêyem, 2015, r. 191-192.

Kurd û welatê kurdan di navbera dewleta Osmanî û Safewîyan de wekî tamponê bû. Bi vê bineyê gelê kurd ji ber şerê her du dewletan xusarên mezin dibîne. Ev şerê di navbeyna van her du dewletan de ji bo kurdan dibe delîv. Di Şerê Çaldêranê (1514) de kurd dibine hevalê Osmanîyan. Di serdema Yavuz Sultan Selimî de sîyasetmevanê kurd Îdrîsê Bidlisî pêwendî bi Osmanîyan dideyne û piraniya mîrektîyên kurdan xwe didine alîyê Osmanîyan. Bi vê yekê re Sefewî têk diçin û di navbeyna van her du dewletên navborî de bi Rêkeftina Qesra Şîrînê sînoren nû tene danîn. Bes di talîya vê yekê de welatê kurdan vediqete du pişkan û hindek mîrektî li alîyê safewîyan dimînin.³

Yek ji egerên piştgirîya Osmanîyan jî ew bû ku dema mîrektîyên kurdan di bin desthelatdarîya Safewîyan de, padşayê wan Şah Îsmail gelek zulm û kuştin û girtin û te'dayê tîne serê kurd û mîrên kurdan. Yek ji egerên di jî ew bû ku kurd bi gelemperî sunî bûn bes xelkê safewî exleb şî'î bûn. Vê yekê cudahîyek diêxiste di navbeyna kurd û safewîyan de. Gelek mîrektîyên kurdan ava dibine ve û ev mîrektî di nav xwe de dibin xweser; ji der ve girêdayî Osmanîyan. Di dûmahîya vê yekê de serdemeke zêrîn bo kurdan dest pê dibe. Kurd medrese û dezgehên fermî ava dikin û zimanê kurdî dibe wekî zimanekî fermî. Kurd di warê ilmî de gelek pêş dikevin; bi kurdî berhemên zanistî û edebî tîne nivîsîn.⁴

Hema bêje li navenda her mirnişînîyeka kurdan medreseyeke sereke hebû. Cihê ilm û zanist û edebîyatê bê guman ev medrese bûn. Kurd têqribî 46 mîrektîyan ava dikin. Di her du sedsalên pêşîkê yên serdema mîrektîyan de ji ber ku salên destpêk û amadehîyê ne û her weha êrîşên mîrektîyên din ên tirkî berdewam in, pergaleke sîyasî û perwerdeyê nayê avakirin û çî berhemên kurdî nayên dayîn, hatibin dayîn jî an bi erebî ne an jî nagehin roja me. Bes piştî hingê di sedsala XVIan de mîrektîyên kurdan hem di warê sîyasî de hem jî di warê perwerde û edebî de xurttir dibin û serdemeke zêrîn dest pê dike. Di vê serdemê de medreseyên kurdan hene, zimanê wan medreseyan bi kurdî ye. Zarokên kurdan di 7-8 salîya xwe dest bi xwendinê dikirin, nêzîkî 10 salan li ber destê wan dixwendin ku ji wan re seydayên 12 ilm dihat

³ Murad Ciwan, *Çaldıran Osmanlılar Safeviler ve Kürtler*, Avesta, Diyarbakir, 2015, r. 232-236.

⁴ Mehrdad Izady, *Kürtler*, wer. Ji îngilîzî: Cemal Atila, Weş. Doz, Çapa Sêyem, Stenbol, 2011, r. 112-117.

gotin. Dersên xet, tecwîh, serf û newf, figih, hedîs, kelam, mantiq, felsefe, rewanbêjî û dîrokê dihatin dayîn. Her weha perwerdeya stêrknasî, erdnîgarî, hesab, aborî û tenduristîyê jî dihat kirin. Ev medrese ji hêla gel ve dihatin piştgirîkirin.⁵ Ev rewş hema bêje heta nîveka sedsala XIXem berdewam dike.

Osmanî ber bi sedsala bîstem ve hêza xwe ya sîyasî û hukimranî roj bo rojê ji dest dide. Li gel vê yekê milletên di bin desthelatdarîya Osmanîyan de yek bi yek dewletên xwe ava dikirin. Bi vê boneyê tirkên Osmanî, dixwestin dewleteke nû, hêzeke nû ava bikin ku dema ev yek dikirin jî nadixwestin kurd wekî milletên din ji wan biveqetin û bibin xwudandewlet. Her çend hindêk rewşenbîrên kurd doza veqetandinê kiribin jî encam bi kuştin û serkutkirinê bi dawî dibe. Li dor vê yekê Osmanî di salên xwe yên dûmahîkê de li hember hilweşînê dixwaze navenda xwe xurt bike. Ji bo hindê yek bi yek mîrektîyan radike û dixwaze otoratîya xwe li şûnê dayne. Serdema Mîrektîyan jî heta nîveka sedsala XIXem (1850) dewam dike û xilas dibe. Mebest ji vê derê mîrektîyên kurdan hemû jî têk diçin.⁶ Ji nav van mîrektîyên di bin desthelatdarîya Osmanîyan de herî dûmahî Mîrektîya Botanê piştî şerên dijwar di sala 1846ê de têk diçe û di sala 1855ê de bi temamî ji holê radike.⁷

Sîstema merkezîyetê tê avakirin, mîrektî tîl hilweşandin û ev yek jî di qada edebîyatê de bizaveke nû ava dike. Ji vê derê pê de Serdema Xalidîyê dest pê dike. Serdema Mîrektîyan cuda ye; desthilatdarîyên kurdan hebûn û wan desthelatan medrese ava dikirin û perwerde bi kurdî bû ku mirov dikare wê serdemê wekî serdemeke zêrîn bi nav bike. Bes wextê dawî li mîrektîyên kurdan tê êdî Serdema Piştî Mîrektîyan dest pê dike heta roja me.

Yek ji sedemên daxwaza ademî merkezîyetê ew bû ku milletên di bin hukimdarîya Osmanîyan de yek bi yek xweserîya xwe bi dest dixistin, lewra berîya ku kurd jî biveqetin Osmanîyan xwest otorîteya xwe li ser wan danin û nehêlin biveqetin. Di şûna wan de qeymeqamên xwe rêdikin Kurdistanê, lêbelê êdî ew îstîqrar û seqamgirî û hizûra berê nemîne. Tevlîhevîyek dest pê dike. Sîstemeke îdarî ya serkeftî neyê damezirandin. Di sala 1847ê de di dewra Evdilmecîdî de wek îdarî

⁵ Samî Hêzîl, *Wêjeya Kurdî*, Sîtav, Wan, 2015, r.68; Abdurrahman Adak, h.b, 2015, r. 191-192.

⁶ Mehmet Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Nûbihar, ç.2, Stenbol, 2011, r. 205-236.

⁷ Altan Tan, *Kürt Sorunu*, weş. Timaş, Çapa yazdeyan, Stenbol, 2011, r. 86-94.

eyaleta Kurdistanê tê avakirin ku navenda wê pêşîkê dikin Xelat; paşê jî dikin Amed. Ev yek jî zêde dewam nake, di sala 1868ê de dawî lê tê û bajar li wilayetan tên dabeşkirin.⁸

Her li dû vê yekê ji ber têkçûna sîstema berê hizûr peyda nabe û di vî warî de valahîyeke sîyasî derdikeve meydana. Tam di vê serdemê de Xalidîtî derdikeve meydana bi rêya tekyayan û li welatê kurdan belav dibe û bi dehan tekyayên nû vedibin. Di van tekyayan de edebîyat derdikeve meydana, şair bi kurdî dinivîsîn. Şêxên tekyayan şûna mîrektîyan digirin û xelk hemî berê xwe didin wê derê û şair û helbestvanên mezin jê derdikevin. Bi taybetî, tekyayên Tewîle, Basret, Nehrî û Paloyê li seranserê Kurdistanê belav dibin û xelîfe û murîdan li dora xwe kom dikin û rêdikin derûdora xwe. Vê carê di vê serdemê de rengên nû derdikevin meydana. Di serdema mîrektîyan de şairên kurdan ji mîrektîyan re dinivîsîn lê ji ber ku êdî mîrektî nînin radibe şairên vê serdemê ji şêxên xwe re dinivîsin. Berê mîr li her cihî nebûn, lê bi rêya tekyayan perwerde û deshelatdarîya kurdan gihişt heta cihên ku berê destê mîrektîyan jî jê nedigirt.⁹

Di sala 1869ê de di dewra Evdilezîzî de Marîfî Ûmûmîye Nîzamnamesî derdikeve ku dewlet mektebên nû vedike di bin tesîra Ewrûpayê de. Li her derê mekteb vedibin ku zimanê perwerdeyê bi tirkî ye ku perwerdeya tirkî êdî li nav kurdan dest pê dike. Di vê serdemê de ji ber ku bi rêya wilayetan hêza merkezî çêbûye û dibistan hatine vekirin, bîvê nevê bandora tirkî zêdetir dibe. Serdestîya Xalidîtîyê heta Şerê Cîhanê yê Yekem dewam dike. Di encama vî şerî de gelek ax ji destê Osmanîyan diçe û bi peymana Lozanê sînorên îro kifş dibin ku kurdên ji hev qetîyayîn zêdetir ji hev vediqetin. Piştî şerî sînorên nû ava dibin û dewletên modern derdikevin meydana û serdem jî diqede.¹⁰

1.1.2. Rewşa kurdan a giştî di serdema Komara Tirkîyeyê de

Dewleta Osmanî demên xwe yên dawî dijîya, li gel vê yekê di pêşengtîya Atatürkî de tirkan dixwest dewleteke nû ava bikin. Hinek kurdên xwende jî dixwestin

⁸ Abdurrahman Adak, "Serdema Xalidîtîyê di Tarîxa Edebîyata Kurdî ya Klasîk de", *Kürt Tarihi*, hj. 30, Stenbol, 2017, r. 59-60.

⁹ Adak, h.g, 2017, r. 59.

¹⁰ Adak, h.g, 2017, r.60.

dewleteke kurdan ava bikin lêbelê bêhtirê kurdan ji ber hestên dînî nedixwestin ji tirkên vebîn ku xilafet di destê wan de bû. Wek encam piştî dewleta Osmanîyê Komara Tirkîyeyê ava bû. Li dijî vê yekê serhildanên kurdên dewletxwaz bi pêşengtiya rêxistinên Azadî û Xoybûnê dest pê dikin. Kesên wekî Şêx Seîd û Seyîd Rîza û eşîrên Millî û Koçgirî serî hildabînin, serhildanên wekî Şerê Mala Elîyê Yûnis çêbûn jî ev ji aliyê girseyên mezin ve nayên piştgirîkirin. Ev serhildan dihatine serkurtkirin û komkujîyên mezin pêk dihatin. Di gel vê yekê bi salên dirêj meseleya kurdan di meclîs û rojevê de cihê xwe digire. Di vê maweyê de ji aliyê edeb û hunerê ve rojname û kovar û destgehên edebî yên curawcur derdikevin.¹¹

Her weha di heman salan de Komara Tirkîyeyê ji aliyê perwerde û dînî ve jî pêngavên nû diavêje. Medrese, ku yek ji destgehên perwerdeyê yên muhîm ên Îslamî ye, di pêvajoya fireh de li gel feydeyên mezin di heman demê de bûye jêdera alim û şarezayan jî. Her dîse medrese li gel aliyê xwe yê perwerdeyê, bûye navenda nîzam û hizûra civakî û sukûnetê. Medrese, çareserîyan ji meseleyên hiqûqî, siyasî û civakî re peyda dike û rêberîya însanîyetê dike di karên dinyawî û axretî de.¹² Bes ev rewş diguhere.

Qanûna Tevhîd-î Tedrisatê qanûneke şoreşgerî ye ku di warê perwerdeyê de li Komara Tirkîyeyê hatîye çêkirin. Ev zagona ku di 3yê Adara 1924an de hatî qebûlkirin, bi yekdestdarîya kar û barên perwerdeyê û hîndekarîyê di bin kontrola dewletê de dibe armanc ku sistemeke perwerdeyê ya nû, laîk û zanistî ava bike. Bi vê qanûnê, medrese têne girtin û sazîyên perwerdeyê jî dikevin bin kontrola Wezareta Perwerdeya Neteweyî. Bi vî awayî di perwerdeyê de yekîtî û hevgerîtin pêk tê û sistema perwerdeyê nû û laîk dibe. Di gelek warên hiqûqî û civakî de nûbûn û guherîn têne çêkirin û Tirkîye diguheve avanîyeke nû.¹³

Her weha di 3yê Adara 1925an de jî Wekaleta Şer'îye û Ewkafe tê rakirin. Li welatê kurdan medreseyên ku cihê ilm, exlaq, edebîyat û çandê ne êdî bi çavekî kêr û qels têne dîtin. Misilman rastî tengasiyan tên, xelk nikare dîne xwe bijî, Qur'an tê

¹¹ Serdar Yıldırım, h.g, 2019, r. 122-123.

¹² Abdulmuttalip Arpa, "Bingöl'de Medreseler ve Müderrisler" *Bingöl Araştırmaları Dergisi*, 2014, r. 39.

¹³ Yahya Akyüz, *Türk Eğitim Tarihi*, weş: Alfa, ç.8, Bursa, 2001, r. 299-301.

qedexekirin, bangdayîn bi tirkî tê kirin, kesên erebîzan tîn sizakirin, herfên erebî tîn qedexekirin.¹⁴ Ev rewş ji alîyê gel ve rastî bertekên tund tê. Li ser vê yekê gelek serhildan û nerazîbûn çêdibin.

Her çend di şûna van medreseyan de mektebên îmam xetîbê bêne vekirin jî rastî eleqeyê nayên û di sala 1930ê de ew jî tîn girtin. Ji alîyê dîtir ve li herêmên ku destê dewletê ne xurt bû, medrese hebûna xwe didomînin. Bes piştî belavbûna sekûlerbûnê û biryarên hikûmetê li gel polîtîkayên çir û tund medrese dikevin deravekî teng û rastî zextên ekonomîk, polîtîk û psîkolîjîk tîn.¹⁵ Li gor agahîyên ji destên cuda, di sedsala XXem de bi taybetî berî serdema Turgut Ozalî bi awayekî veşartî li mizgeftan xwendin hatîye domandin ku car caran leşkeran bi ser gundîyan de girtine û li feqîyan gerîyane, Qur'an sotine, nexweşî bi serê gundî, feqî û melayan anîne.¹⁶ Di encamê de di nav atmosfereke dijwar de be jî bi şiklekî medrese hebûna xwe didomînin. Dîse, mela û şairên kurd berdewam dibin di dayîna berhemên dînî û edebî de.

Di serdema Komarê salên 30-40î de, bi taybetî di edebîyat û civata kurdî de rojên teng dest pê dikin. Li ser vê yekê Kawa Nemir di pêşgotina *Tarîxa Edebîyata Kurdî* ya Qenatê Kurdoyî de vê serdemê wekî xezebekî bi nav dike. Dibêje, di vê serdemê de welêt maye di bin hêzên dereke de û kurd jî hev veqetîyane, mekanîzmayên kontrolkirinê kûrtir kîrîne.¹⁷ Di salên 1930-40an de kovara Hawarê vî barî dide piştî xwe. Di van salan de exleb komên çepgir û yên sosoyalîst ên kurd derdikevin meydana. Çendîn salan kurd jî hemû alîyên siyasî û çandî û hiqûqî ve rastî qedexeyan tîn heta qonaxa dîyasporayê dest pê kirî sala 1980yan, bi taybetî li Swêdê û Ewropayê. Car din ziman û Edebîyata Kurdî hinekî xwe vedizelîne. Her weha di vê qonaxê de kême be jî medreyên kurdan hêj jî aktîv in û şêx û mela û seydayên medreseyan bi veşartî be jî 'ilm û nivîsîna xwe dewam dikin. Li Sovyêtê

¹⁴ M. Şerif Eroğlu, *Bütün Yönleriyle Arabkendi*, Weş: Kent, Stenbol, 2004, r. 21-25

¹⁵ Sabahattin Bala, *Şark Medreseleri*, weş: Hiper yayın, Stenbol, 2019, r. 81-82.

¹⁶ Mela İhsan Çağmar, Hevpeyvîn: Silvan'ın Tewerz Köyünden Mele İhsan Çağmar ile Medrese Eğitimi ve Yaptığı İmamlık Görevi Üzerine Bir Söyleşi, e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi, hj. 9, 2013, r. 163-164.

¹⁷ Kurdo, h.b, 2009, r. 8.

kurd di pêvajoyeke fireh û azad de ne; li Êraqê pêngavî sîyasî têne avêtin, li Êranê jî rewş ne baş be, ne xerab e jî.

Di salên 80yan de li Tirkîyeyê vê carê komên çekdarî yên kurd derdikevin meydanê û nexweşî hê jî berdewam dibin. Li gel vê yekê cara yekem Partîya Kedê ya Gelan tê avakirin ku meseleya kurdan bi awayekî dîplomatîk bê çareserkirin, bes eve jî di bin hukmê komên çekdarî yên kurd de dimîne. Pê bi pêl li sala 2004ê kurdî li radyoyê, li sala 2006ê li televizyonê tê zêdekirin û li dû vê yekê li sala 2010ê beşa kurdî li zanîngeha Mêrdînê vedibe û li sala 2012ê dest bi dersdayîna kurdî tê kirin li dibistanên navîn. Di warê edebîyat û huner û çandê de eve dibe serdemeke azad ji bo pêşkeftinê. Lê ev yek careke di jî xerab dibe.¹⁸

Di encamê de kurd di proseyan dijwar re derbaz dibin. Bi taybetî li Bakur kurd, her çend ne xwedîstatû bin jî li gor salên berê derfet û mecalên berfireh di warê sîyasî, çandî û edebî de bi dest dixin.

1.1.3. Edebîyata Kurdî ya neteweyî di serdema Komara Tirkîyeyê de

Edebîyata Modern li Ewrûpayê di sedsala XVIIem de dest pê dike, li Tirkîyeyê di sedsala XIXem de û di nav kurdan de jî di sedsala XXem de dest pê dike. Di vê serdemê de di warê edebî û sîyasî de gelek pêşketin çêdibin. Modernîzm wekî fikir û kiriyarekî pêşîkê li Ewrûpa û Emerîkayê derket û belav bû. Ev pêl di qadên huner, wêje, mirovnasî, sîyaset, psîkolojî û gelek qadên di de reng veda. Armanç, di şûna raman, şêwaz û pejirandinên kevneşop û edetî de bikaranîna şêwazên nû, giringîya ramanên kesayetî û helwesteke rexneyî bû. Bi vî rengî edebîyat jî rastî gunerînan tê û serdema modern ava dibe.¹⁹

Serdema Komara Tirkîyeyê di heman demê tê paralelî destpêka Edebîyata Kurdî ya Modern tê. Helbestvanên wekî Hecî Qadirê Koyî ji alîyê naverokê ve berê xwe mijarên modern, her weha di de serdemê de Ebdullah Goran yek ji helbestvanên modern ê destpêka Edebîyata Kurdî ya Modern e. Li alîyêkî di yekem

¹⁸ Serdar Yıldırım, h.g, 2019, r. 123-124.

¹⁹ Samî Hêzil, h.b, r. 96.

çîroka kurdî, yekem romana kurdî, yekem şanoya modern ên kurdî derdikevin meydane.²⁰

Çawa ku Şoreşa Pişesazîyê, Şoreşa Frensayê di çêbûna hestên neteweyî de roleke mezin lîstine di heman deme de li gel ramanên ronakbîrî û guherînên sîyasî û civakî serdema modern ava kirine. Ev şoreş dibe remza aşitî û wekhevîyê, ev fikir dibe sebeba hilweşîna împeratoriyan û avabûna netewedewletan. Di vî biwarî de geşedana Edebîyata Modern ya kurdî paralelî avabûna hestên neteweyî ne.²¹

Di çarçoveya neteweperwerîyê de di serdema klasîk de, di sedsala XVIIem de ji alîyê hizirî û hestî ve ji ber ku cara yekem Ehmedê Xanî wekî nasnameya kurdîyê dawa mafê kurdî kirîye, ji alîyê lêkolanan ve wekî dilopa yekem a neteweperwerîya kurd tê hesibandin ku berî Şoreşa Frensayê ye.²² Di sedsala XIXem de, li dû lêkolînan tê hizirkirin ku neteweperwerîya kurdî di serhildana Bedirxanîyan di sala 1847an de bizaveke giştî ya neteweperwerîyê ye ku ji vê malbatê şûneke zêde ya neteweperwerîyê çêbûye ku pir kesên neteweperwer jê derketine.²³ Bes ev li gor hinek lêkolanan wekî Nazmî Sevgen xelet e, ji ber ku li gor wî armanc parastina hêz û otorîteyê bû. Her weha li dû wê jî serhildana Şemzînîyan di sala 1881an de rû dide, di çarçoveya neteweperwerîya kurdan de tê hizirkirin. Şêx Ubeydullah hem sîyasî hem dînî xwedîyê otorîteyeke mezin bû ku di bin hukmê xwe de hem herêmeke berfireh digirt û hem jî pêşdarê herî giring ê kurdan bû. Şêx Ubeydullah di sîyasetê de jî maf û piştevanîya nasnameya kurdan kirîye.²⁴

Bi taybetî gava dewleta Osmanî lawaz dibe, Kurdên li Stenbolê ji bo mafê kurdan tê dikoşin. Li wê derê serokê beşeke kurdan Seyîd Ebdulqadir Nehrî ye ji bo Kurdistanê otonomîyê dixwazin û serokê beşeke dîtir jî Emîn Elî Bedirxan e ji bo Kurdistanê serxwebûnê dixwazin. Ji bo Kurdistanê bi dewletên îngilîz, fransîz û rûsan re dikevin nav pêwendîyê û piştgirîyê ji wan dixwazin, lêbelê ji ber tereduda

²⁰ Samî Hêzil, h.b, r. 106-116.

²¹ Samî Hêzil, h.b, r. 97.

²² Ferhad Şakelî, *Mem û Zîn'de Kürt Milliyetçiliği*, weş: Doz, ç.2, Stenbol, 1996, r. 93

²³ Ji bo zanyarîyên zêdetir bnr: Malmîsanîj, *Cızira Botanlı Bedirhaniler*, weş: Avesta ç3, Stenbol, 2009.

²⁴ Hakan Özoğlu, *Dewleta Osmanî û Neteweperwerên Kurd*, wer: Ali Karadeniz, Weş: Kitap yayınevi, Stenbol, 2012, r. 107-113.

van dewletan û astengkirinên kadroyên Îtihad û Tereqîyê piştgiyeya dixwazin nikarin bigirin.²⁵

Li gel çêbûna hestên neteweyî vê carê di warên sîyasî, edebî, zanistî û civakî de gavên giring tînin avêtin ku bi taybetî yek ji wan gavan jî derxistina rojname, kovar û weşanxaneyan e di warê edebî de û avakirin û hişyarkirina fikirê neteweyî de. Êdî mîr nînin, tekya û medrese qedexe ne û statûya kurdan nîne; li hember vê yekê vê carê xwendevanên kurd li Stenbolê derdikevin meydanê û ew dinivîsin. Anku, mela û şêx û seydayan cihê xwe hinekî ji nivîskarên kurd ên xwende yê polîtîk û neteweyî re dihêlin. Helbet ew jî dinivîsin bes vê carê ew paşçav dimînin. Xusûsen Sovyet ji bo kurdan dibe cih û warê xebatê.²⁶

Ji alîyê edebî ve, di destpêka Sedsala XXem de bingeheên Edebîyata Kurdî ya Modern tînin avêtin. Yek ji wan gavan jî derxistina kovar û rojnameyên kurdî ne, ku derxistina kovar û rojnameyên kurdî hişyarbûneke millî ye. Di vê serdemê de rewşenbîr û nivîskarên kurd ji bo parastina nasname û mafên gelê kurdan berhemên edebî dinivîsin. Bi taybetî di helbest û çîrokan derdikevin pêş. Neteweperestî di vê serdemê de dibe mijareke giringtir.²⁷

Di dawîya sedsala XIXem de û bi taybetî jî di destpêka sedsala XXem de kovar û rojnameyên kurdan ên ewil li derveyî welêt derdikevin. Di sala 1898an de cara yekem rojnameyeke bi kurdî derdikeve ku navê wê Kurdistan e li Qehîreyê. Her weha di pey re kovara yekem jî di sala 1913ê de derdikeve bi navê Rojî Kurd. Ev bi tenê derîyek e, piştî wan çendîn rojname û kovar derdikevin. Bi rêya van rojname û kovaran xelk tîne hişyarkirin, organîzekirin û propagandaya neteweyî tê kirin.²⁸

Bi taybetî piştî Meşrûtiyetê di sala 1908an de kurd dest bi weşangerîyê dikin li Stenbolê. Di navbera salên 1920-1950 dîse ji ber zextên li ser kurdî weşangerî li

²⁵ ‘Elî Teter Nêrweyî, *Bizava Sîyasî li Kurdistanê 1908-1927*, ltnz: Mihemed Xelatê Ertoşî, Sîtav, Wan, 2023, r. 32-52; Chris Kutschera, *Kürt Ulusal Hareketi*, Avesta, Stenbol, 2013, r. 46-48.

²⁶ Qenatê Kurdo, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanê Lîs, ç.3, Amed, 2009, r. 31.

²⁷ Hayrullah Acar, “Ji Destpêkê Heta Îro Qonaxên Rojnamegerîya Kurmancî”, *Di nav, “Mecmû’ae Meqalatê Nexwostîn Hemayeşê Beynelmîlê*, Danişgehê Kurdistan, Îran, 2010, r. 562; Ji bo zanyariyên zêdetir bnr: Sebatullah Tekin, “Kürt Milliyetçiliğinin Gelişimi ve Ulusun İnşası Politik Şiddet, Yayıncılık ve Aydınların Rolü”, *Kürt Araştırmaları*, 18.03.2022.

²⁸ Hayrullah Acar, h.g, r. 563-565; Murat Aktaş, Mehmet Yonat, *Çapemenîya Kurdî Dema Osmanîyan*, Berdan matbaacılık, 2013, r. 69-80.

derveyî Tirkîyeyê tê kirin. Salên 60îyê nermbûnek çêbibe jî ji ber qanûna esasîyê, heta salên 70îyan karê weşangerîyê li Stenbol û Enqereyê ji alîyê xwendevanên kurd ve tê meşandin. Di nav şertên dijwar bi nihênî tene weşandin û belavkirin.²⁹

Ji milê edebîyatê ve di vê serdema modern de Edebîyata Kurdî ya Klasîk jî rengê digire. Êdî mela û şêx li ber kêleka mijarên tesewifî berê xwe didin mijarên neteweyî jî. Anku êdî mela û şêxên şair ên millî derdikevin meydana. Bo nimûne Cegerxwîn yek ji wan şairên mela yê kurd ê millî ye ku ji xeynî tesewifê berê xwe daye mijarên millî û neteweyî. Mela Hesên Sofyanî jî yek ji wan şairên kurd ê millî ye ku di çarçoveya temaya neteweyî de jî helbestên xwe nivîsîne.

Di Edebîyata Kurdî de neteweperestî wekî mijareke giring e ku nasname, çand û hişmendîya dîrokî ya gelê kurd nîşan dide û xurt dike. Ev edebîyat jî wan berhemên pêk tê en ku daxwazên kurdan ên ji bo ziman, çand û mafên xwe yê siyasî tînin ziman. Neteweperestî di Edebîyata Kurdî de di serdemên cuda de bi şêweyên cuda derdikeve holê.

Guhertinên siyasî yê li Rojhilata Navîn bandorê li mijarên neteweperestîya Edebîyata Kurdî jî dike. Kurd li Êraq, Êran, Sûrîye û Tirkîyeyê rastî zext û polîtîkayan tînin û ev yek di berhemên wan ên wêjeyî de jî derdikeve holê. Di vê serdemê de Edebîyata Kurdî li ser mijarên berxwedan û azadîyê kom dibe. Di Edebîyata Kurdî de neteweperestî di vê serdemê de zêdetir xuya û cihêreng dibe. Ji bo parastin û pêşxistina ziman û çanda kurdî gelek xebat tînin kirin. Mijarên nasyonalîzma kurdî di edebîyatê de bi cureyên cewaz (helbest, roman, şano, gotar) tînin behskirin. Di van xebatan de zilma ku di dîrokê de li ser kurdan hatîye kirin, çîrokên berxwedanê, mîrateyên çandî û nasnameyê derdikevin pêş.³⁰

Edebîyata Kurdî di sedsala XXê de jî îro wekî mîraseke dewlemend hebûna xwe didomîne. Helbestvanên vê serdemê di pêşveçûna helbestê de roleke giring listine, dilîzin û îlhamê didin nifşên paşerojê. Berhemên wan hem di cîhana edebîyatê de hem jî di bîra civakî de cihekî giring digirin.

²⁹ Malmîsanîj, Mahmûd Lewendî, *Rojnamegeriya Kurdî*, Öz-Ge Yayınları, c.2, Ankara, 1992, r.15-22.

³⁰ Martin Van Bruinessen, *Kürdistan Üzerine Yazılar*, İletişim Yayınları, 2000, r. 201-225.

1.2. Jîyana Sofyanî

Em ê di vê pişkê de behsa jîyana Seydayî ya şexsî, edebî û dînî bikin. Her weku li jorê jî amaje pê hatî dayîn, Seyda Mela Hesenê Sofyanî hêj sax e û lewma jî çavkanîya vê binepişkê ya sereke ew bi xwe ye. Em bi Seydayî re rûniştin, me pê re hevpeyvîn kir û bi rêya pirs û bersivan agahîyên derbarê şexsîyeta wî de me qeyd kirin. Her weha me bi çend feqîyên wî re jî hevpeyvîn kir.

1.2.1. Malbat, jidayikbûn û zaroktîya wî

Mela Hesenê Sofyanî di dema Şerê Cîhanê yê Duyem de di sala 1943yê de li gundê Kevnecarê yê girêdayî Farqînê tê dinyayê. Navê wî yê fermî Hasan Kan e. Mela Hesen kurê Eskender kurê Mistefa kurê Hecî Reşît e. Babê wî Eskender cotkarek bû, navê dîya wî Kamîle bû û ew ji eşîra Mala Memîşa ne.

Mela Hesenê Sofyanî pênc bira û xwûşkek hebûn ku birayekî wî zû rehmet kirîye. Sofyanî yê herî mezin e di nav xwûşk û birayên xwe de. Sofyanî, du caran dizewice, pêşîkê di 16 salîya xwe de dizewice, xanima wî jî di sala 2000î de nexweş dikeve û piştî heft salan emrê Xwedê dike. Li ser vê yekê Seyda careke dîtir dizewice û ji vê zewacê kurekî wî çêdibe.

Ji zewaca Seydayî ya pêşîyê heft zarokên wî çêdibin, pênc kur û du keç in. Ji van Mistefa û Welat rehmetî ne. Yê mezin Îstî'adîn e bi kare loqenteyê re mijûl e. Yê dî Zeynelabidîn e bi kare însaatê dike, her du Keçên wî yên bi navê Nesrîn û Amîne zewicî ne û kurê wî Felah jî ajovanîyê dike. Seydayî zewaca duyem nexwestibe jî, li ser daxwaza feqî û derdorê dîse dizewice bi keça seydayekî re. Ji zewaca duyem kurekî wî çêdibe bi navê Muhemmed Emîn, wî jî niha dibistan navîn qedandîye, dê dest bi dibistana amadeyî bike.³¹

Rewşa aborî ya malbata wan berê pir baş bû, çend gundên wan û mirovên wan hebûn li derdora Kevnecar û Korxelîlan û Axmeşetê. Gundê wan Kevnecar, li rojhelatê Amedê herêmeke 11 hezar donim erd bû ku yê kalê babê Mela Hesenî bû. Kevnecar wek nehye bû kalê wan ê mezin Hecî Reşît jî mudîrê nehyê bû, ji wan re “Şerq Mudîrî” gotine. Lê paşê kalê wî Mistefa berîya babê xwe Hecî Reşît rehmet

³¹ Hevpeyvîn: Ehmed Kanî (13.07.2024).

dike, mal wan ê ku ji Hecî Reşît dihate ser kalê wan Mistefa êdî diçe. Li ser vê yekê Seyda Sofyanî dibêje heger law hebe ji nevîyan re tiştek nakeve û dîyar dike ku babê wî ji vî milkî bêpar dimîne, ji ber ku du apên babê wî hebûn.

Kalê wî Mistefa bi xwe bi xezûrê xwe Hecî Şerîf re du sê gundên dora Kevnecarê distînin. Dema Mistefa dimire lawekî dî yê bavê wî Hecî Reşît çêdibe ku navê wî jî Mihemed Mistefa datînin. Her çend bavê Mela Hesenî, Eskender ji apê xwe yê nûbûyî mezintir be jî ji ber ku babê wî dimire weraset ji wî re namîne. Kurên Hecî Reşît, Sebrî û Mihemed Mistefa hene û Mihemed Mistefa du kur hene bi navên Hecî Elî Seîd û Mihemed Ezîz. Her du di nifûsê de wekî zarokên Mistefayê babê Eskender hatine nivîsîn. Lê di rastîya xwe de lawên apê Eskender in. Esker jixwe ji weraseta kalê xwe bûbû, bi vî şiklî ji weraseta babê xwe jî dimîne. Apên wî Kevnecarê difiroşin û li Gundê Korxelîlê bi cih dibin ku dora sê hezar donim erdê wan heye. Radibin ew jî bar dikin û li gundê Axmeşetê bi cih dibin.

Bi vî şiklî rewşa wan a aborî xerab dibe. Ji alîyekî dî ve, babê wî gelek xebatkar bû lê di dema zewaca Seydayî de 3.000 hezar pereyê wê demê ku nîvgundek pê dihat dide qelenî. Bi vî awayî babê wî gelek destteng dibe, reşwa aborî nebaş dibe. Lê piştî seyda dizewice dest bi melatîya gundan dike û debara xwe bi vî şiklî dikin. Rewşa aborî ya malbatî li gor şertên wê demê ne baş bû ne jî xirab bû.

1.2.2. Navê wî û mexlesa wî

Yek ji xusûsiyetên esasî yên edebîyata klasîk a Îslamî bê guman mexles e. Di edebîyatê de her wekî tradîsyoneke edebî, şair di şî'r û menzûmeyên xwe de ji bilî nav û neqlûnavên xwe navekî edebî yê cuda û taybet li xwe dikin û bi kar tînin. Heta hindek şair çend navan jî li xwe dikin. Bikaranîna mexlesê di sedsala XIIIan de di Edebîyata Farisî de û di sedsala XVan de di Edebîyatên Tirkî û Kurdî de dest pê kirîye û paşê bûye tradîsyoneke edebî.³²

Her li dû hindê Mela Hesenê Sofyanî jî xwedîyê 2 mexlesan e, anku pirmexles e. Mela Hesen, mexlesên *Sofyanî* û *Dilkanî* bi kar anîne. Sofyanî, navê gundê wî ye û Dilkanî jî ji ber dildarî, dilovanî û xemxwarîya li hember milletê xwe li xwe kirîye. Li

³² Abdurrahman Adak, "Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de", *Nûbihar Akademî*, Stenbol, 2018, hj. 10, sal 5, r. 13-15.

gor senifandina Abdurrahman Adakî heger mirov kategorîze bike hingê mirov dikare mexlesa “Sofyanî” di bin mexlesa deverî de; mexlesa “Dilkanî” di bin mexlesa mizaç, exlaq, rewşê de kategorîze bike.³³

Pirmexlesî, ne taybetmendîyeke Mela Hesenê Sofyanî bi tenê ye. Bê guman di Edebîyata Kurdî de gelek şairên pirmexles hene ku yên du mexles, sê mexles û heta çar mexles jî hene. Li dor vê babetê Mela Mistefa Ehmed Bêsarani (Bêsarani, Mehziî), Şêx Mihemed Kerbelayî (Bedrî, Kerbelayî), Şêx Muhyedînê Hênî (Se’î, Heqî), Xelîlê Resûlê Sincawî (Wafî, Muxlis) hindê ji şairên du mexles in di Edebîyata Kurdî de.³⁴ Mela Hesen mexlesên xwe weha bi kar anîne:

Mexlesa Sofyanî:

Hêvîya mi j’ Xweda ye *Sofyanî* bêje amîn
Ji van caşên bêmêjî di nav me de yek nemîn! (30/8)

Mexlesa Dilkanî:

Dilkanî xweşheval î
Kurdekî zarzelal î
Derbarê wê merdîyê
Ji salixdanê lal î (40/26)

Her wekî li jorê jî hatî amajedan, dîwana Mela Hesenî ji 76 helbestan pêk tê û me 43 helbest kirine mijara xebata xwe. Ji nav van 43 helbestvan, helbestvanî di 27 helbestan de mexlesa “Sofyanî”, di 15 helbestan de jî mexlesa “Dilkanî” bi kar anîye. Li gel vê yekê helbesteke bêmexles jî heye.

Her wekî tê zanîn exleb mexles di beyt/benda dawîyê (meqte) de an jî di ya berî wê de tê bikaranîn. Li rex vê yekê car caran helbestvan mexlesa xwe berî van her du beytên dawîyê dide, ji dawîyê beyt/benda sêyem, çarem an jî zêdetir ku di Edebîyata Farisî de jî nimûyên wê hene û wekî temamkerên beyt/benda mexlesê tînin. Wekî nimûne jî mirov dikare bi taybetî Ehmeqê Feqîr û Melayê Cizîrî bide.³⁵ Li ser vê yekê, Mela Hesenî jî mexlesa xwe exleb di beyt/benda dûmahîkê de carinan yekê berî ya dûmahîkê bi kar anîye. Lêbelê, di 5 helbestan de berî her du beyt/bendên dawîyê an di nîvekê an jî di yên destpêkê de mexles bi kar anîne.

³³ Adak, h.g, 2018, r. 41-43.

³⁴ Adak, h.g, 2018, r. 46-47.

³⁵ Adak, h.g, 2018, r. 29-30.

Kete dilê min ez hinek bêjim
Kulê di dil da piçek birêjim

...

Birê *Sofyanî* gelo: çênabe
Evî mirovê dê her wuha be

Na birê hêja çewa çênabe
Te'lîm û tore eger bira be

Dara benîştê dibe fistiş xwoş
Çewa çênabe ê bi 'eqî û hoş (8/1,74-76)

Çawa ku tê dîtin Mela Hesenê Sofyanî mexlesa xwe ji dawîyê ve di beyta sêyem de daye. Her weha hinek nimûneyên dîtir jî hene ku mexles an di beyt/bendên nîvekê de ne an jî di yên destpêkê de ne.

Her weha gelek caran helbestvan di helbestekî de ji yekê zêdetir mexlesan dide. Ev mexles carinan heman in; carinan jî ji hev cuda ne. Di vê rewşê de bi gelemperî yek ji wan di beyta meqteyê de ye; ya dî jî çend beytan berî wê ye. Di Edebîyata Kurdî de mirov dikare Melayê Cizîrî û Qedrîyê Cizîrî wek nimûne nîşan bide.³⁶ Mela Hesenê Sofyanî jî hindek caran di heman helbestê de ji carekî zêdetir mexles bi kar anîye. Şairî, di 2 helbestan de du caran mexlesa *Sofyanî* û dîse di helbestekî de sê caran mexlesa *Dilkanî* bi kar anîne.

Hey birayê xweşik î
Bi gundê xwe Reşik î
Tu vê îne xelişî
Îna hatî xwe d' ku kî?

...

Me got xema me nîne
Piştî şes roja îne
Şêxê me pîr bikêf e
Dilkanî ne xemgîn e

...

Dilkanî xweşheval î
Kurdekî zarzelal î
Derbarê wê merdîyê
Ji salixdanê lal î (40/1,10,26)

³⁶ Adak, h.g, 2018, r. 31-33.

Her wekî tê xuyanê, di vê helbestê de ji bilî mexlesa li benda dûmahîkê ya *Dilkanî* mexleseke dîtir li bendên nîveka helbestê hatîye bikaranîn. Bi tevahî 3 helbestên weha hene.

Taybetîyeke di jî ji alîyê mexlesê ve di nav helbestên wî de xuya dibe ku Mela Hesen di helbesteke xwe de di hemî bendan de mexles bi kar anîye. Sedema vê yekê jî ew e ku ev helbest murebbe‘eke mutekkerrir e. Ji ber vê çendê mexles jî her hatîye dubarekirin.

Birê xemgîn Seyda Seyrî *Sofyanî* jî çûye çiya
Ew jî wek te hûr dinêre li zinar û li devîya
Şed ax û ox şed ax û ox ji dest me çû jîna zelal
Kanî kexê kanî *Sofya* kanî çavşeliqya delal?

...

Karê dinê hatin û çûn *Sofyanî* pir baş dizane
Bes xebatkar ji bîr nabe di bin axê bi jîyan e
Şed ax û ox şed ax û ox ji dest me çû jîna zelal
Kanî kexê kanî *Sofya* kanî çavşeliqya delal? (37/1-15)

Hem di benda yekem hem jî di benda dawîyê de ji xeynî mutekkerrirê dîse mexles hatîye nivîsîn. Helbesta ku bi temamî ji 15 bendan pêk tê, bi tevahî 17 caran mexlesa *Sofyanî* hatîye bikaranîn. Vê yekê mirov di Melayê Cizîrî de jî dibîne, lêbelê ferqa Cizîrî, ya wî hem xezel e hem jî mexles di rola qafîyeyê de ye.

Li dû lêkolînan hate dîtin ku Mela Hesenê Sofyanî di warê mexlesê de hem bi pirmexlesîya xwe hem jî di şeweyê bikaranîna mexlesan de şairekî pirreng e. Mirov dikare wî jî di nav kategorîya helbestvanên 2 mexles ên Edebîyata Kurdî de cîbicî bike.

1.2.3. Perwerdeya wî

Perwerde di çarçoveya zanîn, şîyanewerî û nirxan de harîkariya geşedana civakî û kesayetî dike. Kesên xwenda piştgirîyê didin pêşkeftina aborî, wekhevî û dadmendîya civakî zêde dikin û şewazên jîyanê yên xweş û hişmend dipejirînin. Her weha tevlêbûna pêvajoyên demokratîk teşwîq dike û hişmendîya hemwelatîya çalak pêş dixê. Ji ber vê yekê, perwerde ji bo başbûna domdar hem di asta kesane û hem jî di asta civakê de pêdivî ye.

Di vî biwarî de, her çend melayên îro perwerdeya xwe bêhtir bi awayekî fermî di dibistan û zanîngehan de bikin jî, di serdemên borî de di medrese, mizgeft û hicreyan dikirin. Mela Hesenê Sofyanî jî perwerdeya xwe di mizgeftan de li ber destê melayan kirîye. Li gorî gotina Seydayî di serdema wî de medrese li navenda Farqînê û Amedê kêmbûn, lê li gundên Farqîn û Amedê zêdetir hebûn, wekî Sofya, Zozincê, Huseyna, Hola, Belê, Îwacixê, Şemamê û hinekên dîtir.

Sofyanî di emrekî piçûk de dest bi xwendevanîyê dike. Gava malbata Seydayî ji gundê Kevnecarê diçin gundê Axmeşetê, Seyda 7-8 salî ye û yekem car li wî gundî dest bi xwendin û feqetîyê dike û heta 12-13 salîya xwe li wî gundî dimînin. Seydayî di feqetîya xwe de dersa yekem ji Mela Mihemed Şêrîn digire û nêzikî 5 salan li ber destê wî dixwîne. Seyda, di destpêka feqetîya xwe de *Qur'an*, *Mewlûd*, *Nûbihar*, *Xayetû't-Teqrîb*, *'Eqîde* û hinek jî *Şerhu'l-Mûbînê* jî dixwîne. Di vî emrê xwe yê piçûk de cuz'ên *Emma* û *Taberekê*, heta qesîdeyan jî dixwîne. Ji ber ku hifza Seydayî baş bû, seydayê wî, wî carekî ew bi xwe re dibe Medreseya Seydayê Hecî (Hecî Ebdulfettahê Hezroyî) li Hezroyê û li ser daxwaza seydayê xwe di civata Seydayê Hecî da qesîdeyê dixwîne. Her weha cara pêşîkê Seyda li ber destê vî melayî hînî xetê dibe. Seydayê wî meşqa xetê pê dide kirin û di netîceya vê perwerdeyê de bi Seydayî re qabilîyeta îstînsaxkirina berhemên destnivîs peyda dibe.

Paşê malbata Seydayî ji wî gundî jî bar dikan, diçin gundê mirovên xwe Sofyayê. Bes ji ber ku melayê gundê Sofyayê nebû Mela Hesen jî 2-3 salan navberê dide xwendina xwe. Di vî maweyî de xwebixwe dixwîne. Piştî hingê melayek bi feqeyên xwe ve tê gundê wan ku jê re Mela Mihemedê Şîdadan dihat gotin, ji gundê Şîdadan yê Bismilê bû. Seyda jî dikeve nav feqeyên wî û dubare dest bi xwendina xwe dike. Seyda li ber destê wî *Tesrîfa* 'Elîyê Teremaxî ya bi kurmancî dixwîne.

Piştî wê, Seyda ji bo xwendina xwe 2-3 mehan diçe gundê Tenbela yê girêdayî Hezroyê li ber destê Mela Mu'tî. Heta hizra neteweyî ya Mela Hesenê Sofyanî cara yekem bi xêra birayî vî melayî Mela Ebdulxefûrî çêdibe ku di beşa *Kesayetîya Edebî* ya Seydayî de hatiye behskirin. Weke din li wê derê Seyda kitêbên *'Izzî*, *el-'Ewamil*, *Zurûf*, *Terkîb*, *Sadûllah es-Saxîra* diqedîne. Ji van berheman *Zurûf* û *Terkîb* bi kurdî ne. Di heman demê de wê demê Seydayî di wê feqîtiya xwe de nusxeya xwe ya *el-'Ewamilê* bi destê xwe dinivîse. Piştî Seyda ji wê derê diçe gundê Çeqelîyê yê

Bismilê û li wê derê di Medreseya Mela Silhedînî de 2-3 salan dimîne. Li cem Seydayê xwe *Gulistana* Se'dîyê Şîrazî dixwîne ku berhemêke giring a Edebîyata Farisî ye û heta di salên muderrîsîya xwe de dersa wê jî dide. Mela Hesen li vî gundî kitêbên ji kitêbên rêzê yê medreseyê *Se'ddînî*, *Hell*, *Sadûllah* û *Suyûtî*'yê dixwîne û digihe *Camîyê* û hinekî ji wê jî dixwîne. Seyda li wê derê bi teşwîqa seydayê xwe *Rîsale-î Nûrê* jî dixwîne. Ji *metnê Elfiyê* 633 beytan, *Qewa'id*, *Şerhu'l-Muxnî* û *Tesrîfa Kurmancî* jî ber dike. Hejmara feqîyan li vî gundî 9-10 kes bûn. Li gorî îfadeyên Sofyanî, perwerdeya wî ya li vî gundî gelekî baş derbaz dibe. Dîse li vî gundî gelek harîkarîya feqeyan tê kirin ku Sofyanî bi minetdarî behsa vê harîkarîyê dike.

Paşê Seyda ji vê derê jî diçe, xwebixwe *Camîyê* diqedîne. Hinek li gundê Etşayê li cem Mela Mihemed Şerîfê Huseyna dimîne û çend kitêban li ber destê wî jî dixwîne. Ji wê derê berê xwe dide cem Mela Huseynê Ferhendî û hinekî li cem wî jî dixwîne. Seyda gelek tiştan bi hewildan û keda xwe fêr dibe. Ji eşqa pêşveçûnê û haydarîyê gelek caran xwebixwe dixebite ku *Kafiye* û *Îsaxocîya* Mela Xelîlê Sêrtî jî ber dike. Piştî hingê li gundên wekî Bilbilê, Çermoyê û hinekên dîtir demên kurt digere, li her yekê bi çend mehekan dimîne.

Her paşê, dîse vedigere cem seydayê xwe yê berê Mela Silhedînî, vê carê li gundê Metranê. Seyda, di sala 1963yan de diçe 2 salan leşkerîyê dike. Di qonaxa destpêkê ya ecemîtiyê de 4 heyvan li Denizliyê, paşê li Islahîyeyê û Îskenderûnê dike leşkerîya xwe. Li leşkerîyê piştî pênc mehan dibe serdesteyê leşkerî (tr: onbaşı), piştî sê meh û nîv dî jî dibe çawîş. Dema Seyda diçe leşkerîyê tirkî nizane, bi tenê bi xêra hin hevalên xwe hinek tişt miştan dielime, xwendin û nivîsandina wî ya tirkî çêdibe. Her weha li leşkerîyê jî hinekî fêrî tirkî dibe. Di sala 1965an de leşkerîya wî xilas dibe. Di heman demê de serdema feqîtiya wî jî xilas dibe û êdî serdema muderrîsîya wî dest pê dike.

Ji alîyê perwerdeya seydayên wî ve dema em bala xwe bidin mijarê Seyda behsa perwerdeyêke çir û hişk û bidisiplîn dike. Heta bi şivikan seyda li ser serê wan gerîyaye û heçê serê xwe rake jî ji wê şivikê xwarîye. Wan jî deng nekirine bi bawerîya ku cihê ji bo xwendinê bê lêxistinê agirê pê nekeve. Li hember vê rewşê wan û malbata wan tehemil kirine ji bo xwendinê.

Her weha Seydayê Sofyanî hinekî gazindeyan dike ku di perwerdeyê de mijarên civakî ji wan re nehatine gotin. Ji ber ku tiştêkî ji derveyî nehw û serfê ji wan re nehatin gotin, heta delîlê Îslamîyê ‘eqaîdê wek kîtabên Pêxemberan ji wan re nehatine gotin, Seydayê Mela Hesên piştî nimêja ‘esrê wate jê piştî ku ders diqedîyan xwebixwe dixebitî.

Ji alîyê jîyan rojane ya feqeyan ve, taybet nimêja sibê radibûn dersên xwe dikirin. Êvaran piştî nimêja îşayê radizan û serê sibê razan nebû. Rojên êvara îne anku pêncşemê piştî nimêja esrê betlaneyê dest pê dikir heta roja îne esirê. Di vî maweyî de feqeyan listikên curbicur ên wekî *Sêgeh*, *Birê*, *Sêkevîrkê* û hwd ji xwe re dilîstin.

1.2.4. Melatî û muderrîstîya wî

Esasen Seydayî ji melatîyê bêhtir dixwest bibe muderrîsek. Piştî ku Seyda di sala 1965an de ji leşkerîyê vedigere serdema wî ya mamostetîyê dest pê dike. Lêbelê hê jî du berhemên wî yên nexwendî hene, pêşîkê divê van her du berheman bixwîne. Lê li alîyekî dî ji ber xizanîyê mecbûr e ku melatîyê bike û bixebite. Di ser halan re Seyda di 16 salîya xwe de zewicîye û zarokêkî wî heye.

Di encamê de Seyda gundekî peyda dike bi navê Qerengozê yê girêdayî Bismilê û li wê derê dest bi melatîyê dike. Salekî melatîya wî gundî dike di nav şert û mercên mezin û hejarîyeke dijwar de ku li jêrê hatîye behskirin. Her weha 4-5 feqîyên Seydayî li vî gundî çêdibin. Piştî wê demê Sofyanî vedigere gundê xwe Sofyayê di sala 1967an de. Di vê hîne re seydayê Mela Hesên Sofyanî, Mela Silhedîn li Batmanê bûbû wa‘îz, Mela Hesên jî diçe li wê derê her du kitêbên xwe yên mayî dixwîne û piştî bi çend salan derengî jî be îcazeya xwe distîne. Mela Silhedîn îcazeya xwe ji Mela Ebdussemedê Ferhendî girtibû, wî jî ji babê xwe Mela Yehya Ferhendî girtibû ku Ferhend gundekî Farqînê ye.³⁷

Piştî salekî diçe li gundê Baheşmê yê girêdayî Hezroyê dest bi melatîyê dike. Di Xanîyekî pir xirab de bi cih dibe. Êdî feqîyên Seydayî çêdibin ku Seyda biçûya ku derê bi Seydayî re diçûn. Dîse di rezîlê û perîşanîyê de debara xwe bi zekatê dike.

³⁷ Ji bo lêkolînên zêdetir li ser Mela Yehya Ferhendî bnr: M. Êhsan Hêvîdar, “Seydayê Mela Yehya Ferhendî”, *Nûbihar*, hj. 104, Stenbol, 2008, r. 48-51.

Seyda li vê derê jî 2 salan dimîne. 15-16 feqîyên wî li vê derê çêdibin. Seyda dibîne ji bo wî û feqîyên wî xanî nîne, radibe lêdide vedigere Sofyayê. Seydayî feqîyên xwe jî bi xwe re tîne Sofyayê lê wê demê melayê Sofyayê heye. Heta ku Sofyanî ji xwe re gundekî peyda bike feqîyên wî ji alîyê gundîyên wî ve demekî kurt têne xweyîkirin. Di wê lehzê de melayê gundê wan diçe cihekî dî û Mela Hesenê Sofyanî di gundê xwe de dibe mela. 15 salan melatîya gundê xwe dike. Di vê hînê re Seyda di sala 1975an de Heca xwe jî dike.

Piştî melatîya 15 salan a li Sofyayê, Seyda berê xwe dide gundê Akragê. Gundî di nav feqîr û perîşanîya xwe de dîse harî Seydayî dikan. Sofyanî 2 salan li wê derê melatîyê dike û bi vî şiklî 20 salên melatîya wî ya fexrî diqedin û vedigere Sofyayê dîse û êdî dev ji melatîyê berdide. Piştî salekê, di sala 1988an de tê nêzikî Amedê li herêma Til 'Eloyê nêzikî Riclikê bi cih dibe. Çawa ku em dibêjin Seydayî dev ji melatîyê berdaye esasen ketîye navberdayînekî ku berî melatîya fermî jê re bê. Di vê hînê re seyda li gel malbata xwe kar û barên avakirina xanîyan dike bi çend salekan. Seyda dikeve nav deyn meynan û perîşan dibe heta ku motora xwe jî bifiroşe.

Gava em berê xwe didine melatîya wî ya fermî, esasen Seydayî bawernameya xwe ya dibistana seretayî bi xwendina ji derve li Batmanê girtîye; ya dibistana navîn jî bi heman şiklî li Amedê girtîye û ya lîseya îmam xetîbê jî bi xwendina du salan girtîye ku karîye serî li melatîya fermî bide. Di sala 1992yan de dewlet îmamê wekîl digire ku Sofyanî jî serî lê dide û wekaleten dibe mela û diçe li gundê Xweylînê yê Liceyê dest bi karê melatîyê dike. Sofyanî, 3 salan li vî gundî melatîyê dike ku piştî 3 salan gund tê şewitandin. Piştî vê yekê Seydayî didin gundê Zarayê ku ew jî girêdayî Licê ye. Ew gund jî berê hatiye şewitandin û xirabe ye ku 6-7 mal tê de mane. Heta daxwaz kirine ku Seydayî bidin nava Licê lê Seydayî ev yek red kirîye, nekarîye/nexwestîye. Li vê derê jî Seyda salekî dimîne. Di encamê de ew gund jî tê valakirin.

Ji vê derê berê Seydayî didin gundê kirmancan Goma Mûsa Begê ku nêzikî sêrêya Bîngolê û Liceyê ye. Seyda heta niha ew 4 sal bûn melatîya xwe bi wekaletî dikir. Di sala 1996an de dikeve azmûnê û vê carê dibe melayê tam fermî. Di vê maweya melatîya çar salan de di destpêkê de her çend hewil dabe feqîyên xwe jî bi

xwe re bibe an jî feqî jê re çêbibin jî ji ber nexweşîyên serdemê ev tişt pêk nayê. Seyda 4 salan jî li vî gundî melatîyê dike.

Paşê peywira Seydayî didin gundê Aqmîyê ku nêzikî navenda Amedê ye. Seyda li vî gundî 9 salan melatîyê dike û emrê wî dibe 65 û malnişîn/teqawid dibe berî sala 2010an bi mehekî. Paşê Seyda tê li Til 'Eloyê xaniyekî ji xwe re ava dike ku heta niha tê de ye û debara xwe bi meaşê malnişînîyê yê herî hindik dike. Her weha piştî wê demê dostanîya wî bi Ebdullah Şahînî re çêdibe ku li ser daxwaza wî nêzikî 2 salan dersê li Weqfa Zehrayê dide li nêzikî Mizgefta Mezin. Piştî vê yekê li nêzikî mala wan a Til 'Eloyê mizgeftek tê avakirin ku vê carê li ser daxwaza wan tê li wê mizgeftê dersê dide feqîyan, nêzikî 7 salan. Teqrîbî hejmara feqîyên wî 10-15 bûn.

Seyda di tevahîya muderrisîyê de ji ber sekna xwe dîyar dike ku wî îcaze nedane feqîyên xwe. Li ser gotina Seydayî feqîyan li ber destê wî dixwendin heta nêzikî qedandinê dihatin lê didîtin Seyda îcazeyê nade wan diçûn ji cihekî din îcaze distendin. Sofyanî bi tenê îcazeya Mela Mehfûzî daye, ew jî ji ber daxwaza wî ya zêde. Seydayî hem xwe hem jî ew layiqî vê tiştê nedidîtin, lewma nedixwest îcazeyê bide. Her weha piştî çend roj di ku niha dîrok 01.08.2024 e, Seyda dê îcazeya feqîyê xwe Mela Remezanê Dedaşî jî bide.

1.2.5. Rûtîna rojane ya perwerdeya wî

Medreseyan bi rêbaza xwe ya xweser û berbelav perwerdeya xwe dane, her wekî cihê birêxistina ilmên fenî, dînî û civakî, di vî warî de bandor li civakê kirîye û ji alîyên curawcur ve feydeyên ciddî dane civakê.³⁸ Ev perwerde bê guman li ser hinek pîlansazîyan hatine amadekirin ku Mela Hesenê Sofyanî jî rêbaza perwerdeya klasîk a medreseyan şopandiye. Li gor agahîyên me ji feqîyê wî Mela Remezanê Dedaşî stendin rûtîna perwerdeya wî weha bû;

Serê sibê zû dihatin bang didan, pênc wext nimêja cimaetê mecbûrî bû. Destpêka rojê bi cimaeta nimêja sibê dest pê dikir. Her feqîyekî di rasta xwe de mîqdarek Qur'an dixwend. Paşê seydayî ders dida feqîyên li kitêbên jor û feqîyên dî jî metin nedixwendin heta demê tayînan. Di demê tayînan de seyda diçû malê,

³⁸ M. Edip Çağmar, "Siirt ve Çevresindeki Medreselerde Eğitim", Uluslararası Siirt Sempozyumu, Şarkiyât Araştırmaları Derneği, 2007, r. 668.

feqîyan jî taştêya serê sibê dikirin. Dema seyda ji malê dihat dest bi dersa dikirin. Ders bi dor dihat dayîn; îro em bêjin dersa yekê *Şerhu'l-Muxnî* bigota sibê dihat ew dihişte paşîyê, ya yên din digot vê carê. Di navbeyna feqîyan de ferq jê re nebû. Piştî taştêyê her kesê muzakere dikir, feqîyê jor ji yê jêrê re mecbûr muzakere dikir. Feqîyê li pêş kîtêb bixwenda mecbûr ê ku li pişt wî gereka guhdarî bikira. Piştî esrê jî piranî wexta dersên seydayî biqedîyan her kes meşxûlî bi metinan dibûn, yên dersên wan zêde bin seydayî dersa wan digot. Piştî nimêja mexrebê şûnda piçûk mezin her kes mecbûrî diçû dersên xwe dixwendin; yê mezin heta berî seetekê bûn heta dihatin mutale'eyên xwe dikirin, yê ku li jêrê ew dihatin xwendina xwe dewam dikirin heta seeta xewê. Seetên xew û nanxwarin dîyar bûn. Roja pêncşemê ji nimêja esrê û pê de ders nebûn serbestî bû heta roja îne nimêja esrê. Rûtîna bi giştî weha bû.³⁹

Yek ji aliyên Seydayî yên tene pesindayîne jî eşq û şewa wî ya li hember zanîne û bêhna wî ya fireh e. Seyda di warê perwerdeyê de jî xusûsiyên giring hebûn. Ji bo famkirinê çî ji destê wî dihat dikir. Dersên xwe bi kurdîyeke xweşik dida. Di dema fêrkirina mijarên gramatîk de li ser zimanê kurdî muqayese dikir û bi wî şiklî dersa xwe dida famkirin. Ji bo dubarekirinê bêhnfireh bû û feqîyên xwe nediêşand. Bi şev û roj ji dil û can teqîbata xwendinê dikir. Heta niha jî Seyda bi rêya telefonê dersê dide hinek feqîyên xwe yên mela.⁴⁰ Birîfkanî dibêje;

Xwendevan li ders kitêbên li jorê jî ba heger kêmasîyên wî hebana ew dibir ji kitêbên jêrê bi awayekî kurt û xweşik lê dida xwendin, dida ber muzakereyan, ders lê dida guhdarîkirin û dîse digihand kitêbên jorê. Ez heyranê dersdayîna Seydayî me! Di dersê de wekî bavekî li ewladê xwe xwedî derdikeve bi wî şiklî li feqîyên xwe xwedî derdiket.

Her weha Seyda di muderrisîya xwe de dersên *Mem û Zîn*, *Nûbihara Bîçûkan*, *Eqîdeya Îmanê*, *Mewlûd*, *Zurûf*, *Terkîb*, *Rewdûn Neîm*, *Nehcû'l-Enam*, *Tefsîra Kurmancî*, *Hellu'l-Me'aqid* û gelekên dîtir ên kurdî dane feqeyên xwe ku bêyî Seydayên wî bi taybetî dersên kurdî bidin wî, xwebixwe hizira vê tiştê dike û van dersan dide feqîyên xwe.⁴¹

³⁹ Hevpeyvîn: Mela Remezanê Dedaşî (11.07.2024).

⁴⁰ Hevpeyvîn: Mela Remezanê Birîfkanî (10.07.2024).

⁴¹ Hevpeyvîn: Mela Remezanê Dedaşî (11.07.2024).

1.2.6. Rewşa aborî ya medreseyan a serdema wî

Gava Seyda behsa xizaniyê û feqîriyê dike li ser rewşa wê serdemê mînakên dilsoj jî pê re dide. Seyda dibêje “carinan em birçî diman, parîyek nan nebû em bixwin. “Me digot niha nane hişk ê di pacê ku mişka hinkî qurisandîye heba me yê têxista avê bixwara ji me ra şîr û şekir bû.” Ev gotin bi tenê ji rewşa wê demê re pênasîyeke mezin e. Seyda dibêje “Rokê perçeyekê piçûk qasî çar tiliyan kete para min, min nexwar min xiste berîka xwe, dîya min êvarê nane min dît got ev çi ye min gotê nanê min ê navrojê ye.” Ji bilî vê yekê di gelek waran de rastî tengasiyên serdemê hatine. Bo nimûne, ne serşok ne jî cihê destavê nebû wê demê, ji bo kar û barên zerûrî jî havînê û zivistana berê xwe didane newalan.

Yek ji tengasiyên di jî vehewandin bû. Di salên destpêka feqîtiya xwe de di nav şertên gelek teng de di maleke du çavî û yek eywanî de perwerdeya xwe ya ewil kirîye. Rewş ew qas xirab bû ku ji bo rûniştinê pûş û palak ji çolan dianîn û dikirin şiklê kursîyan, encaq bi wî rengî karîne perwerdeya xwe bikin. Bi ezîyet û zehmet û feqîrî derbaz dibin ew salên dijwar.

Wê demê peydakirina çavkanîyên xwendinê jî kêr bûn. Peydakirina defterekî an jî pênuşekî ne tiştekî bi sanahî bû. Li ser gotina Seydayî ji bo peydakirina kîtaban qesta Mela Şefîq û kîtabxaneyê wî fikir li Amedê. Diçûne pêşberê Mizgefta Mezin li şûna Xana Hesên Paşayî, li wê derê dikaneke piçûk hebû ku hubira çînî ji wir digirtin. Babê Seydayî 7 gayên wî hebûn û cotkarek bû, wî ji Seydayî re defter û hubir dianî û pênuşa wan jî zil bû. Diçûn ji ber çeman zil dianîn, serê wê diqelaştin tûj dikirin û bi serê wê zilê dinivîsîn. Seyda lê zêde dike ku berê wan li xwendinê bû, hedefa wan zanîn û hînkirin bû.

Helbet gundîya gelek qedrê wan digirt heta ji destê wan hatî, lê bele rewşa wan jî pêşçav bû. Wextê Seyda li Çeqelîyê feqe, gundîya gelek qedrê wan girtiye ku Seyda gelek bi qencî behsa vî gundî dike. Gelek li feqeyan xwedî derketine û giringîyeke mezin dayîne wan. Dibêje, pîrekên gundî hêk difirotime bi qaltekî sabûnê ku cilê feqîyan pê bişon. Dema av ji bîdona feqîyan diqedîya pîrekên gundî rêz dibûn bi tenekeyan ji kanîyê av dikişandin bo feqîyan. Heta Seyda dibêje “germa me ya

zivistanê; ronîya me ya bi şev ji kîsê vî xelkî bû, em çî ji vî xelkî re bikin ji bin mineta wan dernayên.”

Helbet tengasîyan helbest di muderrîsîya wî de jî dewam dikirin. Bi taybetî di warê xwarin û vehewandinê de. Hicreya wî 3 metre fireh û 5 metreyan dirêj bû, gava hejmara feqîyan zêde dibû cihê wan pir teng dibû, diketin nav hev û heta li ser kêlekî radizan nedikarîn xwe qelp bidin. Seyda li ser tunebûna zadî weha dibêje: “Feqî birçî dibûn û digotin Seyda em birçî ne, min dîgo law Welleh quweta me nagîyê. Hûn dixwazin bisekinin, hûn nexwazin herin, hûn dizanin.” Ji ber heskirina wan a ji Seydayî re nediçûn. Gundî bi xwe jî feqîr bûn ku carinan nanekî zuha encaq dikarîn bişînin. Tunebûnî bû dibêje Seyda Sofyanî.

Li ser vê yekê dema Sofyanî li gundê Qerengozê yê girêdayî Bismilê melatîyê dike tîne zimên ku wê demê xanî nebû mirov biçe tê de. Xanî yê gundîyekî bû, du çav û eywaneke wê hebû wekî dîn tiştêkî din tunebû. Çavekê/mezeleke wî xanî ya zexîre û qaf û qoran bû; ya dî jî ya rûniştinê bû. Reqreqa mişkan bû di nava fîraqan de, tunebûnî, perîşanî... Paşê diçe gundê Baheşmeyê yê Hezroyê dest bi melatîyê dike, vê carê xanî ji yê berê jî xirabtir e... Seyda di vê biwarê de anektodeke xwe dibêje;

Rokê ez ji xurînîya serê sibê hatim min dît waye feqî bi hev dikenin. Min got xêr e? gotin Welleh seyda me ji xwe re hebek şorbe anîye sergînek tê de derketîye. Cihê qulatekî qelî, tê da serek sergîn derketîye. Welleh hema me lêxistîye sergîn avêtîye û me ji xwe re xwarîye.

Ev mesela rewşa xizanîya wê demê tam tîne ber çavan. Di vî warî de Seyda di helbesteke xwe de gazindên xwe bi van risteyên tîne zimên:

De binêre vê şedşala xebatê
Hê Şofyanî baz dide l' dû zekatê (26/39)

Li ser hevpeyvînên me yên bi feqîyên Sofyanî re, Mela Remezan Can heman tiştan dibêje, “Feqîrî bû tune yî bû, pêxwerînîya sere sibê gundîyan dida dihiştin bo nîvro, nîvro jî tunebû, êvarî jî diçûn tayin dianîn.” Her wekî Birîfkanî dibêje, “Feqîrî û jarî û xizanî hebû, millet û feqî wekî hev bûn. Seyda ne kesekê wisa bû here li ser navê feqîyan tiştêkî bixwaze. Di dema me de me xwarin ji xwe re çêdikir. Tiştêkê luks nebû.” Mela Remezanê Dedaşî jî weha tîne zimên vê rewşê; “Feqî pir bûn; tayin

hindik bû, birçîbûn hebû. Carinan nan hebû pêxwarin nebû. Mesela em 15-20 heb bûn jî lê sê çar heb nanên me hebûn. Yanî birçîbûma feqîyan pir bû.”

Di encamê de li gor derkeftîyan tê dîtîn ku li herêmê û bi taybetî jî li medrese û cihên xwendinê rewşeke xirab a hejarîyê heye ku Seydayî helbestek terxan kirîye bo rewşa xizanan.

1.2.7. Hinek feqîyên wî

Mela Hesenê Sofyanî helbet li pey xwe jî tesîreke ilmî hiştîye. Di nav şertên dijwar ên serdemê de li ber destên wî çendîn feqîyên jîr û şarezaya gehîştine. Mela Hesenê Sofyanî ji ber jêhatûbûna wî behsa feqîyê xwe yê bi navê Mela Hesenê Hezanî (Prof. Dr. Hasan Tanrıverdi) dike ku xwendina xwe hemî li cem wî kirîye, îcazeya xwe jê girtîye, şî'rên wî ji ber kirine û niha jî li Zanîngeha Dicleyê akademîsyen e. Dîsa li gor ku Seyda dibêje Prof. Dr. Kadri Yıldırım jî yek ji feqîyên wî ye li zanîngeha Dicleyê di beşa Zimanê Erebî de û li zanîngeha Mardin Artukluyê jî di beşa Zimanê Kurdî de akademîsyentî kirîye. Kadri Yıldırım, piştî ku li ser ziman û edebîyata Kurdî gelek xebat kirin ket sîyasetê û di sala 2021ê de rehmet kir. Mela Mehîfûzê Xorosnî jî yek ji feqîyên Seydayî ye. Niha li Bismilê medreseya wî heye û dersan dide. Her weha Mela Mihemedê Zêrînkîr yek ji feqîyên wî yê dîtir e ku Sofyanî behsa jîrekîya wî jî dike. Wekî din, Mela Mehmûd Tekîn ku niha akademîsyen e, Mela Seyîdxanê Kurdîka, Mela Eskerî (Esker Sayar), Mela Remezanê Birîfkanî, Mela Remezan Can, Mela Remezanê Dedaşî û Ehmed Kanî jî hinek ji feqîyên Seydayî yê dîtir in.

Ji bo naskirineke baş, me heypeyivîn bi çend feqîyên Mela Hesenê Sofyanî re kirin yê ku me karî xwe bigihînin wan û me xwest ku kesayeta wî, perwerdeya wî û rewşa serdemê baştir têbigihin.

1.2.7.1. Mela Remezanê Birîfkanî

Mela Remezan yek ji Feqîyên Mela Hesenê Sofyanî ye. Ew li gundê Mermera Têrka ku girêdayî navçeya Sûrê ya Amedê ye di sala 1975an de li dawîya meha Remezanê tê dinyayê. Li cem babê xwe dest bi Qur'anê dike, paşê li ber destê feqîyê Mela Hesenê Sofyanî, Mela 'Eskerî ji mala Bûkarkê dest bi xwendina erebî dike. *Nûbiharê* û *Xayet'l-Îxtîsarê* heta *Bey'ê* li ber destê wî dixwîne. Li cihên curbicur

kitêbên dînî yên curbicur dixwîne. Li ber destê Mela Remezanê Dedaşê jî dixwîne ku ew jî yek ji feqîyên Mela Hesenê Sofyanî ye. Her weha xwendina xwe ya fermî jî ji alîyekê ve didomîne li Amedê.

Di sala 1990an de tê ba Mela Hesenê Sofyanî xwendina xwe li ber destê wî didomîne. Bi temamî du mehan li ber destê wî dixwîne. Bes li ser gotina wî di nav du mehan de gelek tişt ji Seydayî girtine û heta niha jî têkilîya xwe qut nekirîye.

Mela Remezanê Birîfkanî li cem gelek melayan feqîtî kirîye. Di encamê de li ber destê Mela ‘Elîyê Huccetî xwendina xwe diqedîne û îcazeya xwe jê distîne. Li gel salên dûdirêj ên melatîyê xwendina xwe ya fermî jî didomîne. Lîse û pêşlîsansê ji derve dixwîne. Her weha beşa Îxtîsasa Dînî ya Bilind dixwîne û dibe waiz. Niha li Sêweregê karê waiztîyê didomîne. Her wehadîtir Mela Remezan mastera xwe li Zanîngeha Dîjleyê li ser ‘ilmê Hedîsê kirîye û niha jî doktoraya xwe dîse li heman zanîngehê li ser beşa Belaxeta erebî dike. Seyda Mela Remezan zewicandî ye û çar zarokên wî hene.⁴²

1.2.7.2. Mela Remezan Can

Mela Remezan Can di sala 1967an de li Mermera Têrka tê dinyayê ku girêdayî navçeya Sûrê ya Amedê ye. Di sala 1979an de dest bi xwendina Medreseyê dike. Di sala 1984-85an de li ba Mela Hesenê Sofyanî 2 salan dixwîne. Li ba Seydayî kitaben xwe yên jor *Muxnî't-Tulab*, *Qewlî Ehmed*, *Şerhû'l-Eqaîd* û *Muxteserê* xwendine.

Seydayê Mela Remezan Can dibistana seretayî, navîn, lîse û pêşlîsans ji derve dixwîne. Mela Remezan ev 34 sal in melatîyê dike. Li gundê Başîlê yê girêdayî navçeya Yenîşehîrê ya Amedê 12 salan bi fexrî melatîyê dike. Piştî wê jî 22 salan melatîya fermî dike. Niha jî li gundê Şelbetîn yê girêdayî Egilê ya Amedê melatîya xwe dike.

1.2.7.3. Mela Remezanê Dedaşî

Yek ji feqîyên dîtir ên Sofyanî, Mela Remezanê Dedaşî ye ku li gundê Dedaşê yê girêdayî navçeya Hezroyê ya Amedê di sala 1957an de tê dinyayê. Li gundê xwe

⁴² Hevpeyvîn: Mela Remezanê Birîfkanî (10.07. 2024)

dibistana seretayî dixwîne û her weha Qur'an û Mewlûdê li cem seydayê gundê xwe dixwîne. Paşê di sala 1969an de tê Sofyayê cem Mela Hesenê Sofyanî.

Dedaşî ji bilî *Se'dînîyê* hemî kîtêbên xwe li ber destê Mela Hesenê Sofyanî dixwîne. Bi tinê ji bo ku tehsîla medreseyên dîtir jî bibîne sê mehan vediqete diçe gundekî girêdayî Farqînê û car dî vedigere def seydayê xwe û heta 1978an kîtêbên xwe diqedîne û xatir dixwaze. Li ser gotina wî Sofyanî beste çêdikirin û carinan besteyên xwe li wan dane xwendin. Seyda Mela Remezanê Dedaşî niha malnişîn bûye û her weha li Amedê li Hala Kevn li Medreseya Şêx Celalî bi dildarî bi feqîyan re mijûl dibe.

1.2.7.4. Ehmed Kanî

Ehmed Kanîyê ku hem birayê Mela Hesenê Sofyanî ye hem jî feqîyekî wî ye, di sala 1952yan de li gundê Sofyayê ji dayik dibe. Kanî, dibistana seretayî li vî gundî dixwîne. Ji alîyekê ve li ber destê kekê xwe Mela Hesenî jî perwerdeya medreseyê dibîne. Kitêbên xwe yê serf û nehwê li ber destê wî dixwîne. Di serfê de *'Izzî'yê* diqedîne, di nehwê de jî *Şerhu'l-Muxnî'yê* dixwîne û metnê wê ji ber dike. Ji dersên şerî'etê jî pêşî *Îbn-û Qasimê* dixwîne û piştî wê kitêbên şerî'etê yê bi navên *Muxnî'l-Muhtac* û *Îanetu't-Talibînê* dixwîne ku her yek ji van kitaban ji cildekî zêdetir bûn.

Seydayî di salên 60î de ji bo şopandina bûyerên li Başur, ew dişande rojnameyan. Hem van rojnameyan hem jî rewşa li medreseyê kirin ku ew bi fikrên millî yê kurdî bihese. Di lîseyê de dibe berpirsîyarê weşanxaneya Komalê li Amedê ku kovara *Rizgarîyê* derdixist. Ji ber vê çend caran ketîye girtîgehê.

Her paşê ji beşa Tirkî ya Zanîngeha Dicleyê ya Amedê mezûn dibe û di 1980yan de tayîna wî ya mamostetîya tirkî derdikeve bo Beşiktaş Stenbolê. Lê ji ber darbeya leşkerî ya wê salê pêşîya wî tê girtin. Piştî pêvajoyeke dirêj a dozan di sala 1996an de dest bi mamostetîya tirkî dike. Di sala 2012yan de dest bi mastera Ziman û Çanda Kurdî dike û li dibistana xwe bi tenê dikeve dersên bijarte yê kurdî. Di sala 2015yan û dibe malnişîn. Ji alîyekî ve jî li Zanîngeha Stenbolê beşa Rojnamgerîyê diqedîne. Her weha ji Zanîngeha Anadoluyê ji derve beşa Îqtîsadê diqedîne. Di sala

2021ê de di beşa Ziman û Çanda Kurdî de li Zanîngeha Dicleyê dest bi Doktorayê dike û niha teza xwe dinivîse.

Di encamê de, her wekî ji nimûneyên jorê jî hate dîtin feqîyên li ber destê seydayî rabûyîn heman wekî wî dildarê ilm û zanînê. Hema bêje her yek di warê xwe de bûye şareza û di civakê de gehîştîye merheleyên giring. Ev jî nîşaneyê şîyanewerî û dilbexşîya muderrîsîya Sofyanî nîşan dide.

1.3. Berhemên Sofyanî

1.3.1. Dîwan

Berhema esasî ya helbestvanî *Dîwana* wî ye. Lê ji ber ku ev dîwan jixwe mijara tezê ye, behsa vê berhemê di vê derê de nayê kirin.

1.3.2. Haşîyeya Mem û Zînê

Mela Hesenê Sofyanî ji bilî *dîwana* xwe ya civakî, millî û evînî, xwedîyê xebateke dîtir e ku ew jî Haşîyeya Mem û Zînê ye. Ev xebata Sofyanî mensûr e. Heta niha hîç nehatîye weşandin an jî çapkirin. Ev berhem li ser haşîyeyên wê ne û bi şiklê neqilkirinê hatîye amadekirin ji şerhên li ser Mem û Zînê yê M. Emin Bozarslan, Jan Dost, Kadri Yıldırım, Mela Mûsayê Bayezidî. Berhem hem bi kurdî-erebî hem jî bi kurdî-latînî hatîye nivîsîn. Lê Sofyanî dibêje pêdivî ye Mem û Zîn pêşîkê bikeve terkîbê paşê ev haşîye li gor rêza wê di binê wê de bêne rêzkerin. Ji vî alîyî ve jî hêz û şîyanewerîya Sofyanî ya di warên cuda de û ‘eşqa wî ya li ser xebatê, bi taybetî jî xebata millî xuya dibe.

2. VEKOLÎNA DÎWANA SOFYANÎ

Di vê pişkê de danasîna dîwanê û bi awayekî berfireh vekolîna dîwanê ji alîyê naverokî û ruxsarî ve hatîye kirin.

2.1. Danasîna Giştî ya Dîwanê

Dîwan ji wan berhemên re tê gotin ku şairek helbestên xwe tê de kom dike. Ji bilî mesnewîyan hemî cure teşeyên nezmê (xezel, qesîde, murebba, muxemmes, texmîs, helbesta mesnewî û hwd) di dîwanan de cih digirin. Di helbestên dîwanê de tertîb û hunereke bilind a edebî tê bikaranîn. Li dû vê yekê ji hela estetîkê ve asta *dîwanên muretteb* bilindtir e. Heger hemî helbest li gor serwayê hatibin rêzkirin û ev serwa li gor herfên alfabeya erebî, bi rêzê ve hatibin bikaranîn û her weha bi rêzê ve pêşîkê qesîde; piştî xezel û mussematan cih girtibin û heger hebin paşê ruba'î û mufredan cih girtibin, ji vî teşeyê berhemê re *dîwana muretteb* tê gotin. Dîwan di edebîyata klasîk ya rojhilatê de cureyeke gelekî berbelav e.⁴³

Dîwan, yekem car di nav ereban de derkdikeve meydana û xwe berdide erdnîgarîya farisan, ji wan jî derbazî Edebîyata Kurdî dibe. Di vî biwarî de tradîsyona dîwanan di sedala XVIem de dest pê dike heta roja me û di serdema me da jî dewam dike. Sofyanî jî yek ji nûnerên dîwanê yê vê serdemê ye û xwedîyê dîwanekî ye. Her wekî li jêrê jî dê bihête amajedan dîwan ji alîyê cure û temayan ve gelekî dewlemend e.

Edebîyata Kurdî ya Klasîk hebûna xwe di serdema modern de jî didomîne. Helbet ji alîyê şikil û şemal û naverokê ve rastî hindek guherînan tê. Şair û edebîyatvanên kurd, taybet jî şêx û melayên kurd dewamdar in di nivîsîna berhemên kurdî yên klasîk de. Bêguman yek ji wan jî Mela Hesenê Sofyanî ye ku îro bûye mijara vê lêkolîna me. Her wekî li jorê hatî gotin Mela Hesenê Sofyanî niha sax e û xwedîyê dîwanekî ye. Ev dîwana wî bi taybetî ji milê naverokê ve gelek modern e. Lê ji alîyê şikilî ve bêhtir ber bi edebîyata klasîk ve ye. Heta niha bi hîç şeweyekî ev dîwan nehatîye çapkirin, ji bilî heşt helbestan ku di beşa çarem de bi hûrgilî hatîye behskirin.

⁴³ Adak, h.b, 2015, r. 450-451.

Nusxeya dîwanê ya eslî li ber destê me ye ku ji alîye Mela Hesenê Sofyanî ve hatîye nivîsîn. Ev dîwan di deftereke piçûk de hatîye nivîsîn ku, berga wê naylonkirî ye. Ji ber ku defter di nav salan de çûye, piçekî peritî û bazer (zerikî) bûye. Ebada destxetê hema bêje 15x21 cm e, anku teqrîbî mezinahîya wê A5 e. Di dîwanê de 76 helbest hene. Ji bilî xêzikên berwarkî hinek sitûn jî hene. Di her rûpelê de hejmara rûpelê heye. Destpêka dîwanê bi navê Xwedê dest pê dike. Dîroka hemî nivîsîna helbestan hatîye nivîsîn. Nivîs bi pênuşa şîn hatîye nivîsîn û gelek zelal e bo xwendinê. Her çend di gelek helbestan de serenav hebin jî exleb serenav nehatîye bikaranîn. Di nivîsê de hereke (ser, cir û ber) hatine bikaranîn.

Di dîwanê de gelek hêmanên hunerî yên ruxsar û naverokî hene. Dîwan ji alîyê zimên ve gelek dewlemend e. Zimanekî fesîh û delal hatîye bikaranîn. Teşeyên cudawaz tê de cih digirin, rêjeya hunerên edebî ne hindik e. Ji alîyê tamayên xwe ve dîwan pirreng û tejî ye ku mijarên nû tê de hene. Her çend erûz nehatibe emilandin jî dîwan ji alîyê formên kêşa kîteyî, serwa û paşserwayê ve dewlemend e. Ev taybetmendîyên li jorê exleb taybetmendîyên helbestvanên sedsala XXem in.

2.2. Zimanê Dîwanê

Ziman ew cure amûra ragehandinê ye ku di navbera însanan de karê veguhestina hest û helwest û armancê pêk tîne. Ev hest û helwest û armanc dema bi nivîsandin pêk tê hingê dibe zimanê nivîskî. Zimanê nivîskî bi dîtina tîpan û nivîsînê roj bo rojê di qadên cuda de pêş keft. Bêguman yek ji van qadan jî edebîyat e ku însan bûnewerekî hestebare li ser dinyayê. Bi vê rêyê di qadên cuda yên edebîyatê de ziman hatîye bikaranîn. Li gel hizira estetîk û xweşikîyê, huner û şîyanên zimên hatine bikaranîn. Bêguman edebîyat bi vî rengî derketîye holê.

Di edebîyatê de jî taybet di edebîyata klasîk de şairan her tim meyl dane estetîk û şîyanên zimanê ku wê hest û helwest û armanca xwe bi şêwazên cuda bi kar bînin. Di edebîyata klasîk de jî ji ber vê çendê ye cureyên edebî, hunerên edebî, teşeyên nezmê û kêşa helbestê peyda bûne. Bi vê rêkê şairan şîyana xwe ya estetîka zimanê nîşan dane. Ji alîyekî dî ve şairan hewil dane şîyana xwe di biwarê dewlemendiya tûrikê ferhenga xwe de jî nîşan bidin.

Bi her rengê heyî, Mela Hesenê Sofyanî hewil daye jî şîyana xwe ya bikaranîna ferhenga xwe têr û tejî nîşan bide. Mela Hesen, ji dîyalekt û devokên cuda yên kurdî peyv û gotin werigirtine, heta ji zimanên bîyanî jî bi kar anîne. Em ê li jêrê ferheng, biwêj, cotepeyv, peyvên refleks, têgehên taybet û peyvên devok û zaravayên kurdî tesbît bikin û li ser dîwana Mela Hesenê Sofyanî analîzeke zimanewanîyê bikin.

2.2.1. Ferhengok

Di dîwanê de gelek peyv û gotinên orîjînal, arkeîk û marjînal hene. Li dû vê yekê ji bo famkirineke baş ferhenga peyvên di dîwanê de hate dayîn.

Babet: Layiq.

Bale: Ehmeq.

Behadir: Mêrxas.

Bend: Bestin, Girêdan.

Berberî: Rikaberî, dijhev.

Betê Kuş: Cureyek ji teyran.

Bihur: Derbasok, (tr:Geçit)

Bidad: Dadmend, Adil.

Bir: Beş, Teîfe.

Bira: Bi rastî.

Birisîn: Biriqîn.

Bîrdank: Hiş, Bîr, Hafîza.

Cihêbûn: Ducabûn.

Cirkî: Wexta.

Comkirin: Di erdê re kirina tişteki.

Cûn: Şêlî, Rengê şîn.

Çeqçeq: Li aşxaneyê darê li kevirê jorê dikeve ji bo ku genim birije.

Çê: Baş.

Çêj: Tahm, Lezzet.

Dangî: Piştî dotina pezî dema berxikan berdidine ber makê.

Dasî: Hestîyê Masîyan, Dirî

Dayox: Kesê dide.

Demsaz: Hogir, Hînbûyî.

Dinoje (Notin): Qulkirin.

Dewîşk: Gava şîrî dikeyînin, ew gemara di bine rûnê de dimîne.

Dêrin: Kevn, Qedîm.

D'pên (rêpan bûn): Çaverê bûyîn, li bende bûyîn.

Eger: Şert.

Erc: Şeref.

Ferzîn: Di şetrencê de kabika bi wezîrîyê tê zanîn.

Gem: Bizmik.

Ger: Zivirok, Gerînek, (tr: Girdap).

Gerîde: Maşîne, Otomobîl.

Gevez: Rengê zerikî an jî sorikî.

Gêt: Dinya.

Gincî: Ew rîxa bi dûngê heywanan ve hişk dibe.

Gupî: Kerenga Pîrbûyî.

Hahî: Hey hey kirin.

Hatox: Kesê tê.

Henzel: Zebeşê tehl.

Heqîb: Têr, Du berîk hene bi Stuyê xwe ve dikin an jî diavêjin ser dewaran.

Hevaldan: Komkirin.

Heytehol: Şemata, Geremol, Alozi.

Hewisîn: Hînbûn.

Hezîn: Xemgîn.

Hêlvan: Nêçîra kewan di berfê de.

Hêtûn: Karê hûrkin û şewitandina keviran.

Îsîn: Çirîsîn.

Jenandin: Lêdan û veçirîna hirîyê.

Kat: Bêyî tovavêtinê şînbûna genimî an jî tiştêkî dî.

Kejmêr: Katjimêr, demjimêr, seet.

Keleş: Rêbir, Eşkîya.

Kelk: Sûd, Feyde.

Keyber: Kêr.

Kizîr: Xizmetkarê malê, Navmalî.

Kujer: Kesê mirovan dikuje, Qatîl.

Kozik: Mewzî.

Laser: Lêhî.

Lokan: Hêştirê mezin.

Manî: Neşaqekî Çînî.

Melisîn: Çilmîsîn, Rizîyayî, Nermbûyî.

Mîr: Tehl.

Mîrar: Dur, Mîrcan.

Misas: Darê pê li gayê cotkirinê didin.

Mîşt û mîr: Lihevnebûn.

Nagahî: Ji nişka ve.

Nanê Loqo: Kesê li pey parîyê xwe.

Netewxur: Ew kesê zîrê dide neteweya xwe, kesê xayîn.

Nîştecih: Dêmanî.

Nuwaze: Berkeftî, Hêja, Fevkalade, Mikemel.

Peyak: Pîyon, Peyade, di şetrencê de kabikên herî bêhêz û jîmarezêde.

Pilîşkan: Kinîşt, Şelîq, Kilmîş.

Qarik: Zeîf, Bêhêz.

Qerpol: Cilê qetîyayî û kevn.

Qevizdan: Çîndayîn, hilavêtin, Hildan.

Qeyd: Bend, Bestin, Girêdan.

Qeyrana dilî: Sekinîna dilî, kirîza dilî.

Qor: Rêz.

Qubûr: Qalîkê çekê.

Qumutî: sotî, reşbûyî, şewitî, kiziri.

Raperîn: Serhildan.

Ristik: Gerdenî, Kolye.

Renc: Êş, Azar.

Saw: Tirs.

Sa'et: Zelzele, qîyamet.

Selsebîl: Kanî û robarekê boş ê biheştê.

Serad: Gava di nav Koma qulingên li asîmanan re asîman qulqulî xuya bike, Bêjînka genimî, Moxilik.

Sergopejlandî: Mirîşk.

Serhelat: Bêxwedî, kesê sere xwe hil dayî û diçe.

Serhevde: Minet.

Sifirkel: Xerabbûna çekan.

Silik: Xîz, Qom.

Sincirandin: Kelandin.

Siza: Ciza, Êş.

Şamî: 'Elok.

Şehîn: Tirazî, Pîvan.

Şek: Guman.

Şima: Gava hingî dihelînin, ew gemara hişk dibe.

Şirîd: Rêzbûna qulingan li asîmanan.

Şîyan: Karîn, Tiwan.

Vebir: Misogerî, Teqez.

Vizik: Teqol, Gizik (tr: Topaç).

Tatêl û etîr: Fikar, Metirsî,
Endîşe.

Tewer: Zêdetir.

Tewirandin: Komkirin.

Tirad: Bezandina hespan.

Tirkîrêj: Ew kesên bi tirkî
diaxivin.

Vîyan: Xwestin.

Wawîk: Çeqel, Torîk.

Wesî: Qewyatî, Wesîyet.

Wêtin: Bêjînkirin.

Wildan: Xizmetkara Biheştê.

Xalî: Vala.

Xase: Arê safî genim.

Xêt: Dîn.

Xidar: Dijwar, Zetmet.

Xilxal: Wekî ristikan e bi
pêyan ve tê girêdan, alîyê
gozekê.

Xurxor: Çala tijî av.

Xwebixwekir: Ew kesê tiştan
tîne sere xwe.

Xwexwaz: Egoîst.

Zom: Zozan.

Her wekî li jorê tê dîtin ferhenga Mela Hesenê Sofyanî gelek xurt e. Tê de peyvên orîjînal ên wekî “xwexwaz”, “netewxur”, “tirkîrêj” û hwd hene ku îhtîmaleke mezin ji alîyê wî bi xwe ve hatine duristkirin. Her weha peyvên marîjînal û kêmnas ên herêmkî yên wekî “hevaldan”, “comkirin”, “sergopejlandî” û peyvên modern ên wekî “bîrdank”, “kujer”, “raperîn” û hwd dewlemendîyeke di ya zimanê dîwanê ye.

2.2.2. Biwêj

Biwêj, ew cureyê vegotinê ye ku exleb mecazî ne û rewş û wezîyetekî dîyar dikin. Bes di dûmahîya vê yekê de hukmê hizirî nîne.⁴⁴ Di dîwana Sofyanî de em xweş rastî biwêjan hatin, ji wan çend nimûne li jêrê ne:

Bêmejî (3/5)

Barê mila (3/10)

Helîn (4/1)

Ji hiş çûyîn (4/1)

Xwelîlser (5/3)

Çav li derî (5/3)

Birîndarbûn (7/7)

Kulrêtin (8/1)

Zarezarkirin (9/5)

Dilşewitîn (11/1)

⁴⁴ Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanê Belkî, 2012, r. 41.

Xwînrêtin (12/6)	Lêv û diran lewitandin (12/9)
Qîr û şîn kirin (13/7)	Dilperîtîn (13/11)
Dilbîrin (13/11)	Zarîn (15/1)
Qurban im (15/7)	Stûxwar (16/6)
Nukulxwûn im (17/7)	Dil û ceger girtûbirê (18/1)
Ker û lal û çavtarî bûn (19/3)	Kul û keser (21/8)
Fîxan im (22/2)	Mala ava kirin (23/34)
Dilkêşî (26/28)	Çav li xew (28/6)
Birînkûrbûn (29/8)	Bêhnçikandin (30/7)
Nalîn (32/6)	Çirandina gurçik (34 10)
Rijandina rondikên xûnê (38/12)	Şermisar bûn (42/3)
Mirina her roj (42/6)	

Her wekî tê zanîn biwêj di helbestan de gelek berbelav in ku estefîk û tam û lezzetê diêxin helbestê. Mela Hesenê Sofyanî di dîwan xwe de serî li gelek biwêjan daye. Hema bêje di her helbestê de çendîn biwêj bi kar anîne.

2.2.3. Cotepeyv

Cotepeyv, ew komika du peyvî ye ku da wateya peyvê xurttir bibe bi alîkarîya du peyvan tîr sazîkirin û ji alîyê wate û dengî ve tîkildarî hev in. Bi vî rêkê tesîreke gelemperî tê bidestxistin. Wate jê, du peyv hene dengên wan û wateyên wan nêzîkî hev in.⁴⁵ Mela Hesen jî tîra xwe cotepeyv bi kar anîne, her wekî li jêrê hatî:

Post û estî (4/1)	Tatêl û eîr (5/15)
Reh û rîşala (7/3)	‘Eql û hiş (7/3)
Xîr û xalî (8/30)	Şek û guman (8/46)
Şox û şeng (9/7)	Nav û deng (9/7)
Mest û jar (10/16)	Fend û fêl (11/27)
Çêj û lezzet (12/23)	Zar û zêç (25/2)

⁴⁵ Baran, h.b, r. 41.

Hîv û rojê (34/30)

Dab û nerît (39/12)

Bav û kal (27/19)

Xêr û bêrê (33/7)

Fêl û Fend (39/57)

Rih û can (39/103)

Mêrg û kanî (42/14)

Tirş û tal (43/38)

Dost û yar (43/32)

Koşk û seray (43/45)

Ji ber ku cotepeyv hem ji alîyê wateyê ve hem jî ji alîyê dengî ve aheng û rîtmeke xweş ava dikin helbestvan pir bi kar tînin. Li dû vê yekê bi awayekî siruştî em di helbestên Mela Hesenê Sofyanî de gelek caran rastî cotepeyvvan tên.

2.2.4. Peyvên refleksê

Hunera *refleksê* an jî *şewqdanê* ku jê re *onomatopoiea* jî tê gotin cureyekî hunerê ye ku dengen xwezayî tên zarvekirin (teqlît). Armanca vê hunerê çêkirina îmajêke şênber e di hişê xwendevanî de.⁴⁶ Mela Hesenê Sofyanî peyvên şewqdanê bi kar anîne:

Barebar (2/4)

Karekar (2/4)

Birebir (2/10)

Çîkeçîk (6/1)

Nalenal (6/1)

Zorezor (7/8)

Ringering (10/10)

Xuşxuş (10/14)

Şingeşing (11/19)

Xîzexîz (12/10)

Fîkefîk (12/29)

Çeqçeçî (13/16)

Zarezar (14/7)

Barebar (14/9)

Filfil (21/9)

Gazegaz (27/5)

Fişefiş (27/21)

Xilxiland (31/15)

Peyvên şewqdanê ew cure peyv in ku exleb li dor dengen ava dibin. Di encama derketina dengê de saz dibin û exleb tene dubarekirin. Di dîwanê de her çend rêjeya van peyvvan ne zêde bin jî dîse mirov nimûneyên wê dibîne.

⁴⁶ TDK, “yansıtma sözcüğü”, 2024.

2.2.5. Bêje û têgehên taybet

Bêje, yekîneyeke xwedîwate ye û bi dengê an rêzeke dengî tê îfadekirin ku yekeya herî biçûk a zimên e. Têgeh, yekîneyeke wateyê ye ku di hişî de hatîye afirandin û bi giştî taybetîyên razber an jî şênber ên tişteki yan jî rewşekî temsîl dike.⁴⁷ Hindek caran hindek bêje û gotin hene ku bi serê xwe sembola îmajên wan ên fireh hene. Bi taybetî li dora remza mezmûnan hindek bêje û gotinên taybet çêbûne. Bê guman ev peyv bi piranî peyvên hevpar in ku di zimanên erebî û farisî û kurdî an jî yên dîtir de tên bikaranîn. Mele Hesenê Sofyanî jî di dîwana xwe de çendîn ev peyv û bêje û gotinên taybet bi kar anîne.

Tewer (2/3)	Vebir (2/7)
Xwexwaz (2/12)	Hêlvana (4/3)
Misas (4/11)	Erc: Şeref (5/3)
Xwebixwekir (5/4)	Netewxur (5/11)
Tatêl û efîr (5/15)	Vizik (6/3)
Hevaldan (6/8)	Kozik (7/15)
Wêtin (8/10)	Tewirand (8/17)
Keleş (8/47)	Berçavk (10/9)
Kejmêr (12/4)	Serhevde (11/32)
Hewisîn (11/39)	Gevez (12-9)
Gincî (12/30)	Sa'et: Zelzele (20/10)
Şima: Mûm (22/7)	Babet: Dinya (28/4)
Gêtê: Labis (29/4)	Hîndekar (39/4)
Rawestgeh (39/6)	Rehperest (39/133)
Bîrdank (40/7)	Serwer (40/7)
Heytehole: Geremol, Alozi (40/13)	

Her wekû dîyar dibe Mela Hesenê Sofyanî çend bêje û têgehên taybet di dîwana xwe de bi kar anîne ku mirov dikare berfirehtir jî bike.

⁴⁷ TDK, "Sözcük ve Kavram", 2024.

2.2.6. Devok û zaravayên kurdî

Her wekî hatî dîyarkirin ziman bingehtirîn û bandortirîn û karîgertirîn amûra ragehandinê ye. Li ser rûyê dinyayê bi hezaran ziman hene û van zimanan çendîn beş û liq hene. Zimanê kurdî jî yek ji zimanên qedîm ên dinyayê ye. Kurdî di nav xwe de çendîn dîyalektan dihevine ku bi taybetî di bin çar serenavan de tene beşkirin: Kurmancî, soranî, goranî-zazakî, hewramî-lekî. Her weha van dîyalektan jî di nav xwe de çendîn devok hene ku taybet em berê xwe bidin dîyalekta kurmancî, devokên wekî botanî, behdînî, berfîratî, serhedî, silivî, şêxbizinî, xerzanî, torî, mêrdînî, rojavayî û hwd di nav xwe de dihevine.⁴⁸

Mela Hesenê Sofyanî jî ji Farqînê ye, bi devoka silîvanê diaxive. Bi awayekî ji rêzê vê yekê rengê xwe daye dîwanê û devoka silîvanê bandortirîn devok e di dîwanê de. Lêbelê Mela Hesen bi vê yekê nemaye û ji devokên dîtir ên kurmancî û heta ji dîyalekta soranî jî sûd wergirtiye û hin peyv û gotin bi kar anîne. Ev yek jî bêguman hakimî û baldariya wî ya li ser zimên nîşa me dide. Têkilîya Sofyanî bi soranî û zazakî, erebî, tirkî û farisî re heye. Em ê li vê derê hewil bidin ku bikarînanan van devokan di dîwana Sofyanî de tesbît bikin û di vê babetê de encamekî bi dest bixin.

2.2.6.1. Unsûrên kurmancî

2.2.6.1.1. Devoka Silîvanê/Amedê

Ji ber ku Mela Hesenê Sofyanî bi eslê xwe ji Farqînê ye, li wê derê jîyaye û niha li Amedê dijît guman nîne ku kartêkirina devoka wî di berhemê peyda bibe. Silîvan îro navçeya Amedê ye û xwudanê mêjûyeke kevnar e. Devoka Silîvanê li herêm û bajarên Farqîn, Amed, Xarpêt, Mêrdîn û aliyên jor ên Çemê Feradê tête emilandin.⁴⁹

Di devoka Silîvanê de ergatîvî baş nayê bikaranîn, Mela Hesenê Sofyanî jî li gelek cihan ergatîvî baş bi kar ne anîye. Bo nimûne şairî gotîye *Ajokaran me firand...* Mirov nizane ne wî ajokar firandine an jî ajokaran ew firandîye. Li gorî ergatîvîya kurdî divîya weha gotiba: “Ajokaran em firandin...”;

⁴⁸ Hewa Salam Khalid, “Zimanê Kurdî, Malbat û Zarên Wî”, *Kurdîname*, hj. 1, 2019, r. 10.

⁴⁹ Mikail Bülbül, “Prensîpên Amdekirina Ferhengê Otografîk ji bo Kurdîya Kurmancî”, *Nûbihar Akademî*, hj. 20, 2023, r. 37. DOI: <https://doi.org/10.55253/nubihar.1376298>

Ajokara **me** firandin
Gelek şara **me** gerandin (39/107)

Di dîwanê de gelek peyven taybet bo devoka Silîvanê hatine bikaranîn:

Ji xwe **kînga** be evan mirovan
Dê bidin agir her wekî hovan (8/26)

Evya mirov e **evya** heywan e
Evana dar in **vana** giya ne (8/29)

Na birê hêja çewa çênabe
Te'îm û tore eger **bira** be (8/75)

Niha çi bêjim bê'eqî û hiş im
Li pey her duwan her dem dimeşim
Bilê her duwan min tiştêk navê
Ji **hinkatirê** bi çi serxweş im (7/5)

Helbestvan ji ber ku ji vê herêmê bi xwe ye, ev rewşeke asayî ye ku bandora kurmancîya herêma wî hebe. Bi taybetî di warê tewangê de ev revş li seranserê dîwanê xuya ye.

2.2.6.1.2. Devoka Botanê

Herêma Botanê yek ji herêmên kurdan e ku li başûrê herêma Botanê herêma Behdînanê û li rojhelatê wê jî Hekarî heye. Ji xelkên li herêmê dijîn re Botî yan jî Bohtî / Buhtî tê gotin. Navenda herêma Botanê, bajarê Cizîrê ye.⁵⁰

Bajarên wekî Cizîr, Silopya, Basa, beşek ji Hezexê, Şirnex, Dihê, Sêrt Perwarî, Şîrwan, Qileban û Dêrika Rojavayê dikevî nav herêma Botanê. Li van herêman devoka Botanê tê bikaranîn. Ta bajarên bajarên wekî Hîzan, Mîks û Şaxê jî taybetmendîyên vê devokê tên dîtin. Devoka Botanê taybetmendîyên xweser ji alîyê peyv û telafûz û hevoksazî û rêzikên gramerê ve di xwe de dihevinê.⁵¹ Ji serdema klasîk ta sedsala bîstem zimanê standart ê Edebîyata Kurdî li gel devoka Bahdînî/Hekarî devoka Botanê bû. Sofyanî jî di helbestên xwe de serî li van taybetmendîyên devoka Botanê daye:

⁵⁰ İbrahim Işık, *A'dan Z'ye Kürtler*, ç.5, Nûbihar, Stenbol, 2017, r. 109.

⁵¹ Mikail Bülbül, h.g, DOI: <https://doi.org/10.55253/nubihar.1376298>

Hela dengê berx û mîyê
Têk hev dibin **nîk** dangîyê
Şêrîntir in j' nay û neyê
Xweş bihara Kurdistanê (1/13)

Hewce nîne diyar kim ewî razê di dil de
Lewra tu wî dîzanî ne **niho**, dema pêş de (30/3)

Ev feleka me ya ha **çira** ew qas xayîn e!
Ji bilê vî gelê kurd dijminê kesî nîne (31/14)

“Nîk” anku “cem, ba, nik, rex” û peyveke xwesarî devokên botan û bahdînanê ye. Her weha ji bo “weha”yê “holê”, ji bo “çima”yê “çira” tê amilandin;

Divê bîr û bawerî
Tev lî xwîna teva be
Çi gundî çî bajarî
Vêkra nebe qe nabe (4/7)

Sa'eta te kelebçe ye xilxala te qeyd e di pa
Berçavka te potikê reş **ristika** te benê sêpa (10/9)

Ber bi min dildarê bînî, çavê xwe ronî bikim
Serê min cî da bibire, bike **gorî** û fîda (16/10)

“Vêkra” anku “bi hev ra”, “ristik” anku “gerdenî” û “gorî” anku “qurban” û ev hemî ji devoka botanê ne. Di encama lêkolînê hate dîtin ku li hinek cihan peyvên xwesarî devoka botanê di berhemê de hene. Bê guman ev yek ji alîyê helbestvanî ve bi zanebûnê hatine cîbicîkirin ku xwestîye yekitîya zimanê kurdî raxe ber çavan.

2.2.6.1.3. Devoka Colemêrg û Badînanê

Herêma Colemêrgê li bakur heta başûrê Gola Wanê ye. Li başûr qismekî mezin ji herêma Behdînan jî di nava xwe de dicivîne û li rojava jî digehe heta çîyayên Tanînê yên ku sînorê Bêşebab û Qilebanê ne. Di sala 1400ê de herêma Amêdîyê ji herêma Hekkarî veqetîyaye û bûye herêmeke xwesar. Piştî Komara Tirkîyeyê jî bakurê herêmê (Elbak, Şax, Payîzava, Westan, Miks) bi ser wîlayeta Wanê ve hatîye girêdan û piştê jî Bêşebab bi ser wîlayeta Şîrnexê ve hatîye girêdan. Niha di fermîyetê de navê bajêr Hakkari ye. Heta li Silopya jî qismekî bahdînîyan dijîn li gel botîyan. Her weha Behdînî jî Zaxo, Amêdî, Akrê, Zêbar û Duhokê digire nav xwe. He çend devok Colemêrgê û Badînanê wek hev bin jî di navbeyna wan de cudahîyên

piçûk hene lê em ê wan di yek kategorîyê de pênase bikin.⁵² Seydayê Mela Hesenê Sofyanî ji devoka colemêrgî/badînanî gelek nimûne bi kar anîne.

Ji bo pirhejmarîyê “êt/êd” têtê bikaranîn;

Hêja mane ewan kêfêd negotî
Xiyala min diçe w gemê dikotî (26/22)

Piştî çend roj û şevan me zor çavê xwe vekir
Wan nêgizêd hinarî girt û lê temaşe kir (34/3)

Peyvên xwaserî heremê;

Evan gulên me yên **bor**
Hin şor û hin ser û mor
Babetê bêhna we ne
Karê gêtê jêr û jor (28/4)

Gava bûme ji dayik bi wî zarî girîyam
Dîya min gote lorî di **landikî** hewîyam (31/5)”

Gava dengê zarezarê ji gelê wî werêkê
Dasî bêtin di çav wî de bimba û renc û zindan (5/10)

“Dasî”, hestîyê masî an jî tiştêkî wekî strî an jî dirîyî ye ku aydî herêma Colemêrg/Badînanê ye ye. Her weha mînakên weha û zêdetir di dîwanê de cih digirin:

Têkil (6/8)

Divêtin (11/27)

Xir û xalî (22/5)

Evro (33/4)

Axifîm (31/7)

Neşim (35/2)

Disotî (41/1)

Di encama lêkolînê de hate dîtin ku piştî devoka silîvanê -ku helbestvan ji vê herêmê ye- herî zê de nimûneyên devoka colemêrgî/behdînanî xuya dibin. Sedema vê yekê jî ew e ku ev devok, devoka standart a Edebîyata Kurdî ya Klasîk e.

2.2.6.1.4. Devoka Mêrdînê

Li Mêrdînê du devok hene, yek devoka Tûr Abidîn e ku ji Nisêbîn û Midyad û Stewrê pêk tê (Kercos jî dikeve nav), jê re herêma Torê tê gotin; ya dî jî devoka

⁵² Îhsan Çölemerikli, *Hakkari Sûretleri*, weş: Lîs, Amed, 2006, r. 12-15; Mikail Bülbül, *Prensîpên Amdekirina Ferhengê Otografîk ji bo Kurdîya Kurmancî*.

Omerîyan e ku ji bajarên Qoser, Dêrik, Şemrex, Mahsertê, navenda Mêrdînê û Serêkanîya Rihayê pêk tê.⁵³ Sofyanî ji devoka Mêrdînê weha nimûne dane:

Ji naçarî malê digre, **dere** bajar
Zar û zêçan davê şikeftê **dere** kar
Wî kar nîne gerê pê ve heta êvar
Perîtûm ez ji hinavê xwîn dirêjim (2/6)

Li Mêrdînê ji bo çûyînê di forma lêkerê de “derin” tê gotin. Di nimûneya jorê de jî ev yek di di dema niha de wekî “dere” derketîye meydanê. Her weha li jêrê jî peyva talîyê ku li Mêrdînê tê bikaranîn ku di dîwanê de derbaz dibe:

Bêhna te pir xweş dûrê **talîyê**
Herî civatê li rêwîtiyê
Kêleka kê bî serê te bilind
Li çî siwar bî dûrî tengîyê (12/25)

Di hinek devokan de ku devoka Mêrdînê jî di nav de gelek caran ji bo herikbarîya axaftinê tîpa “n”yê ya dawîya peyvê dikeve ku ev yek di dîwanê de jî derbaz dibe. Her weha di vê devoka berbehs de li şûna “hûn”ê “win” tê gotin. Her wekî li jêrê hatîn:

Mi gote wan rast dibêjin hûn pir xweş û şêrîn in
Lê pir ji we şêrîntir e rûniştina bal yarê (14/4)

Me gote wan ser çavan sosinên biskê yarê
Win yê roya cejnê ne, Bîst û Yekê Adarê (34/4)

Sofyanî peyvên bi taybetî xweserî vê herêmê zêde bi kar neanîne. Lewra nimûneyên wê di dîwanê de kêm in.

2.2.6.1.5. Devoka Serhedê

Yek ji devokên dîyalekta kurmancî “devoka Serhedê ye.” Navê Serhedê ji parçeyên “ser” û “hedd”ê pêk tê ku “ser” bi kurdî-farisî ye û “hed” jî bi erebî ye. Ji bo sînore di navbeyna Osmanîyê û Îranê de hatîye bikaranîn û paşê bûye wekî navê herêmekî. Ji bajarên Bilîs, Qers, Erzirom, Erzîngan, Mûş, Agirî, Erdexan, Îdirê, rojhelatê Çewligê pêk tê. Ta bakurê bajarê Wanê jî dikare bikeve nav vê

⁵³ Mikail Bûlbûl, “*Risteyên Peywendîyê û Peyvrezîya Wan (Devoka Mêrdînê)*”, Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, cilt:2, 2016, r. 24.

kategorîyê.⁵⁴ Her weha ji layê çand û zimên ve mirov dikare kurdên Ermenistanê û yên Sovyêtê jî bêxe nav herêm û devoka Serhedê.

Devoka Serhedê ji alîyê peyv û telafûz û bikaranîna hindek rêzikên gramerê ve xwedî taybetmendîyeke xweser e. Her wekî hatî gotin Mela Sofyanî ji Silîvanê ye û ku nêzîkî Serhedê ye hem jî ji ber ku serederîyên wî bi serhedê û serhedîyan re çêbûne û hakimê zimanê kurdî ye car caran vê yekê xwe di helbestên wî de daye der.

Nano loqo tu nebî belê “**parî** b’ feyde ne”
Bapîra xweş gotine “dawî bi ser hev de ne” (11/32)

Tu **dêna xwe didiyê** xwîn di dev **ra** davêje
Gava bêjî gunehko kafir ji ter dibêje (31/19)

Birê min tu biborî mi pir zêde **xeber da**
Lewra ez mame bêhêz hember van kul û derda (31/24)

Mamosteyek hêja û **rind**
Li zankoyê payebilind (39/5)

Her wekî me gotî helbestvan xwestîye peyvên herêmên curbicur bi kar bîne û xizmetê bo kurdî bike bi yekîti û hevgirtina zimên. Li dû hindê ji devoka serhedê gelek nebin jî hinek nimûne hatine dayîn.

2.2.6.1.6. Kurmancîya nû

Bêguman ziman amûra ragehandinê ya zindî ye ku heger mecala xwe dît her dem di nav geşedan û guherînê de ye. Di serdema nûjen de li gel guhorîna jîyana çandî û civakî hin term û têgehên nû li zimên jî zêde dibin. Taybet di kurdî de di van salên dawîn de gelek têgehên nû derketine meydana. Heger em di sentera kurmancî de bifikirin çendîn ji van jî dîyalektên dî ketine kurmancîyê, çendîn ji van jî nû hatine sazîkirin û çendîn ji van jî ji zimanên dîtir hatine. Mele Hesenê Sofyanî jî ji ber ku di vê serdema nûjen dijî bi awayekî xwezayî hindek ji van peyvvan bi kar anîne:

Radio (1/16)

Televîzyon (1/16)

Mersedes (2/5)

Vebir (2/7)

Bêdadî (2/11)

Xwexwaz (2/12)

⁵⁴ Mehmet Yonat, “Di Devokên Kurdîya Kurmancî de Rewşên Morfolojîk (Mînakên Devokên Bakur, Başûrê Rojhelatê û Başûrê Rojavayê)”, *Mukaddime*, 2020, 11 (2), r. 416.

Têdigîjim (2/13)	Sûd (3/2)
Pilîşkan (3/8)	Qor (4/6)
Maf (4/9)	Xwebixwekir (5/4)
Sîroz (5/11)	Şoreşvan (7/16)
Têkoşer (8/71)	Pêşeng (8/73)
Berçavk (10/9)	Rizgar (10/16)
Nîkotîn (12/9)	Qeyrana dilî (12/13)
Zanyar (12/14)	Lêkolîner (12/15)
Asansor (12/22)	Sîpor (12/24)
‘Efûkar (12/28)	Serhelat (13/16)
Lavakar (17/6)	Hawîrdor (21/10)
Çêj (23/29)	Firoşgeh (25/6)
Civat (32/1)	Çê (33/6)
Nîştiman (36/6)	Zanist (39/3)
Hîndekar (39/4)	Endezyar (39/4)
Bijîşk (39/4)	Hemraz (34/19)
Serxwebûnê (34/24)	Mamoste (39/5)
Payebilind (39/5)	Rawestgeh (39/6)
Nuwaze (39/47)	Gerîde (39/92)
Gengaz (39/114)	Êrîş (39/121)
Rehperest (39/133)	Serwer (40/7)
Bîrdank (40/7)	Bersiv (40/8)
Nîgaş (40/9)	Lidarxistin (40/21)
Nîştecih (41/11)	Kujer (42/53)
Mijar (43/11)	Telefon (43/20)

Di encamê de hate dîtin ku Mela Hesenê Sofyanî gelek peyvên nûjen ên kurmancîyê bi kar anîne. Li gor hizra me, Sofyanî ev yek bi zanebûnê kirîye ku xwestîye zimanekî fesîh û dewlemend bi kar bîne.

2.2.6.2. Unsûrên soranî

Pêdivî ye cih ji bo dîyalekta Soranî jî bête veqetandin, bi boneya hinek nimûneyên vê dîyalektê tê de hene. Dîyalekta Soranî li nav qismek kurdên li Başur û Rojhelatê li bajarên Silêmanî, Kerkûk, Hewlêr, Mûsil, Rewandiz, Çemçemal, Şeqlawe, Koye, Qeladize, Seqiz, Bane, Merîwan, Tîkab û çend cihên di tê axaftin. Her çend ji alîyê peyvên ve nêzîkî kurmançî be jî ji alîyê hevoksazîyê ve dûr dikeve. Soranî zimanê fermî yê Herêma Kurdistanê ye ku di warên sîyasî, aborî, komelayetî û zanistî de tê nasîn û axaftin.⁵⁵

Sofyanî bi kurmançî nemaye û hewila bikaranîna çend peyvên soranî kirîye. Cegerxwîn jî heman tişt kiribû lewra ku me di jorê de jî dîyar kiribû em bawer dikin ku ew ketîye bin kartêkirina Cegerxwînî.

Tika w rica min ji te ê hiştûjê weke şûr
Ezber bike vê metnê têke kalan û qubûr (43/54)

Serbilindî ger dixwazî hevalbendî **eger** e
Yan na tu xwebixwekir î ji bo te nîne derman (5/4)

Birê hêja êşên li kurd ne **şêrpence** w sîroz in
Hinek êşên netewxur in xidartirînê eşan (5/11)

Dara benîştê dibe fistiq **xwoş**
Çewa çênabe ê bi ‘eqî û hoş (8/76)

Di rû wî da em bûne mat
Bûn ustuxwar û bêlebat
Hat serê me ev **karesat**
Kesek hewara me nehat (42/20)

Tu pê naheşî wek zîlindar e
Ji şîhetê re dijminê har e
Jehra bi **kejmêr** didî hinavê
Zû te bişîne bin axa sar e (12/4)

“Tika” anku ricakirin, “eger” anku şert û sebeb, “şêrpence” anku penceşêr, “xwoş” anku xweş û “karesat” anku “arîşe, bela” û “kejmêr” jî ji katjimêra soranî ye an ku wateya wê “seet” e.. Sofyanî zêde peyvên soranî bi kar neanîbin jî mirov dizane ku eleqeya wî ji dîyalektên kurdî heye, çî nebe hinek agahîyên wî hene di li ser vê mijarê.

⁵⁵ Kadri Yıldırım, *Fêrkerî Soranî*, weş: Berdan Matbaacılık, Stenbol, 2014, r. 17-18.

2.2.7. Unsûrên zimanên bîyanî

Bêguman Edebîyata Kurdî taybet di serdema klasîk de bi gelemperî ketîye pey şopa Edebîyata Erebî û Edebîyata Farisî. Bivêt nevêt ji wan edebîyatan teşe û cureyên edebî girtine. Li gel vê yekê ji wan edebîyatan rêbazên nivîsînê, peyv, mezmûn, çîrok û îmajên dîtir jî girtine. Bi taybetî gelek peyvên erebî û farisî derbazî Edebîyata Kurdî bûyîne.

Her weha ji ber hukimranî û cîranîyan tirkî, her çend kêmbêr be hindêk peyv û gotin ketine nav Edebîyata Kurdî. Li dû vê yekê di serdema modern de çawa ku îngilîzî serwerîya xwe li dinyayê daye qebûlîkirin, her wesa di her qadê de êdî kartêkirina xwe li hemû zimanan dike. Li ser vê yekê bandora xwe li kurdî jî kirîye taybet di navê amûrên nûjen de. Li dû vê yekê Mele Hesenê Sofyanî jî di berhema xwe de kêmbêr be jî peyv û gotinên erebî, farisî, tirkî û îngilîzî çî bi hemdê xwe çî jî bêhemdî xwe bi kar anîne ku seyda tirkî û erebî dizane û têkilîya wî bi farisî heye.

2.2.7.1. Unsûrên erebî

Erebî li gel qedîmîya ziman û tarîxa edebîyata xwe ya kevin li Rojhelata Navîn çendîn sedsalan bûye yekane û bihêztirîn ziman. Taybet li gel Îslamîyetê ev yek zêde bûye û kartêkirineke mezin li ser netewe û gelên derdorê ava kirîye. Li dû vê yekê tesîra xwe li zimanê kurdî jî kirîye û şairên kurd zor caran peyv û gotinên erebî bi kar anîne di şî'rên xwe de. Yek ji van kesan jî Mela Hesenê Sofyanî ye.

Qelbê wî jî 'j devê wî ra **şedeqte**
Dê bibêje **we bîl heqqî neqeqte** (26/21)

Di dema **te'ellumê** ku demeka hindik e
Nefsa xwe hin bêşîne dût û dirêj şa bike (43/17)

Hecûl ekber e (21/12)

Qudret (12/23)

Nefx (21/11)

Tehsîl (43/14)

Selat û selam (43/55)

Te'lim (34/16)

Qulûban (25/38)

Li gor daneyên li ber destan her çend helbestvan zimanê erebî bizane û digel ku Sofyanî şairekî mela ye û jîyana xwe bi muderristîya erebî derbaz kirîye jî peyvên

erebî ên helbestvanî bi kar anîne gelek kêr in. Ev tişt dîwana wî siviktir û rihetir dike ji alîyê xwendin û famkirinê ve.

2.2.7.2. Unsûrên farisî

Piştî erebî, zimanê farisî zêdetir xwe daye der li Rojhelata Navîn. Zimanê farisî li dor çand û nerîteke xurt ava bûye. Edebîyat farisî ew qas xurt e heta zor caran di hindek mijaran de ketîye pêşîya Edebîyata Erebi jî. Hem wekî cografîk hem jî wekî nijad ji ber ku faris pitir nêzîkî kurdan e tesîra ziman û edebîyata farisan jî kartêkirina xwe li ser kurdî û Edebîyata Kurdî bi hêsanî çêkirîye. Mela Hesenê Sofyanî jî bêguman wekî şairên dîtir ev yek kirîye.

Giştî wan pîr silavan ji dil û can dişînin
Hemîşe du'akar in, ji bo we ra xemgîn in (27/26)

Aya gul bû xiyala min? Ta seherê ji êvarê
Xew nakevîtin çavên min gazî dikim delal yarê (19/4)

Aya kengê em dê derên buharê
Ceşnê bikin Bîst û Yekê Adarê
Gula bêhn kin ji ber biskê dildarê
Vêkra gerin ji sibê ta êvarê
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e (6/7)

Di evînê bûme serxwos
Ji girînê bê çav û **goş**
Ez wek dînim bê 'eqî û hoş
Gelek tû me lê av tune (13/10)

Bikarbirina peyvên farisî her çend di berhemên klasîk ên Edebîyata Kurdî de zêde jî bin Mela Hesenê Sofyanî di dîwana xwe de kêr berê xwe daye pêyvên farisî.

2.2.7.3. Unsûrên tirkî

Li gor zimanê erebî û farisî bandora tirkî kêmtir e li ser helbestvanê kurd, taybet di serdema klasîkê de. Bes taybet piştî avabûna Komara Tirkîyeyê, girtina tekkeyan û mecbûrîkirina dibistanên tirkî hêdî bi hêdî tesîra wî zimanî jî xwe daye der di helbestên şa'irên kurd ên sedsala bîstem û bîst û yekem de. Mele Hesenê Sofyanî jî hindek pevy bi kar anîne bes bi rexneyî.

Di her dema xwe tev da digote min ha çiçik
Negote "**al meme**" yan tişteke dî nexweşik (31/6)

“Hoşçaqalin” me gote wan
Li rêya xwe ‘m bûne rewan (39/9)

Bo me gotin **“hoşgeldiniz”**
Ez ziwa bûm bûm kevrê biz (39/49)

Tiştê ecêb e klasîkvanên kurd ên bakur her çend di nav çerxa Tirkîyeyê de bijîn jî tesîra tirkî hema bêje nîne di helbestên wan de. Bê guman Mela Hesenê Sofyanî di vî warî de ji wan cuda ye. Ya ku Sofyanî ji wan cuda dike, ne bikaranîna peyvên tirkî ye, rexnegirîya wî ye li ser axaftina bi zimanê tirkî. Li dû vê yekê hinek peyvên tirkî bi awayekî rexnegirî di dîwana wî de cihê xwe dîtine.

2.2.7.4. Unsûrên îngilîzî

Îngilîzî di roja me de berfirehtirîn ziman e û li ser rûyê dinyayê. Hema bêje bûye zimanekî ferz li ser dinyayê. Taybet li gel teknolojiya nû hema bêje navê amûran hemûyan bi îngilîzî ye. Mela Hesenê Sofyanî jî taybet ji bo amûrên serdeman nûjen hindêk serî li peyvên îngilîzî daye ku êdî di her zimanî de hene.

Divê her kes pesin bide
Radyo timî salix bide
Televîzyon nîşan bide
Xweş bihara Kurdistanê (1/16)

Dema biteqe çekek **nukleer**
Jîndar ê bibin tev zêr û zeber (8/27)

Ji **telefonê** dûr be ji xwe bike tehsîlê
Xwe famêkorî neke bi aletê te‘tîlê (43/20)

Bê guman bikaranîna van peyvên îngilîzî gelek kêr in di dîwanê de. Ev peyvên îngilîzî exleb navên amûrên teknolojik in ku ji nû ketine jîyana me. Jixwe ev peyv jî êdî bûne peyvên hevpar ên dinyayê.

Wekî encam li gor lêkolînên li ser dîwanê, hate dîtin ku dîwana Sofyanî ji warê devokên kurmancîyê ve pirreng û dewlemend e. Helbestvanî di helbestên xwe de cih daye gelek devokên kurmancîyê. Bi taybetî rêjeya devoka silîvanê ku seyda ji vê herêmê ye û devoka colemêrgî/behdînanî zêdetir e di dîwanê de. Di vî biwarî de, bi taybetî di warê peyvên nûjen ên kurmancîyê de dewlemendîya berhemê gelek zêde ye.

Her weha, gava mirov berê dide nimûneyên zimanên bîyanî di dîwanê de tête dîtî ku her çend peyvên bîyanî mîqdarek hebin jî ev tiştekî asayî ye, lewre em dikarin bêjin Mela Hesenê Sofyanî zimanekî xwerû, fesîh, dewlemend, ji peyvên bîyanî dûr û nêzîkî zimanê rojane bi kar anîye. Tiştê ecêb ew e, digel ku Sofyanî şairekî mela ye û jîyana xwe bi muderristîya erebî derbaz kirîye jî bandora erebî pir kêr e.

Li gor hizra me du sebebên vê yekê hene: Ya yekem, di encama lêkolînê de hate dîtî ku Sofyanî zimanhesekî mezin e. Qedr û ehemîyeta kurdî gelek digire ku di çend helbestên xwe de bal kêşaye ser vê xalê, anku bi zanebûnê xwe ji peyvên bîyanî dûr girtîye. Ya duyem, belkî jî bikarneanîna kêşa erûzê bûbe sedema vê yekê ku hewcehî bi peyvên bîyanî nebûye. Jixwe her wekî tê zanîn, helbestvanên serdema sedsala XXem êdî wekî şairên serdema berî xwe nakevin nav qalibên curbicur û zehmet ên erûzê û zimanekê dijwar bi kar nayînin. Bêhtir bala xwe didin kêşa kîteyî û peyvên xwemalî. Lê gava me ev yek ji Seydayî pirsî hizra me ya yekem rast derket ku piştî demekî biryar daye kurdîyeke paqij û xwerû bi kar bîne. Li dû vê yekê em dikarin bêjin Mela Hesenê Sofyanî jî taybetmendîyên serdema xwe di xwe de dihevwîne.

2.3. Hunerên Edebî

Edebe di zimanê erebî de wateya edeb, terbiyekirina nefsê, xweşîkî û zerafetê dide.⁵⁶ Ji ber ku edebîyat jî li dor van esasan ava bûye heman wateyê ‘edebîyat’ê jî dide. Her weha huner xweşîkkirin û xemilandina tiştekî ye.⁵⁷

Li dor vê yekê ilmê belaxetê ji *me‘anî*, *beyan* û *bedî‘*ê pêk tê. *Beyan* jî wateya dîyarbûn, eşkerebûn û xuyabûnê dide.⁵⁸ Ilmê *bedî‘* anku hunerên ciwankarî û xweşkirinê ye ku me‘neyê û lefzê xweş dikin. *Me‘anî*, ew hêmanên rêzimanî di xwe de dihevwîne ku gotin rast û durist bête famkirin. Ya ku li ser struktûra peyvê disekine *serf* (morfolojî), ya ku hevokê dikole *nahiv* (sentaks) e. Li dor vê yekê *fesahet* jî

⁵⁶ İskender Pala, *Ansiklopedik Divân Şiirî Sözlüğü*, Weş. Kapı, ç.18, Stenbol, 2012. r. 133.

⁵⁷ Ji bo zanyariyên berfireh bnr: Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*.

⁵⁸ M. A. Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat*, Weşanên 3F, ç.6, Stenbol, 2007, r. 17.

zelalbûn û fambarîya peyv û gotinê ye li gor rêzikên zimên.⁵⁹ Em ê nirxandina dîwanê ji aliyê hunerên edebî ve li ser van beşan bikin.

2.3.1. Hunerên edebî yên bi mecaz û teşbîhê ve girêdayî

2.3.1.1. Teşbîh (lêkçiwandin)

Şair li gel zewq û kelecaniya xwe, da tesîrê li ser xwendevanî ava bike û vegotina xwe xurt bike serî li hindek huneran dide. Yek ji wan jî teşbîh e, teşbîh ew cure huner e ku ji du hebûnên ji hev cuda, şibandina ya bêhêz e ber bi ya bihêz ve. Teşbîh peyvek erebî ye û wateya şibandinê dide. Di hunera teşbîhê de divêt hunera muşebbeh (ya ku li tiştekê tê şibandin) û muşebbehûn bîh (ya ku tiştek li wê tê şibandin) hebe yan nexwe hunera teşbîhê dernakeve meydana.⁶⁰

Di teşbîhê de çar hêmanê eslî hene:

- a) **Muşebbeh:** Ya ku li tiştekê tê şibandin.
- b) **Muşebbehûn Bîh:** Ya ku tiştek li wê tê şibandin.
- c) **Wecha Şebah:** Aliyê şibandinê
- d) **Edata Şebah:** Daçeka Şibandinê

Ev huner di berhemên menzûm de gelek berbelav e. Di dîwana Sofyanî de jî ji hunera teşbîhê gele nimûne hene;

Bêhna te gelek fireh her wekî derya mezin
Tu carî xema nexwî çî li ser û çî li bin (11/40)

Seydayê min Mela 'Elî
Baş û raxê tije gul î
Tu şêrînê nava dil î
Înşallah bêderd û kul î (38/1)

Bê çav mame wekî Ye'qûb
Tev birînim wekî Eyûb
Jar û mest im ez bê tixûb
Lew reben im hogir tune (13/8)

⁵⁹ Çağmar, M. Edip, *Aliştırmalarla Belagât Arapça Dil Bilgisi*, weş. Ensar, İstanbul, 2022, r. 286-288; Menderes Coşkun, *Sözün Büyüsü Edebi Sanatlar*, Weşanê Dergah, ç.2, Stenbol. 2010, r. 43-44.

⁶⁰ İsa Kocakaplan, *Açıklamalı Edebi Sanatlar*, weş. Türk Edebiyatı Vakfı, Stenbol. 2011, r. 162; Numan Külekçi, *Edebî Sanatlar*, weş. Akçağ, ç.4, Ankara, 2005, r. 31-33.

Her wekî însanê sebra wî gelek heyî jê re bêhnfireh tê gotin. Ji bo zêdekirina tesîra wê rewşê li ser xwendevanî çêbike bêhna wî şibandîye deryayan, ew qas fireh û mezin. Lewra muşebbeh “te” ye û muşebbehûn bîh jî mezinahîya deryayê ye. Weke din di risteyek din de heskirina xwe ya li beranber seydayê xwe rave kirîye û xwestîye her wî bilind bike, lewra ew şibandîye gul û baxan. Di nimûneya dîtir de helbestvanî hem şibandîye bêçavbûna Ya‘qûbî hem jî birîndariya Eyûbî. Bi vî şiklî gelek nimûneyê teşbîhê hene.

2.3.1.2. Îstî‘are

Îstî‘are bi teşbîha mecazî re pêwendîdar e. Ji bo pêkanîna vê hunerê divêt an muşebbeh (ya ku li tiştekî tê şibandin) an jî muşebbehûn bîh (ya ku tiştek li wê tê şibandin) bi tinê hebe; Anku di îstî‘areyê da yek ji wan heye ya dî tune.⁶¹

Li vê derê xaya hebestvanî rastewxo ji gotina meqseda xwe zêdetir estetîkkirina şeweya wesifdan û vegotinê ye bi rêbazeke cuda. Bi vê rêkê dinyaya xîyalî firehtir dibe û bi şênberkirina hest û ramanê wate tê xurtkirin.⁶² Sofyanî jî di gelek helbestên xwe de cih daye vê hunerê:

Lavakar in em ji te tu evro werî vira
Li vir şevê borînin di gel me şêrê şêra (33/4)

Lehza mirov li ser vê beytê hûr dibe mirov dibîne ku muşebbehûn bîh anku ya tiştek lê tê şibandin heye, ew jî şêr e. Bes muşebbeh bi xwe nehatîye nivîsîn. Her çend nehatibe nivîsîn jî mirov dizane mebest kî ye û çî ye. Nimûneyên bi vî rengî di dîwanê de zêde ne.

2.3.1.3. Mecaza mursel

Mecaza mursel ew cure huner e ku ji xeynî wateya esasî wateyeke din tê qesdkirin lêbelê ji bilî şibandinê pêwendîyek divêt serederî di navbeyna wateya esas û wateya mecazî de hebe û li ber famkirina wateya esasî jî astengek hebe.⁶³ Seydayî jî di dîwana xwe de gelek caran cih daye vê hunerê, her wekî li jêrê hatî:

⁶¹ Ali Bulut, *Belagat Terimleri Sözlüğü*, weş. M.Ü. İlahiyat Fakültesi, No.355, Stenbol, 2015, r. 190.

⁶² Coşkun, h.b, r. 68.

⁶³ Çağmar, h.b, 2022, r. 325.

*Şofyanî her çav li rê ye, xew û xwarin lê tune
Destê wî her tim bilind e, du'akar e ji Xweda (16/9)*

Her wekî di beyta jorê de hatî helbestvan îdîa dike ku ew ji ber dûrîya yarê ketîye xem û tatêlan. Ji ber hinde bêtî xwarin û vexwarin û xewê çavê wî li rêya yara wî ye. Bes tê zanîn ku ji bo jîyana berdewam xew û xwarin du hêmanên sereke ne, wate jê tiştekî weha qet çênabe. Esasen helbestvanî evîna xwe û êşa xwe anîye zimên.

2.3.1.4. Kînaye

Kînaye ew cure huner e ku di ferhengê de wekî sergirtin û peçinandina tiştekî ye. Bikaranîna peyvên cotwate ne bes ji wan meqsed ya mecazî ye. Her çend ji wateya binetar serencam derbikeve jî ya muhîm mecaza wê ye. Ji ber ku biwêj jî bi heman şeweyê tên gotin exleb biwêj jî dikevî nav kînayeyê.⁶⁴ Seydayî jî ev huner weha bi kar anîye:

*Xizanê me bi şekalê li rê kar e
Axê bêdad li mersedesê siwar e
Xwedî ax e, gundî koçerê bêwar e
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim (2/5)*

Li vê derê ji ber xizanî û nezanîyê helbestvan derdê xwe vedibêje û wek nimûne helbestvanî peyva “xwînretin”ê bi kar anîye. Lêbelê rastî jî xwîn ji hinavên wî narijin, nîyeta wî ew e ku bîne ziman ka çi qas derdê wî mezin e. lewra serî vê hunera edebî daye. Her weha ji bo peyva “peritîn”ê jî mirov dikare heman tiştî bibêje. Bi tenê helbestvanî xema xwe anîye zimên.

2.3.2. Hunerên edebî yên bi wateyê ve girêdayî

2.3.2.1. Mubalexe

Mubalexe di ferhengê de tê wateya mezinkirina ji adetê zêdetir û di edebîyatê de ew huner e ku ji bo kartêkirina gotinê mezinkirina tiştekî ji adetê zêdetir an jî piçûkkirina wê ya bi heman rengî ye. Exleb di methîye, fexrîye û hîciwan de tête bikaranîn. Ev huner di pênasikirina tiştekî de derbaskirina ji heddê xwe ye. Piranî di

⁶⁴ Çağmar, h.b, 2022, r. 392; Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Weş. Türk Dil Kurumu, Ankara, 2009, r. 416.

helbestên evînê de têne bikaranîn ku armanc mezinkirina û bilindkirina evînê ye.⁶⁵
Lewra exleb helbestvan dema evîna xwe tînin zimên ta ku destê wan tê vê evînê
mezin dikan. Di helbestên Sofyanî de jî ev huner li gelek cihan heye:

Gazin nekin li min bira
Roj li berê weke çira
Heyva çarde fedî dike
Ciyê lê ye naçe wira (18/8)

Di nimûneya jorîn de hunera mubalexeyê an jî bi navekî dîtir hunera
mezinkirinê derdikeve pêşberî me. Gava helbestan behsa delalîya maşûqê dike wê
ew qas mezin dike ku tîne rezele bêhempa. Ronahîya rojê li ber wê wekî çirayekî
dibîne, heyv ji delalîya wê şerm dike naçe cem wê.

Ji Tofana Nûh buhurîn
Rondikê çavê şil ê min
Arê Xelîlî hênîk tê
Ber şewata nav dilê min

Şewate ye di cegerê
Ger bînekî b' der ve derê
Rûyê erdê bikizire
Bê dar û ber weke bere

Evê renca evîna min
Li ser çiya bata danîn
Hemî deşt dê biba sîlik
Peravê deryaya rengîn (20/7-9)

Di van nimûneyên jorîn de jî ev hunera berbehs dîse derdikeve pêşîya me.
Gava Helbestvan behsa evîna xwe dike dikeve nava hinek şibandin û muqayeseyan.
Rondikê xwe ji Tûfana Nûhî diborîne, şewata dilê xwe ji şewata agirê Hz. Îbrahîm
dijwartir dihesibîne. Heger ew şewat bikeve erdê dê erdê bikizirîne, her li serê
çîyayekî bê danîn dê çiya bihele bibe sîlik û xîz û qom. Bi vî rengî di gelek cihan de
helbestvanî hunera mubaxeleyê bi kar anîye.

2.3.2.2. Teşxîs (kesandin)

Teşxîs ew cure huner e ku tê wateya tîpdana tişteki. Yanî di cuwankarîyê de
taybetmendiyên mirovan li tiştan bîn barkirin û tevgerên mirovane li ser wan bîn

⁶⁵ Pala, h.b, 2012, r. 338; Osman Aslanoğlu, “Di Mem û Zînê de Çend Hunerên Wateyî”, *Mukaddime*, 10(1), 2019, r. 150-151.

nîşandan, ji vê hunerê re teşxîs tê gotin⁶⁶. Sofyanî jî ev huner di helbestê xwe de bi kar anî ye, her wekî li jêrê hatî:

Dara gûzê di serî da desmala xwe dihejîne
Mêwa tirî dawî dajo nav milê xwe dibe w tîne (10/15)

Di vê mînaka jorîn de bûnewerên derveyî însanan taybetmendîyên însanan girtine ser xwe. Bi nimûne dara gûzê destmalê dihejîne an jî mêwa tirî milê xwe dihejîne. Ev hemî kiryar û taybetmendîyên însanan e lê li dar û mêwan hatine barkirin û ew hatine teşxîskirin.

Gazin nekin li min bira
Roj li berê weke çira
Heyva çarde fedî dike
Ciyê lê ye naçim wira (18/8)

Helbestvan di vê helbesta evînîyê de ketîye ber meth û pesindayîna yarê. Gava vê yekê dike jî hinek tiştên qîmetdar û bi yara xwe re muqayese û dike. Bo nimûne di çarîna jorê de heyvê û yara xwe muqayese dike û dibêje heyvê ji ber wê fedî kir. Lê çawa ku tê zanîn, fedîkirin taybmendîyeke hestî û bi tinê insan dikarin însax xwedîyê vê hestê ne. Bes helbestvanî ev hest li heyvê bar kirîye û di vê derê de hunera teşxîsê bi kar anîye.

Gelo gava tu difirî
Vê rewşa me nafikirî?
Bawer dikim ger bizanî
Bibî pepûk her bigirî (9/3)

Di vê nimûneyê de jî ku helbestvan derdê xwe û civaka xwe ji qulingê re dibêje, Seyda pirse ji qulingê dike, dibêje “vê rewşa me nafikirî?”. Her wekî tê zanîn “fikirîn” taybetmendîyeke însanan e, bes Seydayî ev taybetmendî li qulingê anku tişteki derveyî însanan bar kirîye. Bi vî şiklî di dîwanê mirov car caran rastî vê hunerê tê.

⁶⁶ Perwîz Cîhanî, *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, Nûbiharê, Stenbol, Çapa Duyem, 2013, r. 49-50.

2.3.1.3. Tecahula ‘arif

Tecahula ‘arif ew cure huner e ku şair dema behsa tişteki dike, derheqê wî tiştî de xwedî zanyarî ye, zana ye bes xwe li nezanîyê dideyne û heçkû haya wî jê neyî li xwe dike.⁶⁷ Sofyanî jî serî li vê hunerê daye, wek nimûne;

Birê kurdî bes bixape **ev çi li te hatiye?**
Qey rebenî para te ye, li rû dinê nav gela? (3/7)

Rewşa kurdan ya dîyar li ber çavan e û egera serdabirin û xapandina wan jî dîyar e bes şair cardin dipirse û egera serdabirinê dike dibêje “*ev çi li te hatiye?*”

Gelo nayê wê buhara tev de gul
Li ber gulê çin de bixwûne bilbil
Paqij bike ji murovan êşa dil
Sivik bike li murovan barê mil
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e (6/6)

Aya gul bû xiyala min? Ta seherê ji êvarê
Xew nakevîtin çavên min gazî dikim delal yarê (19/4)

Li jorê dîsa di du cihan de serî li vê hunerê daye. Her çend şair bizane piştî wê sir û seqema zivistanê bihar têtin jî dîse xwe li neznîyê dideyne û dipirse “*gelo nayê wê buhara tev de gul?*” Her wekî din di cihek din de gotîye “*aya gul bû xiyala min?*”

2.3.1.4. Îstîfham

Îstîfham ew cure huner e ku da kartêkirina helbestê zêde bibe serî li rêbaz û hunera pirsê tê dayîn. Ji bo balkaşên û estetîkkirinê ev pirs tê kirin. Bersiv giring e, hetta bersiv di nav pirsê bi xwe de ye⁶⁸. Helbestvanî jî di gelek cihan ev huner bi kar anîye:

Hetta kengê em wuha bin, dû heval û perîşan
Li dijê hev bidexesî, bêzanîn û tev xizan? (5/1)

Ji bo şêx re bi gorî ye
Her yek neyarê ê dî ye
De ka kerem ke tu bêje
Ewya li ku; dîn li ku ye? (38/7)

⁶⁷ Kadri Yıldırım, *Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, Weş. Avesta, ç.3, Stenbol, 2016, r. 59.

⁶⁸ Aslanoğlu, h.b, r. 153-154.

Helbestvan di mînaka yekem de li ser nezanîn, xizanî, dexasî, perîşanîyê dibe heta kengî em ê weha bin. Ku esasen bersiva wê di pirsê de veşartî ye ku heger nezanî ji holê rabe ev pirsgirêk jî radibin. Lê helbestvanî bi rêya pirsê xwestîye vê yekê bînin zimên. Di mînakek din de dema şêxan rexne dike dibêje “*Evya li ku; dîn li ku?*” nîyet û armanca şairî heman tişt e...

2.3.1.5. Nîda

Dema şair kelecana dibe, hestîyar dibe hindek peyvên baneşanî yên wekî “ey, ya, ox, ax, lo,” bi kar tîne, wehareng hunera nîdayê peyda dibe. Şair piranî nîdayê di maweyên xemgînî û dilêşîyê de bi nîdayên wekî “ax, of, eywax”; di dema keyfxweşîyê de nîdayên wekî “oxweş, ...lo, ...lê, ...ino”, di dema gazîkirin û xîtabê de nîdayên wekî “ey, ya, hey, lê, lo”yê têne bi kar tîne. Nîda carinan wekî tişteki vala ye û ji alîyê xwendevanî ve tê dagirtin.⁶⁹ Nivîser gelek caran hindek gotinên neyên gotin an jî hindek gotinan nexwaze bêje bi peyvên nîdayî vala/bêdewam dihêle, bi hestên xwe li wateyê wê xwendevanî dide hîskirina an jî ji wî diberde ku ew li gorî xwe şirove bike. Şairî di dîwana xwe de ji vê hunerê hes kirîye:

Ma deng tenê ye **lo malik ava!**
Xweş û mirîyan tîne ber çava (8/13)

Bidî yek kesek vê dinya fire
Dê bêje **oxweş** bê per bifire (8/51)

Hemîşe em diqîrin dibên **ya Reb** tu rakî
Ew nuqteya reş a dil tu bextê me heval kî (27/15)

Li gorî nimûneyên ku ji Dîwana Sofyanî hatine girtin, ji bo rewş sitemê nîdaya “lo malik ava”, ji bo rewşa keyfxweşîyê nîdaya “oxweş” û ji bo nîdaya gazîkirinê nîdaya “ya Reb” hatiye bikaranîn.

2.3.1.6. Tekrîr

Tekrîr wek maneya ferhengî dupatkirin û tekrarkirin e. Armanca xurtkirina maneyê ye, li gel zeelakirina peyvê bi dupatkirina peyvê an jî gotinê bala

⁶⁹ Dilçin, h.b, r. 453; Kocakaplan, h.b, r. 113.

xwendevên tê kêşan.⁷⁰ Takrîr li gorî hewcehîyê û şîyanewerîya şairî car caran bi awayekî estetîk û serincrakêş tê tercîhkirin. Sofyanî jî ev huner weha bi kar anîye:

Evî însanê bi min qe nabe
Pirî ko dibê **hema ji ma be**

Ew besê wî ye **hema ji ma be**
Hema ji mabe, **hema ji ma be** (8/50)

Semaya wan mi serxweş kir bi reqsa wan mest û jar im
Bo dîlana rizgarîyê **evîndar im evîndar im** (10/16)

Dê biba bersiva **we**, fire bikra dilê **we**
Birevanda xemê **we** sivik bikra barê **we** (34/8)

Ên ku weka *Dilkanî* ne
Alîkarê wan tunîne
Lewra ew jî **bêxwedî ne**
Bêxwedî ne bêxwedî ne (42/21)

Karê wê qîr û girîn e
Têjikên min têjikên min
Hewara min kesek nîne
Nema dil û gurçikên min (24/3)

Di dupatkirina van peyvên de mane jî cihekî giring digire. Ji bo kelîmeyên terekarî yê hemwate jî terekîra mukerrer tê gotin. Mînakên li jorê ji bo vê yekê dikarin bêne hesabkirin ku Sofyanî li gelek cihan nebe jî li hindek cihan serî li vê hunerê daye.

2.3.1.7. Tedrîc

Tedrîc bi wateya xwe ya ferhengî tê wateya pilekirinê, derecekirinê dide. Yanî dema rewşek, fikrek, hestek, kelecaneke bête veguhestin pile bi pile tê bilindkirin an jî pile bi pile tê nizimkirin. Li dû vê yekê di edebîyatê de wateya hesta şairî ye bi rengekî pile bi pile, qonax bi qonax an jî ji tiştê piçûk ber bi tiştê mezin ve an jî ji tiştê mezin ber bi tiştê piçûk ve.⁷¹

Me ava selsebîl anî
Baxê me bû mêrg û kanî
Ref bi ref çûkan lê danî
Bû cihê geşt û seyranî (42/14)

⁷⁰ M. A. Saraç, h.b, r. 196.

⁷¹ Vedat Ali Tok, *Edebî Sanatlar Ansiklopedisi*, Stenbol. Literatürk, 2011, r. 249.

Her çend ev huner berbelav be û zêde bê bikaranîn jî di dîwana Sofyanî de em zêde rastî vê hunerê nehatin.

2.3.1.8. Tezad

Tezad cure ew huner e ku peyda dibe gava şair du an jî zêdetir peyv û gotinên wateya wan dijberî hev bi hev re bi kar tîne. Wehareng hunera tezaî derdikeve meydana.⁷² Exleb du bêjeyên wateyên wan li dijî hev di hevan beytê an jî bendê de derbas dibin. Di Dîwana Sofyanî de ji bo vê hunerê gelek nimûne hene.

Nexwendin û çavnebarî ya sisêyan xizanî
Têkil xwûna rehî bûne malê lê kime wêran

Gelo heye royek were bibin xwenda û devek
Destê wan bê ber devê wan biqewrînin dijminan (5/12,13)

Di mînaka jorê de tê dîtin ku li hember peyva “nexwende”yê “xwende” , li hember peyva “çavnebarî”yê “devêk” û li hember “xizanî”yê jî gotina “deste wan bê ber devê wan” anku dewlendî hatîye û peyv û gotinên dijber bi awayekî hunerane hatine bikaranîn.

Tal û şêrîn weke hev germ û serma jî wişa
Ken û girîn birê hev bikevî rabî dîsa (11/38)

Di vê beyte tenê de çar tezad hene; “tal” tezada “şêrîn”ê, “germ” tezada “serma”yê, “ken” tezada “girîn”ê û “ketin” tezada “rabûn”ê ye ku bi awayekî awayekî hunera hatine cîbicîkirin. Her weha;

Gazî dîkin lo rebeno dilê me bo te peritî
Gelo çewa xewa te tê şev û rojê naxebitî (10/8)

Heta ku ew nebin yek
Bi rast û çep de baz din
Dê bihelin wekî lek
Pir serîyan bi dar din (4/5)

Ger dixwazî pêş de herî
Divê bikî şoberberî
Di nav pêlê derya zulmê
Çavan vekî herî werî (9/11)

Bo xwe taştîya sibê rûn û hingiv dixwaze
Bo te dibê navrojê bixwe nan û pîvaz e (11/13)

⁷² Yıldırım, h.b, 2016, r. 55.

“Rast” û “çep” û “şev” û “roj” peyvên dijberî hev in, her wesa di mînaka dîtir de “herî” û “werî” ku ji lêkerên “hatin” û “çûyîn”ê peyda bûne dîse du peyvên dijberî hev in. Di beyta jêrîn de “xwe” û “te” du tiştên dijberî hev in. Her weha helbestvan li dû mijarê dibêje; ew, rûn û hingivî ji xwe re dixwaze ku ev xwarinên xweş û baş in, mirov dikare bêje heçê dewlemend van xwarinan dikare bixwe; li dijî vê yekê dibêje ji “te” nan û pîvaz anku xarina nexweş û feqîran dixwaze. Ev her du, du rewşên dijberî hev in. Sofyanî di dîwanê de gelek caran serî li hunerê daye.

2.3.1.9. Muqabele

Di ferhengê de dijberîya tişteki ye an jî rasthatina du tiştan li miqabilî hev. Wek têgehî jî di edebîyatê de şair tiştên ne li dijî hev dibêje û pê re jî li gor rêza wan tiştên dijber dibêje.⁷³ Di heman demê de ev peyv yekûdu temam dikin. Sofyanî di dîwana xwe de serî li vê hunerê daye:

Mem evîndar le pey **Zîn** im
Na, **Ferhadê** dilşêrîn im
Yar hunda ye **dilbirîn** im
Dil peritî **derman** tune (13/11)

Her wekî xuya dibe Mela Hesenê Sofyanî di dîwana xwe de cih daye peyvên muqabele yên wekî evîndarên navbang Mem û Zînê, Ferhad û Şêrînê, derman û birînê.

2.3.1.10. Tenasub

Tenasub ew cure huner e ku ji komkirina çend peyvên têkildarî hev pêk tê. Divêt di navbeyna wan de dijberî nebe. Helbestvan ji bo hunera tenasubê têgehên cudawaz ên zanistî, mêjûyî, lehengên çîrokan, navê ajal û gîyayan bi hev re zêde bi kar tîne.⁷⁴ Sofyanî di dîwana xwe de ev huner gelek bi kar anîye:

Zemîn dibe **mêrg** û **çîmen**
Çivîk dibin pêk ve **hozan**
Adar û **avrêl** û **gulan**
Xweş bihara Kurdistanê

...

⁷³ Bulut, h.b, r. 297-298.

⁷⁴ Osman Alsanoğlu, h.g, r. 144.

Hinek jîndar **qanûnvan** in
Hinek din jî **tembûrvan** in
Hin **bilûr** û **zirnevan** in
Xweş bihara Kurdistanê(1/2,12)

Xwezî em jî wek te bana
Nava refa xwe da bana
Dûrê **gur** û **wawîk** û **hirç**
Geştê bigra li esmana (9/8)

Deşt û **çiya mêrg** û **devî** gazî dîkin hey hey reben
Çewa di gel **hiş** û **mêjî** ketî nava **zincîr** û **ben** (10/7)

Heger mînakên li jorê yek bi yek bêne nîrxandin di mînaka yekem de “mêrg” û “çîmen” her du jî gîya ne. “Çivîk” û “hozan” ji ber ku her du jî dixwînin têkildarî hev in. “Adar” û “avrêl” û “gulan” her sê jî mehên biharê ne. Di mînaka duyem de “qanûnvan” û “tembûrvan” û “zirnevan” “bilûr” hemî jî têgehên muzîkê ne. Di mînaka sêyem de gur û wawîk û hirç hemî jî ajelên metirsîdar ên dirinde ne. Di beyta dawîyê de “deşt” û “çiya”, “mêrg” û “devî” “hiş” û “mêjî” û “zincîr” û “ben” peyvên têkildarî yek in. Tête dîtin ku Sofyanîyî di dîwanê de ji vê hunerê gelek hes kirîye.

2.3.1.11. Teraduf (hemwateyî)

Teradufê peyda dibe, dema du peyvên hemwate an jî wateyên wan nêzîkî hev li pey hev tên.⁷⁵ Ev her du peyv di navbeyna xwe de an heman wateyê didin an jî wateya wan nêzîkî hev e. Gelek nimûneyên vê hunerê di vê berhema navborî de derbas dibin, dîndek ji wan ev in;

Vê gotina bapîra gelek **rind** û **xweşîk** e
Xurîya canê merîva bi dest kesî naşîke (11/9)

Teva ji kurdî xatir xwest
Bûn tirkê hûr **serxweş** û **mest** (39/24)

Deşt û **çiya mêrg** û **devî** gazî dîkin hey hey reben
Çewa di gel **hiş** û **mêjî** ketî nava **zincîr** û **ben** (10/7)

Di van mînakên li jorê de “rind” û “xweşîk” di nav xwe de û “serxweş” û “mest” jî di nav xwe de hemwate ne; “hiş” û “mêjî” nêzwate ne. Bi vî şiklî hunera teraadufê deketîye meydanê. Helbestvanî ev huner jî gelek bi kar anîye.

⁷⁵ Aslanoğlu, h.b, r. 147.

2.3.1.12. Bera‘etê istihlal

Bera‘etê Istihlal carinan bi husna metleyê an jî bi husna îbtîdayê jî tê binavkirin. Ew huner tê wê wateyê ku destpêka helbestê de li gor mane û mijara helbestê bikaranîna gotinên xweş, biwêj, gotinên pêşîyan an jî hinek gotinên balkêş e. Wate jê, berî ku mirov dest bi mijarê bike mirov meqsed û armanca xwe dîyar bike, ji vê yekê re **îbtîda** tê gotin.⁷⁶

Seydayê min **Mela ‘Elî**
Baş û raşê tije gul î
Tu şêrînê nava dil î
Îşellah bêderd û kul î (38/1)

Li beytên jorê tê xuyanê ku her du jî beytên destpêka helbestê ne û di her duyan de biwara ku di wê helbestê de bê pêşkêşkirin hatîye dîyarkirin. Mijara helbestê li ser Mela Elî ye.

2.3.1.13. Telmîh (bîranîn, yaddaşt)

Hunera telmîhê ew cure huner e ku şair di helbesta xwe de rûdanekî, çîrokekî, gotineke pêşîyan, ayetek ji Quranê an jî hedîseke Pêxemberî bi peyvekî an jî hevokekî dîyar dike û di talîya wê de ew rûdan, çîrok, ayet an jî hedîs tê bîra mirovî. Wehareng ev huner peyda dibe li meydana.⁷⁷ Mela Hesenê Sofyanî di dîwana xwe de serî li vê hunerê daye:

Ji bo yê pêşîn **Hawa û Adem**
Xwarin ji darê me noq kirne xem (8/37)

Bê çav mame wekî **Ye‘qûb**
Tev birînim wekî **Eyûb**
Jar û mest im ez bê tixûb
Lew reben im hogir tune (13/8)

Ji **Tofana Nûh** buhurîn
Rondikê çavê şil ê min
Erê xelîlî hênîk tê
Ber şewata nav dilê min (20/7)

⁷⁶ Turan Karataş, *Ansiklopedik Edebiyat Terimleri Sözlüğü*. Akçağ Yayınları. Çapa duyem. Ankara. 2004, r. 66.

⁷⁷ M. Emîn Bozarslan, *Mem û Zîn Wergerê Tipên Latini û Kurdiya Xwerû*, Weşanê DENG, ç.3, Stenbol, 2010, r. 84.

Mela Hesenê Sofyanî bi Adem û Hewayê çîroka wan, bi Ye‘qûbî çîroka wî, bi Eyûbî çîroka wî û bi Tofana Nûhî çîroka wî tîne bîra me bêyî ku behsa çîroka wan bike. Sofyanî, di dîwanê de li gelek cihan hunera telmîhê bi kar anîye.

2.3.1.14. Îrsala mesel

Îrsala Mesel ew cure huner e ku şair ji bo xurtkirin û selimandina gotina xwe, gotineke pêşîyan an jî biwêjekî bi kar tîne.⁷⁸ Bi vê rêkê gotin tê xurtkirin û selimandin û hewayekî estetîk lê tê barkirin. Sofyanî di dîwana xwe de serî li vê hunerê daye:

Neyar dinasim gelek xîdar e
Bi şev ranazê her dem şîyar e
Lê baş dizanim **zewala darê**
Bêşek û guman **ji kurme dar e** (7/9)

Li jorê şairî bi bikaranîna gotina pêşîyan ya ku dibêje “zewala darê ji darê ye” miletê xwe rexne dike ku ev neyarê qewmê xwe ne. Her weha li jêrê çend dimûneyên di jî hene, serincrakêş e ku yek ji gotineke pêşîyan a Çînîyan e;

Divê her dem bi hiş binî
Gotina bapîrê Çînî
“**Firoşgehê qe veneke**
Ger tu nizanî bikenî” (25/6)

Balkêş e ku di vê mînakê de gotin gotina çînîyan e û li ser mijareke nû û orîjînal ev gotin hatîye gotin ku mijar li ser rêbazên firotin û dikandarîyê ye, anku mijareke orîjînal.

Hate bîra dost gotinek bi cî
Car heye **qencî dibîte gincî**
Hevalê wek mar bo xwe neke yar
Zû anî bêrê serî kir du cî (12/30)

Dibên **dinya bi dor e**
Lê ez dibêm bi zor e
Ma qey dora me nayê
Dijmin timî li jor e (28/5)

Lewra gotîye bav û pêşîya
Ê tîr narame halê birçîya (8/58)

⁷⁸ Osman Aslanoğlu, h.g, 2019, r. 156.

Pîr xweş gotine **êşa l' hevala**
Bav û bapîra **tîra l' kendala** (8/70)

Dema ku bi axîfî bibişire û bêje
Gotina xwe bipêje paşê şekir birêje (43/34)

Pêşîyên me gotine **bi dil be û bi dil be**
Koşk û seray me navê mal kox û erda şil be (43/45)

“Qencî dibîte gincî” gotineke pêşîyan e li Colemêrg û Botanê tê bikaranîn. Anku mirov qencîya mirovî bi xirabî li mirovî dizivire. Her weha mînakên wekî “Hevalê wek mar bo xwe neke yar”, “dinya bi dore ne bi zor e”, “ê têr, narame halê birçîyan”, “êşa li hevala tîra li kendala”, “Gotina xwe bipêje paşê birêje” û “bila dil bi dil be, belgih kevir be, mal û kox erda şil be” hatine dayîn. Wekî dawî, di seranserê dîwanê de gelek nimûneyên vê hunerê hene.

2.3.3. Hunerên edebî yên bi peyv, deng û ahengê ve girêdayî

2.3.3.1. Cînas

Bi wateya xwe ya ferhengî cinas ew tiştên dişibin hev, me‘nedar, vediqetîn wateyên cudawaz, bilêvkirina wan yek e lê xwudanê wateyên cuda ne. Yanî herî kêr du bêjeyên bilêvkirina wan yek bes wateya wan cuda. Taybet şairan gelek caran serî li vê hunerê dane.⁷⁹ Seydayî jî li gelek cihan serî li vê hunerê daye:

Bayê nermîn bûk û **zava**
Bihejîne pêşber **ava**
Kul û keser derin **ava**
Xweş bihara Kurdistanê (1/5)

Linga radide li mal **rûdinê**
Dema bixwaze guh dide **dine** (8/12)

Me girt ji we sê **name**
Sêşed xweşî we da **me**
Wan peyivê b' zarê **me**
Jînek xweş dan canê **me** (28/1)

Li jorê mînakê cinasa merfû heye ku peyvek di nava peyveke din de bi wateyek din hatiye emilandin. “ava” anku pirjimariya avê di nava peyva “zava” de cihê dîtîye bi wateya zavabûnê. Her weke dîtir di mînakê dî de jî “me” di wateya yekem de –

⁷⁹ Tok, h.b, r. 249.

cînavka tewandî ya kesê yekem ê pirjimar- hatîye û bes heman peyv bûye parçeyek ji serwaya risteya yekem anku “name”yê ku êdî wate tiştêkî din e.

2.3.3.2. Muwazene

Muwazene di ferhengê de wateya hevsengîyê dide. Muwazene wek têgeh wekhevîya du an jî zêdetir peyvan e ji alîyê weznê ve. Anku ew peyvên berbehs çêdibe ji rengê serwayê ve yekûdu negirin bes ji alîyê weznê ve yekûdu digirin û hevsengîyek heye di navbera wan de.⁸⁰ Ev huner dîwana Sofyanî de weha derketîye:

Hinek jîndar **qanûnvan in**
Hinek din jî **tembûrvan in**
Hin bilûr û **zirnevan in**
Xweş bihara Kurdistanê (1/12)

Ji ber ku Sofyanî arûz bi kar neanîye vê hunerê xwe zêde nedaye der. Bes her wekî li jorê hatî “qanûnvan” û “tembûrvan” û “zirnevan” di heman aheng û kîteyê de ne.

2.3.3.3. Tersî‘

Tersî‘ beranberkirina peyvên risteyan e li rasta hev û li ser hev ji alîyê kêş û serwa û arûz û peyvê ve. Di helbestê de ev huner pitir di qafîyeyê de xwe daye der.⁸¹ Sofyanî jî li tevahîya helbestê nebe jî li hinek cihên helbestê ev huner bi kar anîye. Wek nimûne:

Ji gulzara tu yî تنها bo min gul î rûfenerê
Ji dildara tu yî تنها bo min dil î rûgewherê (17/9)

Li jorê me gotibû her çend helbestvanî erûz bi kar neanîbe jî bêhna erûzê ji helbestên wî tên. Li dû vê yekê helbestvanî ehemîyetek mezin daye kêşa kîteyî ku li nimûneya jorê jî xuya ye ku hindek beyt û riste di nav xwe de ji kîteya destpêka risteyê bigire heta dawîyê di nav ahengê de ne.

⁸⁰ Bulut, h.b, r. 350-351.

⁸¹ Pala, h.b, 2012, r. 451.

2.3.3.4. Tesmît

Di ferhengê de tê wê me‘neyê ku durên bi dezîyî ve hatine rêzkirin. Wateya wê ya têgehî jî ew e ku şair beyta xwe vediqetîne çar pişkan, her sê pişkên pêşîkê di nav xwe de hemserwa ne û pişka dûmahîkê jî li gel serwaya qesîdeyê ya giştî hevgirtî ye. Ji bo vê yekê musemmat jî tê gotin.⁸²

Birê kurdî bes bixape ev çi li te hatiye?
Qey rebenî para te ye, li rû dinê nav gela?

Çavê xwe hinkê miz bide, pilişkan paqij bike
Li dora xwe çê binêre ji xwe rake van kula

Ê ko bêje ewha xweş e ew bi te ra xayîn e
Neyarê tey mezin ew e jê ra nebê Maşela (3/7-9)

Her wekî tê dîtin serwaya navekî li gel serwayê hevgirtî ye. Helbestvanî ev huner zêde bi kar neanîye, lê dîse jî li hinek cihan ne di tevahîya helbestê de be jî di hinek beytan de hatîye bikaranîn.

2.3.3.5. Tezmîn

Wateya tezmînê ya ferhengî anku mirov tiştêkî bike di tiştêkî dî de û wê biveşêre. Di lîteraturê de heger şairek jî helbestên şairekî dî rêzîkekê, beytekî an jî beşekê bigire û di nav helbesta xwe de bi kar bîne, jî vê yekê re tezmîn tê gotin. Şair dikare guherînan li ser bike. Her weha ferqa wê jî îqtîbasê û îrsala mesele ew e ku îqtîbas jêgirtina ayet û hedîsan e; îrsala mesele jêgirtina gotinên pêşîyan û biwêjan e, tezmîn jî jêgirtina helbestan e.⁸³ Seydayê Sofyanî jî berê xwe daye vê hunerê û weha bi kar anîye:

Eger pirs kî bibêjî hûn çewa ne
Bi iznîllah di kêfê da ‘m xuya ne (26/31)

Ûeta kengê em wuha bin, dû heval û perîşan
Li dijê hev **bidexesî**, **bêzanîn** û tev **xizan?** (5/1)

Li jorê di beyta yekem de helbestvanî êdî atîfê be an jî bêhemdî xwe mabe di bin tesîra Seyîd ‘Elîyê Findikî de -mirov nizane- gotineke aydê wî bi kar anîye ku dibêje “Eger pirs kî bibêjî hûn çewa ne”. Her paşê, di beyta dîtir de jî helbestvanî

⁸² Bulut, h.b, r. 432.

⁸³ M. A. Saraç, h.b, r. 208.

behsa dexesî, bêzanîn û xizanîyê kirîye ku ev her sê hêman beranberî gotinên Bedîuzeman Seîdê Kurdî tên ku ew jî ji van her sêyan re dibêje cehalet, feqîrî û îxtilaf.

2.4. Teşeyên Nezmê

2.4.1. Teşeyên nezmê yên ku ji malikan/beytan pêk tên

Teşeyên ku ji beytan anku ji malikan pêk tên li gor serwayê vedîqetîn du cureyan; yê yekserwa û yê cotserwa. Ji van teşeyan ên xezel û qesîde û qît'e ne; cotserwa jî mesnewî ye.⁸⁴

2.4.1.1. Mesnewî

Wateya ferhengî ya mesnewîyê dudu dudu ye an jî cot cot e. Di edebîyatê de her beyt bi serê xwe di nav xwe de xwudanê serwayeke taybetî be (aa, bb, cc...) ew dibe mesnewî. Mesnewî bi qalibên arûzê yê kurt tene nivîsîn. Ji du beytan heta bi hezaran beytan dikare bê bikaranîn. Mesnewî dikare bibe helbestên serbixwe hem jî dikare bibe berhemên serbixwe. Heger mesnewî weke berhemeke serbixwe be şair dikare navekî taybetî li berhema xwe bike. Cara pêşîkê di Edebîyata Kurdî de bi diyalakta goranî Mela Perîşanê Dînewerî (k.d. 1421?) bi navê *Perîşannameyê mewsnewîyek nivîsiye*. Her paşê di Edebîyata Kurmancî de bi Ehmedê Xanî dest pê kirîye bi mesnewîyên wî yê bi navê *Eqîdeya Îmanê û Mem û Zînê*.⁸⁵

Li dû vê diyardeyê Mela Hesenê Sofyanî jî di diwana xwe de bi teşeyê nezmê yê mesnewîyê helbest ristine û xuya ye Mela Hesenî ji vî teşeyî hes kirîye:

Ax me kurdê bêçare ser dilê me neyar e
Bêhnê li me çikandî 'Elo dibê buhar e

Birînen me pir kûr in Şofyanî bes bisoje
Ji xwe 'Eloyê me ye cegerên me dinoje (29/7,8)

Seydayê Sofyanî 15 helbestên xwe bi teşeya mesnewîyê nivîsîne ku eva li jorê jî yek ji wan e. Ev mesnewîya mînak esasen nameyek e helbestvanî ji ê xwe re nivîsiye û tê de xerîbî û daxwazên xwe anîye zimên.

⁸⁴ Adak, h.b, 2015, r. 405.

⁸⁵ Pala, h.b, r. 321-322; Adak, h.b, 2019, r. 252-255.

2.4.1.2. Qesîde

Qesîde her wekî peyveke erebî ji “qesd”ê hatîye dariştin ku wateya qesdkirinê dide. Şair helbesta xwe li ser kesayetekî dînî an jî ne dînî ava dike ku li ser şîyan û hêz û şahîya wî pesnê wî dide an jî behsa şîna wî dike û hwd. Her du risteyên beyta pêşîkê di nav xwe de hemserwa ne û beytên dî hemû jî risteyên pêşîkê azad û risteyên duyem bi beyta pêşîkê re hemserwa ne. Qesîde berî Îslamîyetê di nav ereban de derketîye meydana û li edebîyatên dî yên Îslamî belav bûye. Di nav kurdan de jî ji Hemîdî û Melayê Cizîrî bigire heta îro çendîn şairan ev teşeyê nezmê bi kar anîye.⁸⁶ Seydayê Sofyanî di dîwana xwe de cih daye vî teşeyî:

2.4.1.2.1. Qesîdeya hizirî

Ev cureyê qesîdeyê di sedsala XXem de di encama guherînên sîyasî û civakî de ketîye nav helbesta kurdî ya klasîk. Forma klasîk a qesîdeyê hatîye parastin lê bele naverok guherîye. Qesîdenûs ji bo ku hizirên xwe yên li ser biwarên însanîyet, azadî, millîyet û hwd di nav raya giştî de belav bike forma qesîdeyê ji xwe re dike amrazek.⁸⁷ Her wekî tê zanîn Sofyanî jî şairekî civakî û millî ye, bê guman wî jî serî li vî teşeyî daye, her wekî lê jêrê hatî:

Ax birê min me ceşş pir in pirên wan jî nîvmela
Bûye perde li ser mêjî zingara eş û bela

Sofyanî her hêvîdar e, azadîya wan nêz e
Çi pir hindik şiyar bûne, ceşşa dibin mezela (3/1,11)

Her wekî di mînaka jorê de jî dîyar bûyî, Sofyanî helbesta xwe bi teşeyê qesîdeyê nivîsîye lêbelê alîyê naverokê ve ketîye nav mijarên civakî û millî, li ser hindê teşeyekî nû girtîye û qesîdeya hizirî derketîye meydana. Di dîwanê de bi tenê 2 qesîdeyên hizirî hene.

2.4.1.3. Xezel

Xezel yek ji berbelavtîrîn teşeyên helbestê ye di edebîyata klasîk de. Herî zêde huner û estetik di xezelê de heye. Di ferhengê de wateya axaftina û suhbeta li gel jinê dide. Di edebîyata erebî de beşek e ji destpêka qesîdeyê. Xezel ji qesîdeyê veqetîyaye

⁸⁶ Adak, h.b, 2019, r. 112-122.

⁸⁷ Adak, h.b, 2019, r. 161.

û bûye teşeyeke serbixwe. Hunera xezelê ew cure helbest in ku li ser evînê, yarê, şerabê û mijarên coş û xweş têne nivîsîn, çi kurt çi dirêj. Xezel, hem navê nezmê ye hem jî navê cureyê ye. Paşxaneya wê çend bigehe erebî jî wekî teşeyekê serbixwe di edebîyata farisî de derketîye meydana. Xezel cara yekem di kurdîya lorî de ji alîyê Baba Tahirê Hemedanî (k.d. 1010) ve hatîye bikaranîn. Di kurmancî de ev qonax bi Elîyê Herîrî dest pê dike û paşê jî bi Melayê Cizîrî derdikeve asteke bilind.⁸⁸ Sofyanî jî di dîwana xwe de cih daye xezelan:

Ax felek bo çi wiha kir: Talî yû tengî te **da**
Bo min ê jar û perîşan, xweşî û kêfê **neda**

Canê min tev de birîn kir, te dilê min pir kewand
Hê li min qet nazivirî, dimeşî derî ku **da**

...

Şofyanî her çav li rê ye, xew û xwarin lê tune
Destê wî her tim bilind e, du'akar e ji Xweda

Ber bi min dildarê bînî, çavê xwe ronî bikim
Serê min cî da bibire, bike gorî û fîda (16/1,2,9,10)

Her wekî tê dîtin, helbesta jorîn hem ji alîyê şiklî ve hem ji alîyê naverokî ve xezel e. Li gor daneyên li ber destan Mela Hesenê Sofyanî di dîwana xwe de 4 xezel bi kar anîne bi teşeyên cuda.

2.4.1.3.1. Xezela murace'e

Di Edebîyata Kurdî de helbestên ku bi awayê axaftina du kesan li miqabilî hev bi murace'e an jî munazere (dîyalog) têne binavkirin. Ev helbestên ku li dor pirs û bersivê têne nivîsîn, helbestvan ifadeya "min go" pirs dike û maşûq jî bi ifadeya "wê go" bersivê dide. Di Edebîyata Kurdî de kesên wekî Melayê Cizîrî, Şêx Evdîrehmanê Aqtepe û Seydayê Licî nûnerên vî cureyî ne.⁸⁹ Mela Hesenê Sofyanî jî di dîwana xwe de xezeleke murece'e nivîsîye:

Di royek ez diçûm der ve ji xweş royên buharê
Gihîştîm nava nêrgîza li min dane hewarê

⁸⁸ Bulut, h.b, p110; Adak, h.b, 2019, r. 166-174.

⁸⁹ Adak, h.b, 2019, r. 207.

Ji ma gotin *Şofyanîyo* çira tu guh nadî me
Tu her diçî narawestî tu qe nakî debarê

Bêhn û dîna me pir xweş e evîndarê me pir in
Hela were hinek rûne bi mer bike bazarê

Mi gote wan rast dibêjin hûn pir xweş û şêrîn in
Lê pir ji we şêrîntir e rûniştina bal yarê

Ji ma gotin rast dibêjî li te nagrin wisa ye
Welê bo me rast bibêjî bi biskê evîndarê

Çi ra wiha tu zer bûyî, sitûxwar û belengaz
Wekî Mecnûn تنها derî li vê çol û pesarê

Mi gote wan bo we bêjim, dilê we ez nahêlim
Welê divêm li min negrin vê şîn û zarezarê (14/1,7)

Her wekî di nimûneya jorê de xuya dibe dîyalogek heye. Lêbelê di vê dîyalogê de pirs ji helbestvanî hatine kirin û yên ku pirsê dîkin wekî pirjimar hatîye nîşandan. Xeleka giring heye ku pirs û bersiv ne di heman beytê de ne, her weha di navbera pirs û bersivan de hevsengîya beytan nîne, carinan beytek ketîye navberê carinan jî li dû hev hatine. Di vî warî de em dikarin bejin ev xezeleke Murace'e ye.

2.4.1.3.2. Xezela mutewwel

Her wekî tê zanîn hejmara beytên xezelê di navbera 7 û 15 de ne. Lê heger ew xezela hatî nivîsîn hejmara beytên wê ji 15an zêdetir bin, hingê ew dibe xezela mutewwel.⁹⁰ Mela Hesenê Sofyanî jî di dîwana xwe de cih daye xezeleke mutewwel:

Ez nexweş im ez bêhiş im, bê hogir û bi hewar im
Dengê min nagîjî kesî, ta şêrê zarezar im

Bi hewar û bi fixan im, bêhna mi teng ez fetisîm
Hawîrdor êrîş e li min, belengaz û ber dîwar im

...

Çarhêlê min faq û dafik dora min gozik vedane
Min dane ber tîr û rima ji dilê xwe da xîdar im

Dilkanî me di bahozê demsazê qir û qeşayê
Jîna mi bir zivistanê dikim gazî bêbuhar im (22/1,2,16,17)

⁹⁰ Adak, h.b, 2019, r. 193-194.

Her wekî tê dîtîna hejmara beytên helbesta jorîn 17 ne. Mirov dikare vê xezela li jorê di bin navê xezela mutewwel de bi cih bike. Mela Hesenê Sofyanî ji vî teşeyî bi tenê helbestek nivîsîye.

2.4.1.3.3. Xezela muserre‘/muselsel

Carinan dibe ku hemû risteyên azad ên xezelê bi serwaya bingehîn a xezelê re bikevin nav serwabendîyê. Di vê rewşê de hemû misrayên xezelê dibin hemserwa û hemû beytên xezelê dikevin dirûvê beyta yekem a muserre‘. Ji ber ku hemî riste wekî xelekên zincîrî bi hev ve girêdayî ne ev xezelek bi “xezela muselsel” jî tê binavkirin. Di dîwana Mela Hesenê Sofyanî de jî nimûneyek ji vî cureyê xezelê heye:

Ez nexweş im pir dinalim evîndar im lê dilberê
Evîna te j’ pîya xistim birîndar im lê esmerê

Bi hêseta dîtina te ez bêxew im kezîzerê
Ez im Memê di zindanê belê ew im lêvşekerê

...

Gelo nabe tu pişkêfî gula lêva rû‘enberê
Bêjî maç ke henarê rû her du sêva miska tere

Dê *Sofyanî* dîyarî ke canê şêrîn hela derê
Dê her bijî heta heta nabe xemgîn bêje **erê** (17/1,2,10,11)

Her wekî tê dîtîna bi tenê beyta muserre‘ ne; risteyên serbest jî ketine nav serwabendîyê. Di dîwanê de wekî din nimûneyên vî teşeyî nînin.

Wekî encam, Mela Hesenê Sofyanî di dîwana xwe de cih daye 4 xezelan ku ji van yek xezela normal e; yek xezela murace‘e ye, yek xezela mutewwel e û yek jî xezela muserre‘ e. Her çend hejmara mînakên xezelan kêr bin jî bikaranîna xezelan bi teşeyên cuda rewşeke balkêş e, anku jî alîyê teşeyan ve dewlemend e.

2.4.2. Teşeyên nezmê yên ku ji bendan pêk tên

Teşeyên nezmê yên ku bendan pêk tên ew cure teşe ne ku yekeya wan bend e û her bendek herî kêr ji sê risteyan pêk tê. Hejmara bendan ji sêyê dest pê dike heta dehê. Her weha ji vî teşeyê nezmê re *musemmet* jî tê gotin. Di vî teşeyê de bi piranî serwabendî weha ye: risteyên benda yekem hemî di nav xwe de hemserwa ne; risteyên dawîyê yên bendên dîtir jî girêdayî benda yekem in, bes risteyên pêşîkê yên

bendên dî ji benda yekem azad in lê di nav xwe de hemserwa ne. Teşeyên nezmê yên ji bendan pêk tên weha ne: Muselles, murebbe‘, terbî, muxemmes, texmîs, museddes, tesdis, musebba, tesbî, musemmen, tesmîn, mutessa, tetsî‘, mu‘eşşer, te‘şîr, terkîb bend, tercî‘ bend.⁹¹ Ji van teşeyan yên ku di dîwana Sofyanî da hatine bikaranîn ev in:

2.4.2.1. Murebbe‘

Murebbe‘ ew teşeyê nezmê ye ku ji çar risteyan pêk tê. Bi gelemperî li gel mijarên dînî û exlaqî mijarên pesindanê, name, mersîye û hwd jî di nav xwe de dihevwîne. Exleb benda yekem hevgirtî ye ji milê serwayê ve û risteya dawî ya bendên dîtir hevgirtî ye li gel serwaya benda yekem. Wate jê; aaaa, bbba, ccca...⁹² Murebbe‘ ku yek ji teşeyên kevn e di kurdî de, ji milê Melayê Cizîrî –bi tinê yek- û Feqîyê Teyran ve di sedsala XVI. de hatiye emilandin. Her weha piştî wan gelek şairên kurd ev teşe bi kar înan. Piştî Serdema Mîrektîyan li gel Serdema Xalidîtîyê şairên xalidî gelek mersîye û medhîye bi vê teşeyê nivîsîne. Her weha ji xeynî xezelê herî zêde murebbe‘ hatiye tercîhkirin.⁹³ Mela Hesenê Sofyanî jî ji vê teşeyê gelekî hes kiriye. Em ê li jêrê cih bidin şeweyên murebbe‘ê yên ku sofyanî di dîwana xwe da bi kar anîne.

2.4.2.1.1. Murebbe ‘a muzdewica asayî

Ji bo ku murebbe‘a muzdewica asayî pêk bê lazim e benda yekem di nav xwe de ji alîyê serwayê ve hevgirtî be, risteya dawîyê ji benda duyem heta benda dawîyê divê hevgirtî bin li gel serwaya benda yekem û serwaya her sê risteyên benda duyem û wêdetir di nav xwe de hevgirtî bin.⁹⁴ Helbestvanî jî ev huner bi kar anîye, her wekî hatî:

⁹¹ Adak, h.b, 2015, r. 427.

⁹² İpekten, h.b, r. 85.

⁹³ Adak, h.b, 2015, r. 371-372.

⁹⁴ Adak, h.b, 2019, r. 372.

Hêja ne bên pesindanê
Her demsalên Kurdistanê
Bi taybetîya vejanê
Xweş bihara Kurdistanê

Şofyanî rast e wisa ye
Niştimanek bêbiha ye
Lê zû da bêxwedî maye
Xweş bihara Kurdistanê (1/1, 18)

Her wekî tê dîtin, helbestvanî *murebbe‘a muzdewica asayî* bi kar anîye ku serwaya risteya dawîyê ya hemî bendan wekî serwaya benda yekem e. Sofyanî ev huner di 5 murebbe‘an de bi kar anîye.

2.4.2.1.2. Murebbe‘a mutekerrira kit a asayî

Heger bi tenê risteya dawîyê ya murebbe‘ê di hemî bendan de her bête dubarekirin hingê ew dibe *murebbe‘a mutekerrira kit a asayî*. Her sê risteyên pêşîkê jî divêt di nav xwe de hemserwa bin.⁹⁵ Helbestvanî jî serî li vê hunerê daye bi vî şiklî:

Dilo bes e girîn zarîn bêmifa ye
Dibe bêjî ka yara min ne xuya ye
Eger bêjî evîndarî ne wiha ye
Evîndarî di her demê bê dewa ye

...

Neçêyek ger min kiribe bêhiş bûme
Bi wê jehra cudabûnê ji hiş çûme
Bawer dikim *Şofyanî* yî efû bûme
Evîndarî di her demê bê dewa ye (15/1,8)

Risteya dawîyê ya benda yekem di hemî risteyên dawî yên bendên dîtir de bi heman şiklî dubare bûne. Seydayî, 3 helbestên xwe bi vî teşeyî nivîsîne di vê dîwanê de.

2.4.2.1.3. Murebbe‘a mutekerrira cot a asayî

Ji bo pêkhatina murebbe‘a mutekerrira cot a asayî, pêdivî ye benda yekem di nav xwe de hemserwa be, di bendên dîtir de her du risteyên pêşîkê hemserwa bin û

⁹⁵ Karataş, h.b, r. 328.

her du risteyên dawîn jî dubareya her du risteyên dawîn ên benda yekem bin. Wate jê; aaAA, bbAA, ccAA...⁹⁶

Birê xemgîn Seyda Seyrî Sofyanî jî çûye çiya
Ew jî wek te hûr dinêre li zinar û li devîya
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zelal
Kanî kexê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?

...

Karê dinê hatin û çûn Sofyanî pir baş dizane
Bes xebatkar ji bîr nabe di bin axê bi jîyan e
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zelal
Kanî Kexê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal? (37/1-15)

Seydayê Mela Hesên ev murebbe‘a xwe ku li ser xerîbîya xwe û hevalên xwe nivîsîye. Bi teşeya Murebbe‘a Mutekerrira cot a asayî nivîsîye. Di hemî bendan de her du risteyên dawîyê yên benda metle ‘ê hatine dubarekirin ku eve jî rêbazeke teşeyî ye di edebîyata klasîk de.

2.4.2.1.4. Murebbe‘ wekî bendên serbixwe

Ev teşe teşeyekê xweser e ku ji bendên serbixwe pêk tê. Li gor qaîdeya vê teşeyê her bend di nav xwe de hemserwa ye, yekîtîya serwayê di nav bendan de nîne û bend ji hev azad in. Her wekî hatî: aaaa, bbbb, cccc...⁹⁷ Helbestvanî weha cih daye vî teşeyî di dîwana xwe de:

Em bêxwedî ne bêxwedî
Di davikê her dem xwedî
Di qefesê kewê kedî
Alîkarek bo xwe nedî


Bêxwedîtî ‘eyb û ‘ar e
Kêmahîyek bêjimar e
Ê jê bibe xwedîpar e
Bêrûmetê herî jar e (42/1,2)

Mela Hesênê Sofyanî di dîwana xwe de cih daye 3 helbestan bi vî teşeyî. Bes exleb murebbe‘ên xwe ji alîyê serwayê ve hinekî tevlihev nivîsîne.

⁹⁶ Adak, h.b, 2019, r. 393.

⁹⁷ Adak, h.b. 2019, r. 396.

Grafik 1: *Teşeyên Murebbe'ê di Dîwanê de*



Her wekî tê dîtîn, hema bêje nîvîya helbestên Mela Hesenê Sofyanî ji murebbe'an pêk tê. Gava mirov berê xwe dide serwa û şewaza van murebbe'an mirov dibîne ku Sofyanî ji serwayên klasîk cudatir tev gerîyaye. Ji 21 murebbe'an 11 lib bi serwa û şewazên aydê xwe nivîsîne ku me nekarî em di bin banê serwabendî an jî şewazekî de cîbicî bikin. Her weha 3 helbestên *murebbe'a muzdewic a asayî* hene; ji aliyê mutekerrirbûnê ve 3 helbestên *murebbe'ên mutekerrira kit a asayî* hene ku ji aliyê serwayê ve mirov dikare wan di bin banê murebbe'a muzdewica asayî de bi cih bike. Paşê helbestek bi teşeya *murebbe'ên mutekerrira cot a asayî* heye. Her weke dûmahîk, 3 helbestên murebbe'ên bi *şêweyên xweser* hatine nivîsînê hene.

2.4.2.2. Museddes

Museddes ew teşeya nezmê ye ku her bendeke wê ji 6 risteyan pêk tê û serwa û kêşên wê di nav xwe de hevgirtî ne. Risteya dawîyê ya hemû bendan girêdayî risteya dawî ya benda yekem in. Wate jê; aaaaaa, bbbba, cccca... an jî aaaaab, ccccb, ddddb...⁹⁸ Di kurdî de jê re *şexîne* tê gotin. Museddesên pêşîkê di Edebîyata Kurdî de yên Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran û Mîr Îmadeddînê Hekkarî ne. Exleb di muşa'ereyan de hatîye tercîhkirin. Her weha bi destê Ehmedê Xanî şeweya standar

⁹⁸ Îpekten, h.b, r. 107.

ketîye nav Edebîyata Kurdî. Şairên piştî wan jî ew teşeyê bi kar anîne.⁹⁹ Sofyanî weha cih daye vî teşeyî:


Zivistan e, ne ardû ye ne nan e.
Tim sahî ye çîkeçîka esman e
Çem qerimîn qeşa avêt aşane.
Gelo çi bû? Nalenala însan e!
Zivistan e, zivistanek giran e.
Berf dibare li ser serê însan e

...

Buhar xweş e rast dibêjî *Şofyanî*
Ew e armanc ji bo hemû însanî
Dagir kirin ewan hinê tu zanî
Tê nehiştin para jar û xizanî
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e (6/1, 9)

Li dû vê yekê Mela Hesenê Sofyanî jî bi teşeyê *museddesa mutekerrira cot a asayî* helbestek nivîsîye ku her du risteyên dûmahîkê di dawîya hemî bendên helbestê de hatine dubarekirin.

Grafîk 2: *Teşeyên Nezmê di Dîwanê de*



Di encamê de mirov dikare bêje dîwana Mela Hesenê Sofyanî ji aliyê teşeyê ve pirreng e. Li gor lêkolînan hate dîtin ku dîwanê de 5 teşeyên nezmê yên ji hev cuda

⁹⁹ Adak, h.b, 2019, r. 425-426.

hatine bikaranîn. Sofyanî herî zêde ji teşeya murebbe‘ê hes kirîye ku di dîwana xwe de cih daye 20 murebbe‘an. Her paşê jî mesnewî bi 15 helbestan teşeya herî zêde ya duyem ku di dîwanê de hatî bikaranîn. Jixwe rêjeya van her du teşeyan di dîwanê de miqabilî 83,3% tê. Yên dîtir jî, 4 xezel; 2 qesîde û museddesek in.

2.5. Tema û Cureyên Edebî

2.5.1. Temayên dîwanê

Mela Hesenê Sofyanî di dîwana xwe de cih daye gelek temayên giring ku bêhtirînê van temayan millî, evînî û civakî ne. Di helbestên Sofyanî exleb rexne û şîretkirina civakê derdikeve pêşberî me. Her weha Sofyanî bala xwe daye gelek mijarên cêwaz ên wekî hizra neteweyî, ziman, yekîtî, geştname, keşfên zanistî, firoşgeh, cixare û gelekên dîtir ku yek bi yek li jêrê hatine destnîşankirin.

2.5.1.1. Hizra neteweyî

Fikra neteweyî yek ji encamên giring ên Şoreşa Mezin a Fransayê ye. Ronakbîrên Frensî li hember fikra monarşîyê derketin û fikra neteweyî ava kirin. Neteweperestî îdeolojîyek e ku berjewendî û nasnameya çandî ya neteweyek an neteweyekî radixe ber çavan û doza parastin û pêşxistina van nirxan dike. Bi giştî tekezî li ser serxwebûn, serwerî û yekrêzîya netewe dike û ji bo vê armancê pêşbînî dike ku sîyasetên curbicur di warên sîyasî, aborî û civakî de bêne pejirandin.¹⁰⁰

Netewe bi xwe refereya îqtîdar û hebûnê ye. Di edebîyatê de nivîskar û rewşenbîran jî di pêvajoya avakirina netewe dewletan de cih girtine. Ji ber ku netewe li ser nasnameyên kolektîf ava dibin û edebîyatvan bi berhem û vegotinên xwe dibin parçeyek ji vê pêvajoyê.¹⁰¹ Bêguman li gor zanyarîyên li ber destan di nav tarîxa Edebîyata Kurdî de yekem şairê babeta neteweyê vekirî Ehmedê Xanî ye. Xanî xwestîye millete xwe hişyar bike û ji bindestîyê derbêxe. Xanî tradîsyoneke millîbûnekî li dû xwe ava kirîye.¹⁰² Di vê proseya de hizra neteweyî yek ji temayên herî giring ên dîwana Sofyanî ye ku her wekî li jorê hatî gotin gotin Sofyanî rihê

¹⁰⁰ Anthony D. Smit, *Milliyetçilik Kuram, İdeoloji, Tarih*, wer: Umit Hüsrev Yolsal, weş: Atıf, Ankara, 2013, r. 15-21.

¹⁰¹ Mikail Bülbül, *Helbesta Cegerxwîn û Îqtîdar*, Weş. Lîs, Diyarbakır, 2016, r. 29.

¹⁰² Yıldırım, h.b, 2010, r. 116.

netewetîyê bi helbestên Cegerxwînî nas kirîyê û bi helbestên Xanî geş kirîye.¹⁰³
Sofyanî, bi boneya maf û heq û hiqûqê gelê jêrdest û neteweperwerîya xwe, zêdetir
hizira xwe dide ser civakê her wekî di helbesta jêrê de hatî:

Hêja ne bên pesindanê
Her demsalên Kurdistanê
Bi taybetîya vejanê
Xweş bihara Kurdistanê

...

Sofyanî rast e wisa ye
Niştimanek bêbiha ye
Lê zû da bêxwedî maye
Xweş bihara Kurdistanê (1/1,18)

Çawa ku di helbesta jorê de tê dîtin helbestvan bi ruhekî neteweyî heskirina
xwe li hember welatê xwe tîne zimên. Ew di helbestên xwe de li ser qelsî û kêmasî û
birînên civakê disekine, her wekî li jêrê hatî:

Heta kengê em wuha bin, dû heval û perîşan
Li dijê hev bidexesî, bêzanîn û tev xizan?

Heta wuha em dexes bin, di nav me da berberî
Tûrê parsê dê li mil bin, gerokê ber derîyan

Her bêerc û lavakar bin çav li derî, xwelî l' ser
Li ser axê dê vezelin mitêla ser me esman (5/1-3)

Bi her halê heyî, arîşe û rewşa civakê ji xwe re dike xem û dil û cegerê wî teji
xwîn dibe. Heta ku ji destê wî tê di vê rêkê de dixwaze gelê xwe hişyar bike û rêya
rast nîşa wan bide. Li dû vê yekê di helbestên xwe de jî xaleke giring ji rewşa civakê
re vediqetîne. Hetta giring e bê gotin, ji ber ku seydayên neteweyî kêmbû ji Seydayî
re “Seydayê Qomunîst jî hatiye gotin. Sofyanî bi ruhê neteweyî li dû zanîn û
haydarbûna milletê xwe ye.

2.5.1.2. Giringîya zimanê kurdî

Seydayê Mela Hesenê Sofyanî di 4 helbestên xwe de bi taybetî bal kêşaye
giringîya zimanê kurdî û rexneyên xwe jî anîne zimên. Bi taybetî di sedsala
nozdeyan de piştî qedexekirin û zextên tund li ser kurdî çêbûyîn, gelek helbestvanên

¹⁰³ Hevpeyvîn: Mela Hesenê Sofyanî (06.07.2024).

zimanhes li zimanê xwe xwudan derketin. Her weha rexneya seydayî bo wê çendê heye ku kurd dev ji zimanê xwe berdidin û peyv û gotinên zimanekî dîtir bi kar tînin ku li jêrê nimûneya vê yekê hatîye dayîn li ser tirkî. Ev yek, giringîpêdana wî ya bo zimanê kurdî nişan dide.

Gava bûme ji dayik bi wî zarê girîyam
Dîya min gote lorî di landikî hewîyam

Di her dema xwe tev da digote min ha çiçik
Negote “al meme” yan tiştek di nexweşik

Dema ku ez axîfîm bi vî zarê ‘m gote nan
Ji wê pê ve tu bêje canê min bo te heyran (31/5-7)

Di van salên dûmahîkê de li gel pêşketina amûrên teknolojîk li Tirkîyeyê zimanê kurdî kete nav metirsîya mirinê. Li gel vê yekê Sofyanî dilsojîya xwe anîye zimên ku meyla nifşê nû bi zimanê xwe naaxivin an jî peyvên bîyanî têxin nav zimanê xwe. Helbestvanî bi awayekî taybetî û bi giringîyeke mezin cih daye temaya zimanê kurdî. Sofyanî bi xwe jî tîne zimên ku şûra millî pê re heye ku divê ziman bê parastan, lewma pêl bi pêl helbestên xwe ji peyvên bîyanî şuştîye û kurdîyeke xwerû, zelal û fesîh bi kar anîye.¹⁰⁴

2.5.1.3. Rexneya civakî

Mela Hesenê Sofyanî di gelek şîrên xwe de civaka kurd rexne kirîye. Ev rexnekirin di çend babetên sereke de derketîye pêş çavan. Yek ji wan jî rexneyê millî ne ku li ser nezanî û xayînîya kurdan sekinîye. Babetên rexneyên dîtir jî li jêrê hatîne derbirînê.

Xweda me anî dinê dibin destê neyara
Jînê kire para me di nav ker û dewara

Derdê neyar giran e lêbelê tê kişandin
Evan kerê nava me dil û gurçik çirandin (34/9,10)

Helbestvan civakê rexne dike û ji ber nezanîyê wan bi rêza keran digire. Doza hişyarbûna milletê xwe dike. Her weha li jêrê balê dikêşe ser bêtifaqîyê jî:

¹⁰⁴ Hevpeyvîn: Mela Hesenê Sofyanî (06.07.2024).

Heta ku ew nebin yek
Bi rast û çep de baz din
Dê bihelin wekî lek
Pir serîyan bi dar din

Divê bibin yek qorek
Xwenda û nexwenda tev
Honandiyê yek porek
Xweş bimeşin li dû hev (4/5,6)

Ev babet taybet li helbestvanên wekî Cegerxwîn di sedsala bîstem de bêhtir ketîye nav mijara helbest û helbestvan û rewşenbîran. Li ser hindê jî bêhtir doza yekîtiyê tê kirin ku rewşenbîrên kurd ji aliyên bêtifaqî û nezaniyê ve rexneyan li civakê dikin. Di vê babetê de yek ji wan jî Sofyanî ye.

2.5.1.4. Hevgirtin û yekîtî

Yek ji babetên giringî hevgirtin û yekîtiya civaka kurd e di helbestên Sofyanî de xwe daye der:

Heta kengê em wuha bin, dû heval û perîşan
Li dijê hev bidexesî, bêzanîn û tev xizan?

Heta wuha em dexes bin, di nav me da berberî
Tûrê parsê dê li mil bin, gerokê ber derîyan (5/1,2)

Her wekî li jorê jî hatî amajedan Mela Hesenê Sofyanî di vê helbesta xwe her wekî Bedîuzeman Seîdê Kurdî ji sê pîrsgirêkên civaka kurd xem xwarîye. Çawa ku Bedîuzeman digot cehalet û feqîrî û îxtîlaf, her wesa Sofyanî jî ji vê yekê xem xwarîyê û gotîye nexwendin û çavnebarî û xizanî.

2.5.1.5. Xwendin û zanîn

Yek ji hêmanên sereke şîret û pend e di helbestên Sofyanî de. Sofyanî exleb li ser xwendin û zanînê şîretan li gelê xwe dike ku Birîfkanî wî weha pênase dike, “Sofyanî, gelek ji xwendinê hes dikir. Digote feqîyên xwe bixwînin! Ne ku ji bo ku hûn bibin mela, bixwînin bibin zana ku neyên xapandinê, ger hûn bibin çopçî jî bixwînin.”¹⁰⁵ Sofyanî di gelek helbestan de şîreta xwendinê dike:

¹⁰⁵ Hevpeyvîn: Mela Remezanê Birîfkanî (10.07.2024).

Birê hêja êşên li kurd ne şêrpence w sîroz in
Hinek êşên netewxur in xidartirînê êşan

Nexwendin û çavnebarî ya sisêyan xizanî
Têkil xwûna rehî bûne malê lê kirne wêran (5/11-12)

Her wehî ji nimûneya jorê xuya dibe behsa sê êşên kurdan dike ku yek ji wan
nexwendin e û li ser vê yekê şîreta xwendinê li kurdan dike. Her weha:

Divêtin pir şîyar bî, fend û fêla bizanî
Da nekevî dafikê, nêçîra nêçîrvan î

Ê nezan û li dij hev her tim dîl û esîr e
Dergevanê fêlbaz e bêserok e bêmîr e

Divê tu pir zana bî ger te divê bibî mîr
Eger nezan bimînî bê şik tê bibî kizîr (11/27-29)

Di vê derê de jî Seyda behsa nezanîyê dike ku nezanî êsîrîyê tîne û teşqîqa
xwendin û zanînê dike. Seyda ew qas giringîyê dide zanînê ku niha jî li ser telefonê
dersê dide hinek feqîyên xwe yên kevn. Ji alîyekê dî ve her çî qas Seydayî ji kurdî
hes bike jî di heman demê de jî teşwîqa fêrbûna tirkî û zimanên dî jî dikir ji bo
pêşketin û xwezanînê. Qet dijberîya latînî nekirîye. Êvarên eynîyan feqîyên xwe
teşwîqî xwendina serbest dikir.¹⁰⁶

2.5.1.6. Beg, şêx û axa

Pişti serdema ronakbîrîya Rojava li Ewrûpa êdî bandor û hesta dînî kêmtir dibe.
Taybet piştî ku Martin Luther serî hil dide li hember fikrên olî êdî di şûna wê de
mezhebên eqlî û sekûler ava dibin. Bi vê yekê manewîyetek nû ava dibe bi navê
welatparêzîyê.¹⁰⁷

Her wekî tê zanîn Edebîyata Kurdî ya Klasîk jî edebîyateke dînî/Îslamî ye. Bes
taybet piştî van hizirên neteweyî êdî ronakbîrên kurd pê dihesin ku ew bi rêya hinek
mela, , beg û axayan tene xapandin û ew jî radibin rexneyan wan dikin. Pêşengên vê
yekê kesên wekî Hecî Qadirê Koyî û Cegerxwîn in. Her wekî li jorî jî hatî diyarkirin
Mele Hesenê Sofyanî peyrewê Cegerxwîn e û li dû vê yekê rexneya mele û şêx û
beg û axayan di helbestên wî de jî xwe dane der:

¹⁰⁶ Hevpeyivîn: Mela Remezanê Birîfkanî (10.07.2024).

¹⁰⁷ Zülküf Ergün, *Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendîyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn*, Nûbihar Akademî, hj. 1, Stenbol, 2014, r. 27.

Ax birê min me cehş pir in pirên wan jî nîvmela
Bûye perde li ser mêjî zingara eş û bela

Em ji wî her bêhêvî ne gûza pûç e bêsûd e
Welê xwezî bihewiya, davême kevr û şela

Hinê dinê bi nav şêx in, mêjokeyên welat in
Hevalbendê maldaran e, xizan dane ber tela

Wî cî nerm e xwarin goşt e, berîk tije kî tê bîr
Li kêfa xwe her dinêre, kî dimre bimre bila

Peyçûyên wî tev bale ne, wekî keran bê mejî
Dibê şêxê mîrrebbanî ye, çî şêx e mala dila

Pê nizane gurê mal e, melay wî jê çêtir e
Bil xwarinê ka şêx çid'ke? De zû ke bêje hela

Birê kurdî bes bixape ev çî li te hatiye?
Qey rebenî para te ye, li rû dinê nav gela? (3/1-7)

Sofyanî mela û an wekî cehşan bi nav dike ku çavê wan bi tenê li mal û milkî ye, kî axa û maldar be ew hevalê wan in, ew welatî dimijin, bi tenê navê wan şêx û mela ne. Li ser vê yekê bangawazîya kurdan dike ku hişyar bin û nexapin.

Melayek kurd im, melayek kurd im
Hevalê jar im bi xem û derd im
Bi şola pîne bi cilê qerpol
Bi zikê birçî serî bilind im

Ez dûrê şêx im, kesê nakim xew
Li dijî axa zulmê nakim tew
Timî evîndar ji bo rastîyê
Di gel bindesta, dibê mîr nebin kew (7/1-2)

Sofyanî ji vê mijarê gelek bêzar bûye ku di gelek helbestên xwe ev mijar anîye zimên. Sofyanî şopa edebîyatvanê serdema xwe girtîye û rexneyên xwe anîne zimên. Vîyan pê heye rêya rast rêya heq û rasteqîn nîşa mîletê xwe bide. helbestvan bi biwarên civakî û polîtîk û hizirî wezîfeya hişyarkirina gelî dide ser milên xwe. Rexneya xwe li nezanî û zilm û zordarî û şêx û beg û axa û melayan dike. Ew dijberekî mezin e li beranber polîtîkayên Emperyalîzm û Kapîtalîzmê. Li rûber van rexneyan dixwaze gelê xwe bibe ser rêya heq; Şîretên yekîtiyê li karkeran dike, berê gel daye xwendin û zanînê, hizra azadîyê têxe dilê wan û ruhê şoreşgêrîyê li ser wan ava dike. Di neteweperwerîya xwe de her gav eşqa xwe ya welêt tîne ziman gerek bi

dar û berên axa xwe; gerek bi mêjûya gelê xwe; gerek jî çand û huner û şîyanewerîya gelê xwe. Têgehên yekîti û hevgirtin û serîrakirina neteweyî gelek bi kar tîne.

2.5.1.7. Xizanî

Yek ji mijarên rexnekirinê jî xizanîya kurdan e. Ev mijar jî gelek caran ji hêla helbestvan û rewşenbîrên kurdan ve hatîye rexnekirin. Herî Sofyanî jî ev mijar rexne kirîye:

Herê bira herê bira ez çi bêjim
Ji girîna van xizana ker û gêj im
Tim û timî derd û kulên wan diwêjim
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim

Geh li vir in geh li wir in bêhiş mane
Herin kê der pelçiqandin para wan e
Berîk vala karê wan timî xweydan e
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim (2/1,2)

Di vê helbestê de Sofyanî xem û derd û kulên xwe anîye zimên ku ji ber feqîrî û jarîya miletê xwe. Behs dike çawa ew ji ber pola burjuwa têne pelçiqandin, çawa ji bo wan şev û roj dixebitin jî beranberê nabînin ku di encama vê yekê de dest bi karên xirab dikin ên wekî xumarê.

2.5.1.8. Evîn

Di helbestê de mijara herî berbelav bêguman mijara evînê ye. Di Edebîyata kurdî de jî nimûyên bê ser û bin hene. Li gorî nêrîna mîstîkê evîn bi vedîqete du cureyan; hejêkirina însanekî bo însanekî dî eşqa mecazî ye, hejêkirina însanî bo Xwudê eşqa îlahî ye. Her weha li gel vê hejêkirina Pêxemberî û hindê kesên dîyarkirî.¹⁰⁸ Li dû vê yekê Mela Hesenê Sofyanî di helbestên xwe de cih daye mijarên evînê:

Qedeş tijî jehra mar e
Xweş vedixwum j' destê yar e
Te'm û lezet bêjimar e
Wê şerbetê hevta tune (13/1)

Mi gote wan rast dibêjin hûn pir xweş û şêrîn in
Lê pir ji we şêrîntir e rûniştina bal yarê (14/4)

¹⁰⁸ Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî Külliyyatı IV: Dîwan*, weş. Avesta, Stenbol, 2014, r. 56.

Mela Hesênê Sofyanî jî di dîwana xwe de bi awayekî tebîî kêmek be jî cih daye helbestên evînê. Sofyanî ber eksê şa'irê klasîk ji eşqa heqîqî û îlahî zêdetir eşqek mecazî teswîr dike. Evîna mecazî bi du şeweyan derketîye meydana di helbestên Sofyanî de. Ji xeynê evîna însanekî bo însanekî dî, evîna welêt jî di helbestên şairî de derdikevin meydana. Temaya welêt û heskirina welêt yek ji temayên sereke yên helbestên sedsala XXem û XXIem e.

2.5.1.9. Dîn

Ola Îslamî di avakirina Edebîyata Kurdî de roleke giring girtîye ser xwe. Girseyeke mezin ji şairên ku berhemên xwe bi kurdî dinivîsin sûfî bûn. Di encama vê yekê de Edebîyata Kurdî û dîn şubhê werîsekî vehûnandî lêk alan. Di vê çarçoveyê de gelek berhemên dî di Edebîyata Kurdî de cihê xwe girtin û her duyan hevûdu têr kirin. Her wekî hatî gotin Mela Hesênê Sofyanî li ser tesewîfê nenivîsîye bes mijarên dînî bi sîvîkahî dane ber xwe. Taybet di warê dînî şîret li şagirtan kirîye û car carn jî pesnê û seydayên xwe daye:

Tu qey nizanî Mûsayê 'Îmran
Noqê derya kir Fîr'ewn û Haman
Ji bo ko rake nîrê sîtemê
Qarûnî com kir di gel mal û can

Birayê mela eger mela yî
Di nava gel de wek Enbîya yî
Ji cem xwe nabêm Pêxemberî go
Warişê wan ê rêya Xuda yî (7/13,14)

Di weqta ko derên tev de bi carek
Xweş bimeşin derên pozê di yarek

Baş binêrin li şin'etê Ellah e
Şed tebarek çi qa xweş Maşellah e (26/17-18)

Her wekî tê dîtin Sofyanî car caran cih daye babetên dînî. Bes bi awayekî giştî stenestên dînî nenivîsîne di vê dîwana xwe de. Her weha li jêrê me cih daye çend têgehên têkildarî mijara dînî yên di dîwanê de:

Xuda (7/14)

Qabîl (8/37)

Hawa û Adem (8/37)

Ya'qûb (13/8)

Eyûb (13/8)

Girê 'Erefatê (17/4)

Tofana Nûh (20/7)

Mecaz(26/11)

Heqîqet (26/11)

Ellah Tebarek (26/18)

Maşellah (26/18)

Şêx Evdilqadir (26/34)

Yezdan (27/4)

Şêx Muhemmed Seyrî (33/5)

Seydê Yehya (36/1)

Mela ‘Elî (38/1)

Selsebîl (42/14)

Her çend behsa olê hatibe kirin jî mirov nikare Mela Hesenê Sofyanî di nav kategorîya helbestvanên tesewîfî yên di Edebîyata Kurdî de bi cih bike.

2.5.1.10. Tenduristî/cixare

Mela Hesenê Sofyanî di dîwana xwe de helbestek ji bo şîretên li ser tenduristîyê veqetandîye. Seydayî şîreta xwe li ser zirarên vexwarina cixareyê dike ku şîretan li xwendevanên xwe yên cixarevexwar dike, da dev ji vexwarina wê berdin.

Cixarekêşê bihiş û mêjî
Hinek guh bide şîretên mi jî
Dilxwazê te me ji dilê tijî
Gelek dixwazim dirêj tu bijî

Nebê cixare bêje reşmar e
Dostê te nîne bo te neyar e
Haya te nîne wan hinavên te
Ji ber dûyê wê timî hewar e

Gava venexwî ta qata jorê
Bi linga herî bê asansorê
‘Umrê te heştê weke cuwanek
Gav û se‘etê bikî siporê (12/1, 5, 22)

Di helbestê de Sofyanî behsa zerera cixareyê li ser hinav, gurçik, pişik û dev û didanan dike. Şîretên xwe li ser devjêberdana wê dike. Her weha behsa alîyên erênî dike li ser ew kesên cixareyê navexwin. Li ser vê babetê ne bi tenê Sofyanî nivîsîye; di heman deme de Seyîd ‘Elîyê Findikî û Mela ‘Izetê Cixsî jî li ser cixareyê helbest nivîsîne ku mijareke taybet e.

2.5.1.11. Mafên karkeran

Mela Hesenê Sofyanî li ber kêleka bindestîyê û razana gelê xwe, berê xwe daye mijarên civakî yên rojane yên wekî bînpêkirina mafê karker û kedkaran ji alîyê axa, beg û kesên burjiwa ve. Şa'îrî li ser nezaniya gel jî nivîsiye û han daye wan hişyar bike ku li mafên xwe xweyî derbikevin.

Gelek pîs e: Ev hawê ha bêdadî ye
Zikê axa w birjiwazî nepxandî ye
Zikguvaştin para karker û gundî ye,
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim (2/11)

Her wekî hatî gotin Sofyanî melayekî millî ye, li kêleka vê yekê alîyê wî yê mafparêz jî heye di helbestên xwe de mafparêz pola ploretaryayê dike. Dema vî tiştî dike taybet behsa zordestîya li ser wan dike.

2.5.1.12. Keşfên zanistî

Bê guman her bizav û dem û dewranek bi xwe tiştên nûjen tîne. Di warê edebîyatê de jî nûjenî li gorî serdem û rewşa dinyayê dikevin nav edebîyatê. Taybet piştî geşedana teknolojîyê amûrên nû jî ketin jîyana me. Li dû vê yekê hedî hêdî nivîskar û helbestvan bala xwe didin ser van û dinivîsin. Li ser vê xalê Mela Hesenê Sofyanî jî helbestek li ser mijara keşfên zanistî nivîsiye bi vî rengî:

Linga radide li mal rûdinê
Dema bixwaze guh dide dinê

Ma deng tenê ye lo malik ava
Xweş û mirîyan tîne ber çava

Noqê derya bû buhustek nehişt
Kûrîya vîya bê guman gihîşt (8/12-14)

Di helbesta jorê de ecêbmayîna xwe tîne zimên li ser balafiran ku di demekî kin de çawa însanan ji cihekî bo cihekî di valahîya ezmanan de vediguhêze. Her weha behsa televizyonê dike çawa deng û dûmen jê derdikeve, behsa gemîyên binav dike çawa di binê avê de diçe. Çeken şerî, nukleer û lîstikên qirêj rexne dike.

2.5.1.13. Firoşgeh û dikandarîya rast

Li gel geşedana dinyayê mijarên nû dikevin nav edebîyatê. Helbestvan berê xwe didin mijarên û yên rojane. Di vê biwarê de Mela Hesenê Sofyanî jî berê daye usul û edetên firotin û dikandarîyeke baş. Li gor zanyariyên li ber destan di Edebîyata Kurdî de kesekî di vî biwarî de helbest nenivîsîye. Li dû hindê em dikarin bêjin ev mijareke orîjînal e û destpêk e bo Edebîyata Kurdî.

Li te dikim şîretek dî
Şerefa xwe b' pera nedî
Tu car kesî nexapînî
Dîn û dinya bi der didî

Emîntî ye mercê yekem
Rêz û kenîn e yê duwem
Bo te bazarkarê hêja
Şîreta min her gav û dem

Divê her dem bi hiş binî
Gotina bapîrê Çînî
“Firoşgehê qe veneke
Ger tu nizanî bikenî” (25/4-6)

Sofyanî di vê helbesta orîjînal de şîretan li dikandarî dike ku kesê nexapîne û rêyên karkirina hilal bizane. Du mercan dide pêşîya dikandarî ku yek bawerî ya dî jî ken e ku her wekî di mînak jorê de xuyayî gotineke pêşîyan a çînîyan mînak daye.

2.5.2. Cureyên edebî

Dîwana Sofyanî her wekî ji alîyê temayên xwe ve dewlemend her weha ji alîyê cureyên edebî ve jî ne kême. Her wekî me amaje pê dayî Sofyanî helbestvanekî millî û civakî ye û zêdetir berê xwe daya civaka kurdî, di encama vê yekê de alîyê wî yê pend û şîretan bêhtir derketîye pêş. Her wesa Sofyanî di dîwana xwe de cih daye 11 nameyan ku di vî warî de li gel Seyîd Elîyê Findikî dibin serkêşê vî cureyî. Wek dûmahîk cureyên dîtir yên wekî lîrîk, mersîye, medhîye, simatîye, geşname, keş û hewa jî bi kar anîne ku li jêrê yek bi yek hatine derbirînê.

2.5.2.1. Helbesta lîrîk

Di zanista edebîyatê de helbestên ku bi hest, coş, heyecan û semîmîyet tînin nivîsîn wek helbesta lîrîk (lyric) hatine binavkirin. Di helbesta lîrîk de “ez”a helbestvan di navendê de ye û helbestvan hizrên “xwe” digel hestên “xwe” îfade

dike. Helbestvan ji alîyê rûhî/derûnî ve dikeve bin bandora tişteke û wê rewşa xwe ya rûhî bi rêya peyvê û di forma helbestê de derdixe der. Helbestvan behsa çî bike ferq nake ew di nav cîhanêke hizrî û me'newî de ye.¹⁰⁹ Li dû hindê helbestvanî di dîwana xwe de cih daye vî cureyî:

Di demsala buharê da gulek min dî di gulzarê
Li dorê carek çerixîm min xwe nedî ta êvarê

Ez bûm bulbul jar û reben serxweş û mestê bîna wê
Ta seherê bi giryan im di nav qeyda evîna wê

Nişka va wenda bû ji min ker û lal û çavtarî me
Weka wê şox û şepalê li rû dinê kes nedîme

Aya gul bû xiyala min? Ta seherê ji êvarê
Xew nakevîtin çavên min gazî dikim delal yarê (19/1-4)

Her wekî dîyar e helbestvan bi coş û kelecana xwe hest û hizirên xwe derbarê yarê de tîne zimên. Sofyanî di helbestên evînî, biharîye, millî û civakî de jî xwedîyê vê helwestê ye.

2.5.2.2. Pendname

Ji wan berhemên ku ji bo avakirina civakeke hişmend û ferdên rast û durist li ser şîret û pendan tîne nivîsîn *pendname* tê gotin. Pendname, bi taybetî li ser qaîdeyên exlaqê felsefî û olên semawî ava bûne. Di edebîyata faris û ereban de gelek nimûneyên wê hene.¹¹⁰ Her weha jê re *didaktik* an jî *te'limî* jî tê gotin. Sofyanî jî di dîwana xwe de cih daye vî cureyî, her wekî hatî:

Cixarekêşê bihiş û mêjî
Hinek guh bide şîretên mi jî
Dilxwazê te me ji dilê tijî
Gelek dixwazim dirêj tu bijî

Gelekî heyf e evê jiyanê
Tu bikî gorî ji bo dûxanê
Bidî ber şûra jiyana şêrîn
Zû baz dî herî ji vê cîhanê (12/1,2)

¹⁰⁹ Abdurrahman Adak, *Helbesta Lîrîk di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*, Academia.edu, r. 1.

¹¹⁰ Îskender Pala, *Nasihatname*, TDV Ansiklopedisi, 2009, r. 409-410

Ka hinek goh bide min feqîyê jîr û delal
Goh bide şîretên min bi hinşekî pir zelal

Kitêba xwe baş hil ke paşê baz de yeka din
Bi te herî şêrîn be hînkirin û helkîrin (43/1-2)

Yek ji alîyên Sofyanî yên zêde berçav bê guman ew ku helbestên xwe zêde cih dide cureyê helbestan. Bi taybetî di warê millî, civakî de gelek helbestên wî ji şîretan pêk tên. Lewra alîyê wî yê şîretan xurt e.

2.5.2.3. Mersîye

Di edebîyata klasîk a Îslamî de helbestên ku piştî mirina kesekî bi mebesta şînê hatine nivîsîn bi mersîyeyê têne binavkirin. Mersîye di Edebîyata Kurdî de wekî *matemname* jî tê binavkirin. Exleb li ser mirina kesekî desthelatdar, dînî an jî ferdeki malê têne nivîsîn. Di edebîyata Îslamî de bi gelemperî bi teşeyên qesîde, terkîbbend û tercî'ebendê de têne nivîsîn.¹¹¹ Mela Hesenê Sofyanî jî di dîwana xwe de cih daye mersîyeyekî ku li jêrê hatîye mînakdan:

Seydaê Yehya Mela
Te agir berda dila
Wê peymanî te da me
Ew jî bû barê mila

Barê me barê loka
Di bin da têne çoka
Di cî da hêz didin xwe
Difirin wek firoka

Çavê me l' rê qetîya
Gelo li ku ma vîya?
Me got û em metel man
Me go bûye keya (36/1-3)

Mela Hesenê Sofyanî ev mersîye li ser seydayê xwe Mela Yehya nivîsiye, şîna wî digire û xemgînîya xwe tîne zimên. Esasen Mela Yehya hevalê wî ye û xemên xwe jê re dibêje, ne ku hevalê wî rehmet kirîye ku eve jî cureyekî mersîyeyê ye. Li ber kêleka helbestên Sofyanî yên civakî û evînî û millî, bi vê helbesta mirov pîralîya wî jî dibîne.

¹¹¹ Adak, h.b, 2019, r. 143.

2.5.2.4. Medhîye

Medhîye di edebîyata Îslamî ya klasîk de tê wateya pesindana kesayetên desthelatdar ên wekî şah, sultan, wezîr, mîr hwd, kesayetên dinî yên wekî ehlê îmanê, sehabe, mela, şêx û hwd û kesên burokrat an jî kesên di merheleyên bilind de. Heta niha bêhtir medhîye li ser şah û mîran hatine nivîsîn di Edebîyata Kurdî de. Di sedsala XVI. de bi avabûna mîrektîyên kurdan medhîye di di Edebîyata Kurdî de jî cihekî muhîm girtîye. Taybet vê yekê bi Hemîdî û Melayê Cizîrî dest pê kirîye ku medhîye ji bo mîrên mîrektîyên kurdan nivîsîne.¹¹² Mela Hesenê Sofyanî jî methîyeyek bo seydayê xwe nivîsîye bi vî rengî:

Seydayê min Mela ‘Elî
Bağ û rağê tije gul î
Tu şêrînê nava dil î
Înşallah bêderd û kul î

Hêvîya min ji Xweda ye
Çi tengî bo te nedaye
Di şadî û xêr û xweşî
Te çi xwest û bo te daye

Lavakar im ji Yezdanî
Zarokê te b’ şadûman î
Mezin bibin jîr û zana
Di rêça Seydayê Xanî (38/1-3)

Mela hesenê Sofyanî di vê methîyeya xwe de pesnê seydayê xwe dide û ji wî û malbata wî re duayan dike. Her weha gazinan dike ku ev zivistan bandora xwe bi tanê li jar û xizanan dike. Bi vî rengî li ser rewşa hewayî ya wê sale agahîyên dikevin ber destê me.

2.5.2.5. Name

Name, beramberî peyva mektûbê tê. Mektûb, anku tiştê hatî nivîsîn ku peyveke erebî ye û ji koka *ketb*’ê dariştîye.¹¹³ Name di Edebîyata Kurdî ya Klasîk a kurmançî de her çend kêmnîmûne be jî kesên wekî Şêx Eskerî (k. d. 1952), Mela ‘Elîyê Findikî (k. d. 1967), Mela ‘Izedînê Xweşîko (k. d. 2010), Mela Ehmedê Zinarexî (k. d. 2018) û Şêx Muşerrîfê Xînûkî (k. d. 2008) her wekî xuya ye hemî jî helbestvanên sedsala

¹¹² Adak, h.b, 2019, r. 135-137.

¹¹³ Nebî Bozkurt, “Mektup”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, Ankara, c.29, 2004, r. 13

bîstem in. Di vî biwarî de li gor zanyarîyan serkeşê vî cureyî Seyîd ‘Elîyê Findikî tê zanîn bi nivîsîna 11 nameyên menzûm.¹¹⁴ Li dû vê yekê mirov dikare Mela Hesenê Sofyanî jî li van helbestvana zêde bike ku wî jî cih daye nameyên menzûm di dîwana xwe de. Sofyanî exleb ev name ji hevalên xwe yên mela û ji feqîyên xwe re nivîsîne yên ger li leşkerîyê ger jî li cihên dûr. wek nimûne:

Te şandibû ji me ra çend nameyên tijî sêv
Gelek şêrîn û xweş bûn me pê ra xwar tilî w lêv

Me girte xwe maç dikir çavê me bû ronî ye
Me go ehlen ser çavan xwedîyê te li ku ye? (27/1,2)

Her çawa di cureyên dîtir de beş hene her weha di nameyan de jî beş hene ku Sofyanîyî cih daye hinek ji wan beşan. Bo nimûne di mînaka jêrîn de her wekî name mensûr û axaftinên rojane bi silavdayîn û keyfxweşîlêdanê dest pê dikin her wesa nameyên manzûm jî bi van dest pê dike:

Pir peyaman ji te re ez rêdikim hevalo
Hurmata xwe ji te re diyar dikim delalo

Zar û zêçên pir delal çavên wan ez maç dikim
Rêberê rîya me bin, ji Yezdan daxwaz dikim (30/1,2)

Piştî silavdayîn û keyfxweşîlêdanê vê carê derbazî mijarê dibin û babet tê vegotin, anku hal û rewşa heyî tê vegotin. Belkî ve yek derdek be, belkî rewşek be an jî tiştêkî dîtir ku her wekî li jêrê xuya dibe mijarên ziman, zikat û meseleyên civakî hatine behskirin:

Birîna me pir helak e
Hela were perdê rake
Hin bawêşîn hin derman ke
Bo me hekîmê luqman î (32/3)

Di vê gava dibên em tê da em rêpanê zekat in
Li me nîne tu qerar bê şêr û bê tebat in

Zekat hate bendera melê feqîr çavîrê
Cilê bavê ser kerê baz de here benderê

Gava diçe benderê dilşikestî tev kul e
Dibê xalo li te be silava min ji dil e (27/16-18)

¹¹⁴ Mesut Arslan, “Nêrîneke Giştî li Nameyên Menzûm di Edebiyata Kurdî (Kurmecî) ya Klasîk de”, *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilgiler Dergisi*, 2023 (11) 3, r. 691-692.

Di her dema xwe tev da digote min ha çiçik
Negote “al meme” yan tiştêk dî nexweşik (31/6)

Mijarên rojane têne axaftinê. Mela Hesenê Sofyanî jî di helbesta jêrîn de piştî silavdayînê daxwaza tîne zimên ku biçin seyranê ber Gola Şîn xwarinê bixwin. Her wekî hatî:

Daxwaza min tu zanî, hêvî tu Kamuran î
Hûn tev bi hev ra werin serokê we Geylanî

Em dê herin Gola Şîn serjê kin berx û karan
Geşta me bit mêrga şîn bêhn dan li siyê daran

Di her deman bixwazin dengbêj bo me Şivan e
Tirş û bilxur bixwazin ew erzanê tevan e (29/2-4)

Tiştê bala me kêşayî ew e ku Sofyanî di du nameyên xwe de behsa Gola Şîn kirîye ji bo xwarinê. Dîyar e keyfa seydayî gelek ji wê dere re tê. Her weha bi temamî çar helbestên Sofyanî li ser mijara xwarinê ne, ecêb e ku sê ji van bi cureyê nameye nivîsîne.

Her wekî dî, gelek caran di nameyên menzûm de dua têne kirin bo kesê li beranberî xwe ku Sofyanî jî dema nameyê bo seydayî xwe dihinêre gelek duayan ji wî û malbata wî re dike:

Hêvîya min ji Xweda ye
Çi tengî bo te nedaye
Di şadî û xêr û xweşî
Te çi xwest û bo te daye

Lavakar im ji Yezdanî
Zarokê te b’ şadûman î
Mezin bibin jîr û zana
Di rêça Seydayê Xanî (38/2, 3)

Gelek caran mijarên tesewifî an jî dînî tîne xebirdanê:

Di weqta ko derên tev de bi carek
Xweş bimeşin derên pozê di yarek

Baş binêrin li şin’etê Ellah e
Şed teberek çiqa xweş Maşellah e (26/17, 18)

Di dawîyê de jî helbestvanî silavdayîn û xatirxwestina xwe kirîye:

Hecî ‘Abid titûnvan Mîm Tahirê Nêçîrvan
Bo wan dikim diyarî qevdek gul û silavan

Qevdê gul û nêgiza demsazê koma we bin
Sosin û beybûnê geş hogirê mala we bin

Hey nameya Sofyanî fir bide here çiya
Gihîje Seyda Seyrî li nav dehl û diriya (34/31-33)

Her wekî li jorê jî dîyar e exleb name bi silavdayînê hatine detspêkirin û bi silavdayînê qedîyane. Di navberê de jî mijarên rojane, ziman, civakî û dînî hatine qalkirin. Qasî tê dîtin, Sofyanîyî ev name hemû jî ji seydayê xwe hinartine. Di dîwanê de rêjeya nameyan hema bêje ji çar baran berek e.

Kesên navên wan di nameyan de derbaz bûyîn hevalên wî Şêx Muhemed Seyrî, Mela Emîn, Mela Yehya, Mela ‘Elî, Ebdulqadir ku navê Geylanî û Şêx ‘Ebdulqadirê Sanî lê kiribûn, Feqîyên wî Hemê, Remezan, Mehfûz, Muhemed, ‘Îsma’îl, û Murad, Zarokên wî Zeynûddîn, Îstê û Mistê ne. Her weha navên dîtir jî ev in: ‘Elî Axê Kerxî û Şivan Perwer, Hecî ‘Abid Titûnvan û Muhemed Tahirê Nêçîrvan.

Di encamê de mirov bi cureyên didaktik, lîrîk, mersîye, medhîye û nameyê pirhêla helbestvanî dibîne. Her weha seydayî di dîwana xwe de cih daye 12 nameyan. Ji van nameyan 8 mesnewî ne; 4 jî murebbe‘ in. Her wekî li jorê jî hatî gotin di Edebîyata Kurdî ya Klasîk a kurmancî de bi 11 helbestan herî zêde Seyîd ‘Elîyê Findikî helbest nivîsîne, bes piştî vê xebatê me dît ku Mela Hesenê Sofyanî di dîwana xwe cih daye 16 nameyan ku li ser daxwaza wî bi tenê 11 hatine weşandin ku Sofyani bi 16 nameyên xwe yên manzûm di vê qadê de dibe serkêş di Edebîyata Kurdî de.

2.5.1.6. Geştname (seyahetname)

Cureyeke dîwana Sofyanî jî *Geştname* anku *seyahetname* ye. Mijara vê cureyê ger e. Li ser vê babetê helbesteke Seydayî heye. Di vê derê de Seyda li gel çend kesên zana û xwedîpîşe derdikeve geşteki di sala du hezar û şeşê de. Li ser vê geşt û gera xwe zanyarîyên taybet û nêrînên xwe anîne zimên.

Dawîya heyva pûşperê
Ji Amedê em ketin rê

Mêjû du hezar û şeş e
Havîn e bo geştê xweş e

Di gerê de heşt mirov in
Tev de bo zanistê tov in

Du bijîşk û yek endezyar
Sê mela û yek hîndekar

Mamosteyek hêja û rind
Li zankoyê payebilind

Rawestgeha me ya pêşîn
Êliha petrola rengin (39/1-6)

Esasen her çend ev geştnameyek be jî li dor mijara zimanê kurdî hatîye nivîsîn. Mela Hesenê Sofyanî di havîna sala 2006ê de li gel sê mela, du bijîşk, endezyarek û mamosteyekî bi tevahî 8 kes çûne gera Serhedê. Vê gerê ji Amedê dest pê kirîye, bi rêze ve çûyîne Batman, Bedlîs, Norşîn, Nûrs, Xîzan, Wan, Panos, Kop, Agirî, Bazîd, Erzirom, Çewlig û dawîyê dîse li Amedê bi dawî bûye. Bes di seranserê helbestê de li ser qedr û giringîya zimanê kurdî hatîye sekinin, ka di gerê de li ku derê bi kurdî hatîye axaftin li ku dere bi tirkî hatîye axaftin. Her wekî li nimûneya li jêrê hatî:

Her kes dibê qamûsa me
Ne cuda ye j' namûsa me

...

Zane îslam hemî dad e
Zarê kesê girê nade (39/120,144)

Seydayê Sofyanî li hember rewşa kurdî gilî û gazine xwe anîne zimên û li cihên ku kurdî lê tê axaftin jî keyfxweşîya xwe anîye zimên.

Lê kurdî dîsa ket binî
Tirkî bi ser ket û kenî (39/22)

Ji ber ku di edebîyata kurdî (kurmancî) de geştname kêma in, ev helbesta gernameyê di edebîyata Kurdî de dikare cihekî giring bigire.

2.5.1.7. Simatîye

Bi taybetî di serdema Xalidîtiyê de warê tema û cureyên helbestê ve nûjenîyek çêbûye. Hin tema û cureyên nû cara yekem di vê serdemê de hatine bikaranîn. Yek ji van xwarin e. Di edebîyata klasîk de ji jî helbestên ku li ser temaya xwarinê hatine nivîsîn *simatîye* tê gotin. Li Hênê û Aqtepeyê di çarçoveya nivîsîna helbestên bi

temaya xwarinê de bizaveke edebî jî peyda bûye li sedsala XIX. de. Lewra Şêx Hesên Nûranî, Şêx Mihemed Canê Aqtepe (k.d. 1909) û Şêx Ebdurehamanê Aqtepe jî bi temaya xwarinê helbest nivîsîne. Di heman maweyê de Şêx Muhyedîn li Hênê, Şêx Mihemed Can û Şêx Ebdurehamanê jî li Aqtepeyê di vê biwarê de helbest nivîsîne. Her weke din, Mela Ehmedê Nalbend (k. d. 1963), Mela Ehmedê Zinarexî, Abdulkadir Bingöl (Dilbikulê Cizîrî), Seyîd ‘Elîyê Findikî (k. d. 1968) û Dilbirînê Botî nûnerên dîtir ên vê temayê ne.¹¹⁵ Mela Hesên Sofyanî jî di 5 helbestên xwe de li ser mijara xwarinê nivîsîye:

Mehîra mastê mîhîn
Di nav de pûnga bi bîhn

Nadim li ser sênîya
B’ goştê berx û şamîya

Dan û pûngê me anî
Li ser agir me danî (23/13-15)

Ev helbest bi temamî helbesteke simatîye ye ku helbest bi temamî anku ji serî heta binî li ser pêvajoya çêkirina xwarina bi navê “mehîr”ê ye. Li dû vê yekê mirov fam dike ku helbestvan gelek ji xwarina mehîrê hes dike. Her weha:

Di her sala em derkevin buharê
Ser jê dîkin car berxik û car karê

Em distînin fasûleyên taze ye
Tev çêdîkin tirşîkek dilxwaze ye

Dê şor bikin goştê şêrîn ne mir e
Rûn lê bikin di lengerê bilxur e (26/23-25)

Ez baş dizanim bo te goştê sergopejlandî
Gelek xweş û şêrîn e di nav rûn da qijlandî

Çiqas bixwazî dê bêt ber te ji vî yê gotî
Te ‘dvê ji yê patî be, te’dvê ji yê biraştî (29/5-6)

Welê dikim peyivim bi qelsî ne bi xurtî
Ji wê tirşa Gola Şîn ji wî goştê biraştî

Tirşîka me pir xweş e, ya taze ye ne kevn e
Fasûleyê taze ne kundur û alûce ne (30/4-5)

¹¹⁵ Abdurrahman Adak, *Muhyedînê Hênî: Di Edebiyata Kurdî de Nûnerekî Girîng ê Temaya Xwarinê*, Nûbihar Akademî, hj. 3, 2015, r. 26-33

Dêna xwe bidê binê
 Bigre goştê bizinê
 Dîzikê baş tije ke
 Bigre bavê firinê (40/3)

Di van her çar mînakên li jorê de helbestvan bi temamî ne helbestên simatîye ne; bes her ji yekê çend beyt hatine veqetandin bo vê mijarê. Her weha ji ber ku mijara xwarinê giring e, me xwest navê xwarin û peyv û têgehên têkildarî xwarinê ku di van her çar helbestan de heyîn bi du komên cuda dîyar bikin:

Mast	Rûnê nivîşk
Şîr	Mehîr
Pûng	Goşt
Dan	Dew
Kereng	Kundir
Dewîşk	Sîr
Tirşik	Bilxur
Fasûle	Rûn
Toy	Alûce
Hêk	Nan

Pêyv û têgehên dîtir ên têkildarî xwarinê:

Çêj	Lezzet
Tahm	Dev
Dilçûyîn	Bêxwê
Pez	Kodik
Keyandin	Kef
Berx	Mîh
Sênî	Agir
Hesk	Kel
Firaq	Sehen
Satil	Telp

Serjêkirin	Kar
Sorkirin	Lenger
Sifre	Biraştî
Dîzik	Firin
Beran	Belindir
Tiştîr	

Di encama lêkolînê de hate dîtin ku Sofyanî helbestek bi temamî ji bo mijara xwarinê veqetandîye û di 4 helbestan de jî bi çend beytekan mijara xwarinê daye ber xwe. Hate zanîn ku Sofyanî ji mehîrê hes dike. Her weha balkêş e ku di Edebîyata Kurdî de, ew herêma ku bizava xwarinê lê ava bûyî Mela Hesenê Sofyanî jî ji heman herêmê ye. Dikare bê gotin ku temaya xwarinê wekî taybetmendîyeke herêmê ye di helbesta kurdî de.

2.5.1.8. Cureyên bi keş û hewayê ra pêwendîdar

Kêş û hewa yek ji temayên helbesta şairên serdema sedsala bîstem e. Exleb şair helbestên xwe bi geşbînî li ser werza biharê dinivîsin. Bêguman Mela Hesenê Sofyanî jî ev tişt kirîye. Bes ya ku wî ji yên di cuda dike ew e ku wî ne bi tenê li ser werza biharê; di heman weqtê de li ser werza zivistanê jî nivîsîye. Heta rasterast agahîyên wê hewayê salê dane ku mirov bi xêra vê yekê digehe agahîyên germahî an jî sermahîya wê salê.

Şitaiyye:

Şitaiyye ji peyva zivistanê “şita”ê derketîye ku qesta wê zivistan e. Exleb di qesîdeyan de di beşa teşbîbê de ev cureyê heye.¹¹⁶ Mela Hesenê Sofyanî jî di dîwana xwe de cih daye şitaiyyeyekî:

Zivistan e, ne ardû ye ne nan e
Tim sahî ye çîkeçîka esman e
Çem qerimîn qeşa avêt aşane
Gelo çi bû? Nalenala însan e!
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e (6/1)

¹¹⁶ Hasan Aksoy, Şitaiyye, *TDV İslâm Ansiklopedisi*, c.39, Ankara, 2010, r. 216.

Ji vê nimûneya jorîn dîyar dibe ku di sala 1983yan de zivistaneke dijar derbaz bûye ku millet gelek perişan bûye. Sofyanî bi vê helbesta xwe rezaleta hingê li ber çavan zindî dike.

Bihar:

Di tarîxa Edebîyata Kurdî de cureya biharîyeyê di serdema mîrektîyên kurmancan de di sedsalên XVII û XVIIIem de gelekî pêş ketîye û gihîştîye asteke bilind a edebî. Di vê serdemê de Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Sewadî, Mela Bateyî û Mela Mensûrê Girgaşî wek nûnerên herî giring ên biharîyeyan derdikevin pêş. Di serdema piştî mîrektîyan û dawîya Osmanîyan de Şêx Ebdurehmanê Aqtepî û lawê wî Şêx Eskerî û di sedsala me de jî Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Mela Ehmedê Nalbend, Mela Ehmedê Zinarexî û Mela Ehmedê Mermerî wek nûnerên giring ên biharîyeyan derdikevin pêş.¹¹⁷ Mela Hesenê Sofyanî jî helbesteke biharîye nivîsîye:

Hêja ne bên pesindanê
Her demsalên Kurdistanê
Bi taybetîya vejanê
Xweş bihara Kurdistanê (1/1)

Mela Hesenî di vê biharîyeyê de pesnê biharê daye, bes her wekî me gotî Sofyanî şairekî millî ye û di dîwana xwe de bal kêşaye ser mijarên millî û civakî jî esasen di vê helbesta xwe ya biharîye de pesnê biharê nedaye; belkî pesnê bihara Kurdistanê daye. Ev jî alîyê wî yê millî nîşa me dide.

Di encamê de tê dîtin ku ji alîyê cureyan ve jî dîwana Mela Hesenê Sofyanî dîwaneke dewlemend e.

2.6. Kêş, Serwa û Paşserwa

Di edebîyatên curawcur ên dinyayê de pîvan û aheng û rîtma helbestê li gor hejmara peyvan an jî çawanîya wan wekî xaleke muhîm a dengî derdikeve pêşberî mirovî. Li dû vê yekê taybet di edebîyatên rojhelatê de wezna erûzê û kîteyî/heceyî

¹¹⁷ Abdurrahman Adak, *Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Bihar û Biharîye*, Çandname, malper: <https://candname.com/di-edebiyata-kurdi-ya-klasik-de-bihar-u-bihariye/> (04.07.2024)

têne bikaranîn.¹¹⁸ Her weha li gel van jî ehemmîyetek mezin ji serwa û paşserwayê tê dayîn ku ev hemî bi hev re aheng û awaz û wateyên xweş li helbestê bar dikin.

Mela Hesenê Sofyanî jî her çend kêşa kîteyî, serwa û paşserwa bi kar anî be jî kêşa erûzê bi kar neanîye. Divê bê cextkirin ku ev taybetmendîyeke sedsala XXem e. Gelek Helbestvanên klasîk ên sedsala XXem erûz terk kirine.

2.6.1. Kêşa kîteyî

Di qonaxa dawî ya dîroka Edebîyata Kurdî ya Klasîk de anku di sedsala XXem de di ruxsar û naveroka helbestê da hindek guhorîn pêk hatine. Yek ji taybetmendiyên şairên kurd ên vê serdemê bikaranîna kîteya heceyî ye.

Di vê çerçoveyê de helbestvanî helbestên xwe bi kêşa kîteyî nivîsîne. Dema em berê xwe didin dîwanê, dîwan ji 42 helbestan pêk hatîye ku di van helbestan de bi temamî 8 formên cuda yên kêşa kîteyî bi kar anîne. Bi taybetî herî zêde formên 8, 14 û 16 kîteyî hatine bikaranîn.

Exleb di helbestan de ji bo ku kêşa kîteyî an jî erûz birûne helbestvan serî li rêkên cuda didin. Sofyanî jî di helbestên xwe ji bo ku kêşa kîteyî birûne, gelek caran kîte kurt kirine an jî jê kuştine. Exleb heger kîteya risteya zêde be ji lêkeran tîpa “î”yê kuştîye. Ev rewşeke normal e ku gelek helbestvan vê yekê dikin. Bo nimûne:

Bimje hewayê paqij û delal
Kin neke jînê bi jehrîya tal
Roya xwe tarî neke hevalo
Bijî dirêj û nazik û delal

...

Bêhna jê digrî bêhna mirar e
Ê kêleka te ji te bêzar e
Ger fedî nekra ew hevalê te
Cihê tu lê dê nekra war e (12/3,16)

Her di nimûneyên jorê de jî hatî xuyanê helbesta ku kêşa wê ya kîteyî 10 e, di hinek risteyan de bûye 11, lewra wî jî “bimije” kirîye “bimje”, “digirî” kirîye “digrî” û “nekira” kirîye “nekra”. Bi vî şiklî kêşa kîteya ya hemî risteyên zêde wekî risteyên dîtir bûne 10 kîteyî û ahenga helbestê ava bûye.


¹¹⁸ Ender Saraç, *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, weş: 3f (ç.2) 2007, r. 201.

Mela Hesenê Sofyanî di kuştina kîteyan de gelek caran serî daçekan daye. Daçek bi peyva berî wê an jî bi peyva piştî wê ve zeliqandîye û bi vî rengî kîteyek kêr kirîye:

Ge l' ser xetê ge l' bin xetê
Çi bixwazî l' beşna te tê (39/33)

Her wekî li jorê xuyayî divê helbesta 8 kîteyî de risteya yekem gihiştîye 10 kîteyan. Helbestvan jî şûna bêje “Geh li ser xetê geh li bin xetê” gotîye “Ge l' ser xetê ge l' bin xetê” û 2 kîte jê kuştine û di navbera risteyan de hevsengîya kîteyan ava kirîye. Wekî encam kuştina kîteyan di edebîyatê de rewşeke asayî ye ji bo hevsengîya ahenga helbestê ku Mela Hesenê Sofyanî jî serî li vê rêbazê daye.

Grafîk 3: Rêjeya Kêşa Kîteyî di Dîwanê de



Her wekî li jorê jî dîyar e Mela Hesenê Sofyanî di dîwana xwe de cih daye gelek cureyên kêşa kîteyî. Li dor hindê, Sofyanî di dîwana xwe herî zêde bi deh helbestan kêşa 8 kîteyî bi kar anîye. Her paşê di rêza duyem de kêşa 14 kîteyî di heşt helbestan de, kêşa 7 û 16 kîteyî di şeş helbestan de bi kar anîye. Weke din, Sofyanîyî kêşên 10 û 15 kîteyî her yekê çar caran, kêşên 11 û 12 kîteyî jî her yekê du caran bi kar anîye. Giringîpêdana kêşa kîteyî taybetmendîyeke vê serdemê ye û Sofyanî jî ji vî alîyî ve pirreng e.

2.6.2. Serwa

Serwa an jî qafiye du pêyvên têkildar in. Qafiye, piştî serî ye ku bi forma “qefa”yî derbazî kurdî bûye. Wate jê, dawîya tiştêkî û di edebîyatê de jî tê wateya dawîya beytê. Serwa wekî têgeheke edebî di dawîya beytê de dubarekirina dengên e di navbera peyvên wateyên wan jî hev cuda de. Hevbeşîya serwayê pêwîst e di binemaya bêjeyan de çêbibe.¹¹⁹

2.6.2.1. Li gorî cih û cureyên serwayê

2.6.2.1.1. Serwaya bêpaşserwa

Di serwaya bêpaşserwa de paşserwa anku redif tune, bi tenê serwa heye. Kîteya ku dubarekirina dengên tê de çêdike di dawîya risteyê de ye û ji alîyê ve hevsengîyek di navbeyna risteyan de ye.¹²⁰ Helbestên Sofyanî yên bi vî rengî jî hene:

Lewra dizanîn bê şek û guman
Xêzê kişîne li tevgerê wan (8/46)

Di mînaka jorîn de tê dîtîn ku redif tune, bi tenê serwa heye. Kîteya ku dubarekirina dengên çêdike “an” di dawîya risteyê de ye û hevsengîyek di navbeyna risteyan de heye.

2.6.2.1.2. Serwaya bipaşserwa

Di vî cureyê de di dawîya risteyan de pêşî serwa û piştî wê jî paşserwa cih digire.¹²¹ Helbestên Sofyanî yên bi vî rengî jî hene:

Jar û perîşan nebî weka wan
Nabî têkoşer di nav koma wan (8/71)

Dê biba bersiva we, fire bikra dilê we
Birevanda xemê we sivik bikra barê we (34/8)

Her weku tê dîtîn di mînakên jorê de pêşîkê ser “we” hatiye paşê jî paşserwa “ê” hatiye ku dîwanê de gelek nimûneyên wê hene.

¹¹⁹ Adak, h.b, 2015, r. 395.

¹²⁰ Adak, h.b, 2015, r. 395.

¹²¹ Adak, h.b, 2015, r. 396.

2.6.2.2. Li gorî hevpişkîya dengan cureyên serwayê

2.6.2.2.1. Serwaya mucerred

Ji wan serwayan re mucerred tê gotin ên ku di dawîyê de bi herfa bêhereke biqede û berî wê jî herfeke bi hereke hebe. Wate jê, herfa dawîyê ya serwayê dengdar be û herfta berî wê jî dengdêr be.¹²² Dîwanê de nimûneyên vê formê hene, her wekî hatî:

Herê bira herê bira ez çî bêjim
Ji girîna van xizana ker û gêj im
Tim û timî derd û kulên wan diwêjim
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim

Geh li vir in geh li wir in bêhiş mane
Herin kê der pelçiqandin para wan e
Berîk vala karê wan timî xweydan e
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim (2/1,2)

Her wekî tê dîtîn di murebbe‘a jorê de herfa dawîyê dengdar “m” û herfa berî wê jî dengdêr “î” e. Di dîwanê de nimûneyên vê formê gelek in.

2.6.2.2.2. Serwaya murdef

Serwaya murdef ew cure serwa ye ku di dawîyê de ji xeynî herfa rewîyê ya serwayê herfeke *rîdfê* dihevine. Herfên rîdfê jî “elîf” û “waw” û “yê” ne. Heger yek ji van herfan hatibe stendin û ji xeynî herfa rewîyê hatibe dubarekirin jê re serwaya murdef tê gotin.¹²³ Di dîwanê de nimûneyên vê formê weha ne:

Ûeta kengê em wuha bin, dû heval û perîşan
Li dijê hev bidexesî, bêzanîn û tev xizan?

Ûeta wuha em dexes bin, di nav me da berberî
Tûrê parsê dê li mil bin, gerokê ber derîyan (5/1-2)

Her wekî tê dîtîn di dawîyê de ji bilî herfa rewîyê, herfa rîdfê elîf hatîye û dengê “a”yê derketîye meydana dubarekirina wê çêbûye. Di dîwanê de nimûneyên wê zehf in.

¹²² Adak, h.b, 2015, r. 397.

¹²³ Adak, h.b, 2015, r. 397.

2.6.3. Paşserwa (redîf)

Peyv û qertafên ku di dawîya risteya beyt û bendan de ku bi peywira serwayê cih digirin heger ji aliyê telafûz û wateyê ve yek bin hingê paşserwa anku redîf derdikeve meydana.¹²⁴ Di dîwanê de bi çend cureyan xuya dibin.

2.6.3.1. Paşserwayên qertafî

Serwa bi tenê ji qertafê pêk tê. Li jêrê jî qertafa tewangê rola serwayê girtîye ser xwe; di dîwanê de mînak vê yekê weha ye:

Ez nexweş im pir dinalim evîndar im lê dilberê
Evîna te j' pîya xistim birîndar im lê esmerê

Bi heşreta dîtina te ez bêxew im kezîzerê
Ez im Memê di zindanê belê ew im lêvşekerê (17/1-2)

Di mînaka jorîn de serwa bi tenê ji qertafa tewandî “ê”yê pêk hatî û dubare bûye. Bi vî rengî paşserwaya qertafî derketîye meydana ku di dîwanê de nimûneyên wê zêde.

2.6.3.2. Paşserwayên qertaf û bêje

Di paşserwayên qertafî û bêje de pêkhatina serwayê bi bêjeyê pêk tê û berî wê jî di nav risteyan de serwaya qertafî pêk tê. Di dîwanê de weha reng daye:

Dilo bes e girîn zarîn bêmifa ye
Dibe bêjî ka yara min ne xuya ye
Eger bêjî evîndarî ne wiha ye
Evîndarî di her demê bê dewa ye

Dê pir cara ji yara xwe cuda bibî
Gelek cara ji hişê xwe wenda bibî
Tal û şêrîn di dîl te da wek hev bibî
Evîndarî di her demê bê dewa ye (15/1,2)

Her wekî tê dîtin pêkhatina serwayê ji bêjeyekî pêk hatîye û berî wê di nav risteyan de serwaya qertafî pêk hatîye ku di dîwanê de nimûneyên wê hene.

¹²⁴ Coşkun, h.b, r. 232.

2.6.3.3. Paşserwayên bêje/kombêjeyî

Di paşserwayên qertaî û kombêjbêje de pêkhatina serwayê bi kombêjeyê pêk tê û berî wê jî di nav risteyan de serwaya qertaî pêk tê. Di dîwanê de weha reng vedaye:

Qedeş tijî jehra mar e
Xweş vedixwum j' destê yar e
Te'm û lezet bêjimar e
Wê şerbetê hevta tune

Şerbeta min jehra mar e
Saqîyê wê bilê yar e
Min ji ber qîr û hewar e
Kes [li] hewara min tune (13/1,2)

Me şuhbeta şêrîn dikir
'Endelîban wîrîn dikir
Şalûlan xweş kalîn dikir
Hezaran her nalîn dikir (32/16)

Her wekî tê xuyanê paşserwa ji kombêyan pêk hatîye. Ev şêwe di dîwanê de kêr hatîye bikaranîn.

Her wekî hatî lêkolînkirin, helbestvanî di dîwana xwe de helbestên xwe bi kêşê erûzê nenivîsîne. Her çend em bêjin erûz bi kar neanî be jî hewa û ahengeke erûzê di helbestên şairî de xuya dibe ku ev jî xusûsiyeteke serdemê ye. Li dû vê yekê helbestvanî kêşê kîteyî bi kar anîye. Weke dîtir, bi şikil û şêwazên cuda giringîyeke mezin daye serwa û paşserwayan ku ji dîwana wî çendîn nimûne hatine dayîn. Bes ev şikil û şêwazê serwayê exleb di tevahîya helbestê de nehatîye cîbicîkirin, hinekî tev li hev hatîye bikaranîn anku exleb ji alîyê serwayê ve şêwaza hemî beyt/bendan hev nagirin. Ji ber vê yekê zehmet e em ji bo her cureyekî serwayê bikarin hejmarekî bidin. Bi kurtî Mela Hesenê taybetîyên serdema xwe nişan dane.

3. KESAYETÎYA EDEBÎ YA SOFYANÎ

Di vê pişkê de vekolîn li ser helbestvanên bandor li Sofyanî kirîn û kesayetîya wî ya poetîk hatîye kirin.

3.1. Helbestvanên Bandor li Sofyanî Kirîn

Di vê binepişkê de vekolîn li ser Ehmedê Xanî û Cegerxwîn hatîye kirin li dor çarçoveya helbestvanên bandor li Sofyanî kirîn.

3.1.1. Ehmedê Xanî (1651-1709)

Ehmedê Xanî yek ji wan sitûnên bihêz ên Edebîyata Kurdî ye. Xwudanê pênuşeke bihêz û hişmendîyeke mezin e. Ew, feylesof û civaknas û siyasetmedar û rewşenbîrekî xurt e. Çend berhemên giranbiha dane Edebîyata Kurdî ku heta niha jî kartêkirina wan berheman berdewam e. Yek ji van berhemên giranbiha jî Mem û Zîn e; vê berhemê cihê xwe di nav klasîkên edebîyata cîhanê de girtîye.¹²⁵

Ehmedê Xanî hêj di sedala hivdemîn de doza dewletekî kirîye ji bo gelê xwe, lewra ev rihê welatperwerîyê çenda tê zanîn di nav kurdan de li dor Xanî peyda bûye.¹²⁶ Di vê çerçoveyê de ev hizirên wî xwe di helbestên wî de dane der û Xanî bi van hizirên xwe tesîreke mezin li pişt xwe daye avakirin. Yek ji wan helbestvanên ku ketine pey şopa wî Mela Hesenê Sofyanî ye.

Sofyanî jî yek ji helbestvanên millî yê serdema xwe ye. Rihê wî yê welathezîyê xwe di helbestên wî de daye der. Sofyanî bi xwe tîne zimên Mem û Zîna Ehmedê Xanî ya Bozarslan gehîştîye ber destê wî ku bi xêra vê yekê helbest ketîye dilê wî û dest bi nivîsîna helbestan kirîye. Anku bi gotina wî bi tesîra Mem û Zînê helbest û nivîsîna helbestan pê re peyda bûye. Heta ku di bin bandora Mem û Zînê de helbesta xwe ya ewil bi 10 kîteyan çêkirîye ku me di vê xebatê de li ser daxwaza wî cih nedayîyê.

¹²⁵ Zanyarîyên berfireh li ser jîyana Xanî bnr: Ebdullah M. Varlî, *Dîwan û Jînewarî ya Ahmed ê Xanê*.

¹²⁶ İzzeddin Mustafa Resûl, *Bir Şair Düşünür ve Mutasavvıf Olarak Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn*, weş: Avesta, Avesta, 2007, Stebol, r. 95-102.

Xaleke dîtir a nîşandana tesîra Xanî li ser Sofyanî ew e ku xabeteke wî ya haşîye heye li Mem û Zînê. Her li ser vê yekê zêdetir jî Sofyanî dersa Mem û Zînê daye feqîyên xwe. Ev yek jî nîşan dide ka Sofyanî çi qas ketîye bin bandora Xanî.

Çawa Xanî di helbestên xwe de banga yekîtîyê dike her wesa Sofyanî jî tim bangewazîya yekîtî û hevgirtinê dike:

Heta ku ew nebin yek
Bi rast û çep de baz din
Dê bihelin wekî lek
Pir serîyan bi dar din (4/5)

Sofyanî, di helbesta xwe ya geşnameyê de dema rêya wan bi Bazîdê dikeve diçin serdana goristana Xanî û li ser vê yekê atîfî helbesta Xanî dike ya bi navê “Kan Padşahê Serhedan”. Ev yek jî nîşan dide ku Sofyanî dîwana Xanî xwendîye û bandor lê bûye:

Me dît gora Mîr Mehmed Beg
Çavê me ronî bû gelek

Ew e ji bo koşka rengîn
Xwedanê destpêk û pêşîn

Mîr Mehmed Beg pir belalî
Navê wî bû li her alî

Xanî dibê ji riş û can
Kan padîşahê Serhedan (39/100-103)

Sofyanî di helbesta xwe de her gav rexneyan li ser civakê dike ji bo zarokên kurd rasterast Ehmedê Xanî dike rêber:

Lavakar im ji Yezdanî
Zarokê te b' şadûman î
Mezin bibin jîr û zana
Di rêça **Seydayê Xanî** (37/3)

Her weha nîşaneyek dîtir jî zimanê vê berhemê ye ku zimanekî zelal û herikbar ji peyvên bîyanî dûr. Taybet di vî warî de peyvên xweser ên devoka behdînan/colemergê û şeweyên zimanî hindek nîşaneyên dîtir in ku di daçekan de xwe didin der:

Di weqta ko derên tev de bi carek
Xweş bimeşin derên pozê **di** yarek (26/17)

Çavên di xwe baş fire ke
Li fêl û fendan mêze ke (39/57)

Sofyanî di gelek helbestên xwe de bal kêşaye ser Mem û Zînê ku du karakterên sereke yên di mesnewîya Xanî ne:

Mem evîndar li pey **Zîn** im
Na, Ferhadê dilşêrîn im
Yar hunda ye dilbirîn im
Dil peritî derman tune

Di her gavê dikim qêrîn
Di zindanê dikim nalîn
Wekî **Memê** ji derdê **Zîn**
Belê **Mem** im **Tacdîn** tune (13/11,12)

Wekî encam, Sofyanî şairekî millî ye û bi taybetî bi gotina wî, li ser Mem û Zînê xebitîye. Mesnewîyeke serbixwe ya Sofyanî nebe jî di dîwana xwe de cih daye gelek helbestên mesnewî. Li dû van zanyariyan, fikrên helbestvanî yên millî, helbestên wî yên mesnewî, nimûneyên ji helbestên wî û xebata wî ya li ser Mem û Zînê bi tena serê xwe têra dikin ku mirov bêje Mela Hesenê Sofyanî peyrewekî Ehmedê Xanî ye.

3.1.2. Cegerxwîn (1903-1984)

Cegerxwîn helbestvanekî kurd ê sedsala bîstem ê piralî ye. Qewareyeke fireh di helbestên wî de hene ji neteweperwerîyê bigire heta sosyalîzm û eşq û xwerist û siruşt û rojî û nimêj û jin û karker û ziman û hema bêje li ser hemû biwarên jîyanê nivîsîye. Her wekî dî jî pertûkên wî yên çîrokî, folklorîk, ziman, mêjû, wergêr û jînenîgarî jî hene. Cegerxwîn, li gel oldarîya xwe ketîye nav mijar û rêxistinên kurdî yên polîtîk û di encama vê yekê li ser mijarên dînî û evînî mijarên kolonyal, sosyaliz, komunîzim, koma ploreter û zulm û zordarîya nivîsîye. Her weha li derdora wî jî kurdên neteweperest ên wekî Hejar, Pîremêrd, Bêkes, Goran, Dildar û Osman Sebrî hebûn ku ev êkol jixwe di hizirê mirovî de îmajekî çêdikin.¹²⁷ Di vî warî de li gor lêkolînên me Mela Hesenê Sofyanî ji alîyê teşe, tema, mijar û zimanî ve ketîye bin bandora Cegerxwînî ku em dikarin bi çend xalan li ser bisekinin.

¹²⁷ Bo zanyariyên berfirehtir li ser jîyana Cegerxwînî: Feqî Huseyn Sağmıç, *Dîroka Wêjeya Kurdî; Cegerxwîn, Hayat Hikayem*.

Di hevpeyvîna me ya li gel Seydayê Sofyanî de hate zanîn Seyda dema li def Mela Mu‘tî dixwîne, birayê wî melayî Mela Ebdulxefûr ji wan re hinek helbestên Cegerxwînî dixwîne. Her weha dema li Sofyayê dixwend, helbestên Cegerxwîn bi Feqîyekî dî re jî dîtine. Her weha Seyda radigehîne ku berî wî jî hinek helbestên wî ghiştine wan. Taybet şî‘rên li ser mijarên netewperwerîyê ghiştine wan û heta Sofyanî hinek ji wan jiber jî kiribûn wê deme. Seyda dibêje çawa min ev bihîstin ez pê ve zeliqîm û ez bi xwe hesîyam. Hêj wan salan de hestên Seydayî yên netewetîyê şîn bûne û heta ji hevaldersên xwe re ketîye nav munaqeşeyên neteweyî û şîret li wan kirine.

Cegerxwîn gelek helbestan li ser rêxistinên û kesayetên welatparêz ên wekî Mela Mistefa Barzanî dinivîse û piştgirîya wan dike. Di vî warî de Mela Hesenê Sofyanî jî heman taybetmendîyan nişan dide ku berê xwe daye temaya millî her wekî Cegerxwînî. Her weha wî jî wekî Cegerxwînî methîyeyek li ser Barzanî nivîsîye, bes her wekî li jorê jî me amaje pê dayî helbestvanî destûra weşandina hinek helbestan nedabû ku ev yek ji wan e.

Li alîyê din, Cegerxwîn rexnegirekî millî ye ku her daîm di mijarên neteweyî de xema nezaniya gelê xwe xwarîye û ketîye nav pend û şîretan. Helbestên rexnegir û pêşverû û estetîk ve merheleya Edebîyata Kurdî berztir dike.¹²⁸

Xweda me anî dinê di bin destê neyara
Jînê kire para me di nav ker û dewara

Derdê neyar giran e lêbelê tê kişandin
Evan kerê nava me dil û gurçik çirandin (34/9,10)

Cegerxwîn, di helbestên xwe de bi awayekî eşkere gazî gel û gundî û kedkaran dike ku bibin yek li hember niheqîyê bi ruhekî millî. Li gor wî şer amûreke berjewendîya dewletên emperyalîst e.

Gelek pîs e: Ev hawê ha bêdadî ye
Zikê axa w birjiwazî nepxandî ye
Zikguvaştin para karker û gundî ye
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim (2/11)

¹²⁸ Bo zanyarîyên berfirehtir li ser neteweperestîya Cegerxwînî: Mîkaîl Bilbil, *Helbesta Cegerxwîn û Îqtîdar*.

Yek ji temayên Cegerxwînê rexneya civakî ya li ser mela, axa, şêx, beg û axayan e ku di helbestên Sofyanî de jî heman tema heye. Li dû vê yekê her tim pend û şîret tên dayîn:

Ax birê min me ceşş pir in pirên wan jî nîvmela
Bûye perde li ser mêjî zingara êş û bela

Em ji wî her bêhêvî ne gûza pûç e bêsûd e
Welê xwezî bihewiya, davême kevr û şela

Hinë dinê bi nav şêx in, mêjokeyên welat in
Hevalbendê maldaran e, xizan dane ber tela (3/1-3)

Yek ji hevparîyên her du şairên berbehs jî zimanê wan e. her du jî zimanekî zelal û bihêz û ji hemî devokan avvexwarî dinivîsin, heta cih didin peyvên soranî jî. Di helbestên xwe de kêşa erûzê bi kar nayînin, giringîyeke mezin didine kêşa kîteyî. Zimanê wan jî peyvên zimanê bîyanî parastî ye ku bi hişmendane vê yekê dîkin.

Serbilindî ger dixwazî hevalbendî **eger** e
Yan na tu xwebixwekir î ji bo te nîne derman (5/4)

Birê hêja êşên li kurd ne **şêrpence** w sîroz in
Hinek êşên netewxur in xidartirîne êşan (5/11)

Li dû van zanyariyên hevpar ên her du şairan pêdivî ye bê gotin ku Mela Hesenê Sofyanî Cegerxwîn dîtîye û pê re rûniştî ye, suhbet kirîye. Di wê serdemê de mirov şairekî weha bihêz bibîne û pê re suhbetê bike zehmet e mirov nekeve bin bandora wî. Ji bilî xalên hevpar jî gava mirov helbestên Sofyanî dixwîne rasterast Cegerxwîn tê bîra mirovî. Li alîyekî dî, çawa ku me gotî Mela Hesenê Sofyanî ketîye bin bandora Xanî, pêdivîyî gotinê ye ku bi heman şiklî Cegerxwîn jî peyrewekî Xanî ye. Her wekî encam di vê çarçoveyê de em bi dilrihetî dikarin Sofyanîyî wekî peyrewê Cegerxwîn destnîşan bikin.

3.2. Kesayetîya Sofyanî ya Poetîk

Sofyanî terzê helbestvanên klasîk ên serdema mîrektîyan neşopandîye. Zêde giringî bi teşe, erûz û qafiyeyê nîşan nedaye. Di naveroka helbestê da cih nedaye mijarên standart ên helbesta klasîk. Bi kurtî uslûba wî û ya şairên berê ne yek e. Lewma Tesîra Mela, Xanî, Bateyî, Aqtepî hwd li ser wî kême ji vî alîyî ve. Esasen jêdera helbestvanîya wî wek helbestvanên berê medrese ye. Lêbelê ji ber ku serdema

wî cuda ye, ji alîyê uslûbê ve ji wan veqetîyaye. Helbestvanên berê uslûba sebkê Îraqî, Sebkê Azerbeycanî, Sebkê Hindî şopandine, lêbelê dikare bê gotin ku wî sebkê millî hilbijartîye. Bi gotineke dî ew di nav bizava helbesta kurdî ya millî de ye. Di helbesta kurmancî ya sedsala XXem de bingeha vê bizav ji alîyê kesên wek Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Seydayê Gurdilî, Mela Ehmedê Paloyî vebatîye temsilkirin. Mela Hesenê Sofyanî bi giştî wek endam û şopgerekî vê bizavê dikare bê qebûlkirin.

Her şair li dor xwendin û zanîn û şîyana xwe xwedîyê şêwaz û nêrînekê ye. Li ser vê yekê Mela Hesenê Sofyanî helbestvanekî millî yê sedsala XXem ê Edebîyata Kurdî ye û di dîwana xwe de berê xwe daye meseleyên civakî. Sofyanî di serdema Şerê Cîhanê yê Duyem de anku tam di nav xelayekê de hatîye dinyayê. Li ser hindê di nav perîşanîyê de xwendina xwe li ber destê çendîn seydayan dîtîye. Ji bilî xwendina hicreyê bi serê xwe xwendin kirine ku bandora vê yekê di hizir û hişmendîya wî de xwe daye der. Bi taybetî ji hevalên xwe cudatir giranîya xwe daye ser berhemên kurdî û meyla xwe daye ser rewşa kurdan. Sofyanî xwedîyê 2 berhemên e ku yek ji wan dîwana menzûm e û yek jî lêkolîneke mensûr e li ser Mem û Zînê. Ji van dîwanan yek mijara xebata me ye.

3.2.1. Ruhê Sofyanî yê hişyarkirinê

Alîyekî edebîyatê bêguman perwerdekirina civakê ye. Şair/nivîskar zor caran dikevin rola mamosteyekî an jî rewşenbîrekî û di mijarên dînî, civakî û millî de civakê perwerde dikin. Sofyanî jî di vî warî de rola mamosteyekî daye ser milên xwe û xwestîye bi taybetî di mijarên civakî û millî de rêberîyekê bike.

Di dîwana Sofyanî de bi giştî tê xuyanê ku merema dilê wî însan bi taybetî jî kurd xwenda û zana bin, nexweşî û kuştin û qirkirina wan nebe. Ew dixwaze hemû însan bi wekhevî û wekî xwûşk û birayan li gel yek bijîn. Sofyanî, li ser ruhê xwe yê azadîxwaz û netewparêzîya xwe mafê karker û xebatkaran jî dike xema xwe. Bi şî'rên xwe bangî karker û xebatkaran dike ku hişyar bibin û yekîtiya xwe ava bikin û dawa mafê xwe bikin. Ew dixwaze gel serî li ber beg û axayan nedaynin, rêz û hurmetê nedin wan; lewra ew wan dixapînin û dikin koleyên xwe.

Her weha bo şêx û melayan jî heman tiştan rêz dike ku şêx û mela kurdan ji ilm û zanîne dikin û wan di bin dagirkerîyê de bêmejî dihêlin. Li dû vê yekê Mela Hesên Sofyanî şîreta xwendin û zanîne li kurdan dike. Sofyanî, gelek ji xwendinê hes dikir. Digote feqîyên xwe bixwînin! Ne ku ji bo ku hûn bibin mela, bixwînin bibin zana ku neyên xapandinê, ger hûn bibin çopçî jî bixwînin.¹²⁹

Di vî warî de feqîyê wî Mela Remezanê Dedaşî dibêje, Seydayî ji bo xwendinê dîsîplîneke zêde hebû, qasî qedir dida feqîyan belkî ew qas nedida malbata xwe an jî kesekî dîtirê. Ji bo karê xwe ders betal nedikir. Feqî heta hûn nekiribana seyda derbaz nedibû, pir jî bûya hindik jî bûya dida tekrarkirinê heta hûn dibûn. Bi çî awayî feqî hûn bibe bi wî awayî dersê feqîyan digot.¹³⁰

3.2.2. Ji alîyê ruxsarî ve poetîkaya Sofyanî

Di hengama nivîsînê de şair dibe tevnrêsek û helbestên xwe peyv bi peyv herf bi herf wekî tevnekê dirêse, wekî bîrkarekî dikeve nav hisaban. Tê de çendîn şewazên edebî bi cih dike.

Lehzeya mirov ji alîyê ruxsarîyê ve li ser dîwana Sofyanî hûr dibe bê guman poetîkaya helbestvanî derdikeve meydana ku di vekolîna dîwanê de di vî biwarî de hinek daneyên giring ketin ber destê me. Sofyanî, helbestvanekî kurdîhez e lewra dîwana xwe bi zimanekî dewlemend nivîsiye û zêde tesîra zimanên bîyanî xuya nake. Tê de pirrengîya peyvên ji devokên cuda, peyvên nûjen, ên orjînal, marjînal û kêmbihîstî xuya dibin. Her çend şairî bi kurdîya îroyîn û xwerû nivîsîbe jî ji bo hindê hewcehî hate dîtin ku beşeke ferhengê bê amadekirin.

Her weha li gorî tesbîtên me ji 20î zêdetir hunerên edebî dîwanê de hatine bicihkirin. Ji alîyê teşeyî ve jî giraniya mesnewî û murebbe‘ê li pêş çav e ku li gor texmîna me ji ber bandora Ehmedê Xanî û mesnewîya wî rêjeya mesnewîyan ev qas zêde ye. Ji alîyêkî dî ve, her çend bêhna erûzê ji dîwanê were jî di dîwanê de erûz nehatiye bikaranîn. Bes helbestvan bi taybetî berê xwe daye kêşa kîteyî û 8 qalibên cuda bi kar anîne. Ji alîyê serwa û paşserwayê ve jî dîwan serwa û paşserwayên cudawaz di xwe de dihevine. Ev taybetmendîyê poetîk tev taybetmendîyên giştî yên

¹²⁹ Hevpeyvîn: Mela Remezanê Birîfkanî (10.07.2024).

¹³⁰ Hevpeyvîn: Mela Remezanê Dedaşî (11.07.2024).

bizava helbesta millî ne jî. Lewma divê bê gotin ku Mela Hesenê Sofyanî di nav poetîkaya helbesta millî de cih girtîye.

3.2.3. Dewlemendiya temayan di helbestên Sofyanî de

Her tim xemeke helbestvan/nivîskarî heye heta binivîse. Li dû hindê di tarîxa edebîyatê de babetên cihê bûyîne mijara nivîsînê. Bi taybetî di çarçoveya tarîxa edebîyata Rojhelatê de mijarên dînî û evînî bêhtir xuyayî ne. Di pey vê yekê re babetên civakî jî êdî bûne mijara nivîsînê. Şair li ser temayên cihêwaz dinivîsin ku li gor daneyên ku li jorê di beşa lêkolîna dîwanê de hatin dîtin ku Sofyanî di vî warî de şairekî pirrreng e.

Her wekî me gotî Sofyanî helbestvanekî millî û civakî ye û dîwana wî ji alîyê temayan ve gelek dewlemend e. Ji mijarên ziman, neteweyî, rexneya civakî, bigire heta mijarên wekî cixare, xwarin, geştname, firoşgeh û dikandarî bi tevahî li gor tesbîtên me 16 mijar tê de hene ku ev yek dîwanê gelek taybet dike. Bi taybetî temaya firoşgeh û dikandarîyê temayeke pir orijînal e di Edebîyata Kurdî de.

Her weha dîwan cureyên edebî yên wekî medhiye, pendname, şitaiye û nameyê jî di xwe de dihevin. Di dîwana Sofyanî 16 name hene ku bi nivîsîna 16 nameyan di Edebîyata Kurdî de dibe serkêş. Heta niha Seyîd ‘Elîyê Findikî bi 11 nameyan serkêş bû.¹³¹ Xaleke dîtir jî ew e ku Seydayî hemî helbestên xwe li derve di nav xwezayê de nivîsîne ku ew jî girêdana wî ya bi xweza û welatê wî ve nişan dide.

3.2.4. Hizir û bîr û bawerîyên Sofyanî

Muhîm e bê gotin ku Seyda di bîr û bawerîyên xwe de xwedîyê sekneke mezin e. Li dû întisabê neçûye û xwe girêdayî çî terîqetan nekirîye û li ber destê şêxan nexwendîye. Her paşê li ber destê seydayên xwe perwerde distîne. Wî bi tenê xwestîye li dû hizir û bawerîyên rast û durist biçe û ilm û zanîna belav bike. Li ser vê mijarê Mela Remezanê Birîfkanî dibêje;

Gelek mela wê demê di bin baskê şêxan de bûn lê Seydayî ev tişt qebûl nedikirin
her çend malhezûrên wî axa bin, xwedîgund bin jî, Seydayî çî caran xwe ji wan
re xwar nedikir. Kes bi navê tesewîfê nedixapand. Seyda ji Xwedê ditirsîya, ji

¹³¹ Mesut Arslan, “Nêrîneke Giştî li Nameyên Menzûm di Edebiyata Kurdî (Kurmaci) ya Klasîk de”, *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilgiler Dergisi*, 2023 (11) 3, r. 691-692.

Pêxemberî hes dikir, li şer'a Xwedê xwedî derdiket. Seydayî digot Qur'an, hedîsên Pêxemberî û kitabên 'ulemayên mezin besî me ne, hewce nake em bikevin bin baskê wan.¹³²

Li gor agahîyên ji Mela Remezanê Dedaşî hatin girtin, Sofyanî hêj di destpêkê de dibe xwedîyê fikra ehlî sunetê. Li gor vê em dikarin bibêjin ku Seydayî ji rêberên li ber qeydê heyatê zêdetir ji berhemên alimên ehlê sunnetê sûd wergirtiye.

Seydayî ne xwe ne jî feqîyên xwe hêjayî îcazetê nedîtîye. Li dû vê yekê Seydayî di warê hizrî de bêhtir serê xwe mijarên civakî û millî ve eşandîye. Armanca wî ew bû ku feydeyekê wî bigehe însanîyetê. Di vê biwarê de ji melayên dîtir zêdetir berê xwe daye mijarên millî û civakî. Yek ji muhîmtirîn xalên giring di perwerdeya Sofyanîyê de bê guman çêbûna hizra wî ya neteweyî ye. Sofyanî cara yekem bi rêya Mela Ebdulxefar digehe hinek helbestên millî yên Cegerxwînî û paşê peyderpey bêhtir digehe van helbestan û hizra neteweyî li dor wî ava dibe. Êdî ji berê bêhtir rojeva kurdan dişopîne û dikeve pey rojname û radyoyan, bi taybetî jî şerê Mela Mistefa Barzanî dişopîne. Van tiştan jî wekî sebeba hişyarbûna xwe dibîne. Ev yek wî ji hevalên wî cuda dike ku di wê serdemê de bilêvkirina mijarên bi vî rengî ne rihet bû.

Bi taybetî wê demê seydayên ku li ser mijarên civakî û neteweyî bisekinin kêmbûn. Lê Seyda ne bi tenê bû, bi wî re hevalên wî Mela Emîn, Mela Evdîlqadir û Şêx Mihemed Seyrî komeke melayan a kurdperwer hebû ku ji wan re digotin "melayên qomunîst". Lê di esasê xwe de Seyday Mela Hesenê Sofyanî ne kesekî qomunîst bû, bi tenê wek Ehmedê Xanî haya wî ji hebûna wî, millet û zimanê wî hebû. Di vî warî de feqîyê wî Birîfkanî dibêje;

Ji ziman û welatê xwe hes dikir. Dixwest feqîyên wî li ziman û welatê xwe xwedî derbikevin. Dixwest her millet li gor bawerî û çanda xwe bijî. Ji ber hindê Seyda dihat rexnekirin û navên wekî qomunîstîyê jî lê dihatin kirin.

Her wekî din di serdema feqîtiya wî de alîyê Sofyanî yê hişmendîyê pir derdikeve pêş ku wî ji feqeyên dîtir cuda dike. Di demên vala de wî xwendinên xwebixwe kirine di warê dînî û berhemên kurdî de. Heta dema dibe muderrîs jî car caran dersen berhemên kurdî wekî *Mem û Zîn*, *Mewlûd*, *Rewdî'n-Ne'îmê* dane.

¹³² Hevpeyvîn: Mela Remezanê Birîfkanî (10.07.2024)

Çawa ku me got Sofyanî seydayekî hizirmend û dijberêkî zordestîyê ye û neheqîyê qebûl neke, vê yekê xwe di têkilîyên wî yên rojane de jî daye der. Mela Remezanê Dedaşî behsa edaleta wî bi vî şiklê dike;

Seyda bi piçûkan re piçûk bi mezinan re mezin bû, cudatîyên wî ji seydalerên dî pir bûn. Dema ez çûyîm cihekê din ew teqwatîya wî ku mînak bû ji hevalan re, me li cihek dî nedît. Li cem Seydayî feqîr û zengîn eynî bûn, heta qasî qedrê feqîran digirt ew qas qedrê zengînan nedigirt. Ji feqîyên xwe re hem heval bû hem seyda bû hem bav bû, bi me re dihat çolê, bi me re dileyîst, yanî çi alîyê wî ku ez seyda me li cem seydayê Mela Hesen nebû.

Li ser vê mijarê birayê wî Ehmed Kanî radigehîne ku Seyda kesekî hem nefşpiçûk bû hem mafparêz bû. Kesekî kurdperwer û dînparêz bû. Pir serxewt bû li ser mafên civakî di çarçoveya dînê de. Di derdorê xwe yê melayan de zêde dihat heskirinê. Digot dîn bi tenê ne îbadet e, dîn di heman demê de birêvebirina civakê ye. Xezûrê Seydayî keyayê gundî bû, piranî axa gundî di destê wî de bû. Li hember xezûrê xwe mafê gundîyên bêax diparast. Seydayî digot “Şorbeya xelkê xwe nadim bi goştê mala zengînan.” Tim hêla dînî ya civakî derdixist pêş. Gelek ayet û hedîsên ku parve dikir di jîyana xwe de, dianî cîh. Di hêla bawerî û fikir û îdeolojîyê de kurdperwer û mafparêz bû. Çi qas şertên dînî derbixista pêş, ew qas şertên dînî yên alîyê civakî jî derdixist pêş.¹³³

Ji alîyê kesayeta Seydayî ve feqîyê wî yê berê Mela Remezanê Birîfkanî çend agahîyên giring dide. Ew bi taybetî balê dikêşe ser adîlbûna wî. Li gor wî Seyda yekî edaletxwaz û dadxwaz bû. Her dixwest feqîyên wî jî xwedî edalet û dadîyê bin. Seydayî stûyê xwe ji kesê re nedidanî, ne ji zengînan re, ne ji zaliman re. Wî ji kesekê tiştek nedixwest.

Mela Remezanê Dedaşî li ser vî alîyê wî serpêhatîyeke xwe weha tîne zimên;

Em carekê roja êvara îne feqî hemî, Seyda jî bi me re ye, çûne baxçeyê Seyda firingîyan. Sebîyekî Seydayî bi wî re bû, navê wî Mistefa bû, 6-7 salî bû. Seyda bi me re sohbetê dike, min dît firingîyek jê kir. Kêra xwe derxist û ev firingî tam di nîvekê re kir du qet, yek ji yekê mezintir nebû. Li ber çavê me tevan min dî nîşanî lawê xwe da gotê lawê min ji xwe re kîjanê bixwazî hilîne. Gotê baba te her du qasî hev jê kirine, ka piçûk mezin tune. Gotê lawê min jixwe ji bo ku tu têkevî wê ferqê min ev kir. Got, di heq û hiqûqê de tiştek wisa tune ji ber ku bav im tu law î para te zêde be. Wexta kete heq û hiqûq em ne li alê hev in, em wekhev in.

¹³³ Hevpeyvîn: Ehmed Kanî (13.07.2024).

Seydayê Mela Remezanê Can jî bi taybetî balê dikêşe ser alîyê Seydayî yê dadî ku gelek biedalet bû ji bo feqîyan û cudahî nedixist navbera wan. Bo nimûne feqîyek bigihîşt a kitabên jorê Seyda bi wan dor nedida kirin û ew nedişandin tayînan. Lêbelê wan jî xizmet berdewam dikirin, feqî giş weka hev bûn. Seyda bi feqîyên xwe re diçû tayîn dianî û li gişan wek hevûdu belav dikir, ne kêr ne zêde. Dema Seyda diçû mêhvandarîyê, carekê feqîyek bi xwe re biriba careke dîtir feqîyekê dîtir dibir. Bang û qamet û nimêj û carinan xutbe jî li feqîyên bi awayekî edaletî dida kirine û ew teşwîq dikirin ku tirs a wan bişkê.¹³⁴

Hate dît in ku Sofyanî bi ruhê neteweyî bi xêza edaletxwazîyê -ku di hevpeyvînan de bi taybetî feqîyên wî behsa edaletê wî kirin- bi şîretan gelê xwe ji xwe re kirîye armanca hînîkirin û pêşxistinê. Di encamê de Mela Hesenê Sofyanî helbestvanekî taybet ê serdema xwe ye ku diwana wî bi taybetî ji alîyê temayan ve gelek dewlemend e, bi zimanê xwe gelek xurt e û bi hunerên edebî, teşe, kêş, serwa û paşserwayên xwe ve jî diwaneke orjînal e. Di heypeyvînan de bi taybetî hate zanîn ku taybetmendîyên sereke yê Mela Hesenê Sofyanî dadîya wî, ruhê wî yê ji bo zanîna birçî, meyla wî ya li ser kurdî û agahîyên derbarê hejarîya serdemê de wekî deskeftîyên mijarê hatine tesbîtkirin.

¹³⁴ Heypeyvîn: Mela Remezan Can (11.07.2024).

4. METNA REXNEYÎ YA DÎWANA SOFYANÎ

Di vê pişkê de danasîna nusxeya dîwanê hatîye kirin, rêbaza amadekirina metina dîwanê û metina rexneyî ya dîwanê hatîye dayîn.

4.1. Danasîna Dîwanê û Nusxeyên Wê

Di vê binepişkê de derbarê ew helbestên hatîne weşandin û nusxeya eslî ya dîwanê de vekolîna wan hatîye kirin.

4.1.1. Helbestên hatîne weşandin

Her çend Sofyanî dîwana xwe nedabe weşandin jî car caran hinek helbestên xwe di Nûbiharê de dane weşandin. Pêdivî ye bê gotin ku ji dîwana Sofyanî 8 helbest li ser navê *Seyda Dilkanî* ku Dilkanî mexlesa wî ye di Nûbiharê de hatine weşandin. Helbestên hatina weşandin li gel kunyeya wan weha ne¹³⁵:

4.1.1.1. Seydayê Mela Yehya

Sofyanî ev helbesta xwe bi tîpên latînî li Stenbolê di Nûbiharê de weşandiye di sala 1994an de di hejmara 16an de, di rûpela 19an de. Her çend di dîwanê de mexlesa *Sofyanî* hebe jî di Nûbiharê bi mexlesa *Dilkanî* hatîye weşandin.¹³⁶

4.1.1.2. Hela Rabe

Sofyanî ev helbesta xwe bi tîpên latînî li Stenbolê di Nûbiharê de weşandiye di sala 1994an de di hejmara 20an de, di rûpela 17an de. Her çend di dîwanê de mexlesa *Sofyanî* hebe jî di Nûbiharê bi mexlesa *Dilkanî* hatîye weşandin. Li ser daxwaza Seydayî me cih nedaye vê xebatê di xebata xwe de.¹³⁷

¹³⁵ Em spasîya mamoste Hayrullah Acarî dikin ku bi xêra wî haya me ji hinek van helbestên weşandi çêbû.

¹³⁶ Yusuf Turan, “Îndeksa Kovara Nûbiharê (Cild I-XII)”, *Zanîngeha Mardin Artuklu* (Teza Neweşandî ya Lîsansa Bilind), 2018, r. 35.

¹³⁷ Yusuf Tekin, h.b, r. 37.

4.1.1.3. *Melayê Qurişa*

Sofyanî ev helbesta xwe bi tîpên latînî li Stenbolê di Nûbiharê de weşandiye di sala 1995an de di hejmara 34-35an de, di rûpela 42an de. Ecêb e ku ev helbest hemî nehatîye weşandin ku di dîwanê de murebbe‘ek e û ji 22 bendan pêk tê, bes di Nûbiharê de bi tenê heşt bendên dawîyê hatine weşandin. Her çend di dîwanê de mexlesa *Sofyanî* hebe jî di Nûbiharê bi mexlesa *Dilkanî* hatîye weşandin. Di dîwanê de ev helbest bêserenav e bes di Nûbiharê bi serenavê *Melayê Qurişa* hatîye weşandin. Li ser daxwaza Seydayî me cih nedaye vê xebatê di xebata xwe de.¹³⁸

4.1.1.4. *Çengek Tişt*

Sofyanî ev helbesta xwe bi tîpên latînî li Stenbolê di Nûbiharê de weşandiye di sala 1995an de di hejmara 34-35an de, di rûpela 43-44an de. Di dîwanê de ev helbest bêserenav e bes di Nûbiharê bi serenavê *Çengek Tişt* hatîye weşandin. Her çend di dîwanê de mexlesa *Sofyanî* hebe jî di Nûbiharê bi mexlesa *Dilkanî* hatîye weşandin.¹³⁹

4.1.1.5. *Ji Bo We*

Sofyanî ev helbesta xwe bi tîpên latînî li Stenbolê di Nûbiharê de weşandiye di sala 1996an de di hejmara 47an de, di rûpela 6an de. Di dîwanê de ev helbest bêserenav e bes di Nûbiharê bi serenavê *Ji Bo We* hatîye weşandin. Her çend di dîwanê de mexlesa *Sofyanî* hebe jî di Nûbiharê bi mexlesa *Dilkanî* hatîye weşandin.¹⁴⁰

4.1.1.6. *Geşta Serhedê*

Sofyanî ev helbesta xwe bi tîpên latînî li Stenbolê di Nûbiharê de weşandiye di sala 2008an de di hejmara 104an de, di rûpela 54-57an de. Her çend di dîwanê de mexlesa *Sofyanî* hebe jî di Nûbiharê bi mexlesa *Dilkanî* hatîye weşandin. Latînzeya wê ji alîyê M. Êhsan Hêvîdar ve hatîye kirin.¹⁴¹

¹³⁸ Yusuf Tekin, h.b, r. 45.

¹³⁹ Yusuf Tekin, h.b, r. 45.

¹⁴⁰ Yusuf Tekin, h.b, r. 50.

¹⁴¹ Yusuf Tekin, h.b, r. 80.

4.1.1.7. *Derbarê Cixareyê de*

Sofyanî ev helbesta xwe bi tîpên latînî li Stenbolê di Nûbiharê de weşandiye di sala 2009an de di hejmara 107an de, di rûpela 39an de. Di dîwanê de ev helbest bêserenav e bes di Nûbiharê bi serenavê *Derbarê Cixareyê de* hatiye weşandin. Her çend di dîwanê de mexlesa *Sofyanî* hebe jî di Nûbiharê bi mexlesa *Dilkanî* hatiye weşandin.¹⁴²

4.1.1.8. *Pesnê Pêşkêşê Mezin Barzanî*

Sofyanî ev helbesta xwe bi tîpên latînî li Stenbolê di Nûbiharê de weşandiye di sala 2020an de di hejmara 152an de, di rûpela 85an de. Li ser daxwaza Seydayî me cih nedaye vê xebatê di xebata xwe de. Her çend di dîwanê de mexlesa *Sofyanî* hebe jî di Nûbiharê bi mexlesa *Dilkanî* hatiye weşandin.¹⁴³

4.1.2. Nusxeyên dîwanê

Bi tenê nusxeyeke Dîwana Mela Hesenê Sofyanî heye, ew jî li def seydayî bi xwe ye. Di dema amadekirina vê lekolînê de emanetî me kiribû. Kâtibê wê seyda bi xwe ye. Li gor vê ev nusxe dibe nusxeya muellifî ku nusxeyên weha biqîmettirîn nusxe ne.

4.1.2.1. Teswîfa nusxeyê

Navê berhemê: Dîwana Mela Hesenê Sofyanî.

Navê helbestvanî: Mela Hesenê Sofyanî.

Te'lîf, Tercume, Şerh: Te'lîf.

Mustensîx: Mela Hesenê Sofyanî.

Dîroka îstîsaxê: Ji sala 1974an heta 2020an.

Cihê îstîsaxê: Farqîn û Amed.

Awayê nusxeyê: Destxet.

¹⁴² Mahsum Tûrkan, “Îndeksa Kovara Nûbiharê (Cîld XIII-XXIV)”, *Zanîngeha Mardin Artuklu* (Teza Neweşandî ya Lîsansa Bilind), 2021, r. 20.

¹⁴³ Mahsum Tûrkan, h.b, r. 61.

Orîjînal, Fotokopî: Orîjînal.

Zimanê nusxeyê: Kurdî (kurmancî).

Serbixwe - Mecmû‘e: Serbixwe.

Menzûm – mensûr: Menzûm.

Cureya xetê: Şexsî.

Hereke: Heye.

Besmele: Heye (bi kurmancî ye).

Serenavên helbestan: Di hinekan de heye.

Hejmara helbestan: Nîne

Hejmara rûpelan: Heye (bi erebî ye).

Pîvana rûpelan: Deftera A5

Destpêka berhemê:

Birayê kurdî çavê xwe veke
Bixwûne tarîx, razanê meke

Dawîya berhemê:

Li ser resûlê Xweda tev al û eshabê wî
Selat û salamên gur her bibarin bêdawî

Mustensixê vê nusxeyê Mela Hesenê Sofyanî ye. Her wekî me dîyar kirî şair sax e û niha li mala xwe ya li Dîyarbekirê dijît. Nusxeya hatî lêkolînkirin nusxeyeke orîjînal e bi destê şairî bi xwe hatîye nivîsîn. Di nav defterekî de hatîye nivîsîn, rengê defterê pinîpinîkên reş û helesor e. Defter ji her du alîyên xwe ve hatîye naylonkirin, da neperite. Teqrîbî mezinahîya wê A5 e. Di destpêkê de 6 û di dawîyê de 5 per vala ne. Helbest, ji perê 7em bi hejmara “1”em dest pê dîke. Di her perî de 22 xêzikên berwarkî hene. Carinan per veqetîyaye du beşan û beyt li ber kêla hev hatine rêzkirin ku di van rewşan de exleb 20 beyt hatine terxankirin. Carinan jî beyt ku li binê hev hatine rêzkirin ku di vê rewşê de kêmtir riste hatine terxankirin. Li dora peran cetwel nehatîye kişandin. Li jora helbesta pêşîkê wekî serlewhe bi kurdî besmele anîye bi vî şiklî “Bi navê Xweda”. Di nusxeyê de 76 helbest hene.

4.2. Rêbaza Amadekirina Metina Dîwanê

Di dema nivîsîn û amadekirina vê xebatê de me serî li çend rê û rêbzan da, taybet di wexta latînîzekirina dîwanê de. Di destpêkê de me nusxeya orîjînal da ber xwe û bi awayekî spontane me latînîzeyê wê derêxist. Piştî taybet bi hûrgilî çendîn caran li gel şêwirmendê xwe me ev latînîze yek bi yek li ber nusxeya eslî kontrol kir û çendîn caran em pê de çûn. Di vî biwarî de serperîştê vê xebatê rêber û harîkar bû. Peyvên nadihatine xwendinê jî rasterast me ji melayî dipirsî û em fêr dibûn. Carekî jî ji serî heta binî li gel Mela Hesenê Sofyanî me metina latînîze û ya orîjînal bi rengê edîsyon krîtîkê xwend û me kêmasîyên xwe rast kirin.

- Ji bo latînîzeyê me serî li herfên navneteweyî da ji bo deng û telaffuz û wateya peyv û gotinê rasttir û çaktir bête famkirin. Bi gotineke dî, me di metna dîwanê da alfabeya navneteweyî ya transkrîpsîyonê bi kar anî.

Alfabeya nawnetewî ya transkrîpsîyonê:

ث	:	s	S
ح	:	h	H
ذ	:	z	Z
ص	:	ş	Ş
ض	:	ḏ, z	Ḍ, Ž
ط	:	ṭ	Ṭ
ظ	:	ẓ	Ẓ
ع	:	‘	‘
غ	:	ḡ	Ḡ
ء	:	,	,

Apastrops : `

- Tu peyv û îzafeyên di dîwanê de li gorî zimanê îroyîn nehatine standartkirin. Peyv û îzafeyên di dîwanê de çawa hatibin bikaranîn, em wesa pê sadiq mane. Wek nimûne:

Gelo nayê wê buhara tev de gul
 Li ber gulê çin de bixwûne bilbil
 Paqij bike ji **murovan** êşa dil
 Sivik bike li **murovan** barê mil
 Zivistan e zivistanek giran e.
 Berf dibare li ser serê însan e (18/6)

Wekî di mînaka jorê de xuyayî ji ber ku di nusxeyê de “murov” hatibû nivîsîn, me dest nedayê û me nekir “mirov”. Gelek mînakên bi vî rengî hene.

- Me hemû helbest li gorî tertîbkirina metna nusxeyê bi hejmar kirin. Dîsa Me li pêşîya hemû malik û bendên helbestan hejmar danî da ku di analîzkirina helbestan de gengeşî dernekevin holê.

Bo nimûne di beyta jêrîn de reqema pêşî (13) ya helbestê, ya duduyê jî (7) ya malikê îşaret dike.

Dilê min jar û birîn e
 Bê rawestî qîr û şîn e
 Di çavan da xwûnê tîne
 Hê bi ser ve ol jî tune (13/7)

- Di çend cihan de ji ber kêmasîya kîteyî li gor wateya helbestê me guherîn an jî lêzêdekirinên piçûk kirin û ew guherîn me di nav kevaneka goşeyî de nişan da, wek nimûne:

Şerbeta min jehra mar e
 Saqiyê wê bilê yar e
 Min ji ber qîr û hewar e
 Kes **[li]** hewara min tune (13/2)

- Di risteyên di beyt/bendan de hatine dubarekirin anku di helbestên mutekkerrir de risteyên dubare bi **bold** hatine nivîsîn, wekî:

Avê li ser şinahîyê
 Ji rojhelat ro didiyê
 Dibirise dur dixûyê
Xweş bihara Kurdistanê (1/15)

Wek di nimûneya jorê de jî xuyayî, di vê helbesta heşt kîteyî de risteya duyem heft kîte bû. Lewra me bi însîyatîfa xwe gihaneka “û”yê tê de bi cih kir û bi haydarbûna xirabnebûna wateya helbestê.

- Hinek bêje ji bo kêşa helbestê xera nebe kurt hatine nivîsîn. Me jî ev kurtkirina peyvan bi apostropsê (‘) nîşan da. Bo nimûne:

Pir xweş gotine êşa l' hevala
Bav û bapîra tîra l' kendala (8/70)

- Di alfabeya Kurdî-Erebî ya klasîk de tîpa “ê” hem dengê “û” hem jî dengê “o”yê dide. Me li gor konteksa peyvê yek jê hîlbijart. Dîsa tîpa “û”yê di cihan de dengê “î”yê di cihan de jî dengê “ê”yê dide. Me di vê herfê de jî li gorî konteksa ku hatîye bikaranîn yek jê hîlbijart.
- Ayet û hedîsên di metnê de derbas dibûn, me wan di metnê de bi awayê îtalîk nivîsî û di jêrenotan de vegotina wan kir.
- Çi di peyvên erebî, çi di yên kurdî de îşareta şeddeyê li ku hebe, me ew bi dubarekirina heman tîpê nîşan da. Me li gorî pêwistîya helbestê ew peyv bi dengên dubare nîşan da: Heqqî, Te'llum, Şettû'l-'Ereb, Heccûl ekber, şeddeq...
- Me peyv û hevokên erebî di nava metnê de bi îtalîk da û di jêrenotan de jî maneya wan bi Kurdî da.

Qelbê wî jî 'j devê wî ra şedeqte
Dê bibêje *we bîl heqqî neşeqte* (26/21)

- Di risteyan de gelek caran xalbendî hatibû bikaranîn wekî (bêhnok, xal, duxal, sêxal, xalebêhnok, remza pîrse, baneşan...). Ji bilî hinek cihên îhtîmala xerabbûna wateyê heyî hema bêje hemî jî me jê birin.
- Me serê her misrayê û serê her nav û nîşanên taybet bi tîpên mezin nîşan da: Kardoxoy, Gutî, Kaşî, Xarpût, Serhed, Dehak...
- Di terkîb, îzafe û sîfetên erebî de li şûna hemzeyê herfa te'rîf (') û di nava herfa te'rîfe û peyva duyem de jî xêzeke kurt (-) bi kar anî. Bo nimûne: Şettû'l-'Ereb...
- Helbestvanî di destpêka hemî helbestan de tarîxa nivîsîna helbestan nivîsîbû. Bes ji ber ku di qismê latînîzekirina wê de xweş xuya nedikir, me ev tarîx birin li binê helbestan bi cih kirin.
- Helbestvanî di dîwana xwe de wateya hindek peyvan dabû bi şewaza haşîyeyê. Me jî bi heman şiklî bêtê desttewerdan di jêrenotê de cîbicî kirin.
- Piştî dîwan ketî destê me, hinek peyvên taybet û kêmnas me di dîwanê de dîtin. Me wateya wan ji Seydayî pîrsî û me ew jî di jêrenotê de cîbicî kirin.
- Me mexlesên helbestvanî îtalîk nîşan dan: *Sofyanî, Dilkanî*.

4.3. Metina Rexneyî ya Dîwanê

1

Bi Navê Xweda

Xweş Bihara Kurdistanê

1. Hêja ne bên pesindanê
Her demsalên Kurdistanê
Bi taybetîya vejanê
Xweş bihara Kurdistanê
2. Zemîn dibe mêrg û çîman
Çivîk dibin pêk ve hozan
Adar û avrêl û gulan
Xweş bihara Kurdistanê
3. Rûyê zemîn radixîne
Bi kulîlkan dixemlîne
Dilê bikul dimalîne
Xweş bihara Kurdistanê
4. Bes li dora xwe binêrî
Neşî kulîlkan jimêrî
Pirî pir in tê d'heyîr î
Xweş bihara Kurdistanê
5. Bayê nermîn bûk û zava
Bihejîne pêşber ava
Kul û keser derin ava
Xweş bihara Kurdistanê
6. Ger 'endekoyê bêhn bikî
Bi biskê dildarê vekî
Kula ji dil paqij dikî
Xweş bihara Kurdistanê
7. Ger gihîjî nav nêrgiza
Dî gel yarê b' lezûbeza
Ji bîr dikî hemû siza
Xweş bihara Kurdistanê
8. Sosin û beybûnê delal
Li dêmê yarê bidne pal
Dil pê dibe şad û zelal
Xweş bihara Kurdistanê
9. Yara te hevalê te be
Kesknefelê geşta te be
Dibe gelo derdek hebe?
Xweş bihara Kurdistanê

10. Ji vî xweştir bo min nabe
Mil li milê dilber şa be
Geşt a te l' kesk û ava be
Xweş bihara Kurdistanê

11. Eger تنها herî derve
Çi bi rojê çi bi şev e
Dengê saza j' hev nakeve
Xweş bihara Kurdistanê

12. Hinek jîndar qanûnvan in
Hinek din jî tembûrvan in
Hin bilûr û zirnevan in
Xweş bihara Kurdistanê

13. Hela dengê berx û mîyê
Têk hev dibin nîk dangîyê
Şêrîntir in j' nay û neyê
Xweş bihara Kurdistanê

14. Jinên paqij keçên delal
Qefle qefle dibin heval
Bêrî dîkin şîr tînin mal
Xweş bihara Kurdistanê

15. Avê li ser şînahîyê
Ji rojhelat ro didîyê
Dibirise dur dixûyê
Xweş bihara Kurdistanê

16. Divê her kes pesin bide
Radyo timî salix bide
Televîzyon nîşan bide
Xweş bihara Kurdistanê

17. Di navîna Rojhelatê
Swîsreya Awrûpa tê
Bi xwedî ba vî welatê
Xweş bihara Kurdistanê

18. *Şofyanî* rast e wisa ye
Niştîmanek bêbiha ye
Lê zû da bêxwedî maye
Xweş bihara Kurdistanê
(Cotan (Nîsan, 1979))

Li Ser Rewşa Xizanan

1. Herê bira herê bira ez çi bêjim
Ji girîna van xizana ker û gêj im
Tim û timî derd û kulên wan diwêjim
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
2. Geh li vir in geh li wir in bêhiş mane
Herin kê der pelçiqandin para wan e
Berîk vala karê wan timî xweydan e
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
3. Li gunda be ji axa re kerê jar e
Li bajara tewer jiyan mezin bar e
Here kê der ji cîhanê ew bêpar e
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
4. Li gunda bo çenga axê barebar e
Li serê wî axa timî karekar e
Ferman bikim mala te l' kerê siwar e
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
5. Xizanê me bi şekalê li rê kar e
Axê bêdad li mersedesê siwar e
Xwedî ax e, gundî koçerê bêwar e
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
6. Ji naçarî malê digre, dere bajar
Zar û zêçan davê şikeftê dere kar
Wî kar nîne gerê pê ve heta êvar
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
7. Berîk vala ber bi malê gava dere
Wekî teyrê perşikestî bédil dere
Ji dil zane, bigê malê vebir şer e
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
8. Dere malê jin û biçûk ponjandî ne
Di malê da bilî avê tiştek nîne
Dibên bavo te çi anî? Em birçî ne
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
9. Diponije, jê va havilek naxuyê
Tê heşê wî dê dest bavêje dizîyê
Çi b'ke reben kî dikêşe birçîtîyê
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
10. Li qehwê ye bi ro w heya şev pir dere
Qumarbaz û di şevê da meyvexwer e
Dibe tarî di kuçan da birebir e
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim

11. Gelek pîs e: Ev hawê ha bêdadî ye
Zikê axa w birjiwazî nepxandî ye
Zikguvaştin para karker û gundî ye
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
12. Ne tu rewş e, bi her kesî reş û tal e
Bilê beşa me ji b' zengar ji hiş vale
Bilî xwexwaz, yê wî her cejn û sersal e
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim
13. Bike bawer têdigîjim *Şofyanî* me
Bo reben û perîşanan ez mirî me
Ne îro ye b' gelê xwe ve bêxwedî me
Peritûm ez ji hinavê xwîn dirêjim

(Pîşper (Hêzîra) 1979)



1. Ax birê min me ceşş pir in pirên wan jî nîvmela
Bûye perde li ser mêjî zingara êş û bela
2. Em ji wî her bêhêvî ne gûza pûç e bêsûd e
Welê xwezî bihewîya, davême kevr û şela
3. Hinê dinê bi nav şêx in, mêjokeyên welat in
Hevalbendê maldaran e, xizan dane ber tela
4. Wî cî nerm e xwarin goşt e, berîk tije kî tê bîr
Li kêfa xwe her dinêre, kî dimre bimre bila
5. Peyçûyên wî tev bale ne, wekî keran bêmejî
Dibê şêxê Rebbanî ye, çi şêx e mala dila
6. Pê nizane gurê mal e, melay wî jê çêtir e
Bil xwarinê ka şêx çid'ke? De zû ke bêje hela
7. Birê kurdî bes bixape ev çi li te hatiye?
Qey rebenî para te ye, li rû dinê nav gela?
8. Çavê xwe hinkê miz bide, pilişkan paqij bike
Li dora xwe çê binêre ji xwe rake van kula
9. Ê ko bêje ewha xweş e ew bi te ra xayîn e
Neyarê tey mezin ew e jê ra nebê Maşela
10. Gelo heye kurd reha be ji sîtema neyara
Ew jî bijî wek mirovan deyne wî barê mila
11. *Şofyanî* her hêvîdar e azadîya wan nêz e
Çi pir, hindik şiyar bûne ceşşa dibin mezela

(Cutan(nîsan) 1980)

1. Em helîyan qedîyan
Em bûne post û estî
Em ji hiş çûn xemîyan
Lê her geş e zordestî
2. Evî gelê belengaz
Aya lê nifir bûye
Li ser serê teyrê baz
Li hawîrdor bend bûye
3. Wekî kewa di berfê
Hêlvani l' ser piştê ne
Cihê bûye ji refê
Kûçk û tajî li pê ne
4. Li ku dinêre tije
Çi diyar û çi newal
Bi hesret çenga mij e
Bêxwedî û bêheval
5. Heta ku ew nebin yek
Bi rast û çep de baz din
Dê bihelin wekî lek
Pir serîyan bi dar din
6. Divê bibin yek qorek
Xwenda û nexwenda tev
Honandiyê yek porek
Xweş bimeşin li dû hev
7. Divê bîr û bawerî
Tev lî xwîna teva be
Çi gundî çi bajarî
Vêkra nebin qe nabe
8. Gelek şedşal bihorîn
Evî gelê nebû yek
Dîsa kulêm tewirîn
Gazî dikim ji felek
9. Çira ew qas bêdad î
Hevalê zordaran î
Mafê kesî tu nadî
Li dijî bêçaran î
10. Ger bireve Pehlewî
Cî da Xumeynî tînî
Bişewite mala wî
Lê dixê şed pihînî

11. Somoza çû w Boqasa
Li pey wan Îdeamîn
Li wan dane misasa
Venegerin bê amîn

12. Tirsim dîsa tu bînî
Ji nû ve hind zordara
Lewra tu pir bikîn î
Li hejar û bêçara

13. *Şofyanî* tu bes bêje
Rast e felek dijwar e
Lê nêz e ro bavêje
Pey ziftanê buhar e

(Meha dozdan: Berçile/yan Berfanbar 1980)

1. Heta kengê em wuha bin, dû heval û perîşan
Li dijê hev bidexesî, bêzanîn û tev xizan?
2. Heta wuha em dexes bin, di nav me da berberî
Tûrê parsê dê li mil bin, gerokê ber derîyan
3. Her bêerc û lavakar bin çav li derî, xwelî l' ser
Li ser axê dê vezelin mitêla ser me esman
4. Serbilindî ger dixwazî hevalbendî eger e
Yan na tu xwebixwekir î ji bo te nîne derman
5. Ger nebêjî dora min e kesek dorê nade te
Gava darê xwe hejîni "rast e" dê bêje aşvan
6. Evê benda dijîtiyê hîmê wê ye nezanî
Bilê bumba zanatîyê, ker ker nake béguman
7. Heta ku ew tenejîjîn ev sîtema tê dijîn
Dê her bêjin ji te ra çi, tê bibî rûşê wan
8. Hê nîzane şelandî ye ji mafê xwey netewî
Pal vedaye hay lê nîne mala wî kirne talan
9. Dema ko ew baş bizane diz ketine mala wî
Bawer nakim ew bitirse gule wernê wek baran
10. Gava dengê zarezarê ji gelê wî werêkê
Dasî bêtin di çav wî de bimba û renc û zindan
11. Birê hêja êşên li kurd ne şêrpence w sîroz in
Hinek êşên netewxur in xîdartinê êşan
12. Nexwendin û çavnebarî ya sisêyan xizanî
Têkil xwûna rehî bûne malê lê kirne wêran
13. Gelo heye royek were bibin xwenda û devek
Destê wan bê ber devê wan biqewrînin dijminan
14. Di wê royê ger mirî bim di bin axê rizandî
Hê ji nû ve dê xweş bibim, gora min bexçê gulan
15. *Şofyanî* tu bawer bike, bê tatêl û etîr be
Dê gelê te azad bibe kengê hebe bê guman

(Cotan Nîsan. 1981)

1. Zivistan e, ne ardû ye ne nan e
Tim sahî ye çi keçîka esman e
Çem qerimîn qeşa avêt aşane
Gelo çi bû? Nalenala însan e!
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e
2. Zivistan e tev bahoz û bager e
Em qefilîn av û ax bûye ber e
Rê nemane meriv jê nake der e
Bayê bakur wekî şûr û xencer e
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e
3. Gelo çawa avê me tev qerisîn.
Bûne qeşa vizik li ser reqisîn
Gul û kulîlk tev bi hev ra çilmisîn
Pelê dara hilweşîn û melisîn
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e
4. Biçûk digrîn dibên bavo em mirin
Herin bajêr ji me ra nan bikirin
Ya me têr kin ya serê me bibirin
Li me negrin em ne dar û kevir in
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e
5. Zivistan e du kanûn û du çile
Bêsalix e barê giran li mil e
Jana zirav êşa giran li dil e
Meha paşîn reşemeh tev da kul e
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e
6. Gelo nayê wê buhara tev de gul
Li ber gulê çin de bixwûne bilbil
Paqij bike ji murovan êşa dil
Sivik bike li murovan barê mil
Zivistan e zivistanek giran e.
Berf dibare li ser serê însan e
7. Aya kengê em dê derên buharê
Ceşnê bikin Bîst û Yekê Adarê
Gula bêhn kin ji ber biskê dildarê
Vêkra gerin ji sibê ta êvarê
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e

8. Xwezî bata wê bihara şox û şeng
Firîşteyan qîr lê kira bida deng
Têkil hev ba wan kulîlkên rengareng
Heval dana gul û nêrgizên çeleng
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e
9. Buhar xweş e rast dibêjî *Şofyanî*
Ew e armanc ji bo hemû însanî
Dagir kirin ewan hinê tu zanî
Tê nehiştin para jar û xizanî
Zivistan e zivistanek giran e
Berf dibare li ser serê însan e

(Çîle, Miha Yekan. 1983)



1. Melayek kurd im, melayek kurd im
Hevalê jar im bi xem û derd im
Bi şola pîne bi cilê qerpol
Bi zikê birçî serî bilind im
2. Ez dûrê şêx im, kesê nakim xew
Li dijî axa zulmê nakim tew
Timî evîndar ji bo rastîyê
Di gel bindesta, dibêm nebin kew
3. Reh û rîşala berda dilê min
Dara rastîyê sîh da jorê min
Li bin wê sîyê serxweş û mest im
Ji min cuda kir 'eqî û hişê min
4. Di rexê wê da dara azadî
Çavê min pê ket êdî xwe nedî
Negote çav e negote serî
Ji bo wan baz dam bûme bêxwedî
5. Niha çi bêjim bê'eqî û hiş im
Li pey her duwan her dem dimeşim
Bilê her duwan min tiştê navê
Ji hinkatirê bi çi serxweş im
6. Timî dinalim ax û wekhevî
Xizan tê ba min axa direvî
Bi şonda giran em tev bira ne
Tu qey mirov î; em hirçê devî?
7. Herê birano ez birîndar im
Bi dû birînan gelek dîzarim
Bi tîra neyar bi şûrê xulam
Bi şûrê xulam bêtir bikarim
8. Neyar li ser me lêbelê dûr e
Xulam li ber me bi destî şûr e
Li ser serê me şûr dihejîne
Li ber goma pez wî zorezor e
9. Neyar dinasim gelek xîdar e
Bi şev ranazê her dem şîyar e
Lê baş dizanim zewala darê
Bê şek û guman ji kurmê dar e
10. Guhê nezana şêx girt û bada
Axa mil dayê derîya rada
Mela suwar bû li hespê tazî
Bê gem û hefsar dide tirada
11. Benikê defê l' milê mela ye
Gumîna gopal bi dest axa ye
Nezan birçî ye ji kê ra derd e
Daweta şêx e hela hela ye

12. Divê tu carî dest nedî axa
Nebî nêçîrvan ji bona şêxa
Rastîyê bêjî wekî Qur'anê
Herî zindanê bi renc û daşa
13. Tu qey nizanî Mûsayê 'Îmran
Noqê derya kir Fir'ewn û Haman
Ji bo ko rake nîrê sîtemê
Qarûnî com kir di gel mal û can
14. Birayê mela eger mela yî
Di nava gel de wek Enbîya yî
Ji cem xwe nabêm Pêxemberî go
Warîşê wan ê rêya Xuda yî
15. Pêşeng û rêber bo sîtembar î
Serî bilind kî rû sîtemkarî
Vedî kozika li ser rêya wî
Gul û rîhanê bidî hejarî
16. Hingê mela yî dilê *Şofyanî*
Ji bo na jara tu şoreşvan î
Ji bo Xudayî axa b' xulam î
Pir birûmet î şêrê Yezdan î

(Çile Miha yekan 1983)

1. Kete dilê min ez hinek bêjim
Kulê di dil da piçek birêjim
2. Halê însana bînim ber çava
Tevgerê tê de her dem û gava
3. Gazina nekî gava binalim
Lewre bi we re e' jî heval im
4. Tiştê ez bêjim tê pişikdar im
Ji vî teb'ê me e' jî bipar im
5. Gelek xerîb e evî insanê
Hat afirandin bi rengê hanê
6. Ji her jîndarî ew xweşiktir e
Di ser teva ra bêper difire
7. Li vir navrojê Cenewre şivê
Baskê wî sê ne gihaşte hîvê
8. Dê pir bifire bi jor ve here
Ne hîvê tenê dê pir bigere
9. Di valahîyê peya meşîya
Qe nate xwarê bi meha jîya
10. Vê erça hanê tevakî seh kir
Jor û jêrê wê wê û li ba kir
11. Evya kevir e evya çiya ye
Li ber çavê wî wekî hewa ye
12. Linga radide li mal rûdinê
Dema bixwaze guh dide dine
13. Ma deng tenê ye lo malik ava
Xweş û mirîyan tîne ber çava
14. Noqê derya bû buhustek nehişt
Kûrîya vîya bê guman gihîşt
15. Ew ne maşî ye, bi 'eqî sipart
Gelekî dûr çû ji maşî buhart
16. Herê di hêzê rast e wuşa ye
Pir pêş ve çûye, ji xwa çewa ye
17. Ax birê hêja cergê min kewand
Derd û kulê min dîsa tewirand
18. Gelek mixabin ji hev pir dûr in
Di ber gora hev tu car naborin

19. Bo hev neyar in bikîn û tol in
Ji hevûdu ra gorê dikolin
20. Ne biratî ye ne wekhevî ye
Xema kes nîne vîya birçî ye
21. Milyon dolara çeka dikirin
Bi şedhezara birçî dimirin
22. Ji bêxwedîtî biçûkên dinê
Rojê b' hezaran derin mirinê
23. Karê wan ew e çekê nû derxin
Mirov di çav wan golik û berx in
24. Li wan biçewtî dikî gazînê
Çeka çêdikin ji bo kuştinê
25. Bêçek bimirin ji wan re baş e
Mirina wuha bo wan belaş e
26. Ji xwe kînga be evan mirovan
Dê bidin agir her wekî hovan
27. Dema biteqe çekek nukleer
Jîndar ê bibin tev zêr û zeber
28. Gava yekê dîn agir bidêkê
Dinê dê bike her wekî hêkê
29. Evya mirov e evya heywan e
Evana dar in vana giya ne
30. Tiştêk namîne tev xir û xalî
Dê bê qîyamet herin wî yalî
31. Lê birê hêja însan wuha ye
Ji kê gazin kin bêjin bela ye
32. Aya ji bo çî wî kirin ev e?
Eger tu bêtî hingiv bi dev e
33. Ser ser û çavan bo te bibêjim
Du eger hene dê ez birêjim
34. Ew ê yekemîn bo wî mayîn e
Beqa û jîyan di dil mezin e
35. Êdî tu carî ew razî nebû
Bi para jê ra ew qe têr nebû
36. Her wî bi xwe ve kaş kir ji êdî
Mafê jîyanê ji bo wî nedî
37. Ji bo yê pêşîn Hawa û Adem
Xwarin ji darê me noq kirne xem

38. Ev ê duwemîn bûye egera
Kuştina Qabil ji birê xwe ra
39. Her kes dixwaze nemre bimîne
Para wî pir be zewqê bibîne.
40. Ji Qabil vir de halê me ev e
Mêjû ronî ye ne tarî, şev e
41. Di nav nava da hinek hatine
Ji bo dadîyê xebat kirine
42. Roja bêçara bi wan xweş zaye
Kesk û şor û zer ronahî daye
43. Dema l' mirinê dane silava
Roja bêçara zû çûye ava
44. Li pey bidadan meşîne hejar
Pê ra çûne şer bêçare û jar
45. Li hemberê wan rabûne maldar
Nehêlin dadî bibe fermanîdar
46. Lewra dizanîn bêşek û guman
Xêzê kişîne li tevgerê wan
47. Evî însanê bi'eqî û hiş e
Welê ji bo xwe diz û keleş e
48. Ji bo sîda xwe her kes dikuje
Divê bi tenê b' dinya bimije
49. Evî însanê bi min qe nabe
Pirî ko dibê hema ji ma be
50. Ew besê wî ye hema ji ma be
Hema ji mabe, hema ji ma be
51. Bidî yek kesek vê dinya fire
Dê bêje oxweş bêper bifire
52. Dê bêje şeddeq تنها paşa me
Ji min û pê ve bo min xulam e
53. Bila rûnenê, nere civatê
Fermana min da bike xebatê
54. Xulamê hêja tu car ranazê
Dê ez bidimê nan û pîvazê
55. Meriv tev bimrin bi qasê dasî
Ew pê naêşe qe pê naheşî
56. Evya tazî ye evya birçî ye
Barê jîyanê li pişta wî ye

57. Haya wî nîne ji xwe û pê ve
Eger bibêje bidev û lêv e
58. Lewra gotîye bav û pêşîya
Ê têr naramê halê birçîya
59. Rast e kî têr be berîk pir tije
Digre hişê wî pir tarî mij e
60. Tê ber çavê wî perdeyek tarî
Digre guhê xwe heta dikarî
61. Halê bêçara tu car naramê
Derd û kulê wî şuhret û nam e
62. Dibê tu kesek birçî nemaye
Binêre têr e loma raza ye
63. Di çavê wî da wekî hovan e
Serî bilind e gihîşt esman e
64. Ez im xwedîyê vê av û axê
Tu çi dibêjî? Hey kurê Şaxê
65. Gava birçî bû ew jî dinalî
Hevalbendê wan gelek dikalî
66. Digo guneh in evan bêçara
Pelçiqandîyê destê maldara
67. Werin raperin van sîtemkara
Bigrin mafê xwe ji van neyara
68. Piştî qeviz da di ser newalê
Gihîşte ser gir xelaş kir palê
69. Bêhna xwe berda, dora xwe nêrî
Çû nav bizina ew jî bû nêrî
70. Pir xweş gotine êşa l' hevala
Bav û bapîra tîra l' kendala
71. Jar û perîşan nebî weka wan
Nabî têkoşer di nav koma wan
72. Gava weka wan reben û birçî
Dê bikî zarîn xweş pêş ve biçî
73. Hil dî milê xwe ala xizana
Pêşeng û rêber ji bo nezana
74. Birê *Şofyanî*: gelo çênabe
Evî mirovê dê her wuha be
75. Na birê hêja çewa çênabe
Te'îm û tore eger bira be

76. Dara benîştê dibe fisti q xwoş
Çewa çênabe ê bi ‘eqî û hoş

(Miha Çara (Cutan) 1984)



1. Lo qulingo tu quling î
Xwedîper î tu bêceng î
Bilindfir î zelaldeng î
Xwedî warê rengareng î
2. Xwezî em jî wek te bana
Me fir bida li esmana
Wek te serbest wek te aza
Li zozan û germîyana
3. Gelo gava tu difirî
Vê rewşa me nafikirî?
Bawer dikim ger bizanî
Bibî pepûk her bigirî
4. Ka bêje mi b' serê xwe kî
Çi ra ev çend nêz û yek î
Dibî şîrît dibî serad
Vêkra deşt û zozan dikî
5. Em mirov in em hişdar in
Çi ra bo hev em neyar in?
Tim lêdan û şer û pevçûn
Bi axîn û zarezar in
6. Ez nizanim gelo çi ra
Em bi hev re nabin bira?
Dijberî û peyhevneçûn
Me qedandin dane gura
7. Lo qulingo 'bnavûdeng î
Pir bişeref şox û şeng î
Naçî nava refa qaşa
Nabî legleg her quling î
8. Xwezî em jî wek te bana
Nava refa xwe da bana
Dûrê gur û wawîk û hirç
Geştê bigra li esmana
9. Belê rewşa me dijwar e
Me ne welat me ne war e
Tiralê bin dara xurma
Dî xew de man berêvare.
10. *Şofyanî* ma bi girînê
Derman dibe vê birînê?
Li ser dara alûca tirş
Hêlîn çêdkî li Xweylînê
11. Ger dixwazî pêş de herî
Divê bikî şoberberî
Dî nav pêlê derya zulmê
Çavan vekî herî werî

(Gulan, 1993)

1. Di nav bexçê evînê da weke bilbil dinalim ez
Bexçê gula bêgul maye rondikê xwe dimalim ez
2. Gelo bo çî wan gulên şor ne pişkifin di buharê
Istirî û dirî şîn bûn di wî baxê geşta yarê
3. Buhara me gelek xweş çû bi baran û birûsk û ba
Çewa baxê me şîn nebû xwezî me jî gulek heba
4. Bû qir û qeşa payîzê tav û barana nîsanê
Dara pelê xwe weşandin buharê meha gulanê
5. Buhar li me bi reş gerî serî li me bû wek teşî
Dolaba me çep gerîya bîra ava me hilweşî
6. Li me çikî wê ava sar dev û lêvê me miçiqî
Xwelî li ser serê me hat dil û gurçik tev pelçiqî
7. Deşt û çiya mêrg û devî gazî dîkin hey hey reben
Çewa di gel hiş û mêjî ketî nava zincîr û ben
8. Gazî dîkin lo rebeno dilê me bo te peritî
Gelo çewa xewa te tê şev û rojê naxebitî
9. Sa'eta te kelebçe ye xilxala te qeyd e di pa
Berçavka te potikê reş ristika te benê sêpa
10. Te asîman ringering e erda te tev de şewitî
Gelo jî vî guhgiran î rengê te reş û qumutî
11. Ku da derî rê lê girtî nig davêjî dişeqitî
Çarhêlê te nêçîrvan in di dafikê diperpitî
12. *Şofyanî* tu negrî şa be Kurdistan tev qada şer e
Cuwanê kurd serî hil da ta azadî venegere
13. Qeyd û benda tev de şikand li ser dijmin wek laser e
Dafikên wî tev de qetand pêş da dere wek bager e
14. Xuşxuşa dengê çekên wî bûye bilûr di nav çiya
Wer temaşayê binêre govenda dehl û deviya
15. Dara gûzê di serî da desmala xwe dihejîne
Mêwa tirî dawî dajo nav milê xwe dibe w tîne
16. Semaya wan mi serxweş kir bi reqsa wan mest û jar im
Bo dîlana rizgarîyê evîndar im evîndar im

(Miha Gulanî 1995)

1. Dilşewitîn qedîya, dilovanî qe nema
Em ketin şeva tarî, em bûn kewara xema
2. Di ber te de dibore li te nake silav e
Çavê wî te nabîne hişê wî pir belav e
3. Noq bûye ta qirikê di nav xiyala pera
Çewa li te hay bibe bîr kirye bav û bira
4. Ew 'aşîq e hevalo! Hêvî ji wî bibire
'Aşîq ji bil me'şûqê tiştêkî nafikire
5. Ê bêhiş û evîndar tu jê nebe hêvîdar
Tu ger li pê wî baz dî tê pir bibî ustûxwar
6. Ger barê te xwar bibe tu rast bike hiş li ser
Ê ber bi te ku were heqîba xwe davê ser
7. Tu hemalê kêlê yî, heqîb bo wî giran e
Nalîna te nabîze guhê wî pir giran e
8. Birîna te bijan e bi destê xwe derman ke
Bi kesî de negirî kes nayê derman nake
9. Vê gotina bapîra gelek rind û xweşik e
Xurya canê meriva bi dest kesî naşike
10. Rast û durust gotine ji dil bapîr û kala
Êş û jana l' hevala mîna tîra l' kendala
11. Armanca dilê mirov, mirov tîne bizavê
Bê armanc û faîde kesek lingê xwe navê
12. Bêşûd û berjewendî kesek dostê te nîne
Her kes fedayê xwe ye bo vî li hev bikîn e
13. Bo xwe taştîya sibê rûn û hingiv dixwaze
Bo te dibê navrojê bixwe nan û pîvaz e
14. Wuha hatîye w çûye vê mêjûya însana
Ji berê w pêş wuha ye ji Adem heta ana
15. Xwudê Adem afirand, danî nava cennetê
Nêzê vê darê nebe, got bixwe her ni'metê
16. Birçî w tazî namînî her tiştê te belaş e
Arvanê te xase ye bê kapek û telaş e
17. Di wan naz û ni'meta dilê Adem sêwirî
Go tu ji darê nexwî dê royekî bimirî
18. Bo ku nemre bimîne nêz bû û xwar ji darê
Pir zirar û ziyar kir, ji wêrê hate xwarê

19. Em jî weke wî bavê bo em li vê bimînin
Şingeşinga şûra ye serê hev difirînin
20. Kîja dibe xwedî text li ber xwe hew dinêre
Ha mirov û har kermêş di cîhanê ew şêr e
21. Bê rawestî şer dike ji bo li ser bimîne
Bêsalix dide kuştin di çav wî de kulî ne
22. Ez û te tene kuştin mêranî ya serdar e
Ê helim û bişefqet navroja ê xîdar e
23. Ê bi rehîm û dîlnerm e, ji vê dinê bêpar e
Xwedî milkê fire ye ê pir hov û dijwar e
24. Serokîya cîhanê di destê ê xwînrej e
Li dîrokê binêre dê xweş ji ter bibêje
25. Ger bixwazî li dinê serbilind û serwer bî
Divê bo te yekîti divê nijadperwer bî
26. Ger lingekî te pêş de yê di jî paş de here
Ji bêgavî tê rûnî li ser serê te şer e
27. Divêtî pir şîyar bî, fend û fêla bizanî
Da nekevî dafikê, nêçîra nêçîrvan î
28. Ê nezan û li dij hev her tim dîl û esîr e
Dergevanê fêlbaz e bêserok e bêmîr e
29. Divê tu pir zana bî ger te divê bibî mîr
Eger nezan bimînî bê şik tê bibî kizîr
30. Heta karî bixebit li pey kesî nebeze
Tê j' birçîna bimirî zikê wî tije bez e
31. Serî rake bilind ke, nebî nebî têxî tûr
Yan ne tê piştazî bî bisosretê dûr û kûr
32. Nano loqo tu nebî belê “parî b’ feyde ne”
Bapîra xweş gotine “dawî bi ser hev de ne”
33. Divê tu xwe nas bikî pê l’ şerefa xwe nekî
Tê her serî bilind bî, rûsipî fedî nekî
34. Kesayetî girîng e, gava tu wê bibînî
Bi dinyayê nafroşî, dema bimirî bijîn î
35. Jiyana herî hêja ya mirovan li dinê
Jiyana ku dide te jîna piştî mirinê
36. Ev jiyana pir hêja nabe para her kesî
Ger dixwazî bi dest xî divê te nanê tisî
37. Guh nedî xweşîneka zikek têr û deh birçî
Kumê serê te qul be, bi şola pîne biçî

38. Tal û şêrîn weke hev germ û serma jî wişa
Ken û girîn birê hev bikevî rabî dîsa
39. Hevalê bargiran î, hemû derda hewisî
Bikevî gerînekê ser kevî nefetîsî
40. Bêhna te gelek fireh her wekî derya mezin
Tu carî xema nexwî çî li ser û çî li bin
41. Nêzê her kesî bibî nemaze yê bihewar
Armanca te rast bikî bo her kesî barê xwar
42. Wê gavê tê reh berdî di dilê her mirovî
Textê te ye dilê wan çî bajarî çî kovî
43. Dê pir û pir bigirîn li pey te gava bimirî
Di gorê de tu xweş î bizînet û bixişî
44. Ji bîra wan tu naçî, her qal û behsa te kin
Di gorê de tê şa bî, rehîma Xwedê li te kin
45. Xwezî bi wî mirovî, pey mirinê bijîn e
Dema qala wî bibe her kes rehîmê lê bîne
46. Ew bawermendê paqij gora wî rezê tirî
Ta gihîje beheştê bêagir û bêxurî
47. Sekrata wî dawet e her wekî pirsî gorê
Di nav bira pêşîn de serbilind bê meşêrê
48. Dê ji kêfa bifire dema bidnê defterê
Dê here ber şehîne bê saw li goşê pirê
49. Weke birq û birûskê wê fir bide l' ser pirê
Têr û tijî wê vexwe ava hewza Kewşerê
50. Pê re namîne tiştek ji wan êş û 'illeta
Bijî di nav beheştê di gel naz û ni'meta
51. Bi hesret û keser e *Dilkanî* biba mûyek
Li canê vî mirovî li dinê şev û rojek

(Gulan 2002)

1. Cixarekêşê bihiş û mêjî
Hinek guh bide şîretên mi jî
Dilxwazê te me jî dilê tijî
Gelek dixwazim dirêj tu bijî
2. Gelekî heyf e evê jiyanê
Tu bikî gorî ji bo dûxanê
Bîdî ber şûra jiyana şêrîn
Zû baz dî herî ji vê cîhanê
3. Bimje hewayê paqij û delal
Kin neke jînê bi jehrîya tal
Roya xwe tarî neke hevalo
Bijî dirêj û nazik û delal
4. Tu pê naheşî wek zîlindar e
Ji şîhetê re dijminê har e
Jehra bi kejmêr didî hinavê
Zû te bişîne bin axa sar e
5. Nebê cixare bêje reşmar e
Dostê te nîne bo te neyar e
Haya te nîne wan hinavên te
Ji ber dûyê wê timî hewar e
6. Taxim binêre tijî qetran e
Ji bona êşa kanî û kan e
Xwezî te b' dîta ciyê tê diçe
Hemî reş bûne tenî tê dane
7. Bawer kî jehr e jehra kujer e
Pişika te re tîr û xencer e
Gewrî nazik e nede ber kêra
Mîdeya te re gelek xeter e
8. Li ser çavê te pir bite'sîr e
Ji guhê te re her wekî qîr e
Derbarê çav û pişt û ustûyan
Di gel bahorî dijminê pîr e
9. Lêv û dirana dilewitîne
Qey bawer nakî tev nîkotûn e
Ew pêçîyên zer simêlên gevez
Ev çar şahid in ji te re tîne
10. Dê royek were bîn ê biçike
Xîzexîza xwe di hişê xwe ke
Singê te bibe kana belxemê
Êdî tu zanî te d'vê terk neke

11. Di cixarê de pêncî êş hene
Devê wan vekrî tim li dû te ne
Bîst jê kujer in “Xweda parêze”
Li benda keys û feşala xwe ne
12. Dev û pişik û lûleya bêhnê
Gewrî û gurçik mîdeya jînê
Vana ne cihê şêrpenceya wî
Yeka dî heye şêrpenca xwînê
13. Rehê laşê te dixitimîne
Xwîna ji dil tê vedigerîne
Ji te re tîne qeyrana dilî
Te wek dilopê l’ erdê dixîne
14. Ji çara yekê cixarekêşa
Bîst û sê şala bi derd û êşa
Berî hevala bar dike gorê
Zanyar dibêjin ehlê teftêşa
15. Serê heşt çirkî dere mirinê
Cixarekêşek li hemû dinê
Lêkolîner û zanyar dibêjin
Ji dil û hinav dirêjin xwînê
16. Bêhna jê digrî bêhna mirar e
Ê kêleka te ji te bêzar e
Ger fedî nekra ew hevalê te
Cihê tu lê yî dê nekra war e
17. Dibe tu neşî tu dev jê berdî
Lewre nekêşî neşî xeber dî
Mafê te nîne ê kêleka xwe
Bêhn lê çikînî dû b’ serda berdî
18. Gava tenê bî an jî li der ve
Dibe tu vexwî bi roj û şev e
Lê gava hundir dema civatê
Her kes diêşe ji te direve
19. Tu hundur nekî weke dûxanê
Civatê nekî mij û dûmanê
Eger hevalê xwe nefikiñ
Gelek nebaş e vî tiştê hanê
20. Cixarê mekêş xweşikheval be
Zarokê xwe re bedewmîşal be
Li te nenêrin ew jî venaxun
Serê te bilind tim bêwebal be
21. De were bira hawê min bike
Cixarê mekêş pera kom bike
“Ne here secdê ne kê m bibîne”
Derbarê pera rastgotinek e

22. Gava venexwî ta qata jorê
Bi linga herî bê asansorê
'Umrê te heştê weke cuwanek
Gav û se'etê bikî siporê
23. Tê pir bibînî çêj û lezzetê
Ji her xwarina ku ber bi te tê
Bêhna xwe bidin cil û porê te
Ji bêhna gulê gula qudretê
24. Çermê rûyê te zû naqermiçe
Şêst û heftê şal ser te de biçe
Hawîrdorê te delal û paqij
Kesek navê te kevir û kuçe
25. Bêhna te pir xweş dûrê taliyê
Herî civatê li rêwîfîyê
Kêleka kê bî serê te bilind
Li çî siwar bî dûrî tengîyê
26. Ez lavakar im ji te bişanî
Bigre şîretê birê *Dilkanî*
Hevalê neyar lazim divê lez
Jê bi dûr kevî di her zemanî
27. Rojek yekî şaf li ser berfa sar
Dibîne marek bûye weke dar
Dilê wî nerm e wek me b' rehm e
Hil dide tîne wî dide ber ar
28. Bîra wî nayê ku ew neyar e
Ji bav û kala dijminê har e
Qencî li cem wî qe pere nake
Derbarê wî de ne 'efûkar e
29. Germê ku dayê çavê xwe vekir
Dît way li ber e dostê bêfikir
Rabû ser pîya kire fîkefîk
Êrişê birê pê şîr û şekir
30. Hate bîra dost gotinek bi cî
Car heye qencî dibîte gincî
Hevalê wek mar bo xwe neke yar
Zû anî bêrê serî kir du cî

(Gulan, 2003)

1. Qedeḥ tijî jehra mar e
Xweş vedixwum j' destê yar e
Te'm û lezet bêjimar e
Wê şerbetê hevta **tune**
2. Şerbeta min jehra mar e
Saqîyê wê bilê yar e
Min ji ber qîr û hewar e
Kes [li] hewara min **tune**
3. Ez ji yarê bûme cuda
'Eql û mêjî bûye wunda
Ez nizanîm biçme ku da
Kes hevalê min **tune**
4. Di nav gelan wekî gur im
Ez dixwazim her bifirim
Di axûşa yar bimirim
Lê per û bask[ê] min **tune**
5. Bayekî hat der seherê
Dil şewitî gazî kirê
Tu bê silav diçî kurê
Got quweta min **tune**
6. Gelek dûr im ji nav dosta
Hin hîn kir û hin mamosta
Dikim qêrîn bi helbesta
Lew di jînê aram **tune**
7. Dilê min jar û birîn e
Bê rawestîn qîr û şîn e
Di çavan da xwûnê tîne
Hê bi ser ve ol jî **tune**
8. Bê çav mame wekî Ye'qûb
Tev birînim wekî Eyûb
Jar û mest im ez bê tixûb
Lew reben im hogir **tune**
9. Ez diqîrim di fetlê mar
Pir hezîn im lawaz û jar
Lewra dijîm bê dost û yar
Di tevgerê mêjîm **tune**
10. Di evînê bûme serxwoş
Ji girînê bê çav û goş
Ez wek dînim bê 'eql û hoş
Gelek tî me lê av **tune**

11. Mem evîndar li pey Zîn im
Na, Ferhadê dilşêrîn im
Yar hunda ye dilbirîn im
Dil peritî derman **tune**
12. Di her gavê dikim qêrîn
Di zindanê dikim nalîn
Wekî Memê ji derdê Zîn
Belê Mem im Tacdîn **tune**
13. Ji nagahî min dîyar hat
Ji mirinê ser bûm helat
Bi peyakan şah kirme mat
Lewra fîl û ferzîn **tune**
14. Min ne mal e ne jî saman
Min ne laş e ne jî giyan
Ji bo welat tev de heyran
Welat heye şah tê **tune**
15. Ji bo welat ez bûme jar
Ji wî pê ve min nîne yar
Ji bo wî ye ev zarezar
Kes [li] hewara min **tune**
16. *Şofyani* bes bûy serhelat
Ji derdê jarê nav welat
Zevî çûye çidkî bikat
Bi çeçqeçî kevir **tune**

(1975)

1. Di royek ez diçûm der ve ji xweşroyên buharê
Gihîştîm nava nêrgiza li min dane hewarê
2. Ji ma gotin *Şofyanîyo* çira tu guh nadî me
Tu her diçî narawestî tu qe nakî debarê
3. Bêhn û dîna me pir xweş e evîndarê me pir in
Hela were hinek rûne bi mer bike bazarê
4. Mi gote wan rast dibêjin hûn pir xweş û şêrîn in
Lê pir ji we şêrîntir e rûniştina bal yarê
5. Ji ma gotin rast dibêjî li te nagrin wisa ye
Welê bo me rast bibêjî bi biskê evîndarê
6. Çi ra wiha tu zer bûyî, sitûxwar û belengaz
Wekî Mecnûn تنها derî li vê çol û pesarê
7. Mi gote wan bo we bêjim, dilê we ez nahêlim
Welê divê min li min negrin vê şîn û zarezarê
8. Bo min jî dildarek hebû, keserên me tevî hev
Çiqas barê derda heba me hildida wî barê
9. Îro ji wê cuda bûme sitûxwar û bargiran
Di dest min da tiştek nîne ji bil vê barebarê
10. Ez hay nabim li tu kesî karê min tim girîn e
Ji rondika çav ziha bû xwîna şor tînim xwarê
11. Dil dane min pêk ve gotin *Şofyanî* hêvîdar be
Lavakar in em ji Yezdan, dê gihîjî dildarê.
(Adar 1979)

1. Dilo bes e girîn zarîn bêmifa ye
Dibe bêjî ka yara min ne xuya ye
Eger bêjî evîndarî ne wiha ye
Evîndarî di her demê bê dewa ye
2. Dê pir cara jî yara xwe cuda bibî
Gelek cara jî hişê xwe wenda bibî
Tal û şêrîn di dil te da wek hev bibî
Evîndarî di her demê bê dewa ye
3. Gelek hatin dilperitî wek te m' nedî
Dikî gazî: ez şewitîm yarê nedî
Bêşewatî evîndarî li kê te di
Evîndarî di her demê bê dewa ye
4. 'Îşq û evîn barek mezin, pir giran e
Gelek hatin li milê xwe wê hildane
Ger tu neşî dev jê berde ê lokan e
Evîndarî di her demê bê dewa ye
5. Heta derd û kulên mezin neborînî
Bi kovan û keseran, dil neşewînî
Çavê belek armanca xwe tu nabînî
Evîndarî di her demê bê dewa ye
6. Herê bêje Hesenî ez dilê te me
Pir giran im timî barê milê te me
Min biborî wek te ye ez şermende me
Evîndarî di her demê bê dewa ye
7. Divê ti jî li min negrî perîşan im
Te jî wek min evîn dîye, wekî zanim
Li bêhişî nayê girtin, te qurban im
Evîndarî di her demê bê dewa ye
8. Neçêyek ger min kiribe bêhiş bûme
Bi wê jehra cudabûnê jî hiş çûme
Bawer dikim *Şofyanî* yî efû bûme
Evîndarî di her demê bê dewa ye

(Pûşper (Hezîran). 1979)

1. Ax felek bo çi wiha kir talî yû tengî te da
Bo min ê jar û perîşan, xweşî û kêfê neda
2. Canê min tev de birîn kir, te dilê min pir kewand
Hê li min qet nazivirî, dimeşî derî ku da
3. Awurê kerbê didî min, birînan napan dikî
Hê te dil hênîk nebûye, te ji min yar kir cuda
4. Te çima ewha li me kir yar ji min kir dûr û dûr
Li dinê kêfê nebînî, hêvîya min ji Xweda
5. Bo mi jî dildarek hebû, malê mi rewşa mi bû
Te ji min girt û bir û bir, qe li min awir neda
6. Te mi kir dînê pesara, her wekî Mecnûnê jar
Yan wekî Ramînê hejar, yan Memê zindanê da
7. Karê min şîn û girîn e, çavê min 'ewrê buhar
Tavîyê xwînê dirêje! Reben im jar û geda
8. Metel im şaş û bêçare, ka çi ye dermanê min?
Bê evîndarê e' najîm, ser didîm fermanê da
9. *Şofyani* her çav li rê ye, xew û xwarin lê tune
Destê wî her tim bilind e, du'akar e ji Xweda
10. Ber bi min dildarê bînî, çavê xwe ronî bikim
Serê min cî da bibire, bike gorî û fîda

(Adar 1980)

1. Ez nexweş im pir dinalim evîndar im lê dilberê
Evîna te j' pîya xistim birîndar im lê esmerê
2. Bi hesreta dîtina te ez bêxew im kezîzerê
Ez im Memê di zindanê belê ew im lêvşekerê
3. Bi agirê dûrbûna te ez helîyam taca serê
Bi xwedê kî nêzê bibe ez qedîyam min serwerê
4. Derê der ve te bibînim şevberatê lê keserê
Hewce nîne herî Girê 'Erefatê bask û perê
5. Te hay nîne li min ê jar serbilindê bêxeberê
Ketim qeyda evîna te gelekrindê guloverê
6. Çav û biryên te bûn dafik tê dinalim biskçeperê
Lavakar im jê min berde pir bêhal im min kederê
7. Min bigre bavê qefesê nukulxwûn im min zêferê
Derê rû min bêrawestin dê buxwûnim min cegerê
8. Di nav bexçe evîna te ez bilbil im lê nasberê
Ji te pê ve min gul nîne dilbikûl im gulazerê
9. Ji gulzara tu yî تنها bo min gul î rûfenerê
Ji dildara tu yî تنها bo min dil î rûgewherê
10. Gelo nabe tu pişkêfî gula lêva rû'enberê
Bêjî maç ke henarê rû her du sêva miska terê
11. Dê *Şofyanî* diyarî ke canê şêrîn hela derê
Dê her bijî heta heta nabe xemgîn bêje erê

(Miha Yekan. 1995)

1. Gazî dikim te lêvdurê
Çavxezalê perîsurê
Dil û ceger girtûbirê
Qe nabêjî derî kurê
2. Hey dilbera min bêkes î
Gorî te me li te weşî
Bilî te horî naxwazim
Di beheştê bo min bes î
3. Tu wunda bûy ji min ê jar
Bûm hogirê dar û zinar
Hevalê hewr û baranê
Rondikrêj im di şevê sar
4. Jîyan li min bû zehr û jan
Dinya li min bûye zindan
Bûm hevalê kund û pepûk
Xweş dinalim di taristan
5. Çewa bextê mi reş gerî
Dûr bûm ji yar taca serî
Şev û rojê gazî dikim
Ka nazika horîperî
6. Belê horî şox û şeng in
Di beheştê b' nav û deng in
Bo xizmeta nazdara min
Şev û rojê b' şer û ceng in
7. Perî rêz in mesîn di dest
Ê dibîne lêvê digest
Şondê dixwe ne beşer e
Rindmelek e serxweş û mest
8. Gazin nekin li min bira
Roj li berê weke çira
Heyva çarde fedî dike
Ciyê lê ye naçe wira
9. Belê ez bêhiş û dîn im
Ne d'bihîsim ne dibînim
Peymana min bi Xweda ra
Dê bigirîm ta bibînim
10. *Şofyanî* me di peymanê
Venagerim ji giryanê
Ta gihîjim bidim desta
Qevdek gulê Kurdistanê

(Miha Yekan 96)

1. Di demsala buharê da gulek min dî di gulzarê
Li dorê carek çerixîm min xwe nedî ta êvarê
2. Ez bûm bulbul jar û reben serxweş û mestê bîna wê
Ta seherê bi giryan im di nav qeyda evîna wê
3. Nişka va wenda bû ji min ker û lal û çavtarî me
Weka wê şox û şepalê li rû dinê kes nedîme
4. Aya gul bû xiyala min? Ta seherê ji êvarê
Xew nakevîtin çavên min gazî dikim delal yarê
5. Çavêd belek berf û hubur yek awirekî dane min
Min xemandin bêhiş kirin her hewar û fixan e min
6. Tîr û kevanên çavêd wê dil û ceger herişandin
Bejna serwî rûyê bedrîn bendeyê xwe min gerandin
7. Çavxezala Çiyay Cûdî geştê dike li rûbara
Qe hay nîne li min ê jar mecnûnê çol û pesara
8. Belê rast e bêwijdan in şox û şepal û nazenîn
Dîroka ‘îşqê wiha ye heta karî bike zarîn
9. Hêvîya xwe ez nabirim dê royekî bi hevalî
Em hevûdu hemêz bikin bi delalî bi zelalî
10. *Dilkanî* her vê dixwaze ji Xwedayê pir diloan
Di nav gulên buharê da di nav gulzarê Kurdistan

(Gulan 2001)

1. Gelek şal çûn te nabînim
Şev û rojê xiyala min
Royek were te bibînim
Hemêz bikim zelala min
2. Heşê min bûye dîlê te
Ji bilê te nafikire
Dema razê ew şiyar e
Ji hîzra te nazivire
3. Çavê min tişteke nabîne
Hemî reng jê re tarî ne
Bes rengê çavê tey belek
Reş û sipî dihebîne
4. Dilê min kûr birîndar e
Te dî w vir de bi girîn e
Horî w perî dor jê bigrin
Dê her axîne bikşîne
5. Dê bêje ax xezala min
Ew horîya di beheştê
Bila çavê min pê keve
Dojeh bi min gelek xweş tê
6. Ger carekî hemêz bikim
Meşwerdeka xweşqametê
Serî ji secde ranakim
Ta bi roja qiyametê
7. Ji Tofana Nûh buhurîn
Rondikê çavê şil ê min
Arê Xelîlî hênîk tê
Ber şewata nav dilê min
8. Şewate ye di cegerê
Ger bînekî b' der ve derê
Rûyê erdê bikizire
Bê dar û ber weke berê
9. Evê renca evîna min
Lî ser çiya bata danîn
Hemî deşt dê bîba sîlik
Peravê deryaya rengîn
10. Ez helîyam ez qedîyam
Ger deng nekim xuya nabim
Vê jana dil ji min rabe
Bi sa'etê şiyar nabim.
11. Meya 'îşqê bû para te
Dilkanî pîr bextyar î
Hevalê Mem û Ferhad î
Bes e ev qas meke zarî

(Gulan 2001)

1. Seyran û geşta feşla buharê
Pir şêrîntire j' mûz û henarê
Hêjayê pesnê sibe w êvarê
Lê nagihîje şuhbeta yarê
2. Gelekî xweş e geşta buharê
Lêbelê şert e di gel dildarê
Herim bihiştê bê evîndarê
Bi min pir tal e wek zîlindarê
3. Buhara rengîn bo her kes xweş tê
Jê pir dibînin tam û lezetê
Buhara bê yar dilêm neketê
Lewre ez bê yar naçim cenetê
4. Buhar e belê pir nazenîn e
Li ser gula xwe bilbil dixwîne
Her kes dilşad e cejn û şahî ne
Dûr bûm ji yarê karêm girîn e
5. Ez di buharê bûme birîndar
Karê min girîn, qêrîn û hewar
Sa'et û deqê dibêjim dildar
Ez ji hal ketim pirî mi got yar
6. Her kes dinale ji bo buharê
Lê ez dikalim ji bo dildarê
Zarîna min e kes nay hewarê
Dermanê min e dîtina yarê
7. Yar ji min xeydî piştê bi min da
Min lê dinêrî ji min bû wunda
Ez bûme dînê bajar û gunda
Dîlê zindanê di qeyd û benda
8. Karê min gazî li min vegere
Dilê min tijî kul û keser e
Derya kovana jê nakim der e
Rihê min gorî ji biskê te re
9. Bide ber bayê porê filfilî
Berde ser mila kezî û gulî
Poşîyê rake 'j rûyê gulgulî
Dê bibim bilbil tê bêjî dil î
10. Bi te bilbil im li Kurdistanê
Xweş xweş dixwînim li daristanê
Didim hawîrdor jîn û jîyanê
Bê te mirî me li Kurdistanê

11. Nazenîna min  orî û perî
Sur  rîna min ri   min gorî
N    min bibe ji min pir d r î
B  te mirî me tu nefxa   r î

12. *Dilkanî*  a be d  royek were
 ox û  enga te li te vegere
D  ser û bin bin kul û keser e
Ew ro ji bo te  ecc l ekber e

(N san 2009)



1. Ez nexweş im ez bêhiş im, bê hogir û bi hewar im
Dengê min nagîjit kesî, ta seherê zarezar im
2. Bi hewar û bi fişan im, bêhna mi teng ez fetisîm
Hawîrdor êrîş e li min, belengaz û ber dîwar im
3. Qêrîna min li esmana weke birûskê deng dide
Ê li ber min ker û kor e ji lew hemî girînkariyên im
4. Ez im saxê di gorê de xwezî tînim bi zindanê
Qêrîna min difetlê mar bawer kî bê dost û yar im
5. Ez im mirîyê bêxwedî kesek li serê nagirî
Goram cihê xir û xalî di bin axê tengezar im
6. Gora tarî bû warê min di vê jîna nazik û xweş
Rojê min bû şeva tarî pir bi êş û giranbar im
7. Xem û xiyala min qedand ez helîyam bûme şîma
Xew nakevîtin çafêd min şeva tarî ser zinar im
8. Feleka min çep gerîya bayê ku tê gelek xwar e
Berfê avête kela min bawer kî pir ustûxwar im
9. Feleka min reş û bi kîn gefa dixwe bi destî şûr
Daye pey min ez direvim bê heval û alîkar im
10. Çûka destê zarokî me, ne dike ne berdide
Her deqê şed car dimirim bê aram û bê debar im
11. Ji her alî tûr dibarin tûrê xem û derd û kula
Di nav xwînê dipertim ji her hêlê birîndar im
12. Şev û rojê bêrawestî gazî dikim hey dost û yar
Min nedî dostê roja teng perîşan û pir hejar im
13. Heta singê di berfê de li dora min gurên birçî
Derketina rihe mi d'pên karê min gazî ez xwarim
14. Ji min girtin hemû mafan bi hesret mafê jîyanê
Mi şelandin di qeydê de karê min gazî xembar im
15. Jehra kujer di fîncanê her deqê şed car vedixum
Ha jîyan û ha marê reş saxê mirî tar û mar im
16. Çarhêlê min faq û dafik dora min kozik vedane
Min dane ber tîr û rima ji dilê xwe da xîdar im
17. *Dilkanî* me di bahozê demsazê qir û qeşayê
Jîna mi bir zivistanê dikim gazî bêbuhar im

(Avrêl 2003)

1. Me şend mastê koçera
Toyê wî girt di sera
2. Tama devê me bû xweş
Rengê rûyê me bû geş
3. Dil diçû rûnê nivîşk
Ê bêxwê û bêdewîşk
4. Me dixwest rûnê teze
Gelek sipî yê pez e
5. Me mast kire kodikê
Bir û anî l' ser dikê
6. Çavê me her li rûn e
Rengê dewê me cûn e
7. Me keyand û pir keyand
Sê jina piştê tewand
8. Li hev gelek bedel bûn
Bi ser neket kef û rûn
9. Rengê dewê me zelal
Rûnê me bûbû xiya
10. Me hêvîya xwe birî
Êdî li rûn nenêrî
11. Lewre em têgihijtûn
Toyê şîr hatye girtin
12. Hate bîra me mehîr
Pê bixun nanê feîr
13. Mehîra mastê mîhûn
Di nav de pûnga bi bîhn
14. Nadim li ser sênîya
B' goştê berx û şamîya
15. Dan û pûngê me anî
Li ser agir me danî
16. Dewê sipî berda ser
Di navê de heska zer
17. Dewê me pir sipî bû
Bê kerengê gupî bû
18. Ger heba ew û kundir
Pêçî diçûne hundir

19. Heska xwe her me tev da
Ta mehîra me kel da
20. Goştê bizina gobel
Nake mehîra berkel
21. Wiha digot bapîra
Bo berkela mehîra
22. Hekîm weke wê nîne
Xwîndan ji enyê tîne
23. Ji ser agir me danî
Firaqê xwe me anî
24. Sehen sehen tije kir
Li heft mala belav kir
25. Ew mehîra xweşikî
Di nav gund de herikî
26. Mastê me yê bêadan
Hemî bû dîn û îman
27. Satilek ma ji bo me
Lê ê me da ma bo me
28. Ew mehîra suphanî
Heft roj kêfa me anî
29. Dame çêj û lezzetê
Ser sênîya ni'metê
30. Rûnê teze û nivîşk
Li ber bû telp û dewîşk
31. Me wî rûnê ji bîr kir
Me gotê qîr û sîr kir
32. Pir halxweş bû *Dilkanî*
Bi mehîra rehmanî
33. Du'a kir bo koçera
Dûrê tengî û şera
34. Me got mala we ava
Tije ji bûk û zava

(21/04/2004)

1. Çêleyên çûka ser darê
Zilûtên nû ji hêkê der
Ji hêlînê ketin xwarê
Dayik reben çîvîn e her
2. Çavek li wan yek li dorê
Ha derkeve pisîka reş
Weke maşîyê nîv torê
Her yek jê re deveka xweş
3. Karê wê qîr û girîn e
Têjikên min têjikên min
Hewara min kesek nîne
Nema dil û gurçikên min
4. Kî tê hewara ê kefî
Heta karî bêje hewar
Her kes ji bo xwe şewitî
Nîne hevalê barê xwar
5. Têjikên te pisîngê xwar
Kesek bo te ne xemgîn e
Xwe avêtye piştê dîwar
Dibêj te devek şêrîn e
6. Xwe parêze heya karî
Bawer bike bi hêza xwe
Her kes ji bo xew dizarî
Kes te nake hemêza xwe
7. *Dilkanî* her van dixwûnê
Gurê mirovan mirov e
Ji bo xwe re Eflaûn e
Lê ji bo te hîrç û hov e

(Miha Adarê 2002)

1. Ez ne şêxê nexwendî me
Ne melakî bêfedî me
Bigrim ji te şolê belaş
Tu qey nizanî ez kî me
2. *Dilkanî* me tije mêjî
Baş dizanim rewşa te jî
Zar û zêçan xwedî dikî
Bi vê firoşgehê dîjî
3. Divê tu hîn bikî karê
Dûrê zîyan û zirarê
Berîka te vala nebe
Herî malê berêvarê
4. Li te dikim şîretek dî
Şerefa xwe b' pera nedî
Tu car kesî nexapînî
Dîn û dinya bi der didî
5. Emînfî ye mercê yekem
Rêz û kenîn e yê duwem
Bo te bazarkarê hêja
Şîreta min her gav û dem
6. Divê her dem bi hiş bînî
Gotina bapîrê Çînî
“Firoşgehê qe veneke
Ger tu nizanî bikenî”

(Miha Çara 2003)

1. Nivîsyan im bi vî zarê vê namê
Dikim xîlaf bi vî hawê bo ‘amê
2. Belê zanim evî zarê nemeqbûl
Li nik xaşan di gel ‘aman ne me‘qûl
3. Li nik piran bi wî nivîs xerîb e
Bi xeyrê wî gelek baş û necîb e
4. Welêkin ew li cem min bîngulav e
Dî rû wî da şekir, hingiv zirav e
5. Dikim xîlaf ji bo her kes kî dibe
Xîlafa ha li cem min pir hebîb e
6. Birayê min birîna me pir kûr e
Di her gavan fixana me şebûr e
7. Bidî sebrê bo dilê me hezîna
Ji me rakî evan derd û birîna
8. Birîna me di vê meha adarê
Meha ewwel di mewsîmê buharê
9. Xwînê havêt wekî kanî w çeman e
Guh neda rê ew gihîştî behran e
10. Ew ê şor kir deşt û newal çiya ne
Ji ber wê em zer bûne wek şima ne
11. Nebî mehzûn bi van qalan ti car, qet
Tev mecaz in tune pê ra heqîqet
12. Xiyala min evan tiştan dibêje
Ji bo kêfa te ra derdan dirêje
13. We îlla qet nîne jê ra, tu keser
Di her zeman xem û birîn bêkeder
14. Çendî hebin ji ber bikin hewarê
Tev de rabûn em derketin buharê
15. Tu baş zanî sê tişt hene xemrevîn
Di dest me de ji her sêyan av û şîn
16. Di gava ko li wê avêm dinêrin
Wekî aşan hemû derdan dihêrin
17. Di weqta ko derên tev de bi carek
Xweş bimeşin derên pozê di yarek
18. Baş binêrin li şin‘etê Ellah e
Şed tebarek çîqa xweş Maşellah e

19. Dê bibînin sor û zer û şînahî
Hin ê bêjin hin ê tew kin bihahî
20. Ma dimîne di wê gavê yek hezîn
Min ne bawer tunebe yek devkenîn
21. Qelbê wî jî ‘j devê wî ra *şedeqte*
Dê bibêje *we bîl heqqî neşeqte*¹⁴⁴
22. Hêja mane ewan kêfêd negotî
Xiyala min diçe w gemê dikotî
23. Di her sala em derkevin buharê
Ser jê dîkin car berxik û car karê
24. Em distînin fasûleyên taze ye
Tev çêdikin tirşîkek dilxwaze ye
25. Dê şor bikin goştê şêrîn ne mir¹⁴⁵ e
Rûn lê bikin di lengerê bilxur e
26. Tev de rûnên li bin sîyê bi raşet
Hin kaş bikin ewan tiştên melaşet
27. Ê rast bikin ewê sifra delal e
Tu bibêje heye kesek binale
28. Li vir bes kim van peyvên dîlkêşî
Bibî raşet bê keder û dilêşî
29. Silavê min ko bê hed û hisab in
Li te w Hemê wekî berfê libab in
30. Hêvîdar im ji Ellah zûlcelalî
Werin malê bi halekî delalî
31. Eger pîrs kî bibêjî hûn çewa ne?
Bi îznîllah di kêfê da ‘m xuya ne
32. Radimîsin destê te û Hemê ye
Zeynûddîn û Îstê tev û Mistê ye
33. Eger pîrs kî ji eşwalê mala xwe
Pir bi kêf in bê axîn û bê wax e
34. Ger sûal kî ji eşwalê Geylanî
Şeyxê mezin ‘Ebdulqadirê şanî
35. Pir bi kêf e di her deman li mal e
Naçe cihkî bi kesî a naqale
36. Dike kêfê di her deman di hundir
Nayê dîtin ne li vir û ne li wir

¹⁴⁴ “Te biheq xeber da”

¹⁴⁵ Mir: Tehl.

37. Wisa baş e, bi wî hawê ‘ezîz e
Di axeftin gelek xweş û lezîz e
38. Tu nexwazî êdî ji min mektûban
Zekat nêz bû ‘eqil nema ‘d qulûban
39. De binêre vê şedşala xebatê
Hê *Şofyanî* baz dide l’ dû zekatê

(Gulan 1975)



1. Te şandibû ji me ra çend nameyên tijî sêv
Gelek şêrîn û xweş bûn me pê ra xwar tilî w lêv
2. Me girte xwe maç dikir çavê me bû ronî ye
Me go ehlen ser çavan xwedîyê te li ku ye?
3. Çima nebû ew hatox ew qas dîkin întîzar
Ma qey ne bes e ji me ev qas qêrîn û hewar
4. Hêvîya me ji Yezdan, hûn tim bibin bêkeder
Di her demê sipahî bi dilxweş û bextewer
5. Di gel hêsanîya can hûn werin mal serfiraz
Serbilind û dilbikêf, lê qêrîn û gazegaz
6. Silavan ez ji we ra bi şed baran dişînim
Li ser cênig û enyan misk û 'enber 'dreşînim
7. Ji halê wey nazenîn pîrsa me gelkî heye
Di şuhbeta xewaşan qala we timî heye
8. Di her gava 'm dinalin, dibên ka wan hevalan
Xwuya nakin li rû me ewan çak û delalan
9. Dikêşînin axîned ne li rû ne pîr kûr in
Çewa evan şepalan ne nêzik in pîr dûr in
10. Belê ji dil wiha ye, welatê we pîr dûr e
Welê em hêvîdar in, lewra ne qebra kûr e
11. Hêvîya me tim heye ji wî zatê xaliq e
Hûn bistênin teskere bi halekî malîqe
12. Hûn werin mal pîr bi kêf bi kêfekî bêhevta
Kêfa we bêdawî be wekî kêfa 'd cenneta
13. Eger pîrs kî j' halê me; halê me û hevalan
Pîrî xweş û lezîz in ji wan im ez devkalan
14. Me bihartin rengê xweş di demsala buharê
Welê di dil da heye wê legreşa adarê
15. Hemîşe em diqîrin dibên ya Reb tu rakî
Ew nuqteya reş a dil tu bextê me heval kî
16. Di vê gava em tê da em rêpanê zekat in
Li me nîne tu qerar bê şêr û bê tebat in
17. Zekat hate bendera melê feqîr çavîrê
Cilê bavê ser kerê baz de here benderê
18. Gava diçe benderê dilşikestî tev kul e
Dibê xalo li te be silava min ji dil e

19. Xalo serî hevraz e bêpeyv e xeydan e
Tid'bê ji bav û kala dijminekî giran e
20. Dîsa dibê bereket xalo li mal û can e
Şerm û fedyê davêje ji bo parîkî nan e
21. Xalo her serbilind e jê diçe pir fişefiş
Rûniştîye ranabe, qerimye wek betê kuş
22. Welê bi me pir xweş e evî halê xwedîraz
Eger roja meşerê nebin şaş û belengaz
23. Hêvîya me 'j Xweda ye evan halê dilşikên
Ji mer bike kefarete gunahê me pê hilên
24. Di vê gavê em pênc in barê me pir xeffî e
Lewra havîn e germ e însan gelek ze'îf e
25. Remezan û Mehîfûs û Muhemmed û Îsma'îl
Biçûkê wan Murad e gelek xweş in ne 'elîl
26. Giştî wan pir silavan ji dil û can dişînin
Hemîşe du'akar in, ji bo we ra xemgîn in
27. Li vir dikim daxwazê paşî bînim li namê
Ji we bibim cuda ye di vî şêrînkêlamê

(Pûşper 1975)

1. Me girt ji we sê name
Sêşed xweşî we da me
Wan peyivê b' zarê me
Jînek xweş dan canê me
2. Sipasa min ji we re
Bê zêr û bê ziber e
Dixwazim ez hinêrim
Di her deman ji we re
3. Ji van gulên biharê
Sosinên biskê yarê
Qevdo qevdo bişênim
Da bikin pê debarê
4. Evan gulên me yê bor
Hin şor û hin ser û mor
Babetê¹⁴⁶ bêhna we ne
Karê gêtê jêr û jor
5. Dibên dinya bi dor e
Lê ez dibêim bi zor e
Ma qey dora me nayê
Dijmin timî li jor e
6. *Şofyanî* baş dizane
Ê xebat ke b' jiyan e
Ê tiral û çavlixew
Her bindest û xizan e

(Cotan (Nîsan), 1977)

¹⁴⁶ Babet: Layiq.

1. Şêxê min ez ji te re silavan dihinêrim
Ji bo pirsê rewşa te hemîşe ez şîyêr im
2. Daxwaza min tu zanî, hêvî tu kamuran î
Hûn tev bi hev ra werin serokê we Geylanî
3. Em dê herin Gola Şîn serjê kin berx û karan
Geşta me bit mêrga şîn bêhn dan li siyê daran
4. Di her deman bixwazin dengbêj bo me Şivan¹⁴⁷ e
Tirş û bilxur bixwazin ew erzanê tevan e
5. Ez baş dizanim bo te goştê sergopejlandî
Gelek xweş û şêrîn e di nav rûn da qijlandî
6. Çiqas bixwazî dê bêt ber te ji vî yê gotî
Te d'vê ji yê patî be, te d'vê ji yê biraştî
7. Ax me kurdê bêçare ser dilê me neyar e
Bêhnê li me çikandî 'Elo dibê buhar e
8. Birînên me pir kûr in *Şofyanî* bes bişoje
Ji xwe 'Eloyê me ye cegerên me dinoje

(Gulan 1977)

¹⁴⁷ Şivan Perwer.

1. Pir peyaman ji te re ez rêdikim hevalo
Hûrmeta xwe ji te re diyar dikim delalo
2. Zar û zêçên pir delal çavên wan ez maç dikim
Rêberê riya me bin, ji Yezdan daxwaz dikim
3. Hewce nîne diyar kim ewî razê di dil de
Lewra tu wî dizanî ne niho, dema pêş de
4. Welê dikim peyivim bi qelsî ne bi xurtî
Ji wê tirşa Gola Şîn ji wî goştê biraştî
5. Tirşika me pir xweş e, ya taze ye ne kevn e
Faşûleyê taze ne kundur û alûce ne
6. Hin tiştê din tê hene nikarim ez bibêjim
Lê goştê berx û karê! Ji salixdanê gêj im
7. Ax birê min tu zanî em jî bi çav û guhn e
Ê bêhn li me çikandî, ji me 'Elo w Çelo ne
8. Hêvîya mi j' Xweda ye *Şofyanî* bêje amîn
Ji van caşên bêmêji di nav me de yek nemîn!

(Gulan 1977)

1. Ev nameya min a ha bi zarê mey şêrîn e
Wusa ji min ra xweş e tiştek hemberê nîne
2. Tu çi zarî bidî ber çavê mi da dasî ye
Ger pê bi hev xim tiştek ti d'bê kakl û kuncî ye
3. Tu gazin û lomeyan li min nekî birê min
Dilgirtîya min ew e min rûreş e kekê min
4. Li pey wî ez baz didim sitûxwar û evîndar
Bo wî her tim gorî me, bilê wî min nîne yar
5. Gava bûme ji dayik bi wî zarî girîyam
Dîya min gote lorî di landikê hewîyam
6. Di her dema xwe tev da digote min ha çiçik
Negote "al meme" yan tiştek di nexweşik
7. Dema ku ez axîfîm bi vî zarê 'm gote nan
Ji wê pê ve tu bêje canê min bo te heyran
8. Derd û kulê xwe me rêt bi vî zarê me yê han
Qe 'b serê min nakeve ji no ve dev jê berdan
9. Bêrûmetî ji wî ra nankorî ez dibînim
Ji wî qencîyên mezin li ser kurdan dibînim
10. Mi pir dirêj kir bira, biborî tu kekê min
Ji wî ra ez gorî me bil wî nîne yarê min
11. Birê min ê pir hêja dibe tu pirsî mi kî
Bawer dikim wusa ye lew birayek xweşik î
12. Guh bide min dibêjim der heqê *Şofyanî* da
Gava sihûd parve bû Xwedê para wî neda
13. Tim binal û kalîn e ji derdê gelê bindest
Tim biqêrîn û şîn e bo wê feleka bêbext
14. Ev feleka me ya ha çira ew qas xayîn e!
Ji bilê vî gelê kurd dijminê kesî nîne
15. Bawer bikî nizanim çira ew qas bêdad e
Sitîyê me xilxiland, ji bin xwe me bernade
16. Ez nizanim qey ker e vê qêrîn û girînê
Ji vî gelê belengaz qe carekî nagîhnê
17. Ka bêje min birê min ez bi xwe metel mame
Di vê rewşa me ye ha ji hişê xwe wenda me
18. Gelo qey em ne îns in di vê dinê bênav in
Tu dev ji dijmin berde çira ew qas em xav in

19. Tu dêhna xwe didiyê xwîn di dev ra davêje
Gava bêjî gunehko kafir ji ter dibêje
20. Lêbelê ez lê nagrim guhê wî xitmandî ye
Ji sîtema zordaran berçavê wî tarî ye
21. Di gel vê jî dibêjim kêfa te bila hebe
Hêza te ya veşarî bila neşkê kêma nebe
22. Lewra zanayên me jî xebateka baş dîkin
Darik bi destê wan e guhê wî paqij dîkin
23. Bo wê perdeya tarî hêrîşek dijwar dîkin
Bi guhê wê girtine diçirînînin radîkin
24. Birê min tu biborî mi pir zêde xeber da
Lewra ez mame bêhêz hember van kul û derda
25. Ax birê min tiştêk dî dikim ji te ra bêjim
Xwîn û xirarê bînim ji dilê xwe birêjim
26. Roja Yekê Adarê bi sitûyek şikandî
Mi devê radyê vekir bi tilîyek birandî
27. Dengê ji dûrî ve hat nişka va ket guhê min
Bi wî dengî helîyam, peritî hinavê min
28. Pir çûk hatin canê min li serê min hiş nema
Li min kovan barîyan, ez bûme tûrê xema
29. Ev dengê ko dibêjim dengê serokê me bû
Serokê me Barzanî ji dinyayê verê bû
30. Di despêka bîstinê dilê mi pir şikiya
Piştî ko ez ponijîm dilê mi xweş hewîya
31. Me go dêna xwe bidê xebateka mezin kir
Bo dijminê gelê xwe serê xwe qe xwar nekir
32. Her kejmêra jîna xwe kire gorî ji bo wan
Da ko ew jî azad bin navdar bibin li cîhan
33. Ev şerefek mezin e, tu carî qe ‘j bîr nabe
Dê navê wî her bijî ciyê wî nav dilan be
34. Bo wê doza ko dikir îro em tev şiyar in
Ê ko ciyê wî bigrin ne şed in, ne hezar in
35. Bi şer û xebata xwe qencîyeka dîyar kir
Em di xewa giran de raza bûn me şiyar kir
36. Bawer dikim bi dilî vedibrim bi zimanî
Bi dengê şoreşa wî ji xew rabû *Şofyanî*
37. Hêvîya mi j’ Xweda ye gora wî tije nûr e
Xemlandîye ji gulan, kêmahîyan bibore

(Adar 1979)

1. Birê min şêrê şêran î
Ji derda ra tu derman î
Ji bo me ra tu giyan î
Bijî gula civatan î
2. Ji zû va ye te nabînin
Reben in tim biaxîn in
Dilbikul û tev birîn in
Tu dermanê birînan î
3. Birîna me pir helak e
Hela were perdê rake
Hin baweşîn hin derman ke
Bo me hekîmê luqman î
4. Şev û rojê me xew nîne
Birîna me binî nîne
Ji ber vî ye me tim şîn e
Bawer dikim ti jî zanî
5. Wek şîşa şor di dil da ye
Çavê me bê ronî maye
Qîr û girîn bêmifa ye
Zû ke qudûmê çokan î
6. Dinya li min tev bûye gur
Tarî zindan e vir û wir
Şettû'l-‘Erebê bê bihur
Zû ke were bihurzan î
7. Birê şêrîn hêz bide xwe
Dest bavêje dermanê xwe
Zû gihîje birayê xwe
Ew ê birîndar *Şofyanî*

(Gulan 1979)

1. Hêvîya mi j' Xweda ye dilgeş î bêkeder î
Pir dilxweş û bikêf î, bêkovan û keser î
2. Silavê me ji te ra ji bala bêne xwarê
Wek bagera ziftanê, an tavîyê buharê
3. Ser û çavê biçûkan radimîsim maç dikim
Jiyana wan bi xweşî ji Yezdan lava dikim
4. Lavakar in em ji te tu evro werî vira
Li vir şevê borînin di gel me şêrê şêra
5. Evî şêrê ko me got 'Elî Axê Kerxî ye
Çêtir ji min tu zanî Şêx Muhemmed Seyrî ye
6. Şeva xwu ko me borand dê em rabin gelek çê
Dê em herin Dêrxustê gundek ji gundên Licê
7. Yê dil mede pir şêrîn dê kom bibin li wêrê
Divêtin mehrûm nebin em ji xêr û bêrê
8. Bi dîtina hevalan çavê xwe em ronî kin
Dê xweşîyek bête dil, îcazê guhdarî kin
9. Dêna xwe ji dil bidê ger tu neyê poşman î
Napeyivin bi tera birê şêr û *Şofyani*

(1979)

1. Te hinartbû ji me ra birê hêjayê delal
Nameyeka rengareng, tije sêv û pûrteqal
2. Zivistan bû lêbelê bêhna gulê buharê
Difûrand, em xemîyan, ser danî biskê yarê
3. Piştî çend roj û şevan me zor çavê xwe vekir
Wan nêrgizêd hinarî girt û lê temaşe kir
4. Me gote wan ser çavan sosinên biskê yarê
Win yê roya cejnê ne, Bîst û Yekê Adarê
5. Di Newroza cejna me divê em we bidin hev
Bo hev bikin diyarî agir dadin geş bi şev
6. Hêvîdar im kekê min gunehê min veşêrî
Barê min pir giran e, kêmahîyan biborî
7. Zû ve ye min diviya ji seyda ra hinarta
Nameyeka rengareng derd û kula qewarta
8. Dê biba bersiva we, fire bikra dilê we
Birevanda xemê we sivik bikra barê we
9. Xweda me anî dinê di bin destê neyara
Jînê kire para me di nav ker û dewara
10. Derdê neyar giran e lêbelê tê kişandin
Evan kerê nava me dil û gurçik çirandin
11. Gava bête zirînê heta karî bêje hoş
Tu car ew naraweste te kar nîne bêje şoş
12. Tu carî tu neşî pê, dê te bêguh bihêle
Lê gava dijmin werê direve wek kihêl e
13. Wekî kerê bihefsar pey dijminê xîdar e
Lê ji bo pismamê xwe pir bihêrs û dijwar e
14. Ax birê min wisa ye tiştê me got hindik e
Têra fîşkê wî nake her kitêb û pirtûk e
15. Dîsa ez lê nagirim wî nakim ez gunehbar
Ê van tiştan pê dike jîna bin nîrê neyar
16. Pir birçî ye, perîşan, bê te'lim û tûre ye
Ji xwendinê bêpar e, şeytan neyarê me ye
17. Eger bi serê xwe ba, bi zarê xwe bixwenda
Dê biba cejn û dawet li bajar û li gunda
18. Ez çi bêjim bi kurtî, ji ber serê me dêşe
Bi şev xewa me nayê dilê me pir biêş e

19. Bo vî ye em bêhiş in, nagihîn daxwazên xwe
Timî dûr û bêagah ji dost û hemrazê xwe
20. Kêmahîyan biborî me pir kire gotegot
Seydayê hêja delal! Ji bêgavî me dil şot
21. Bawer kî ez naxwazim birînan napan bikim
Qaşmûşê wan hilînim xwey bigrim pê wer bikim
22. Ger timtêla me pirs kî e d'bêjim qey dizanî
Pirê jîna xwe borand me qet nedî erzanî
23. Me fir da deşt û çiya, li hev xist mêrg û zozan
Em vegerîn warê xwe bûn Dodoyê Qulingvan
24. Tiştê ez tê digîjim dê em ê her wuha bin
Serxwebûn û xweşî jîn bo ên di pey me ra bin
25. Me qalibê xwe diye bo xwe tişteke naxwazin
Bo gulê paşerojê bi lava û daxwaz in
26. Ya reb tu wan reha kî ji bin nîrê neyara
Jînek xweşik bidî wan di nav gulê buhara
27. Timtêla te napirsim e' jî weka te zanim
Te pir pîva û ro kir şadang û ceh û genim
28. Evro vingî vala ye ew ê çapa pîvanê
Ne ceh e ne genim e hêvî nîskê razanê
29. Germ û gurê silavan wek tavîyê buharê
Li ser we xweş bibarin ji bala bêne xwarê
30. Sitêrkê rûyê erdê kulîlkê paşerojê
Çavê wan radimîsim diyar kim hîv û rojê
31. Hecî 'Abid titûnvan Mîm Tahirê Nêçîrvan
Bo wan dikim diyarî qevdek gul û silavan
32. Qevdê gul û nêrgîza demsazê koma we bin
Sosin û beybûnê geş hogirê mala we bin
33. Hey nameya *Şofyanî* fir bide here çiya
Gihîje Seyda Seyrî li nav dehl û diriya

(Adar 1987)

1. Min diviya ez ji te ra binivîsim çê bira
Bi zimanê me yê şêrîn derd û kul û keder
2. Welê neşim binivîsim bi wî zarê şêrîn e
Ji qurmê da hilkişandin meqes danê birîne
3. Li min negrî *Şofyanî* me hewya min bê wî nayê
Lewra ji min cuda nebû cirkî mi gote dayê

(11-1990)



1. Seydaê Yehya Mela
Te agir berda dila
Wê peymanê te da me
Ew jî bû barê mila
2. Barê me barê loka
Di bin da têne çoka
Di cî da hêz didin xwe
Difirin wek firoka
3. Çavê me l' rê qetîya
Gelo li ku ma vîya
Me got û em metel man
Me go qey bûye keya
4. Seydaê Şêx Omera
Li cem me taca sera
Berê xwe ka vir da ke
Bavê berîkê pera
5. Birê hêjayê delal
Welatê şox û şepal
Gelê me yê pelçiqî
Jê dere pir nalenal
6. Niştimanê b' nav û deng
Li xwedîya bûye teng
Ciyê wan tê nemaye
Mêjî tije bûye zeng
7. Heta ew vê zenga ha
Neşon navên dera ha
Tev bi hev ra nebin yek
Tu car ew nabin reha
8. Hey *Şofyanî* bargiran
Bêje bi dev û diran
Yan ne di paşerojê
Dê l' te bikin nifiran
9. Nifirê wan giran in
Lewra gelek nezan in
Bo wan nekin xebatê
Mela fedaê wan in

(Miha Yekî (Çile) 1989)

1. Birê xemgîn Seyda Seyrî *Şofyani* jî çûye çiya
Ew jî wek te hûr dinêre li zinar û li devîya
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zela
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?
2. Rondikê min rê nadin min ez digirîm ev çi hal e
Ez ketime gola xema min ne dost e ne heval e
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zela
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?
3. Derim hucrê kesek nîne tême mala xir û xalî
Dî hundir de metinxûn im ge l' vî alî ge l' wî alî
Sed ax û wax sed ax û wax ji dest me çû jîna zela
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?
4. Ez veqetîm ji refa xwe تنها derim li newala
Weke teyrê perşikestî di hêlîna vingî vala
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zela
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?
5. Tê bîra te aya gelo? Wan gul û nêrgizên rengîn
Me bêhn dîkir di buharê li bin biya li Gola Şîn
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zela
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?
6. Li ser mêrgê li dora me dixwend şalûl û bilbila
Derd û kulên me radibûn sivik dibû barê mila
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zela
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?
7. Min fir dida te fir dida em li Mejdo digîştin hev
Royek dûr û me hev nedya tarî dibû roj dibû şev
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zela
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?
8. Çile nîva zivistanê buhar bû meha Nîsanê
Bayê bakur berf û baran gul û kulîlkên gulanê
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zela
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?
9. Hela cara bi me ra ba Seyda Emîn birê durust
Em nêzîkê Xweda dibûn di nav me da dima buhust
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zela
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?
10. Mala minê mala minê îro di bin axa sar e
Xatir xwest û go elweda' binê erdê bo wî war e
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zela
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşeliqya delal?

11. Hela hela tev derew bûn wan kêf û serdanê me kir
Li ser mêrga li rex çema wan geşt û seyranê me kir
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zelal
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşelîqya delal?
12. Têb bîra min bawer nakim cejn û kenîndanê me kir
Dibên xewn in yan xiyal in govend û dîlanê me kir
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zelal
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşelîqya delal?
13. Tilfişatê ez li Xweylîn qêrîn dikim hey hewar e
Dengê min nagîjt kesî dora min dar û zinar e
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zelal
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşelîqya delal?
14. Ez dê bêjim bê rawestin ta zinarî bihelînim
Arê 'îşqê dê geş bikim ta wê darê bişewtînim
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zelal
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşelîqya delal?
15. Karê dinê hatin û çûn *Sofyanî* pîr baş dizane
Bes xebatkar ji bîr nabe di bin axê bi jîyan e
Şed ax û wax şed ax û wax ji dest me çû jîna zelal
Kanî Kerxê kanî Şofya kanî Çavşelîqya delal?

(Çirîya Dawî(11) 1992)

1. Seydayê min Mela ‘Elî
Baş û raşê tije gul î
Tu şêrînê nava dil î
Înşallah bêderd û kul î
2. Hêvîya min ji Xweda ye
Çi tengî bo te nedaye
Dî şadî û xêr û xweşî
Te çi xwest û bo te daye
3. Lavakar im ji Yezdanî
Zarokê te b’ şadûman î
Mezin bibin jîr û zana
Dî rêça Seydayê Xanî
4. Ez dibêjim piştî vîya
Konê te l’ navsera çiya
Barê te gelek giran e
Tu seydayê nav şofiya
5. Gundê te tev de şofî ne
Dî emrê şêx de mirî ne
Cîran neyarê cîranî
Wek Şedam û Xumeynî ne
6. Ger emrek bê ji Karazê
Ew şev kesekî ranazê
‘Eysê gazî dike Fatê
Zû ke çêleka me nazê
7. Ji bo şêx re bi gorî ye
Her yek neyarê ê dî ye
De ka kerem ke tu bêje
Evya li ku; dîn li ku ye?
8. Dersa rastîn nedîtîye
Guh xitimî çavgirtî ye
Ger bixwenda dê bidîta
Ku nêvê dîn cîrantî ye
9. Xwedê bide hiş û mêjî
Sivik bike barê te jî
Taca serê me “biratî”
Benîştê me “rastî bijî”
10. Eger pîrsa mi kî seyda
Ez bûme bilbilê şeyda
Nalîna min di gulzarê
Şev û rojê gulê neda

11. Gelo heye royek were?
Vebe gula taca ser e
Weke bilbil bixûnin em
Li dora wî gula zer e

12. Ez dinêrim li gerdûnê
Cuda nîne ji hêtûnê
Ji bo min ê jiyan dojeh
Dirêjim rondikê xûnê

13. Lavakar im ji Yezdanî
Bide mi jî kamûranî
Dojeh here were beheşt
Bêje amîn weke zanî

14. Birê biçûk ê “*Dilkanî*”
Fermana te bi cî anî
Bo te şiyand wê risteya
Cixareya goristanî

15. Seydayê min gelek zana
Bêje bo kal û cuwana
Berdin cixareya bîno!
Da bijîn bê êş û jana

(Meha Dozda, Du hezar û pênc, 2005-12)

Geşta Serhedê

1. Dawîya heyva pûşperê
Ji Amedê em ketin rê
2. Mêjû du hezar û şeş e
Havîn e bo geştê xweş e
3. Di gerê de heşt mirov in
Tev de bo zanistê tov in
4. Du bijîşk û yek endezyar
Sê mela û yek hîndekar
5. Mamosteyek hêja û rind
Li zankoyê payebilind
6. Rawestgeha me ya pêşîn
Êliha petrola rengîn
7. Me vexwendin firavînê
Ta qirîqê ketim şînê
8. Me kurmançî kir tar û mar
Me nanê xwe bi tirkî xwar
9. “Hoşçaqalin” me gote wan
Li rêya xwe ‘m bûne rewan
10. Ji Bedlîsê çûne wê da
Li Norşînê me bêhn veda
11. Wêrê hemî bi kurdî bû
Civata me bê fedî bû
12. Dab û nêrîtên di berê
Didomandin li wê derê
13. Seyda digot ji nava dil
Feqî dixwend weke bilbil
14. Sê medrese hebûn li wir
Her yek xweser bi mişt û mir
15. Belê di gel qîm nekire
Çavkul ji yê kor çêtir e
16. Me xatir xwest berê êvar
Em çûne Tetwanê bi xar
17. Şîv dane me bi rêzdarî
Ji me sipas li wan barî

18. Civata me gur û germ bû
Ta wê gavê çî ne şerm bû
19. Dor hate xwenasandinê
Tirkî ji nû hate dinê
20. Lê hevalek dest avêt şûr
Serî firand çû gora kûr
21. Ta dawî vê nasandinê
Bi kurdî hate gotinê
22. Lê kurdî dîsa ket binî
Tirkî bi ser ket û kenî
23. Di dilê xwe min gem dikot
Lê mamoste dersê digot
24. Teva ji kurdî xatir xwest
Bûn tirkê hûr serxweş û mest
25. Bênezer be ji nava dil
Tirkîrêj bûn weke bilbil
26. Dawîya dersê hat dema
Kurdî bû şadîman û ma
27. Serê sibê dema taştê
Tirkî têk çû ket ser piştê
28. Kurdî di ser gefa dixwar
Karê tirkî tim zarezar
29. Zarîna wê 'erşê Xwedê
Gihîşt me got qet guh medê
30. Me xatir xwest em suwar bûn
Ber bi Nûrsê li rê kar bûn
31. Me silavek da Xîzanê
Me got zû kin Xeyda kanê
32. Em gihîştin Xeyda bi nav
Hê hê me got dinya bi gav
33. Ge l' ser xetê ge l' bin xetê
Çî bixwazî l' beşna te tê
34. Di pey wê da gelîyek tê
Dibên Gelyê Sipayêrtê
35. Ew herêm nav Sipayêrt e
Sitareyek gelek xurt e
36. Me xwe berda nava gelî
Xuya nake ax û xwelî

37. Li dîmena ku dinêrî
Xwe nabînî derî w derî
38. Ev Îrem e, ev cennet e
Pêşberê wî kêmrûmet e
39. Hêleka te çê bindeq e
Hêla dinê xweşfisteq e
40. Bêsalix e xemla gelî
Tije şalûl û bilbilî
41. Em gihîştin gundê Ustad
Warê pîroz pir bûne şad
42. Mizgeft û mala wî me dî
Kûr fikirîn bûn bêxwedî
43. Bi şed şalî bi dûr ketin
Ji vê dema em tê ketin
44. Ji xiyala kûr bûn şiyar
Ji Nûrsê ra bûn peşindar
45. Me got Nursê pir şanaz î
Bûyî warê vî şehbazî
46. Şahê bazên di ‘ulûma
Ê ku wî dî heyirî w ma
47. Jê re gotin nuwaze ye
Bêemsalê dema xwe ye
48. Lê mixabin em bûne kund
Dema me dî zarokên gund
49. Bo me gotin “hoşgeldiniz”
Ez ziwa bûm bûm kevrê biz
50. Hişê mi çû çelq bû mêjî
Heta bi dev bûme tijî
51. Pir sosret e evî gelî
Wek bezê ber rojê helî
52. Zarokên navsera çiya
Dijîn di şax û gelîya
53. Zarê kujer bi wan xweş tê
Zimanê dê bi wan reş tê
54. Ji dest me çû çiya w gelî
Li serê me ax û xwelî
55. Ziman ku çû têkoşero
Tê çî bikî xwelîlsero

56. Kûrbira me birê zana
Berpirsê vê rewşa hana
57. Çavên di xwe baş fire ke
Li fêl û fendan mêze ke
58. Dîn weke şûr di dest wî de
Koşkê çêkir di gelî de
59. Ger ji dû wî venegerî
Tê ker û lal herî w herî
60. Em vegerîn xemgîn ji can
Ber bi Wanê bûne rewan
61. Ber û berê behrê em çûn
Dî nîgaşê kûr de noq bûn
62. Em gihîştin Wana rengîn
Me fir da ser kela dêrîn
63. Me gotê hey kela kevnar
Gelo serê çendan te xwar
64. Demek bûka l' hespê suwar
Îro kavl xirbê diyar
65. Ez lê gerîm her xan û man
Pêrgî mi hat xortek cuwan
66. Bi kurdî min pirsek jê kir
Bi tirkî got min fêr nekir
67. Min gotê ma tu ne kurd î
Got belê bê şerm û fedî
68. Ez kurd im û ez ji Wan im
Lêbelê kurdî nizanîm
69. Bavê min kurdî dizane
Min hîn nekir şerma wan e
70. Ka binere l' vê sosretê
Jê bigre ders û 'ibretê
71. Xortê kurd û Kurdistan e
Tîpeke kurdî nizane!
72. Me xatir xwest ji Kela Wan
Li malekî 'm bûne mêvan
73. Bi rûmet bi nîrxek pîr
Ji xwarina xwana me gur
74. Hebû li kurdî fetl û fet
Geh tîk diçû geh b' ser diket

75. Tirkî bo her kesî nazdar
Kurdî melûl û ustuxwar
76. Rojê li me ku da silav
Em ketin rê weke her gav
77. Me serda Panos û Kopê
Li pey xwe hişt xêz û şopê
78. Li Kopê min tiştek vegot
Dilê birê Yaqûbî şot
79. Em çûn wek av û agirî
Bî şev civîn li Agirî
80. Dersa me dîsa tirkî bû
Lê mijarek bihêvî bû
81. Rûyê pira bi ken û geş
Lê çendikek mirûznexweş
82. Hemû kurd bûn çend xapandî
Derbarê zarê birandî
83. Digot roja qiyametê
Dema mirov çû axretê
84. Pirsê Xwedê ji îmanî
Pirsê nake ji zimanî
85. Nizanibû alîkar e
Bo zalimê gurê har e
86. Şûrê zalim xweş tûj dike
Davê zarê xwe jê dike
87. Xwedê dibê dojah war e
Bo ê zalim alîkar e
88. Hey pereyo! Çi diwar î
Xefkujer î reşemar î
89. Bo çavî perdeya tarî
Guh û mêjî re zingar î
90. Pere gera bêbinî ye
Ê xwe berdê fetisî ye
91. Bêhêvî be riş jê çûye
Termê wî xurê masî ye
92. Serê sibê me hişt wêrê
Gerîdeyên me ketin rê
93. Em çûne Bazîda seyda
Giyanek nû li me veda

94. Bilez firîn serdangehê
Bexçê beheşt horîgehê
95. Lû'lûê wildan lê bimeş
Beheşt seyda tê de xweş
96. Me gotê hey seyda Xanî
Rast e bo kurda giyan î
97. Destan qefalt dil pê mebest
Bê dilê xwe xatir me xwest
98. Em daketin koşka paşê
Pir hêja ye bo temaşê
99. Dîrokî ye, rindpirtûk e
Gelek pîr e weke bûk e
100. Me dît gora Mîr Mehmed Beg
Çavê me ronî bû gelek
101. Ew e ji bo koşka rengîn
Xwedanê destpêk û pêşîn
102. Mîr Mehmed Beg pir belalî
Navê wî bû li her alî
103. Xanî dibê ji riş û can
Kan padişahê Serhedan
104. Zêmara wî ka binêre
Çiqas pesindar e jê re
105. Ji Bazîdê xatir me xwest
Bi nîgaş û aşopa mest
106. Me xwe berda Erziromê
Serhedê zozan û zomê
107. Ajokara me firandin
Gelek şara me gerandin
108. Mala wan gelek ava be
Tije ji bûk û zava be
109. Li Erziromê şiv me xwar
Kurdî dikir qîr û hewar
110. Geh kom dibûn em li dorê
Geh wer dibûn di xurxorê
111. Serê sibê em rê ketin
Li Çewligê em daketin
112. Kurdî reben weke borî
Tirkî bi mircan û morî

113. Dawîya geşta Serhedê
Hat êvarî li Amedê
114. De ka bêje kurdê Medî
Gengaz e tu nekî fedî
115. Civata te kurdên xwerû
Zarê te lê bê av û rû
116. Zimanê te barê mila
Zarê biyan ji nav dila
117. Zarê biyan re bilbil î
Zarê xwe re zimankul î
118. Bi zarê xwe tu netew î
An na tu nêçîr î, kew î
119. Bi destê xwe tu xwekuj î
Goh dêre xêrê bêmeji
120. Her kes dibê qamûsa me
Ne cuda ye j' namûsa me
121. Êrîşa ser qamûsa me
Êrîşe l' ser namûsa me
122. Li ser zarê te tim şer e
Her rojê hêlek jê dere
123. Mil jê kirin dora ser e
Li cem te qet, xêr xeber e
124. Eger tu neyê xîretê
Rûreş biçî qiyametê
125. Zarê te bo te ni'met e
Şêna Xwedê re ayet e
126. Xwedê dibê reng û ziman
Bo min in ayet û nîşan
127. Li nik Xwedê zar yeksan in
Di mafan de wek biran in
128. Ê bêje mafê te nîne
Li bal Xwedê ew bêdîn e
129. Xwedê daye te vî zarê
Ji te digre vî xîdarê
130. Gelo tu qe nafikirî
Bo çî li te asteng kirî
131. Eger bira tu nizanî
Û bihiş î misilman î

132. Îslamê jî xweşik zani
Tu baş goh dêr e *Dilkanî*
133. Rehperest e, rehperest e
Bo rehê xwe har û mest e
134. Bo nijada xwe feda ye
Armanca wî ne Xweda ye
135. Ger dîn li dij rehî derê
Dê êrîş kî bi xincerê
136. Şûr dê kaş ke bajo serê
Perçe bike bi keyberê
137. Tu her duwan bidî bere
Bêjî bigre yekî, ferê
138. Wê dîn di çalê wer bike
Regeza xwe hembêz bike
139. Oldarê wî wuha gêj e
Bêdînê wî tu bibêje
140. Ew dizane ew çi dike
Bi dîn rehê te pûç dike
141. Ê ku ji dîn bêxeber e
Dîn jê re wek tevzîner e
142. Fêlbazo pir bi kar tîne
Li nezana xweş dixîne
143. Lê ê ji dîn ku haydar e
Bi çi hawî pê nikare
144. Zane îslam hemî dad e
Zarê kesê girê nade
145. Her kes wek hev xwedîmaf e
Tê de nîne dam û daf e
146. Li min negrin dirêj mi got
Vî rewşê pir dilê mi şot
147. *Dilkanî* me rast û durust
Ava zelal di tas û mist

(Tîrmeh(7), 2006)

1. Hey birayê xweşik î
Bi gundê xwe Reşik î
Tu vê îne xelişî
Îna hatî xwe d' ku kî?
2. Me şendîye dîzikê
Tê de çekin tirşikê
Bawer kî em nahêlin
Car di herî Reşikê
3. Dêna xwe bidê binê
Bigre goştê bizinê
Dîzikê baş tije ke
Bigre bavê firinê
4. Tu rika me baş zanî
Rika şêx û *Dilkanî*
Ger li dîkê sor deynin
Dinêrî hêkê anî
5. Ji gundê xwe vegere
Bilez ber bi me were
Dûr ve gazî ke bêje
Ez radest im ji we re
6. Me kêfa xwe pir anî
Gelek me kir rêpan î
Dê seyda rêz ke îne
Goştê berx û beranî
7. Dema îna me nêz bû
Kêf û şahî bihêz bû
Serwerê bîrdanka me
Seydayê me y' birêz bû
8. Me hinartê peyamek
Lewre borî heyamek
Da me bersivek xemnak
Seydayê me y' mubarek
9. Got ez çûme Senbolê
Ev î jî çû ji holê
Nîgaşa ku we dikir
Gêr bû çû kete golê
10. Me got xema me nîne
Piştî şex roja îne
Şêxê me pir bikêf e
Dilkanî ne xemgîn e

11. Me dîzikê xericand
Di firinê sincirand
Em rêpana te dikin
Kar û barê xwe qedand
12. Me çendek kir rêpanî
Seyda kulîlka kanî
Li wê xwe dabû erdê
Qet kêfa me nedanî
13. Digot ez li Senbolê
Mekin vê heyteholê
Dema ez hatim welêt
Lêxin def û daholê
14. Hûn dizanin ez kî me
Seydayê Reşikî me
Ser jê bikim gayê şor
Dayoxê nanekî me
15. Bişebirin ta ez tîm
Min nebînî nizm û kêr
Bi gorîya we dikim
Walî di gel qêmeqêr
16. Nebî hûn bibin xemgîr
Lî mi din keyber û tîr
Ber lingê we ser jê kim
Xam belindir, xam tiştîr
17. Me got rast e em zanin
Nexweşê bêderman in
Sê roja te nebînî
Em bêrih û giyan in
18. Seydayê ‘Ebdulqadir
Pir zana û behadîr
Were ji ser me rake
Bayê çile, qeşa w qîr
19. Buhara rasteqînî
Dawî li çile tînî
Gula meha gulanê
Gulzareka rengîn î
20. Ah û zarî me kir rêz
Deng çû seydayê birêz
Bê rawestî vegerî
Tev şahî û xeml û xêz
21. Me kir hewar û gazî
Pêk ve bikin pêşwazî
Me rê w resmek li dar xist
Weke çewa bixwazî

22. Seyda piştî silavê
Fermanek da wê gavê
Sibê kom bin her wekî
Daweta bûk û zavê
23. Me kar û barê xwe kir
Hemî heval û hogir
Di gel seyda em kom bûn
Li ser xwana hûr û dur
24. Çi bixwazî diîsa¹⁴⁸
Wek Maîdeya ‘Îsa
Bi rêz berdabû erdê
Zîv û zêrê di kîsa
25. Ger ew Hatemê navdar
Bidîta xwana maldar
Dê seyda re secde ba
Jê re biba xizmetkar
26. *Dilkanî* xweşheval î
Kurdekî zarzelal î
Derbarê wê merdîyê
Ji salixdanê lal î

(Adar 2009)

¹⁴⁸ Îsîn: Çirisîn.

1. Remezan ketbû havînê
Amed dişot ax û kevir
Cilê li me didan tînê
Hinav dişot arê li wir
2. Ê diqedand diçû bêcir
Fir dida zozan û çiya
Xwezî bi xêra ê li wir
Xêra mezin weke çiya
3. Di havînek em jî revîn
Me xwe avête Westînê
Zomek hênîk û nazenîn
Dûr bûn ji germa havînê
4. Li ser Bedlîs gundek şêrîn
Di nav Tetwan û Xîzanê
Tev mêrg û zozanê hêşîn
Hêjayê geşt û seyranê
5. Em bûn dilek me hev heband
Em bûn bîra ji dil û can
Me razê xwe bo hev rijand
Em ji hev re bûne heyran
6. Ji bîr diçû xwar û vexwar
Bi nêrîna li wî warê
Hezar û bilbil xwendekar
Li ser ban û li ser darê
7. Dengê avê me fikir xew
Di nav gund de diherikî
Me pîr didîn xewnên bedew
Dema ku ew dixuşikî
8. Warê wuha bêjimar in
Li Kurdistanê têr pîr in
Lê bindestê gurê har in
Ji me girtin wêran kirin
9. Vî warê ha warê şêra
Weke hemû Kurdistanê
Di buhara not û çara
Roma dabû ber talanê
10. Buhar lê kirbûn zivistan
Çileyê qir û qeşayê
Wan hirç û hovên bêîman
Rûreş bibin li dinyayê

11. Agir berdan her xan û man
Tev hilweşîn mabûn dîwar
Niştecih û cilê xwe man
Bûn koçerê bêpez û war
12. Ji roma ra nebûn xulam
Da şerefa wan bixuyê
'Enî paqij man weke cam
Bê deqa reşa l' 'enîyê
13. Laiqê kurd ev e bira
Cerdevanî riswaî ye
Şêr dibe xulamê gura
Karê şêra mêrxasî ye
14. Mêrxas dîsa l' warê xwe ne
Kula hova bi hova ma
Li ser av û axa xwe ne
Rûreşî para ceşşa ma
15. Westînê xweş nav û deng da
Me nav lê kir gundê şêra
Kurdîtîya xwe berneda
Berxwedan bû nîşan jê ra
16. Berxwedan jiyan e gotin
Sing dane ber tîra dijmin
Wek pilingan bi ser ketin
Hindik in van pesnên ji min
17. Eger her kurd weke wan ba
Mêr û şêrê roj û şev ba
Fedakarê mal û can ba
Çara dijmin dê bes rev ba
18. Mînakeka pir hêja ye
Vê berxwedana Westînê
Serkeftin para kurda ye
Ger yek bin û berdîn kînê
19. Heta ku em tev nebin yek
Mîl nedin hev weke bira
Û nedin dû pêşewayek
Dê her bibin xurê gura
20. Bêyekîtî dû heval î
Her bindest û ustuxwar
Ser nakevî bes binalî
Bêrûmetê ber dîwar
21. Ji hev hes kin bidin dû hev
Ji hevûdu dûr nekevin
Bibin yek guh û tim yek dev
Ji bindestîyê derkevin

22. Em hêvîdar in bi xurtî
Lewre em jî bûne netew
Me berda êl û 'eşîrtî
Weke berê em nabin kew
23. Şerê xwe b' xwe malê bar kir
Reş û tarî de wenda bû
Çeka fêlbaz sifirke kir
Bêhêvî ma kor wenda bû
24. Pêwîst e em ne rawestin
Tê bikoşin cuwan û kal
Ta ji welat bê derxistin
Bi çi bibe li ser me mal
25. Te l' jêrê xwe l' jor dibîne
Çi qominîst çi misilman
Ew çi bêje te d'xapîne
Mebe heval, mebe cîran
26. *Dilkanî* wuha bawer e
Rast yeqîn e xelet nîne
Ê li pey roma li kar e
'Estîkoj e ya jî dîn e

(Tebax, Gelavêj 2012)

Bêxwedî ne

1. Em bêxwedî ne bêxwedî
Di davikê her dem xwedî
Di qefesê kewê kedî
Alîkarek bo xwe nedî
2. Bêxwedîtî 'eyb û 'ar e
Kêmahîyek bêjimar e
Ê jê bibe xwedîpar e
Bêrûmetê herî jar e
3. Ê bêxwedî şermisar e
Ji şerefê ew bêpar e
Li rû dinê ustuxwar e
Di qeydê da zarezar e
4. Karê wî gazî w girîn e
Kesek hewara wî nîne
Kê ra bêjî lê bikîn e
Her kes wî neheq dibîne
5. Wek sêwiyê bê dê w bê bav
Çi kesek lê nade silav
Di tarîyê lê nade tav
Tî û birçî bê nan û av
6. Bêxwedî her roj dimire
Tal û tîrş e b' rihê xwe re
Kulî kulî b' rê da dere
Gora kûr jê ra çêtir e
7. Xwedê neke para kesî
Er gul be her dem çilmisî
Wer şêr be dê bibe pisî
Bî hesreta nanê tisi
8. Macerayek bo we bêjim
Bêjîngê bigrim biwêjim
Tenûra dil da bipêjim
Hêsîrê xûnê birêjim
9. Di baxê dil da me danî
Binefş û gul û rîhanî
Her kulîlkên canî manî
Di wî baxê asîman î
10. Beybûna pel sipî û zer
Me jê fikir dima bêper
Sosina pir nazik û ter
Em pê şa bûn bike bawer

11. Me dinêrî li asmînê
Li kêleka yasemînê
Nêrgizê me dikir bînê
Em bûn Mem û bax bo Zînê

12. Kulîlkên wî erxewanî
Hin zer û wek ze'feranî
Neqş û niqûşên lê danî
Xweşiktir in ji ên Manî¹⁴⁹

13. Baxê me baxê rehmanî
Dergevanê wê rîdwanî
Wek ceneta asîmanî
Xwezî tê ba nemir Xanî

14. Me ava selsebîl anî
Baxê me bû mêrg û kanî
Ref bi ref çûkan lê danî
Bû cihê geşt û seyranî

15. Xuşxuşa ava sûlavê
Her dema lê bida tavê
Rûdiniştin em di navê
Dibarî nûra xunavê

16. Me şuhbeta şêrîn dikir
'Endelîban wîrîn dikir
Şalûlan xweş kalîn dikir
Hezaran her nalîn dikir

17. Bilbil li ser şaxa gulê
Helbest dirist weka melê
Dikenîya dihat kelê
Guh neda lale w sunbulê

18. Her pêşê çuka l' ser daran
Xweş dengê ney û nayê wan
Olan dida bi asîman
Bilind dibû tala mekan

19. Nişka va hat ê talankar
Dagirker û zêde xûnkar
Pir bêbext û her sîtemkar
Me j' hev û dû kir tarûmar

20. Di rû wî da em bûne mat
Bûn ustuxwar û bêlebat
Hat serê me ev karesat
Kesek hewara me nehat

21. Ên ku weka *Dilkanî* ne
Alîkarê wan tunîne
Lewra ew jî bêxwedî ne
Bêxwedî ne bêxwedî ne

(Bêxwedîtî, Reşeme, 2020)

¹⁴⁹ Manî: Neqaşekê Çînî.

Şîretên li Feqîyan

(Benda hînkirinê)

1. Ka hinek goh bide min feqîyê jîr û delal
Goh bide şîretên min bi hişekî pir zelal
2. Kitêba xwe baş hil ke paşê baz de yeka din
Bi te herî şêrîn be hînkirin û helkîrin
3. Kitêb û berjorbirin bê hînkirin şevreş e
Derkeve ronahîyê heta karî bimeşe
4. Bê hînkirin tu lez kî bi jor ve herî herî
Tê pîr deman fedî kî poşman bibî vegerî
5. Lê bizanin bixûnî weka feqîyên berê
Her dem serê te bilind tê bibî gula hucrê
6. ‘Îlmê şerfê hel bike û tê de baş bipije
Bîrdanka xwe tije ke ta di ser da birije
7. Î‘raba mu‘dîrî ‘ê ref‘û neşb û cezma wê
Di şerfê da hîn bike paşê bixûne nehwê
8. Ger tu vana hîn nekî pêş da di ‘ilmê şerfê
Tê li hev gêjo bibî di dawîya zurûfê
9. Elîf û waw û ya ku bi fi‘lê ve mutasil
Di gel nûna î‘rabê emşîlê da tîk e dil
10. Kîja ‘ilmê bixûnî tê da divê bî beza
Yan na bi ser nakevî nabî zana şareza
(Benda se‘y û xebatê)

11. Bawer im ket hişê te qîmeta hînkirinê
Niha divêm bijenim bo te mijarek dine
12. Xweda dibê se‘î ke ew e bo te bifeyde
Tembelî û sistayî ji te ra gem û qeyd e
13. Ger dixwazî ser kevî hucrê da bibî pêşîk
Cehd û lebatê bike yan na tê bibî qarîk
14. Digihîjî armancê bi teşîl û xebatê
Bê ezyet û bê zehmet naçî serê civatê
15. Ger dixwazî bilind bî bê tengî û bê talî
‘Umrê xwe wenda dikî di daxwaza mu‘halî
16. Nefsa xwe delîl nekî li pey kêfê binalî
Di hemû ‘umrê xwe da bo ziletê heval î

17. Di dema te‘ellumê ku demeka hindik e
Nefsa xwe hin bêşîne dûr û dirêj şa bike
18. Haya te l’ xewê hebe jê ra nebî evîndar
Ger tu radestê wê bî tê bimînî ustuxwar
19. Qasî lazîm e razê feqîyê jîr û şêrîn
Pir hogirê wê nebe tu ew nebin Mem û Zîn
20. Ji telefonê dûr be ji xwe bike teħşîlê
Xwe famekorî neke bî aletê te‘ûlê
21. Heta tu nebî mela telefon bo te jehr e
Qenc û xirab nas nekî ji te ra reşemar e
22. Lê gava bûyî mela te nas kir henzel û şîr
Xwe berde nav baxê wê hezaran bike nêçîr
23. Beşekî wê derya ye di devra dur û gewher
Noq be tê da û derê bîrdank tije zêrê zer
24. Ferhenga her bêjeyî Xwedê ji bo te daye
Pirtûkxaneyê mezin di berîka te da ye
25. Li vir ez dawî tînim li wê mijara mî go
Bawer im tê gihiştî te dabûnê her du go
(Benda Hevalî û Civakî)
26. Ev car dê şîrove kim hevalî û civakî
Ji dîl û can goh bidê pir baş di hişê xwe kî
27. Pêwîst e pir haydar bî li heval û hogira
Ji wan ra xwe bike erd ji wan ra bibe çira
28. Bo mezîna wek zarok bo biçûkan weke bav
Hevsalî ra wek bira nefsbiçûk her dem û gav
29. Çiqas bikî xizmetê ew şeref e ne şerm e
Ji bîrdanka xwe nebe *men xedeme xudîme*¹⁵⁰
30. Herî qencê mirovan ê bo wan qencîkar
Her dem bî kelk û sûd e alîkarê barxwar e
31. Qencî qencîyê tîne gotina şêrînzara
Heta karî bî kêr be bo muhtac û hejara
32. Heta karî bînefs be çardorê te dost û yar
Her kes dê nêzî te be ti carî nabî xemxwar
33. Nebî nebî qure bî dora xwe kêr bibînî
Her kes ji te bireve bê dost û yar bimînî
34. Dema ku bi axîfî bibişîre û bêje
Gotina xwe bipêje paşê şekir birêje

¹⁵⁰ “Heçê xizmetê bike, dê xizmeta wî bê kirin.”

35. Bi gotina nerm û xweş dertê j' qulê marê reş
Bapîra kir dîyarî ji me ra şîretek geş
36. Hinek axeftin hene weke şûra bijan in
Û hinek din jî hene bo birîna derman in
37. Heta karî bibêje nêrgiz û sosinên ter
Da ku li te bicivin di dest wan da gulên zer
38. Çi kesî neke neyar bi gotinê tirş û tal
Şêrîn şêrîn axife da nemînî bêheval
39. Bi zanîna civakî heta karî xwe şa ke
Lewra 'ilmê civakî ji bo jiyanê mak e
40. Ji bîrdankê dernexî durr û gewherên borî
Bûk e me j' te re anî bûka li pêş berbûrî
(Benda Heskirinê)
41. Niha divêm biwêjim bo te mijarek dinê
Nirxa wê herî bilind babeta heskirinê
42. Heskirin bo jiyanê xeml û xêza bûka ye
Ne zêr e û ne zîv e gewherek pir buha ye
43. Jiyan bi heskirinê bi zewq e bi şefa ye
Yan na ew jîn ne jîn e tev jan e û cefa ye
44. Şuhbeta bi dosta ra hingiv e şîfadar e
Civata tev neyara zirav e zilindar e
45. Pêşîyên me gotine bi dil be û bi dil be
Koşk û seray me navê mal kox û erda şil be
46. Em naxwazin doşeka tijî hirîya pir be
Mitêla me asîman balîfa me kevîr be
47. Yeka dî jî gotine: Zewaca ku bêdil e
Gelek giran e 'ar e wek kirasê bêmil e
48. Ji dil ji hev hes bikin ji hev ra bin alîkar
Dê wunê xweş pêş kevin tev bi hev ra dost û yar
49. Jiyan di hucrê da an jî ewa malbatî
Teng û tal e doje ye ger tê nebe biratî
50. Ên ku ji hev hes nakin ji nijadek netew bin
Dê rûnên nav şikala bê şek nêçîr û kew bin
51. Ger dixwazin her dema serkeftî bin wek şêra
Gelek ji hev hes bikin bi hev ra bin wek bîra
52. Ger ji hev du hes nekin hev ra nebin beraber
Wek kesên bêçek û rext rabin herin ceng û şer
53. *Dilkanî* lavakar e ji Rebê şev û tavê
Neyartîya hevalî nede kujerê bavê

54. Tika w rica min ji te ê hiştûjê weke şûr
Ezber bike vê metnê têke kalan û qubûr

55. Li ser resûlê Xweda tev al û eshabê wî
Şelat û selamên gur her bibarin bêdawî

(Adar, 2020)



ENCAMNAME

Edebîyata Kurdî piştî serdemeka zêrîn derbazî qonaxeka dî bû. Di qonaxa Serdema Mîrektîyan de li dor hêza mîran patronejek ava bûbû û di warê edebî û dînî de gelek berhemên hêja ji alîyê gelek şa'irên kurd ve hatibûne dayîn. Bes piştî guhorîna hindêk rewşên sîyasî ev mecalên he ji şiklê xwe guhartin. Li şûna mîr û mîrektîyan û medreseyan wan li dor tekke û terîqatan pêvajoya patronaja şêx û melayan dest pê dike. Bi her rengê heyî ev yek di sedsala bîstem de jî li gel Edebîyata Modern hebûna xwe berdewam diket. Bes ji alîyê naverok û şiklî ve rastî hindêk guhorînan tê. Ji bilî mijarên tesewîfî û evînî mijarên curawcur ên civakî jî tene nivîsîn. Ji alîyê şiklî ve kêşa kîteyî li gor erûzê berçavtir dibe. Di sedsala XXem de jî fikra neteweyî dikeve nav helbesta kurdî. Di vê serdemê de gelek mela derdikevin meydana ku temaya esasî ya dîwanên wan hizra neteweyî ye. Yek ji van melayan jî Mela Hesenê Sofyanî ye.

Mela Hesenê Sofyanî şairekî kurd ê sax e. Her çend di sala 1943yan de li gundê Kevnecarê bûbe jî bi gundê Sofyayê yê Farqîna Amedê tê nasîn ji ber ku gelek salan lê maye. Mela Hesenî, dîwaneka millî nivîsîye û di vê dîwanê de 76 helbestên serbixwe cih digirin ku li ser vîyana wî di xebata xwe de me cih da bi tenê 43 helbestên wî. Mela Hesen di helbestên xwe de mexlesên *Sofyanî* û *Dilkanî* bi kar anîne. Hem di encama lêkolînê de hem jî li ser gotina Seydayî bi xwe, hate bidestxistin ku şair wekî gelek şairên kurd ketîye bin bandora Ehmedê Xanî û Cegerxwînî. Ji alîyê fikir û şêwazê ve ev yek di helbestên wî de jî bi rihetî xuya dibe.

Nusxeya eslî ya dîwanê ji alîyê helbestvanî bi xwe ve hatîye nivîsîn. Dîwan heta niha hîç nehatîye weşandin ji bilî heşt helbestan. Di vê xebatê de me han da em hemû helbestên destûrheyî yên di dîwana wî de transkirîbe bikin û li Edebîyata Kurdî zêde bikin û arasteyî xwendevan, lêkolêr, zimanzan û edebîyatnasan bikin.

Sofyanî, dîwana xwe bi hest û helwesteka civakî û millî nivîsîye. Dema em berê xwe didin dîwana wî exleb mijarên civakî xuya dibin. Bêhtir di xêza hişê neteweyî de mijarên civakî û millî anîne zimên û li dor vê yekê pend û şîret û nesîhet li kurdan kirîne. Li dû vê yekê alîyê wî yê pendan gelek derdikeve pêş. Dîwan ji alîyê huner, vegotin û şêwazê ve pirreng e, asta edebî ya dîwanê berçav e.

Ji alîyê teşeyê ve erûz nîne; bêhtir kêşa kîteyî derdikeve pêş. Bi temamî 8 cureyên kêşa kîteyî (7, 8, 10, 11, 12, 14, 15, 16) hatine bikaranîn ku ji van herî zêde kîteyên heceyî yên 8 û 14 kîteyî hatine bikaranîn. Weke dî, helbest bi serwayên curbicur hatine xemilandin. Me di dîwanê de gelek hunerên edebî tesbît kirine. Bi her rengê heyî dîwan ji milê teşeyên nezmê, cureyên edebî û temayên xwe ve dewlemend e. Helbestên di dîwanê de bi 5 teşeyên nezmê hatine nivîsîn; mesnewî, qesîde, murebbe‘, xezel û museddes. Her wekî cureyên nezmê jî pendname, medhîye, şitaye, name û xezel cih digirin.

Yek ji xetên balkêş ên Sofyanî û dîwana wî bê guman nameyên wî ne. Name ji heval û hogirên xwe yên mela re û ji feqîyên xwe yên çûyîne leşkerîyê re şandine. Hejmara van nameyan 16 ne ku di Edebîyata Kurdî de heta niha herî zêde Seyîd ‘Elîyê Findikî nivîsîbûn bi 11 nameyan. Di vî warî de di Edebîyata Kurdî de Sofyanî dibe kesê yekem li gor hejmar/qewareya nameyan.

Weke din, Dîwan wekî taybetîyeka serdemî ji alîyê temayan ve dewlemend e; temayên neteweyî, zimanî, rexneya civakî, hevgirtin û yekîtî, li ser beg û şêx û axayan, xizanî, xwarin, evîn, dîn, geşname, tenduristî, mafên karkeran, keş û hewa, keşfên zanistî, û firoşgeh û dikandarîyê helbest nivîsîne. Li gor zanyarîyên heyîn, bi taybetî nivîsîna li ser firoşgeh û dikandarî yekem car ji alîyê Sofyanî ve bûye mijara helbestekî di Edebîyata Kurdî de. Her weha nivîsîna li ser cixareyê jî ne cureyekî berbelav e. Heger mirov bixwaze hinek alîyên helbestvanî derbêxe pêş bêguman mirov dikare balê bikêşe ser temayên wî yên evînî, civakî, millî û pendên wî ku di dîwanê de qewareyeka mezin digirin.

Gava em berê xwe didine şêwaza zimanê dîwanê, tete dîtî ku zimanekî fesîh, zelal û herikbar hatîye şuxulandin, li şûna peyv û gotinên dijwar û bîyanî bêhtir peyv û gotinên orîjînal û xwerû yên kurdî hatine bikaranîn. Helbestvan, her çend kêş zêde 3-4 zimanan bizane jî peyvên bîyanî gelek kêş bi kar anîne. Jixwe egera vê yekê ji dîwanê tê xuyanê ku çend helbestên xwe ji bo giringîya zimanê kurdî terxan kirine. Li ser vê yekê Seydayî di hevpeyvînê de jî anî zimên ku wî bi hişmendane xwe ji peyvên bîyanî dûr kirîye. Her weha ji alîyê zimên ve, ji ber ku helbestvan ji herêma Farqînê ye devoka Silîvanê berçavtir e, her wesa ji milê kurdî ve luxeta helbestvanî dewlemend e, helbestvanî sûd ji devokên dîtir ên kurmancîyê jî wergirtîye û heta ji

soranî jî. Li ber kêleka vê yekê, li ser Mem û Zîna Ehmedê Xanî jî xebateka Sofyanî ya neweşandî heye.

Wekî dûmahîk, li dû van taybetmendîyan mirov dikare bêje kalîteya helbestên helbestvanî ji aliyê tema û şêweyê ve di çarçoveya edebî, civakî, siyasî û çandî de zêde xurt e. Di heman demê de helbestvan li gel şêweya xwe ya xweser, xusûsiyetên serdema xwe dide. Mela Hesenê Sofyanî helbestvanekî kurd ê serdema modern e û girêdayî esasên Edebîyata Kurdî ya Klasîk a sedsala XXem dîwanek nivîsîye ku bû mijara xebata me. Li dû vê yekê em dixwazin ev xebat li Edebîyata Kurdî zêde bibe û bo lêkolîn û lêkolanan bibite çavkanîyek û cihê sêdwergirtinê.

JÊDER

Acar, Hayrullah, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr, Nûbihar*, Stenbol, 2016.

Acar, Hayrullah, “Ji Destpêkê Heta Îro Qonaxên Rojnamegerîya Kurmancî”, *Di nav, “Mecmû’aê Meqalatê Nexwostîn Hemayeşê Beynelmîlêlî, Danişgehê Kurdistan, Îran*, 2010, r. 562-584.

Adak, Abdurrahman, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar, ç.3, 2015.

Adak, Abdurrahman, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, Nûbihar Stenbol, 2019.

Adak, Abdurrahman, “Aheng û Mûsîqî di Helbestên Melayê Cizirî de” *Mukaddîme* hj. 8 (3), r. 41-76.

Adak, Abdurrahman, “Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de” *Nûbihar Akademî*, Stenbol, hj. 10, sal 5, r. 11-58. 2018.

Adak, Abdurrahman, “Şêx Muhyedînê Hênî: Di Edebiyata Kurdî de Nûnerek Girîng ê Temaya Xwarinê” *Nûbihar Akademî*, hj. 3, 2015.

Adak, Abdurrahman, “Serdema Xalidîtîyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de” *Kürt Tarihi*, hj. 30, Stenbol, r. 59-64, 2017.

Aksoy, Hasan, “Şitaiyye”, TDV İslâm Ansiklopedisi, c.39, Ankara, 2010, r. 216.

Aktaş, Murat, Yonat Mehmet, *Çapemenîya Kurdî Dema Osmanîyan Berdan matbaacılık*, 2013.

Akyüz, Yahya, *Türk Eğitim Tarihi*, weş: Alfa, ç.8, Bursa, 2001.

Arpa, Abdulmuttalip, “Bingöl’de Medreseler ve Müderrisler” *Bingöl Araştırmaları Dergisi*, r. 29-42, 2014.

Arslan, Mesut, “Nêrîneke Giştî li Nameyên Menzûm di Edebiyata Kurdî (Kurmancî) ya Klasîk de”, *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilgiler Dergisi*, 2023 (11) 3, r. 689.703.

Aslanoğlu, Osman, “Di Mem û Zînê de Çend Hunerên Wateyî” *Mukaddime*, hj. 10 (1), 2019.

Bala, Sabahattin, *Şark Medreseleri*, Hiper yayın, Stenbol, r. 81-82, 2009.

Baran, Bahoz, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Belkî, 2012.

Bruinessen, Martin Van, *Kürdistan Üzerine Yazılar*, İletişim Yayınları, Stenbol, 2000.

- Bozarslan, M. Emîn, *Mem û Zîn Wergerê Tipên Latini û Kurdiya Xwerû Weşanê* DENG, ç.3, Stenbol, 2010.
- Bozkurt, Nebî, “Mektup”, *TDV İslam Ansiklopedisi*, c.29, Ankara, r. 13-14, 2003.
- Bulut, Ali, *Belagat Terimleri Sözlüğü*, weş: M.Ü. İlahiyat Fakültesi, No.355, Stenbol, 2015.
- Bülbül, Mikail, *Helbesta Cegerxwîn û Îqtîdar*, weş. Lîs, Diyarbakır, 2016.
- Bülbül, Mikail, “Risteyên Peywendîyê û Peyvrezîya Wan (Devoka Mêrdînê)” *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, c.2, r. 22-45, 2016.
- Bülbül Mikail, “Prensîpên Amdekirina Ferhengêka Otografîk ji bo Kurdîya Kurmancî” *Nûbihar Akademî*, hj. 20, r. 34-49, 2023.
- Cegerxwîn, *Agir û Pirûsk*, weş. Avesta, ç.7, Stenbol, 2014.
- Cegerxwîn, *Hayat Hikayem*, wer: Gazî Fîncan, weş. Evrensel, Stenbol, 2003.
- Ciwan, Murad, *Çaldıran Osmanlılar Safeviler ve Kürtler*, Avesta, Diyarbakır, 2015.
- Cîhanî, Perwîz, *Şiroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*, weş. Nûbiharê, Stenbol, ç.2, 2013.
- Coşkun, Menderes, *Sözün Büyüsü Edebi Sanatlar*, Dergah, ç.2, Stenbol, 2010.
- Çağmar, M. Edip, *Alıştırmalarla Belagât Arapça Dil Bilgisi*, weş. Ensar, İstanbul, 2022.
- Çağmar, Mela İhsan, Hevpeyvîn: “Silvan’ın Tewerz Köyünden Mele İhsan Çağmar ile Medrese Eğitimi ve Yaptığı İmamlık Görevi Üzerine Bir Söyleşi”, *e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, hj. 9, r. 163-178, 2013.
- Çağmar, M. Edip, “Siirt ve Çevresindeki Medreselerde Eğitim”, *Uluslararası Siirt Sempozyumu, Şarkiyat Araştırmaları Derneği*, r. 668-681, 2007.
- Çölemerikli İhsan, *Hakkari Sûretleri*, weş: Lîs, Amed, 2006.
- Dilovan, Selman, *Dîwana Melayê Cizîrî*, Nûbihar, Stenbol, 2010.
- Dilçin, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, weş. Türk Dil Kurumu, ç.9, Ankara, 2009.
- Dost, Jan, *Mem û Zîn Şîrove û Kurdiya Îro*, weş. Avesta, Stenbol, 2010.
- Ergün, Zülküf, “Di Helbesta Kurdî de Destpêka Rêbaza Romantîzmê û Taybetmendîyên Romantîzma Hacî û Cegerxwîn” *Nûbihar Akademî*, hj. 1, Stenbol, r. 11-33, 2014.
- Eroğlu, M. Şerif, *Bütün Yönleriyle Arabkendi*, weş: Kent, Stenbol, 2004, r. 21-25

- Hêvîdar, M. Êhsan, “Seydayê Mela Yehya Ferhendî”, *Nûbihar*, hj. 104, Stenbol, r. 48-51, 2008.
- Hêzîl Samî, *Wêjeya Kurdî*, Sîtav, Wan, 2015.
- Işık, İbrahim S., *A’dan Z’ye Kürtler* ç.5, Nûbihar, Stenbol, 2017.
- Izady, Mehrdad “Kürtler” wer. ji îngilîzî: Cemal Atila, weş. Doz, ç.3, Stenbol, 2011.
- İpekten, Haluk, “Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekiller ve Aruz” *Dergâh*, Stenbol, 2014.
- Karataş, Turan, *Ansiklopedik Edebiyat Terimleri Sözlüğü*, Akçağ Yayınları. ç.2, Ankara, 2004.
- Khalid, Hewa Salam, “Zimanê Kurdî, Malbat û Zarên Wî” *Kurdîname*, hj. 1, p10, 2019.
- Kocakaplan, İsa, *Açıklamalı Edebi Sanatlar*, weş. Türk Edebiyatı Vakfı, Stenbol. 2011.
- Kurdo, Qenatê, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Öz-Ge yayinlari, Ankara, 1992.
- Kutschera, Chris, *Kürt Ulusal Hareketi*, Avesta, Stenbol, 2013.
- Külekçi, Numan, *Edebî Sanatlar*, weş. Akçağ, ç.4, Ankara, 2005.
- Malmîsanij, Lewendî, Mahmûd, *Rojnamegeriya Kurdî*, Öz-Ge Yayınları, c.2, Ankara, 1992.
- Malmîsanij, *Cızira Botanlı Bedirhaniler*, weş: Avesta ç.3, Stenbol, 2009.
- Nêrweyî, ‘Elî Teter, *Bizava Sîyasî li Kurdistanê 1908-1927*, ltnz: Mihemed Xelatê Ertoşî, Sîtav, Wan, 2023.
- Resûl, İzzeddin Mustafa, *Bir Şair Düşünür ve Mutasavvıf Olarak Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn*, Avesta, Stenbol, 2007
- Nas, Taha & Aydın, Tahirhan & Adak, Abdurrahman & Ergün, Zülküf, *Dîwana Mela Ehmedê Zinarexî*, Nûbihar, Stenbol, 2018.
- Özoğlu, Hakan, *Dewleta Osmanî û Neteweperwerên Kurd* wer: Ali Karadeniz, weş: Kitap yayınevi, Stenbol, 2012.
- Sağnıç, Feqî Huseyn, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, weş. Enstitûya Kurdî ya Stenbolê, Çapxaneya Bedan Matbaacılık, Çapa Yekem, Stenbol, Berfanbar 2002.
- Saraç, Ender, *Klasik Edebiyat Bilgisi Biçim-Ölçü-Kafiye*, weş: 3f (ç.2) 2007.
- Saraç, M. A, *Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat*, Weşanên 3F, ç.3, Stenbol, 2007.

- Saraç, Yekta, *Klâsik Edebiyat Bilgisi Biçim – Ölçü – Kafiye*, 3F Yayınevi, ç.2, Stenbol, 2007.
- Seyda Dilkanî, “Seydayê Mela Yehya”, *Nûbihar*, hj. 16, Stenbol, r. 16, 1994.
- Seyda Dilkanî, “Hela Rabe”, *Nûbihar*, hj. 20, Stenbol, r. 17, 1994.
- Seyda Dilkanî, “Melayê Qurişa”, *Nûbihar*, hj. 34-35, Stenbol, r. 42, 1995.
- Seyda Dilkanî, “Çengek Tişt”, *Nûbihar*, hj. 34-35, Stenbol, r. 43-44, 1995.
- Seyda Dilkanî, “Ji Bo We”, *Nûbihar*, hj. 47, Stenbol, r. 6., 1996.
- Seyda Dilkanî, “Geşta Serhedê”, ltnz: M. Êhsan Hêvîdar, *Nûbihar*, hj. 104, Stenbol, r. 55-57, 2008.
- Seyda Dilkanî, “Derbarê Cigareyê de”, *Nûbihar*, hj. 39, Stenbol, r. 39, 2009.
- Seyda Dilkanî, “Pesnê Pêşkêşê Mezin Barzanî”, *Nûbihar*, hj. 152, Stenbol, r.85, 2020.
- Smit, Anthony D. *Milliyetçilik Kuram İdeoloji, Tarih* wer: Umit Hüsrev Yolsal, weş: Atıf, Ankara, 2013.
- Şakelî, Ferhad, *Mem û Zîn’de Kürt Milliyetçiliği*, weş: Doz, ç.2, Stenbol, 1996.
- Şemrexî, Huseyn, *Mem û Zîn a Xanî*, weş. Nûbihar, Çapa Sêyem, Stenbol, 2013.
- Pala, Îskender, *Ansiklopedîk Divân Şiirî Sözlüğü*, Weş. Kapı, ç.18, Stenbol, 2012.
- Pala, Îskender, “Nasihatname” *TDV Ansiklopedisi*, r. 409-410, 2009.
- Tan, Altan, *Kürt Sorunu*, weş. *Timaş*, ç.11, Stenbol, 2011.
- Tekin, Sebatullah, “Kürt Milliyetçiliğinin Gelişimi ve Ulusun İnşası Politik Şiddet, Yayıncılık ve Aydınların Rolü”, *Kürt Araştırmaları*, 18.03.2022.
- Tok, Vedat Ali, *Edebî Sanatlar Ansiklopedisi*, Stenbol. Literatürk, 2011.
- Turan, Yusuf, *İndeksa Kovara Nûbiharê (Cîld I-XII)*, Zanîngeha Mardin Artuklu Mêrdîn, 2018, (Teza Neweşandî ya Lîsansa Bilind).
- Türk Dil Kurumu Sözlüğü, 2024.
- Türkan, Mahsum, *İndeksa Kovara Nûbiharê (Cîld XIII-XXIV)*, Zanîngeha Mardin Artuklu, Mêrdîn, 2021, (Teza Neweşandî ya Lîsansa Bilind).
- Varlî, Ebdullah M. Varlî, *Dîwan û Jînewarî ya Ahmed ê Xanê*, weş: Sîpan Yayîn Evî, Stenbol, 2004.

- Yıldırım, Kadri, *Ehmedê Xanî Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlili*, Avesta Stenbol, 2016.
- Yıldırım, Kadri, *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, Ağrı Kültür ve Dayanışma Derneği, Ağrı, 2011.
- Yıldırım, Kadri, *Ehmedê Xanî Külliyyatı IV: Dîwan*, weş. Avesta, Stenbol, 2014.
- Yıldırım, Kadri, *Fêrkerî Soranî*, weş: Berdan Matbaacılık, Stenbol, 2014.
- Yıldırım, Serdar, “Kürtler” *TDV Ansiklopedisi*, ç.3, Ankara, r. 122-128, 2019.
- Yıldız, Mehmet, *Dîwana Heyderî (Şêx Mihemed Emînê Heyderî): Metn û Lêkolîn* Teza Masterê, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Mêrdîn, 2020, (Teza Neweşandî ya Lîsansa Bilind).
- Yonat, Mehmet, “Di Devokên Kurdîya Kurmancî de Rewşên Morfolojîk (Mînakên Devokên Bakur, Başûrê Rojhelatê û Başûrê Rojavayê)”, *Mukaddime*, 2020, 11 (2), r. 410-445.
- Zeki Beg, Mehmet Emin, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Nûbihar, ç.2, Stenbol, 2011.
- Zivingî, Mela Ehmed, *Gerdenîya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, Avesta, Stenbol, 2013.
- Zivingî, Necat, *Stêrkên Edebîyata Kurdî*, Banga Heq, Stenbol, 2014.

Malperên Înternetê;


- Adak, Abdurrahman, “Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Bihar û Bihariye,” *Çandname*, 2017, malper: <https://candname.com/di-edebiyata-kurdi-ya-klasik-de-bihar-u-bihariye/> (04.07.2024)


Hevdîtîn û Hevpeyvîn:


- Mela Hesenê Sofyanî (03.04. 2022, 06.11.2023, 06.07.2024)
- Mela Remezanê Birîfkanî (10.07.2024)
- Mela Remezan Can (11.07.2024)
- Mela Remezanê Dedaşî (11.07.2024)
- Ehmed Kanî (13.07.2024)

PÊVEK


Wêne 1: *Bergê Nusxeya Dîwanê yê Orîjînal*








Wêne 4: Rûpela 60ê ya Dîwanê



Wêne 5: Rûpela 80yê ya Dîwanê



Wêne 6: *Mela Hesenê Sofyanî*



Wêne 7: Wêneyê Komî



(Ji milê rastê ve: M. Edip Çağmar, Abdurrahman Adak, Mela Hesenê Sofyanî)



T.C

MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSTESİ

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

MELA HESENÊ SOFYANÎ’NİN DİVANI:

METİN VE İNCELEME

Halit ERTAŞ

21711013

Danışman

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mardin – 2024